DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

**https://rantey.org**

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

Ereb Şemo

# ŞIVANÊ KURD
# LE BERGER KURDE



kurdî-fransizî
kurde-français

INSTITUT KURDE DE PARIS

Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Ereb Şemo

# ŞIVANÊ KURD
# LE BERGER KURDE

kurdî-fransizî

kurde-fançais

*traduit en français*
*par Basile Nikitine*
*ancien consul de Russie à Ourmiah*

INSTITUT KURDE DE PARIS
106, rue La Fayette, 75010 Paris
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

DU MÊME AUTEUR / JI EYNÎ NIVÎSKARÎ

*Xo-xo hînbûna xandina nvîsana kurmancî,*
(Apprendre soi-même l'écriture kurde),
Erîvan, 1929, (bi hevkariya J. Marogûlov).

*Emrê Lenîn* (La vie de Lénine), Erîvan, 1930.

*Kara kolxoza gundiya ra* (Pour les kolkhozes paysans), Erîvan, 1930.

*K voprocu o feodalizme u Kurdov,*
(Pirsa feodalîzmê li cem Kurdan/De la question du féodalisme chez les Kurdes), Erîvan, 1958.

*Berbang* (L'Aube), roman, Erîvan, 1958.

*Jiyîna Bextewar* (La vie heureuse), roman, Erîvan, 1959.

Berevok (Recueil), Erîvan, 1969.

*Dim-dim* (forteresse de Dim-dim), roman historique Moscou, 1974

© Institut Kurde de Paris, 1989
Dépôt Légal : décembre 1989

ISBN 2-908416-01-8

Imprimé en Italie
Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

# ŞIVANÊ KURD
# LE BERGER KURDE

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ŞIVANÊ KURD çîroka jiyana hîmdarê edebiyata Kurdên sovyetî Ereb Şemo ye. Nivîskar di malbateke koçerên kurd de hatiye dinê û di zarotiya xwe de şivantî kiriye. Bilî zimanê dayika xwe, ew di jiyanê de hînî fileyî û tirkî bûye û di dibistana gundê xwe de fêrî nasîneke têrker a xwendin û nivîsandina rûsî jî bûye. Ew hê xort bû gava Şerê Cîhanî yê Yeka dest pê kir. Bi saya nasîna xwe ya zimanan ew karî di ordiyên rûs ên ku Kurdistanê dagîr kirin û ketin nav tixûbê Tirkiyê bibe tercuman. Ji ber belengaziya zarotiya xwe ew tiyê bextiyariyeke mestir bû û gava ku Şoreşa 1917 qewimî ewî baweriya xwe bi îdeala komunîst anî.

Di salên Şerê hundir de Şemo wek dilxwaz şer kir û piştî serketina bolşevîkan, bû yek ji sazkerên sereke yên sovyetan li nav eşîrên kurd ; ewî tevî J. Maragûlov di sala 1929 alfabeyeke kurdî bi tîpên latînî çêkir li Ermenistana sovyetî (Piştre, di 1940 de, alfabe kirîlîk a rûsî li Kurdên Sovyetî hate ferz kirin.). Ji sala 1921 ve ew di şerê dijî "beg, axa û şêxên feodal" ên kurd de roleke muhîm leyist, lê di dawiyê de li wî jî hate gilî kirin û ew di 1937 de şandin sirgûnê. Piştî 17 salan li kampên Sibiryayê di sala 1954 de bêrîtiya wî hate nasîn û ew vegeriya Rewanê. Ta mirina xwe, di 1978 de, ew li wê derê jiya û xwe da xebata xwe ya edebî.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

LE BERGER KURDE est le récit autobiographique d'Ereb Chémo, fondateur de la littérature kurde soviétique. Né dans une famille de pauvres nomades kurdes l'auteur débuta dans la vie comme pâtre. Par la pratique, outre sa langue maternelle, il apprit l'arménien et le turc et, à l'école de son village, il acquit même une connaissance suffisante de la lecture et de l'écriture en russe. Il était tout jeune adolescent lorsqu'éclata la Première Guerre Mondiale. Fort de ses connaissances linguistiques, il réuissit à se faire prendre comme interprète par les troupes russes qui occupèrent le Kurdistan et pénétrèrent en Turquie. Les misères de son enfance le faisaient aspirer à plus de bonheur qu'il crut trouver dans l'idéal communiste, lorsque se déclencha la Révolution en 1917.

Engagé volontaire dans l'Armée rouge pendant la guerre civile, Chémo, après la victoire des bolcheviques, devint l'un des principaux artisans de l'organisation des soviets parmi les tribus kurdes; il fut aussi, avec J. Maragoulov l'un des auteurs de la latinisation en 1929, de l'alphabet kurde en Arménie Soviétique (plus tard, en 1940, l'alphabet cyrillique a été imposé aux Kurdes soviétiques). A partir de 1921 il joua un rôle important dans la chasse aux "koulaks, féodaux et chefs religieux" kurdes, et fut à son tour dénoncé et déporté en 1937. Après 17 années de camp en Sibérie, il fut réhabilité en 1954, regagna Erévan où jusqu'à sa mort, survenue en 1978, il se consacra à la littérature.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Di *Şivanê kurd* de Ereb Şemo, bi awayekî gelek xwezayî û sade û ne bê şiîr, bûyerên her roj, jiyana eşîrên kurdên koçer bi me dide nasîn. Mirov ewê nikaribe van nivîsaran bê heyecan û bê eleqe bixwîne, nemaze ji ber ku êdî îro ev orf û adet ên sedsalan di piraniya Kurdisanê de li ber windabûnê ne.

Ev çîrok afirandina navdartir a edebiyata Kurdên sovyetî ye. Navdariya wê ya li nav Kurdan ji bo pareke mezin, ji çapa wê ya ku dostê me yê rehmetî Nûredîn Zaza di 1947 de li Beyrûtê belav kiribû tê. Ev çapa bi wêne bi nihênî li her aliyên Kurdistanê belav bû û tesîreke mezin kir li ser ciwanên kurd ên xwenda.

Kurdiya vê çapa nû jî bi bingehî ya metnê Dr. Zaza ye, tenê hin kêmasiyên wê hatine temam kirin û ji ber eslê wê hin guhartin tê de hatine kirin. Heçî wergerandina fransizî, ew bi qelema kurdnasê bi nav û deng Bazîl Nîkîtîn, qonsulê kevn ê Rûsya li Wirmê, nivîskarê nemaze kitêba hêja *Les Kurdes, étude sociologique et historique, édition Klincksieck, Paris, 1956,* hatiye pêk anîn. Nîkîtîn ew di 1946 an de li ber wergerandina rûsî ya ku di sala 1935 de li Tiflîsê ji ber *Şivanê Kurmancan* (Erîvan, 1935) çap bûbû kiriye zimanê fransizî. Wergerandina Bazîl Nîkîtîn ta nihu li tu ciyan derneketibû. Û çapa kurdî jî demeke dirêj e ku peyda nedibû. Bi vê çapa du-zimanî ya vê çîroka navdar, em hêvîdar in ku xwendineke dewlemend û balkêş pêşkêşî xwendevanên pircure bikin ; ên ku bi fransizî an kurdî dipeyivin û berî hemiyan, ciwanên kurd ên ku fransizî hîn dibin û fransizîaxêvên ku dixwazin hînî kurdî bibin û kêmasiya metnên du-zimanî dikşînin.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Dans le *Berger kurde*, Ereb Chémo, avec beaucoup de naturel et de simplicité et non sans poésie, nous fait connaître, dans les détails de tous les jours, la vie au grand air des tribus nomades. On ne lira pas ces récits sans émotion ni non plus sans intérêt, d'autant plus que ces coutumes séculaires ont pratiquement disparu dans la majeure partie du Kurdistan.

Ce récit est l'œuvre la plus connue de la littérature kurde soviétique. Il doit en grande partie sa notoriété parmi les Kurdes à l'édition que notre regretté ami Noureddine Zaza en fit en 1947 à Beyrouth. Cette édition illustrée circula sous le manteau dans l'ensemble du Kurdistan et eut un grand impact sur la jeunesse kurde instruite.

La version kurde du présent ouvrage reprend, pour l'essentiel, le texte établi par le Dr. Zaza en y apportant quelques remaniements et en comblant ses lacunes. Quant à la traduction française, elle est due à la plume de l'éminent kurdologue Basile Nikitine, ancien consul russe à Ourmiah, auteur notamment de *Les Kurdes, étude sociologique et historique, édition Klincksieck Paris, 1956*. Elle a été menée à bien en 1946 à partir d'une traduction russe publiée en 1935 à Tbilissi d'après l'original kurde édité la même année à Erévan. La traduction de Basile Nikitine était restée jusqu'à ce jour inédite. Et l'édition kurde depuis longtemps introuvable. En publiant le texte intégral de ce récit célèbre, nous espérons offrir une lecture riche et intéressante à un public multiple : francophones et kurdophones et, en premier lieu, les jeunes Kurdes étudiant le français et les francophones désireux de s'initier au kurde, qui souffrent du manque de textes bilingues.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

BIRA PÊŞÎN

## 1- Malbat û zarotiya min

Şemo Şamil ji Eşîra Hesenî, Kurdekî bê milk bû. Di mentîqeya Sûrmelî de -berê tabiê Hikûmeta Erîvanê- şivanî dikir. Piştî ko jina wî mir, Şemo her du kurên xwe -Bro û Derwêş- bi xwe re birin û ji wê derê derket.

Di himbêzê de, bi van her du zarokan re bi rê ve çûn, jê re ne hêsanî bû. Bro hîngê sê û Derwêş jî du salî bûn; ji bextê wî yê baş, pêre ji bo hilgirtinê tiştên din tunebûn.

Li nêzîkî Qersê, di gundê yûnanî Azatê de, Şemo li cem Yûnanekî bi navê Tôdor bû şivan. Li cem Todor bi navê Mayane, keçeke bêkes hebû. Şemo Şamil xwest vê keçikê ji xwe re bîne. Lê, xadimeke bê dê û bav wek milkê axayê xwe tê hisab kirin. Todor dizanî ku Kurd jinên xwe bi pere tînin, ango qelen didin, ji lewre, ewî ji Şemo Şamil xwest ku du salan belaş pezê wî biçêrîne. Şemo careke dî çavên xwe li Mayane gerandin, û ji bo jineke ewqas delal xebata du salan kêm dît û bi dilxweşî razî bû.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

PREMIERE PARTIE

# 1- Ma famille. L'Enfance

Chémo-Chamil était un Kurde sans terre, de la tribu des Hasani. Il travaillait comme berger dans le district de Sourmaly du ci-devant Gouvernement d'Erivan. Quand sa femme fut morte, il prit ses deux fils, Bro et Davrech, et quitta tout-à-fait le district de Sourmaly.

Il ne lui était pas facile de marcher en portant dans les bras les deux fils. Bro avait trois ans et Davrech deux. C'était encore bien que Chamil n'est rien eu d'autre à emporter.

Pas loin de Kars, dans le bourg grec d'Azat, il s'engagea comme berger chez un Grec, Todor, qui avait comme ouvrière une Kurde, sans famille, jeune fille du nom de Maianeh. Chémo Chamil voulut l'épouser. Maianeh n'avait plus de parents, ils étaient morts du choléra. L'ouvrière sans famille appartenait en quelque sorte au patron. Todor qui savait que les Kurdes payent pour la fiancée la dot (*kalym*) déclara qu'il ne donnerait Maianeh qu'à la condition que Chamil, deux années durant, fasse paître son bétail sans être payé. Chémo Chamil fixa une fois de plus son regard sur Maianeh et consentit, heureux de ne pas devoir travailler longtemps pour une si bonne femme.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Di kadînekê de, bi kêfxweşî daweta wan çêbû.

Mayane, xweş bi kêrî îşên malê dihat. Ji hiriyê rîs dirist û benik çêdikir û jê jî palas diwûnandin. Her du xweşkên min - Çîçek û Gulzar - û ez Ereb Şemo, em di vê kadînê de hatin dinê. Diya min her du kurên mêrê xwe - Derwêş û Bro - diêşandin, lê em zaro me gelek ji hev hez dikir.

Şemo di zivistanê de, li cem dewlemendan dibû rencber û li karên wan dinêrî. Zar û zêçên wî êdî pir bûbûn. Bi xebatên xwe yên rojê, dê û bav, bi zor em xwedî dikirin. Tenûra me di nav kadînê de, di zivistanê de, carna bi rojan ve bê agir dima. Tu dewarê me nebû ku em ji ziblê wan sergîna çêkin û tevî kayê tenûra xwe pê germ bikin, ji ber ku li aliyê me dar û devî nebûn.

Pircaran, dadê, li cem xelkê bi rojê kar dikir, bi wan re li hev dihat ku bihêlin em zaro, li axurê an li gova pez rûnin, ji ber ku di zivistanê de ciyê pez û dewar germ dibe. Lê tu xwedî belaş nedihişt em xwe germ bikin. Ji lewre, gava dadê li mala wan dişixulî emir didane me ku em li ber alifên miyan rûnin û ji sibê heya êvarê, birçî êmên ku ji alifan diketin em wan berhev bikin û dîsa wan deynin cihê wan. Eger em li wê nebiwana, miyan pê li ewqas qûtên giranbiha bikirina.

Gava em hinek serbest diman, xwediyê pez helez datanî ber me ku em ji bo sobeya wî, wî hûr bikin. Êvarê, piştî şixul, bi dadê re, ji tab ketî, bi lez û bez em diçûn kadîna xwe ya cemidî.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

On a joyeusement fêté la noce dans une grange de foin (*parak*) où on conservait pour l'hiver le fourrage pour le bétail.

Maianeh s'est mise à des travaux divers de ménage ; elle filait la laine et tissait des tapis (*palas*). Mes soeurs Tchitchak et Gogui - ainsi que moi Arab Chamil, naquîmes dans la grange. La mère traitait durement ses beaux fils Davrech et Bro, mais quant à nous, les enfants, nous nous aimions tous bien.

Chémo notre père, s'embauchait l'hiver entier chez des propriétaires pour donner les soins au bétail. Sa famille, en effet, était devenue trop grande. Au prix d'efforts quotidiens, le père et la mère arrivaient tant bien que mal à nous nourrir. Le poêle (*tondyr* creusé en forme d'amphore dans le sol) de notre grange restait chaque hiver plusieurs jours sans feu. Nous n'avions pas de bétail à nous et on n'avait pas de quoi chauffer le poêle qu'on remplissait de bouse séchée avec de la paille (*kiziak*). Il n'y a pas de forêts dans nos parages.

Fréquemment, la mère, en s'embauchant pour travailler à la journée s'entendait pour qu'on nous laissât nous autres, les petits, nous asseoir à l'écurie ou à l'étable aux brebis du propriétaire, car en hiver il fait chaud avec le bétail... Cependant, pas un seul propriétaire ne nous laissait nous chauffer pour rien. Pendant que la mère travaillait, on nous ordonnait de nous asseoir à côté des auges pour les brebis. Et tout au long de la journée, affamés, nous ramassions par terre et remettions dans les auges la pitance des brebis qui, en mangeant la laissaient tomber par terre. Si nous n'avions pas été là, les brebis auraient piétiné quantité de nourriture précieuse.

Aux moments libres, nous découpions en tranches le kiziak, le poêle du propriétaire. Après le travail, nous nous dépêchions avec la mère, fatigués de regagner notre grange froide.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ji roja ku ez hinek mezin bûn, min xwest ez bibime şivan. Birayên min ji nihû de bi bavo re diçûn çolê wek du şivan û arîkariya wî dikirin û ewî jî ew hînî şivantiyê dikirin.

Daxwaza min bi cî bû. Rojekê, serê sibê, bi bav û birayên xwe re ez çûm çolê ber golikan. Wê roja ha, diya me jî bi me re hat da ku pincaran şanî me bide (spînk, tirşo, mendik, pêkesk, hwd...). Diviya bû, em şivan, zikê xwe bi nan û pincaran têr bikin. Dadê, heftekê bi me re hate çolê. Piştî ku me ev pincarên ha naskirin, ew êdî nema hat. Her sibê, ewê perçeyek nanê lewaş û hinek xwey bida me da ku em wan bi pincaran bixwin. Birayên min, pincarên ku tên xwarin û ên nayên xwarin ji hev nas nedikirin û ew ji min dipirsîn? Diya min pesnê min dida û digo gava ez mezin bibim ezê bibim şivanekî pispor.

Bavê me jî, giyayên ko bi kêrî pez nedihatin şanî me didan. Kîjan giya di pez de kurm pêyda dikin, bi kîjana pezên nexweş tên derman kirin, û pez ji guran çawa tê parastin.

Di destpêkê de, me pincar ji bo xwe berhevdikirin û ew bi nanê xwe dixwarin. Lê, piştre, diya me, hîn giyayên din ji me re dan naskirin, wek : spîdak, gûtik û sîso. Me ew hişk dikirin, ji bo ku zivistanê bixwin. Tûrikek dabû her yek ji me û diviyabû em bi xwe re ji çolê miqdarek gotî ya pincarê bînin. Diya me ew dineqandin, ew datanîn ser hev, û baş hişkirî, ew hiltanîn ji bo rojên zivistanê.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Dès que j'eus grandi un peu, je voulus devenir berger. Mes frères s'en allaient déjà dans la campagne comme aide-bergers pour assister le père qui leur apprenait comment faire paître le bétail.

Mon désir se réalisa. Un matin de bonne heure, avec le père et les frères ainés, je partis pour faire paître les agneaux. Ce jour là, la mère se joignit à nous pour montrer quelles sont les herbes comestibles : *spynk, trcho, mendyk et pekask* (épinard, oseille sauvage, etc..). Comme bergers, nous devions nous nourrir de ces herbes. La mère vint avec nous dans la campagne pendant une semaine environ. Après que nous eûmes bien appris à distinguer les herbes, elle cessa de nous en montrer. Tous les matins, elle nous donnait à chacun le même morceau de pain (*lavach*, en forme de galette mince), un peu de sel, et nous mangions de l'herbe avec le pain. Mes frères oubliaient souvent les caractéristiques des herbes utiles et s'adressaient à moi. La mère me louait en disant que j'avais bonne mémoire, et que, quand je grandirai, je serai certainement *pispor*, berger-chef, connaisseur.

Quant au père, il nous indiquait quelles sont les herbes nuisibles aux moutons, quelles plantes leur donnent des vers, quelles sont les autres qui servent à soigner les moutons tombés malades et comment on doit protéger les brebis contre les loups.

Pour commencer, nous ne cueillions les herbes que pour nous-mêmes et les mangions avec du pain. Mais après la mère commença à nous apprendre aussi à distinguer d'autres herbes - *spidak, goutyk et sso*. Nous faisions sécher ces herbes et en ramassions une provision pour manger en hiver. Chacun de nous reçut une sacoche à lui et devait rapporter en revenant de la campagne une quantité définie d'herbes. La mère triait ce que nous apportions, tressait les herbes en nattes, les séchait et les gardait pour l'hiver.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Gava em hîn mezintir bûn dadê ji me di zeviyan de peydakirina helezê xwest, me jî her gav bi xwe re hinek jê tanî mal.

Me rêxa hişk jî berhev dikir, bi avê şil dikir û jê sergîn çêdikir. Li ber germiya tavê, tepikên me hişk dibûn, û êvaran me ew bi xwe re dibirin mal. Her yek ji me, dibiyabû her êvar deh liban jê bîne. Lê, ê min bi xwe, kêfa min ji pîskirina destên min bi ziblê nedihat. Dadê gazina ji min dikir û ez ceza dikirim.

Dê û bav jî ji xebata me kêfxweş bûn. Vê zivistana ha, tirsa me ji sermê ewqas ne giran bû. Me têra xwe helez, pincar û sergîn pêkanîbûn.

Payîzê, nîv tazî, em ji sermê, baran û zîpika gelek diêşiyan. Bê sebir, em li benda ketina berfê bûn ko em neçin çolê.

Sala şivantiya me ya pêşîn bi vî awayî derbas bû. Li mal, nivîna me ji kayê bû. Me ew li erdê radixist û me hesîrek ji giyayê nerm çêkirî datanî ser; balgêha me jî ji vî giyayî bû. Li ser xwe jî me merşeke fireh davêt. Em zaro, li cem hev, li ser rêzekê, radizan, û di navbera me de pevçûn bê hesêb bû, heryekî ji me dixwest li nîvîn raze, ji ber ku ew der hêj germtir bû. Herwekî ez piçûkê gişan bûm, ew ciyê şeref pir caran, ji min re dihiştin.

Di vê zivistanê de, cara pêşîn, agirê me hebûn, û dadê gelek bi kêfxweşî tenûr germ dikir. Piştî ku şîva me çêdibû û nan dihate pehtin, diya me bi palaseke


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Quand nous grandîmes, la mère nous donna pour tâche la préparation du kiziak dans les champs, que nous apportions par petites quantités à la maison.

Nous ramassions la bouse sèche, la trempions dans l'eau et en façonnions des briquettes. Sous le soleil brûlant, les briquettes arrivaient à sécher pour le soir et nous les rapportions à la maison. Chacun de nous devait apporter chaque jour dix pièces, mais moi, souvent, je ne remplissais pas ma tâche ; il ne me plaisait guère de me souiller les mains dans le fumier comme dans la pâte et la mère me grondait et me punissait.

Le kiziak et les herbes ont quelque peu allégé notre existence cet hiver là. Le père et la mère se réjouissaient que nous ne perdions pas de temps ; nous nous appliquions à chercher les meilleures herbes et préparions du kiziak.

En automne, à moitié nus, nous souffrions beaucoup dans les champs du froid, des pluies et de la grêle. Nous attendions avec impatience la première chute de neige qui nous dispenserait d'aller aux champs.

Ainsi se passa la première année de notre métier de berger. Notre lit de maison était fait avec de la paille. On l'étendait en couche égale par terre et on la couvrait avec une natte tissée d'une herbe très souple. Sous la tête, à la place de l'oreiller, on mettait de la même herbe, le tout recouvert d'un palas large et long. Nous autres, les enfants, nous dormions tous ensemble, en un rang, et les querelles étaient fréquentes entre nous : chacun voulait se trouver au milieu, où il faisait plus chaud. Cette place d'honneur on me la cédait souvent à moi qui étais le plus petit.

Pour la première fois, cet hiver là, on avait du combustible, et maman chauffait avec joie le tondyr. Dès que le dîner était préparé et le pain cuit, maman recouvrait le *tondyr* avec



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

mezin devê tenûrê digirt ku bi şev sar nebe. Êvaran, em li dora tenûrê rûdiniştin û me lingên xwe dixistin tê de û xwe germ dikir. Diya me ji pincarên ku ji havînê de me hişk kiribûn (tirşoyê kelandî) ji genim danû, û ji ard haşil, ji ardê qelandî jî devşewitî û gelek xwarin rengareng pêk tanîn.

Ji bo çêrandina çêlekan, bavê min genim distand. Ewî bi vî karî, ji destpêka nîsanê heya dawiya çiriya paşîn, ango heya ketina berfa ewil radibû.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nos palas, pour qu'il ne perde pas sa chaleur pendant la nuit. Le soir, nous nous assoyions autour du *tondyr*, y laissions pendre nos jambes et nous nous chauffions. Maman préparait à manger sur le *tondyr* en se servant de l'herbe dont on avait fait provision en été, mélangée par moitié avec de la farine ou du froment. L'herbe servait à préparer le *trchoé kelandi*, le fromage pour le *dannou*, la farine pour le *hachil*, la farine grillée pour le *dev chaouti* - autant de mets variés.

Pour les vaches qu'il faisait paître, mon père recevait du froment. Il devait vaquer à cette occupation depuis le début d'avril jusqu'à la fin novembre, quand tombait la première neige.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## 2- Kerê me yê piçûk Şivaniya Molokan

Bavo, ku genim ji xwediyê dewaran distand bi pişta xwe dibire êş. Gelek hez dikir ku kerekî wî hebe. «Hingê, ewê şixul hêsanîtir bibe», wî pir caran digot.

Bê dewarekî, îşê me dijwar bû. Ji bo îşekî ne hêja, diviya bû em serê xwe li ber cîranan xwar bikin. Kûlak (têr mal û pêre) ker didane me lê, ne bê tu tişt; ji bo kiriya wî, rojek an du roj, ji me xebat dixwestin.

Ji bo kirîna kerekî, bavo her sal du rûbl (pereyê rûsî) datanîn alîkî. Piştî sê salan, şeş rûbl bi girêkeke mezin di paçikekî de, paçik di elbikeke tenekê de û elbik di xurcikê de, hatibûn veşartin. «Bi sê an çar rûblên din emê bikaribin kerekî ji xwe re bikirin», bavo digo.

Gelek caran, bavo girêka bi sir vedikir û pereyên paxurên giranbiha, jê vala dikirin. Bi dadêre careke din ew dijmartin. Di hesabê xwe de, xwe şaş dikirin û di cî de ji nûve dijmartin. Carna, em zaro, ji dengê wan



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# 2- Notre petit âne
# Comme berger chez les Molokans.

Le père transportait sur son dos, au moulin, le froment reçu du patron. Il désirait beaucoup avoir un âne. "Alors, ça ira mieux", disait-il souvent.

Sans une bête de somme, c'était pour nous bien difficile. Pour n'importe quelle bêtise, il fallait aller s'incliner devant les voisins. Les koulaks donnaient l'âne, mais pas pour rien ; il fallait travailler un ou deux jours pour le payer.

Pour acheter un âne, le père mettait, tous les ans, deux roubles de côté. Au bout de trois ans, six roubles étaient serrés par un grand noeud dans un chiffon et mis dans une boite de conserves de viande en fer blanc. La boite était cachée dans un *khourjine* (double sac en tapis qu'on met des deux côtés d'une selle). "Encore trois ou quatre roubles, et on pourra acheter l'âne," disait le père.

Il défaisait souvent le noeud, plein de mystère, et en déversait la monnaie de cuivre précieuse. Ensemble avec la mère, il se mettait à la compter une fois de plus. Ce faisant, ils se trompaient et se remettaient à compter derechef.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

şiyarbûyî, me li wan dinêrî, çawa dijmêrin: bi hûrikên 5, 3, 2 kopek (pereyê rûsî) rûbl pêk tanîn, piştre paçika pere têde datanîn nav elbikê û elbik jî li nav xurcikê.

Di vê zivistanê de, bavo li cem Yûnanekî bi navê Polba Triandofîlof dixebitî. Ewî aşek û gelek pez hebûn. Li biharê, li meha adarê, 4 rûbil dan bavo, ser de ji bo xebata wî ya baş jê re paltoyê eskerî yê kurê Triandofîlof hediye kirin. Û me di dawiyê de ji xwe re kerek jî kirî. Li dora heywên me çenberek girt û bi helahela me ew bir hundirê kadînê.

Ev kera ha, delala hemû malê bû; li havînê ewê dehşek anî. Me gelek bala xwe dida her du kerên xwe. Ji bo zivistanê me ji wan re ji dil û can alif pêk tanî, me giya diçinî, me jê rêsî çêdikir, û gava hişk dibûn me ew dikişandin mal. Kera me, di mala me de gelek bi kêrî me dihat, me pê gunî û giya tanîn mal û li ser pişta wê me tûrên genim ên giran dibirin êş.

Di vê wextê de ez dûşivanekî têgihiştî bûbûm û pir caran bavo, kerê bi timamî disparte min û brayên min û ew bi xwe diçû mal. Salek welê derbas bû. Brayên min bûbûn şivanên bi serê xwe û ez jî bi bavê xwe re dimam. Nihu em li ciyekî din rûdinin, Aleksandrovka; piştî ku bavê min bê şixul mabû, em hatibûn vir. Di vê cihguharinê de kerê me yê piçûk gelek bi kêrî me hat. Ewî serweta me bi timamî kişand- palas, kulav, beroş, giyayê me yê nivînê û firaxin dîtir.

Bajarê ku em niho tê de bûn, berê Kurda jê re Konê Sor digotin lê mihacirên rûs ên Molokan jê re



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Quelquefois, réveillés la nuit, nous voyions comment la mère avec le père comptaient à nouveau l'argent, formaient des roubles séparément avec des pièces de 5, 2 et 3 kopeks.. Ensuite, on cachait le chiffon noué dans la boite et la boite dans le *khourdjine*.

Cet hiver là, le père s'était embauché comme ouvrier chez un riche Grec, Polba Triandaphilov, qui avait un moulin et beaucoup de bétail. Au printemps, au mois de mars, on paya au père quatre roubles et, en outre, pour le bon travail, on lui fit cadeau d'une vieille capote d'officier du fils Triandaphilov. Et voici qu'enfin on acheta une ânesse. Nous fîmes cercle autour de la bête et avec des cris d'enthousiasme la conduisîmes à la grange.

Cette ânesse, favorite de toute notre famille, donna en été naissance à un ânon. Nous prodiguions des soins à nos ânes et nous nous mîmes avec ferveur à préparer la provision de fourrage pour l'hiver. Nous avons travaillé avec zèle tout l'été, ramassions de l'herbe, la séchions et ainsi fut constituée la réserve d'hiver. L'ânesse était d'une grande utilité dans notre ménage. Elle transportait le kiziak et l'herbe des champs, ainsi que les lourds sacs de froment au moulin.

A cette époque, j'étais déjà un aide-berger accompli et le père me laissait souvent avec les frères dans les champs en nous confiant tout le troupeau, alors qu'il s'en allait à la maison. Une année se passa ; les frères étaient devenus des bergers indépendants, et moi je restai avec le père comme premier aide-berger. Nous habitions à un nouvel endroit dans le bourg d'Alexandrovka où nous nous sommes installés après que le père eut perdu son travail. C'est à cette occasion que le petit âne se montra utile ! Il déménagea toute notre fortune - palas, kacil, la marmite, l'herbe de couchage et diverses bricoles.

Le bourg où nous nous installâmes s'appelait auparavant chez les Kurdes Komatsar, et les nouveaux colons ap-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org 

navê Aleksandrovka danîbûn. Ev gundê ha 7 kîlometre ji Qersê wê da ye û bi awakî gelek şaîrane li ber çemê Qasat hatiye ava kirin. Gava yek çem bi çem diçû, li doraliyên xwe wek xalîçeyên rengareng mêrg didîtin, û hinek li dûr, zeviyên çandiniyê yên çarkoşe kesk dikir, di nav zeviyan re, coyên avê li bin tîrêjên tavê wek şivên zîv diçirisîn. Li wî aliyê gund jî ciyê bîstanan bû. Molokan li wê kelem, gîzer û hêşinayiyên din diçandin. Aleksandrovka di nav heşînayî û kulîlkan de xeriqî bû. Li biharê, wextê vebûna kulîlkan, bihneke xemrevîn li her derê newalê însan mest dikir.

Molokan di nav xweşiyê de dijîn û erdê wan têrhatin bû. Bi xwe, li her derê mintiqeya Qersê, gundên Rûsan li erdên baş hatibûn ava kirin, û Molokan li serê her nefs ji 50-80 donim milk hebû.

Aleksandrovka ji gundên ermenî, tirk û yûnan ên cîran gelek cihê bû. Molokan cotkarên pir şehreza bûn : ew aletên cotkarî yên pêşveçûyî bi kar tanîn, erdê bi cotên du gîsin dikêland, giya bi qiriman diçinîn û drûnê bi şeneyên kişandî yên mezin dikirin. Genim û ceh bi mangêran di zeviyên avdayî de tov dikirin. Lewra ne ecêb bû ku li cem Molokan hatina genim ji ya gundên cîran gelek baştir bû. Li zeviyên wan ên baş çandî nêrîn bi xwe zewq dida. Bi saya bolixiya giya Molokan pir dewar xwedî dikirin.

Xelkê Aleksandrovka du bir bûn û her bir dêr û keşekî xas hebûn. Molokanên kûlak (dewlemend) ku bi henek xelk ji wan re (merivên qenc) digotin, li me û li Molokanên feqîr gelek zilm dikirin. Cama, ewqas bê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

partenant à la secte des Molokans, lui ont donné le nom d'Alexandrovka. Ce bourg est situé à 7 kilomètres de Kars, d'une façon pittoresque sur la rivière de Karsatchai, la plus importante de cette région. En suivant les bords de la rivière, tels d'énormes tapis multicolores ornés de fleurs s'étendaient les pâturages ; plus loin les champs bien cultivés verdoyaient en carrés réguliers : ils étaient traversés par les canaux d'irrigation qui brillaient au soleil comme des lames d'argent. De l'autre côté du bourg se trouvaient des potagers, où les Molokans plantaient les pommes de terre, les choux, les carottes et d'autres légumes. Alexandrovka baignait dans la verdure et les fleurs. Au printemps, au moment de la floraison des arbres fruitiers, l'arôme s'étendait sur toute la vallée.

Ils avaient une bonne vie, les Molokans, et leur terre était bénie ! Tous les bourgs russes dans la région de Kars se trouvaient sur les meilleures terres et les Molokans avaient de 5 à 8 *dessiatines* par tête (la dessiatine vaut un peu moins qu'un hectare).

Alexandrovka différait beaucoup des villages avoisinants arméniens, turcs et grecs. Les Molokans étaient d'excellents cultivateurs : ils se servaient d'outils agricoles perfectionnés, ils labouraient avec les charrues à deux socs, ils fauchaient l'herbe avec des faucheuses et moissonnaient avec de grands râteaux attelés. Les semailles de froment et d'orge se faisaient avec des semeuses sur des champs irrigués. Rien d'étonnant que le blé réussissait chez les Molokans bien mieux que dans les bourgs voisins. On avait du plaisir à regarder leurs champs bien cultivés. Grâce au fourrage abondant les Molokans tenaient beaucoup de bétail.

Les habitants du bourg d'Alexandrovka se divisaient en deux sectes. Chaque secte formait une paroisse à part avec son pope. Les koulaks-Molokans "bienfaiteurs" comme on les appelait quelquefois en plaisantant, nous exploitaient ter-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

insaf li şivanên piçûk dixistin ku bi saetan ve bê hiş em li erdê diman. Hîn di bîra min de ye, şivanek hebû, bi navê Misto, rojek -êdî baş nizanim- dewar dereng anîbû an du ga ketibûn bîstanê kûlak Matîyû, evî hingî lê da, her dû dest û lingên wî şikênandin.

Ji me pê ve, çend şivanên din hebûn ku gelek di perîşaniyê de bûn. Lê, piraniya wan bê kiflet bûn, ji lewre halê wan dîsa dihate qedandin. Şivanekî gihaştî, bi kirêya xwe îdare dikir. Hîn tê bîra min, bi navê Cewoyê Bîrkele, şivanek hebû dostê bavê min bû. Carna, êvarên zivistanê, dihate mala me û ji me zarokan re serhatiyên xwe digotin. Ji tebea wî ya vekirî û nerm me gelek hej wî dikir û tucaran, gava ewî guhê me dikişand da dengê me bide birîn, em jê nedienirîn.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

riblement sans épargner leurs compatriotes pauvres. Quelquefois, ils battaient cruellement les bergers enfants. Il arrivait qu'après avoir été battus ainsi, nous restions plusieurs heures couchés sans connaissance. Je me rappelle par exemple, qu'il y avait à Alexandrovka un berger nommé Misto, à qui le Koulak Mathieu mutila les bras, parce que, semble-t-il, il avait ramené les boeufs avec retard ou, peut-être parce que deux boeufs pénétrèrent dans le potager de Mathieu, je ne me souviens pas exactement.

En plus de nous, il y avait encore quelques bergers qui trainaient aussi une existence plutôt misérable. Mais c'était en majorité des hommes non mariés et pour cette raison ils vivaient un peu mieux. Un berger célibataire adulte pouvait s'en tirer avec son salaire. Je me rappelle un berger de vingt ans, Djavoé Bir-Kaleh qui était ami de mon père. Il venait quelquefois chez nous, les soirs d'hiver et racontait aux enfants des histoires intéressantes de sa vie. Nous l'aimions tous pour son caractère ouvert et affable et n'étions pas du tout offensés quand il tirait l'oreille à un polisson pour remettre la chambrée au calme.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# 3- Tadariya guran

Li payizê, gelek caran gur dihatin heya nêzîkî gundê me, xwe davêtin nêv kerî û pez dibirin. Dadê û bavo ji bo selameta pezê ku me diçêrand, gelek ditirsiyan. Tirsa wan a mezin, nemaze, ji bo min bû; ewan dizanîn ku zarokekî wek min nikare xwe ji guran biparêze. Her êvar gava min kerî tanî mal, bêî ku tu pez jê kêm be, dê û bavê min bi dengekî bilind, ser hev: «Şikir ji Xwedê! Şikir ji Xwedê ku roj bê xisar derbaz bû!...», digotin.

Gava di zeviyan de, giya dest bi hişkbûnê dikir, jiyina me dijwartir dibû. Bê pincar ku parekê xwarina me ya bingehîn bû, me têra xwe nedixwar. Vî halî, heya gihaştina genim dom dikir. Hingê me simbil jê dikirin, û li ser êgir me ew dikizirandin, fêrik çêdikirin û bi vî awayî birçîbûna xwe me dikuşt. Me çengek simbil diçinî, davêt nav agir û ew bi darek li hev dixist ku nehêlin simbil bişewitin. Piştre, me bi carek agir ji hev



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# 3- Agression de loups

En automne, les loups apparaissaient souvent près de notre bourg. Ils attaquaient le troupeau et s'emparaient de moutons. Mes parents s'inquiétaient toujours de la sécurité des troupeaux que nous faisions paître. Ils avaient surtout peur pour moi, sachant qu'un gosse pareil ne saurait guère se défendre contre les loups. Quand, le soir, j'amenais le troupeau et que l'on constatait que tous les moutons étaient sains et saufs, le père et la mère répétaient à haute voix : " " Dieu soit loué que le jour s'est passé pour nous sans perte".

Quand l'herbe commençait à sécher dans les champs, la vie devenait plus difficile. Sans les herbes comestibles qui constituaient une part essentielle de notre alimentation, nous ne pouvions pas manger à notre faim, et cette période maigre continuait jusqu'à ce que le froment fût mûr. Alors nous apaisions notre faim avec des grains grillés. Ayant arraché une poignée d'épis, nous y mettions le feu en la retournant avec un bâton pour ne pas laisser brûler les épis. Ensuite, on dispersait rapidement le feu pour que les grains refroidissent


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

belav dikir ji bo ku tene sar bibin û agir nekeve nav genimê zeviyê. Me teneyên baş qelandî di quncikek cilê xwe de hûr dikirin û jê xwarineke pak bi nave *qelînok* çêdibû.

Piştî paleyiya genim, di zeviyên vala da êdî tu tişt nedima. Ji aliyê din, di bîstanan de kartol digihaşt. Her sibê çi wext me pez dibir çolê, me ji pîrekên Molokan çend kartol dixwest; gava kebanî çavtengî dikirin û bera me didan, ji nêza xwe, bi veşartî em diketin nav bexçan û me dizî dikir. Bi vî awayî me timî kartol hebûn. Piştre me komek helez berhev dikir, agir berdidayê û li benda vemirina wî diman da ku kartolên xwe bêxin di nav xuliyên germ de; piştre bi xwey me ew gelek bi lezet dixwarin.

Eger me dizî dikir ji neçarî bû. Şivan kiriya xwe li payîzê, dereng, piştî ketina berfê, distandin, û heya wê wextê diviyabû em îdara xwe bikin.

Di nav pîrekên Molokan de yek hebû, gelek kêfa wê bi min dihat, xaltika Paraşa. Ewê hej min dikir. Bê şik dilê wê bi vî şivanokî reben ê ji sermê tevizî, dêşiya, ku serê sibê, li payizê keriyê pez dibir çolê. Heftê du car, xaltika Paraşa, bi dizî ji min re nan û xiyarên xweykirî didan.Tu zaroyê wê nebû. Gelek caran, êvaran piştî ku me pez dixist govê, ewê banî min dikir û bi bermayiyên şîvê ez têr dikirim.

Bêî ku em pê bihesin, payîza rast a bi baran, tevî serma û mija, dest pê dikir. Ber bi vê demê re, şixulên çolê timam dibûn û li beriyê ji şivana pêve tu kes



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

et que la flamme n'envahisse pas le froment du champ. Nous écrasions les grains bien grillés dans un pan d'habit, et il en sortait un assez bon mets *kalinok* en kurde.

Après la moisson de froment, il ne restait plus rien à se procurer dans les champs devenus vides. Par contre, les pommes de terre mûrissaient dans les potagers, et chaque matin, nous demandions aux femmes molokanes quelques pommes de terre. Si les ménagères se montraient avares et nous chassaient, aiguillonnés par la faim, nous pénétrions en cachette dans les potagers et commettions des vols. Toujours est-il que les pommes de terre étaient là. Ensuite, on ramassait du kiziak, on en faisait un tas qu'on allumait et, affamés, on attendait impatiemment que le feu se consumât pour mettre les pommes de terre dans les cendres chaudes. Nous mangions avec délice les pommes de terre cuites en les soupoudrant de sel.

Si nous commettions des vols, c'était seulement par nécessité. Les bergers ne touchaient pas leur salaire avant l'automne, quand le pâturage était fini, et jusque là il fallait bien se nourrir de quelque chose.

Parmi les femmes molokanes, il y en avait une qui me voulait du bien, la tante Paracha. Elle m'aimait bien. Probablement éprouvait-elle de la pitié pour un gamin qui, recroquevillé par le froid, menait en automne , à l'aube, le troupeau de moutons. Deux ou trois fois par semaine, la tante Paracha me donnait en secret du pain et des concombres salés. Elle n'avait pas d'enfants. Souvent le soir, quand les troupeaux rentraient à l'étable, elle m'appelait chez elle et me nourrissait des restes du dîner.

Insensiblement l'automne profond s'installait, les pluies commençaient avec le froid et les brouillards épais. Vers cette époque, tous les travaux des champs s'achevaient

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org 

nedima. Lê min xwe bi tenê his nedikir; li cem min, hergav, hevalê min ê sadiq, seyê meyê pez, Kavreş hebû. Min gelek hej Kavreş dikir, tucara ew bi gavek ji min dûr nedibû.

Bavo tim digote min ku divê di payîzê de şivan çavvekirîtir bin; gur ji birçîna pir çavsor dibin, û hema firseteke piçûk bikeve destê wan, xwe davêjin nav pez û çendek jê dibin. Bavê min ez hînî xwe parastinê ji guran dikirin. Her sibê wextê derêxistina pez, ewî çend perçe darê çam ên hişk û qulkirî dixistin tûrikê min. Min êdî dizanî ku ev dar zû pêdikevin û rewîneke mezin didin û eger gurekî êrîş kir, divê vî darî vêxim û bixim devê wî, ewê baz de.

Rojeke sar û bi mij, min keriyê xwe dibir çêrê. Piştî xurîniyeke sivik, ez dîsa birçî bûbûm. Digel vê yekê, perçeyê nan ku sibê, dadê danîbû tûrikê min, gelek piçûk bû. Min nanê xwe kir du par, yek jê min xwar û ya di jî min da Kavreş. Lê ev perçeyê piçûk, şûna ku min têr bike, birçîbûna min hîn tûjtir kiribû. Wextê taştê nêzîk dibû, lê tûrik vala bû. Çawa bikim? Min kerî nêzîkî bexça kir, ketim nav wan û ji xwe re çend kartol dizîn. Piştre min pez bir ber şkeftekê. Li wê, komek helez hebû; min agir dada, xwe germ kir, û bi bêsebriyeke tamdar, li benda vemirina êgir mam da ku kartolên xwe bêxime di nav xuliyê de. Gava ku rewîn bi timamî vemirî, bi lez û bez min kartolên xwe avêtin tê de.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

et, sauf les bergers, il ne restait personne. mais je ne me sentais pas seul ; il y avait toujours à côté de moi mon ami fidèle, le chien berger Kavrech,"tête noire". J'aimais beaucoup Kavrech, et il ne me quittait pas d'un pas.

Le père m'avait prévenu plus d'une fois qu'en automne, le berger doit redoubler de vigilance : les loups ont faim et sont méchants, et il s'en faut de peu qu'ils ne saignent et n'enlèvent un mouton. Il m'apprenait avec soin comment on se défend des loups. Chaque matin, quand je m'apprétais avec le troupeau pour le pâturage, le père faisait des trous dans quelques bouts de bois secs de sapin et les mettait dans ma sacoche. Je savais déjà que ces morceaux s'allument vite et donnent une grande flamme et que, si l'on est attaqué par un loup, il faut pousser ce bois enflammé dans la gueule de la bête qui se sauvera.

Une fois par une journée froide et brumeuse, je menais le troupeau dans le champ. Après un déjeuner peu substantiel, j'avais de nouveau faim. Cependant le morceau de pain que la mère en me conduisant avait mis dans la sacoche était bien petit. J'avais fait deux parts de mon pain. J'en avais mangé une et j'avais donné l'autre à Kavrech. Mais ce petit morceau, loin de m'avoir rassasié n'avait fait, au contraire, qu'aiguiser mon appétit. Le temps de dîner s'approchant ; la faim me torturait, mais la sacoche était vide. Que faire ? Je poussai le troupeau vers les potagers et, furtivement me procurai quelques pommes de terre en les arrachant. Je ramenai ensuite le bétail dans la campagne vers une autre caverne où dans un endroit commode, abrité de la pluie, il y avait une réserve de kiziak. J'allumai le feu, me réchauffai et, avec une impatience agréable, attendis que le feu se consumât pour cuire les pommes de terre dans le cendre. La flamme baissait visiblement, et je m'empressai de jeter quelques pommes de terre.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ji nişkave, min dît ku Kavreş radibe, guhên xwe bel dike û di nav mijê de li tiştekî dinêre. Dilê min his kir ku xeter nêzîk dibû. Lê ez gelek birçî bûm û ji min nedihat ku ez kartolên xwe di nêv êgir de bihêlim û herim. Ji ciyê xwe nedilebitîm û bi fîkandineke sivik min îşaret didan Kavreş. Se bi nûzenûz û reyîneke tûj di nav mijê de winda bû. Ez ji piya, şaş li ber êgir dimam û min qenc guhê xwe dida reyina kûçik, pê re jî, bi çavên birçî, min li kartolên xwe yên nîv pijayî dinêrî. Dilê min xurt davêt. Di nav mijê de çi derbas dibû? Gur an diz? Şivanekî hîn bêtir tecribekar, ji reyina se wê fehim bikira ku Kavreş bêhna gur kiribû.

Çend deqîqe derbas bûn, Kavreş dîsa xuya kir û bi reyinên xurt hate ber min, herwekî dixwest tiştekî bibêje min car din çû. Min fehim kir ku belayek hatiye serê me. Min lez da xwe. Destê min dilerizîn. Min êzingê çam xiste gopalê xwe, lê ji gêjbûna xwe min pêxistina wî ji bîr kir û ketim pey Kavreş. Bîstek dî, min du gur dîtin. Yekî ji wan, ji nihu de miyek xistibû devê xwe û ê din jî xwe danîbû ber Kavreş, diranên xwe jê re qîc kirin, herwekî hevalê xwe diparast.

Di vê demê de, şîretên bavo hatin bîra min. Wek berikekê, min xwe gihande êgir, êzingê xwe pêxist û gava rivîna wî geş bû, min xwe avêt ser gurê ku miyek biribû alîkî. Gava Kavreş ez bi êgir dîtim cesaret girt û xwe avête gurê li ber xwe ku qet netirsiya. Şerekî dijwar di nav wan de dest pê kir. Dilê min bi Kavreş êşiya. Min dev ji miyê berda û çûm arîkariya hevalê xwe yê sadiq. Di vê gavê de, Kavreş gur xistibû bin



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Tout à coup, je vis que Kavrech se levait et dressait les oreilles en regardant dans le brouillard. Mon coeur sentit que le dangèr approchait, mais j'avais trop faim et je regrettais de laisser là les pommes de terre ! Je ne bougeai pas de ma place et seulement, par un sifflement léger, donnai le signal à Kavrech. Le chien en glapissant et en aboyant d'une façon aiguë disparut dans le brouillard. Je restai debout, près du feu, indécis, prêtant attentivement l'oreille à l'aboiement et, en même temps, regardant avec mes yeux d'affamé les pommes de terre à moitié cuites. Le coeur me battait fort. Que se passait-il dans le brouillard ? Loup ou voleurs ? Un berger plus expérimenté aurait compris aussitôt d'après l'aboiement de Kavrech que le chien flairait justement le loup.

Quelques minutes se passèrent. Kavrech apparut, se précipita vers moi en aboyant fort, comme s'il voulait dire quelque chose, puis il repartit. Je compris qu'un malheur était arrivé. Je me hâtai. Les mains tremblantes, je fixai le morceau de bois de sapin sur le bâton, mais, ayant perdu la tête, j'oubliai de l'allumer et courus après le chien. Bientôt, je vis deux loups. L'un d'eux avait déjà eu le temps de saisir une brebis et l'autre, posté plus près de Kavrech, montrait les crocs comme s'il gardait son camarade.

A ce moment, je me suis rappelé ce que le père m'avais appris. Comme une balle, je me précipitai vers le feu, allumai le bois et, quand il flamba d'un feu vif, je me jetais sur le loup qui avait déjà tiré la brebis de côté. En me voyant avec le feu, le chien prit du courage et se jeta sur l'autre loup qui ne s'effraya pas cependant. Une lutte acharnée s'engagea. J'eus pitié de Kavrech. Abandonnant la brebis, je courus à la rescousse de mon ami. A ce moment, Kavrech avait déjà


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

diranên xwe, lê heywanê kûvî bi awakî welê diranên xwe xistibûn qiriqa Kavreş ku kûzekûzên seyê reben ji yên gur bilindtir bûn. Diviyabû ez xwe bilezînim. Min bi destê xwe yê çep darê bi rivîn girtibû, û bi destê xwe yê rast jî min rahişt kevirekî. Min êzingê pêxistî anî heya ser pozê dijmin û heya ji min dihat, bi hiz, min kevirê xwe li parsûyên wî xist. Gur xwe ji lepên Kavreş derêxist û bi lez berê xwe da newalckê. Hevalê min êdî rizgar bûbû.

Digel vê yekê, gurê din mî kişandibû nav mijê. Ez ji heyecanê dilerzîm; min berê xwe da aliyê wî û ez gihaştimê. Bi dîtina min, gur xwe da ber tehtekê, pez avête alîkî, û diranên xwe li min beş kirin.

Êzingê min êdî tu rivîn ne dida. Ez bê çek mabûm, û gur bi çavên xwe yên tûj û şerût li min dinêrî û xwe kar dikir bête min. Lê baş bû min xwe şaş nekir. Bêî ku ez çavên xwe ji gur hilînim, min hêdî hêdî êzingê din pêxist, ji siûda min bû êzing zû agir girt, û hingê min êrîş birê. Gava gur rivîna geş dît, xwe ji miyê bi dûr xist xwe gij kir û diranên xwe qîc kirin. Di vê demê de min reyîneke xurt bihîst, Kavreş dihate hewara min.

Rewş herhal guhirî. Kavreş bera gur da, min jî kevirek avêtê, û piştre bi êzingê xwe yê pêxistî ez çûme ser û min agir xiste gepa gur, tirs pê ket û di cî de, di nav xiraman de winda bû.

Şer xilas bûbû û dijmin reviyabû. Min xwe nêzîkî miyê kir. Rebenê, ji tirsa dilerizî, û ji sê ciyan brîndar



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

réussi à fouler le loup sous son corps. Mais le loup enfonça si habilement ses crocs dans la gorge du chien que Kavrech glapissait plus fort que le loup. Il fallait se dépêcher. Je tenais le bâton avec le bois en flammes de la main gauche et je soulevais une pierre de la main droite. Je portai le bois allumé juste sur le nez de l'ennemi et, en même temps, de toutes mes forces, le frappai au côté avec la pierre. Le loup se dégagea et, à toute allure, se précipita dans un ravin. Kavrech était sauvé.

Cependant le premier loup avait réussi à traîner la brebis loin dans le brouillard. Frémissant d'émotion, je courus de ce côté là et bientôt rattrapai le carnassier. A ma vue, le loup se retira vers un grand rocher, jeta la brebis sous un rebord en saillie et montra les crocs.

Le bois ne flambait plus, j'était désarmé et le loup regardait avec ses yeux méchants et enflammés, montrait les crocs et, semble-t-il, était tout prêt à attaquer. Heureusement je ne me suis pas démonté. En tâtonnant et en m'appliquant pour ne pas rater, tout en ne détachant pas mes yeux du loup, je commençai à allumer le second morceau de bois. Pour mon bonheur, le bois prit feu assez vite et je passai à l'offensive. Ayant aperçu la flamme vive, le loup s'éloigna de la brebis et se hérissa, claquant des dents. A ce moment, un fort aboiement se fit entendre ; Kavrech se dépêchait à ma rescousse.

La situation changea aussitôt. Kavrech attaqua le loup, sur qui je lançai une pierre, mais sans l'atteindre. Alors je commençai de nouveau à avancer avec mon bois qui continuait de brûler avec une flamme vive et poussai le feu dans la gueule même de la bête. Le loup prit peur. Il se sauva précipitamment, et, en un clin d'oeil, disparut dans les broussailles.

La bataille était finie et l'ennemi était en fuite.

Je m'approchai de la brebis. La pauvrette tremblait de peur ; elle portait des blessures en trois endroits. Quand nous

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bû. Gava ez vegeriyam keriyê xwe, min dît bizinek avêtiye erdê, gur ew dirandibû.

Min pezê belavbûyî da hev û ew anî nêzîkî êgir. Ez ji tabê ketibûm, û birçîbûn ji ezabekê xurtir ez gêj dikirim. Bi destên xwe yên bi lerz, di nav xuliyên de li kartolên xwe geriyam. Kartol li ku ne?... Tu tişt jê nemabû... Giş şewitîbûn. Deqîqeke tehl... Ez li ber girînê bûm...

Ji goştê bizina dirandî min perçeyek da Kavreş. Lê min bi xwe jê tam nekir û êvarê ji nêza diliyayî, ez vegeriyam gund. Min, bi rûmetî, goşt bir xudiyê wî ku ji bêsiûdiya min keşeyê Molokan bû. Xezebeke dijwar ew girt; ez birim axurê, û li wê, ewqas li min xist ku min nedikarî xwe ji erdê rakim. Ez bê hiş li wê mam. Bavê min hat û ez li wê dîtim û bi zehmet ez kişkişandim mal.

Adet wa ye ku şivan ji xisara ji pez re ji aliyê guran, neyin berpirsiyar kirin. Herwekî şivan bê çek in, ev tiştekî maqûl e. Lê, kûlak Selîverstov, mezinê Molokan, guh neda adet û qanûnan. Ji bo bizina dirandî, saliya min -çend rûbil û çend kopek- ji min birî.

Ji van peran mehrûm bûyî, ji bêgaviyê, zivistanê, ez li cem xelkê nanzikî xebitîm. Biharê, min xwest ez dîsa vegerim karê xwe yê ku min gelek hez dikir, ango şivaniyê. Ez pir geriyam ku ji xwe re ciyekî peyda bikim. Tu kes, ji bo piçûkbûna min bi min qaîl nedibû û digotin ku ez ne hêja me nanê zivistanê.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

retournâmes vers le troupeau, je vis une chèvre qui gisait par terre, le loup l'avait déchirée.

Je réunis le troupeau apeuré et l'amenai plus près du feu. J'étais fatigué, affaibli et la sensation de la faim, forte comme une torture reparut. Je commençai à fouiller dans la cendre avec mes mains tremblantes. Où sont mes pommes de terre ? Il n'y en avait plus, elles étaient entièrement brûlées. Minute amère ! J'étais sur le point d'en pleurer.

Je donnais à manger à Kavrech, en lui coupant une tranche de viande de la chèvre qui avait succombé. Je ne pris pas de viande pour moi et, fourbu de fatigue et mort de faim, je retournai, le soir, au village. J'apportai honnêtement la viande au patron qui, pour ma déveine était le prêtre Molokan. Il se mit dans une violente colère, me poussa dans l'écurie et me battit tellement que je ne pouvais plus marcher. Je suis resté par terre à l'écurie. Mon père m'y retrouva et non sans difficulté me conduisit à la maison.

Habituellement, le berger ne répond pas de la perte du bétail par les loups, s'il n'a pas pu en venir à bout. C'est bien compréhensible, le berger n'ayant pas d'arme à feu. Mais le Koulak Saliverstov, comme maire de la commune ne voulut pas du tout tenir compte des usages et des lois. Pour la chèvre dépecée par les loups, il exigea et obtint tout mon salaire de l'année, les cinq roubles avec des kopeks.

Privé de cet argent, je fus obligé de m'embaucher pour l'hiver comme ouvrier au pair. Au printemps, je pensai de nouveau m'occuper de mon métier préféré, celui de berger. Je dus chercher longtemps une place ; personne ne voulait de moi, disant que j'était trop petit et ne valais pas le pain que j'aurais mangé en hiver :

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Piştî mideteke dirêj, gundiyekî ez ji bo zivistaneke timam birim cem xwe.

Li cem xudiyê min ê nû, gelek pez û dewar hebûn. Ez li axurê, li ser textikan radizam.

Şixul ne hêsanî bû, diviya bû ez berê şefeqê rabim, axur bimalim, zibil bibime hewşê, wê baş kom bikim, alifa paqij bikim, û ji gişan dijwartir êmê hespan bidim. Taqeta min nedigihîşt ku ez êm bi darek tevîhev kim û min awayek hêsatir dît : ez diketim nav alifê û min bi destên xwe êm tevîhev dikir. Min ev tişt bi dizî dikir ku xudî pê nehise. Min giya dida dewarên din. Berê derketina rojê, diviyabû ez vana giş xilas bikim.

Ji xebata min a baş, axayê min, ji min gelek razî bû. Sibeha gava dihate axurê, ciyê hesp û yê çêlekan gelek paqij û dewar û pez têr xwarî didîtin. Ez gelek dixebitîm û ji axur qet dernediketim. Xwarina min jî ji min re tanîn wê derê. Bi tenê, rojên cejnê, min li mal dixwar, ew jî ne bi xweyiyên malê re, lê bi tena xwe.

 Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Après de longues recherches, je réussis à trouver du travail chez un paysan qui m'embaucha pour l'hiver entier.

Chez mon nouveau patron, il y avait beaucoup de bétail et toutes sortes de volailles. Il me logea à l'écurie où je dormais sur un lapas fait de planches.

Le travail n'était pas facile. Il fallait se lever avant l'aube, balayer l'écurie, transporter le fumier dans l'arrière-cour et mettre en tas bien fait, nettoyer toutes les auges, et, enfin le plus difficile, préparer le mélange pour les chevaux. Il était au dessus de mes forces de le faire avec un bâton et je trouvai un autre procédé plus facile, je me mettais dans l'auge et mélangeais la masse lourde avec mes mains. Cela se faisait en cachette pour que le patron ne s'en aperçoive pas. Au reste du bétail, je mettais du foin. Tout ce travail, je devais le finir avant l'aube.

Je plus beaucoup au patron pour mon travail soigné. En venant, le matin à l'écurie et à la vacherie, il voyait que c'était propre partout et que le bétail avait eu à manger. Je travaillais beaucoup et ne sortais presque pas de l'écurie. C'est là qu'on m'apportait aussi à manger. Je ne dînais dans la chambre que les jours de fête, et ceci encore non pas avec les patrons, mais après eux, séparément.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## 4- Çetel bi kêrî çi tê ?

Havîn hat, xwîşka min Gogî û ez, me li cem yekî xwe kir golikvan. Havîn bê serêş derbaz bû û heya payîzê em xweş bi karê xwe rabûn.

Carek mielimeya gund, ji bavê min xwest ku ji bo şixulekî xwe min rêke Qersê, ji gundê me Aleksandrovka heft kîlometir wê da. Bavo razî bû. Mielime tûrek û mektûbek dan min ji bo mêrê xwe ku bi du kurên xwe re li Qers rûdinişt û li wê memûrtî dikir. Piştî ku ji bo vê zehmetê, min 15 kopek xistin berîka xwe û tûrik avêt ser mile xwe, bi dilxweşî ez bi rê ketim. Li bajêr, ji bo peydakirina mal, li gora adresa ku da bûn min, ez gelek geriyam. Piştre, di hewşekê de min du kurik dîtin ku bi xweşî dileyistin. Bê pirsîn, min nas kir ku ew kurê mielimê ne. Min mektûb şanî yekî ji wan da. Kurik qîr kir: «Bavo, mektûbek ji yadê!»


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# 4- A quoi est bonne une fourchette ?

Vint l'été. Ma soeur Gogui et moi fûmes embauchés pour garder des veaux. L'été se passa sans incidents désagréables et nous nous en sommes bien tirés jusqu'à l'automne.

Une fois l'institutrice de notre village demanda à mon père de me laisser aller à la ville de Kars, à 7 kilomètres d'Alexandrovka, pour quelques commissions. Le père consentit. L'institutrice me donna un sac et une lettre pour son mari qui était fonctionnaire à Kars et vivait là-bas avec ses deux fils. Ayant reçu quinze kopeks pour ma peine, je me mis le sac sur le dos et m'acheminai gaiement vers la ville. Après avoir trouvé, non sans difficulté, la maison d'après l'adresse qu'on m'avait donnée, je vis deux garçons qui jouaient gaiement dans la cour. C'était vraisemblablement les fils de notre institutrice. Je tendis la lettre à l'un d'entre-eux qui s'écria : "papa une, lettre de maman".



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Bavê wan, di cî de derket, mektûb vekir û piştî ku ew xwend, banî min kir. Zarok jî, ji hewşê hatin û em tev de ketin mezeleke dî. Her du bira bi hev re pistepist dikirin û şaş li min dinêrîn. Ji vî tiştî bêhna min gelek teng bû. Bîstek dî zaroyên din û hin jin jî hatin. Giş li mezelê kombûyî, çavên xwe ji min hilnedikirin. Ez gelek acîz bûm. Piştre, sebeb ji min re dan zanîn; mielimê di mektûba xwe de gotibû ku ez Kurd im. Bê şerm, wek dehbekî ecêb, ji serê qehfê min heya neynûkên lingê min, li min dinêrîn. Hin ji wan ji min çend tişt pirsîn; min jî bi lez bersiva wan da.

Wa dixuya, mielime, di mektûba xwe de hin tişt xwestibûn, ji ber ku mêrê wê em berdan û berê xwe da aliyê bajêr û ez jî tevî zarokan derketim hewşê. Zarok dora min girtin û ji min xwestin ku ez jî bi wan re bilêyzim. Lê her wekî min leyistikên bajaran nedizanîn, min xwe da alîkî.

Gava bavê zarokan ji sûkê vegeriya, ew banî taştiyê kirin. Ji min re jî li metbexê xwarin dan. Xadima wan, jinekeke bi laş û gewde û bi hinarikên sor, firaxeke şorbê da min û li cem firaxê jî kefçî, kêr û çetelek danîn. Min dizanî kefçî ji bo xwarinê ye lê, kêr û çetel ji bona çi...? Min da eqlê xwe û min jê derêxist ku ev leyistikên zarokan in; hediyek ji min re... Li gund, milhebên mezin min dîbûn ku pê giya li ereban bar dikirin û kêfa min gelek bi van milhebokan hat. Min sehina pêşîn û a dîtir jî bi kefçiyê xwar û gava ez ji masê rabûm, min kêr û çetel xistin berîka xwe. Xadima ku çavên xwe ji min nedizivirandin çû û mesele gote efendiyê xwe. Ewî ji min pirsî eger min dil dikir bi rê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Le père aussitôt décacheta la lettre, et après l'avoir lue, m'appela. Les enfants aussi accoururent de la cour et, étant passé dans une autre pièce, se mirent à chuchoter entre eux, en me regardant avec étonnement. Je commençai à me sentir gêné. Bientôt apparurent d'autres enfants de voisins et de femmes. Tous entassés dans la chambre, ne me quittaient pas des yeux. J'étais interloqué. Par la suite, on m'expliqua la raison de cette attention insolite envers moi : l'institutrice disait dans la lettre que j'étais kurde. Sans cérémonie, ils me dévisageaient comme une petite bête curieuse. Quelques-uns se mirent à me parler et me posèrent des questions auxquelles je répondis rapidement.

Certainement, dans la lettre il y avait des commissions parce que le mari de notre institutrice partit aussitôt en ville pour des emplettes et moi je sortis dans la cour avec les garçons. Les enfants m'entourèrent en proposant de jouer avec eux . Mais je ne connaissais pas les jeux des enfants de la ville et je me mis silencieusement sur le côté.

Quand le père revint du marché, on appela les enfants pour dîner dans la chambre, et on me donna à manger dans la cuisine. La servante, une forte femme aux joues rouges, posa devant moi, une assiette de potage et mit à côté une cuillère, un couteau et une fourchette. Je connaissais l'usage de la cuillère, mais à quoi pouvaient bien servir le couteau et la fourchette ? Réflexion faite, je conclus que c'étaient des jouets d'enfants, un cadeau pour moi. A la campagne j'avais vu les grandes fourches avec lesquelles on chargeait le foin sur les chariots et, ces petites fourches me plaisaient beaucoup. Je mangeai le premier et second plat avec la cuillère et, m'était levé de table je mis le couteau et la fourchette dans la poche. La servante qui m'observait tout le temps le rapporta au patron. Celui-ci vint à la cuisine me regarda avec étonne-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

herim an na? Min gotê ku min dixwest ku ez vegerim mala xwe. Rexma tiştên baş ku min xwaribûn û hediyên delal ku min standibûn, dilê min ne rahet bû. Her tişt li vir ji min re biyanî û nenas bû û her kesî li min bi awakî ecêb dinêrî.

Efendî ji odê, tûrikê bendkirî anî û du elbik jî dan min ku ez wan deynim bêrîkên xwe. Ewî qesden ev tişt dikir da ku bibîne ezê çawa xwe jê derêxim. Lê, bi awakî gelek adetî, min çetel û kêr ji berîkên xwe derêxistin û ew kirin paşila xwe, da ji elbikan re cî çêkim. Hingê efendî ji min pirsî :

- Te kêr û çetelê me ji ku birin?

- Ma, we bi xwe ew ji min re hediye ne kirin...?, bi telaş min jê pirsî.

- Bê şik, na. Kê ew ji te re hediye dan?

Ew jî şaş mabû. Ê min, êdî, min xwe negirt û bi xeyd min qîr kirê:

- Nexwe, wextê xwarinê, we çima ew danîn ber min...?

Di vê gavê de zaro xeber gihandibûn cîran û metbex tije xelk bûbû; giş guhdariya me dikirin.

- Kêr û çetel ji bo xwarinê danîn ber te ne ji bo tiştekî din, efendî gote min.

Min nedizanî êdî çi bêjim. Zimanê min nedigeriya. Ez bi girînê ketim.

Di nav jinan de ku li me kom bû bûn, Ermenîyek hebû; ewê xwe nêzîkî min kir û pirsan ji min kirin. Baş bû ku min bi ermenî dizanî û karî derdê xwe jê re bêjim.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ment, mais ne dit rient au sujet de la fourchette et du couteau. Il me demanda seulement si j'étais prêt à prendre le chemin du retour. Je répondis affirmativement que je me réjouissais de rentrer chez moi. Malgré le bon dîner et le cadeau intéressant, je me sentais un peu gêné et mal à l'aise ; tout ici était étranger et inconnu et il m'était désagréable de sentir que tout le monde écarquillait les yeux sur moi.

Le patron apporta de la chambre le sac ficelé et deux grandes boîtes qu'il me proposa de mettre dans les poches. Il le faisait exprès pour voir comment je m'en tirerais. Mais moi, sans me gêner nullement, je sortis de la poche le couteau et la fourchette et commençai à les fourrer sous ma blouse pour faire de la place aux boites. Alors le patron me demanda:

- "Où as-tu pris notre fourchette et notre couteau" ?

- "Est-ce que vous ne m'en avez pas fait cadeau", demandai-je étonné. -

- "Bien sûr que non. Qui t'en a fait cadeau ?"

Il était surpris. Quant à moi, je finis par me fâcher.

- "Alors pourquoi les avez-vous mis devant moi pour le dîner ? "m'écriai-je avec colère ?.

Cependant, les enfant avaient déjà eu le temps de raconter la nouvelle aux voisins et la cuisine s'était remplie de monde ; tous écoutaient avec curiosité la conversation.

"On t'a servi le couteau et la fourchette seulement pour manger", dit le patron, "et non comme cadeau".

J'étais confus, je rougis ne sachant plus quelle réponse donner et j'éclatai en sanglots.

Parmi les femmes réunies dans la cuisine, il y avait une Arménienne qui s'approcha et commença à me questionner.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Bi girîn, bi dengekî êşayî û dilşkestî min gotê :

- Li van leyistokan binêre -kêr û çetel- ew ji min re hediye kirin û nihu jî dibêjin ku min ew birin.

- Ev ne leyistok in, jinika ermenî gote min, ew dan te da ku tu bi wan xwarin bixwî...

Dawiyê em li hev hatin. Hinckan dikeniyan û dilê hinekan jî bi min ve dima. Efendî gote xadimê ku du çetelên kevin bide min; lê ez xeyidî bûm û min ew red kirin. Efendî bi xweşî ez qanî kirim û dawiyê min her du çetelên giranbiha xistin paşila xwe. Piştî ku ji mielimê re mektûbek dan min, min 'ûrik hilgirt û berê xwe da dîsa gundê xwe.

Di riya xwe de, ev hadîseya pîs ji bîra min qet dernediket, lê digel vê yekê bi van çetelan ez ewqas ne dilşikestî bûm û min bi leyistika wan ji xwe re gelek xeyala dikirin. Gelek caran, li rê, ez disekinîm, min ew derdixistin, heyran heyran li wan dinerî û bi wan, kayên li erdê ketî hildikirin.

Wê roja ha, dinya pir xweş bû û ez beriya êvarê gihaştim gund. Min mielime, digel keça wê li hewşê dît. Ew li aliyê sefikê disekinî û ji ber êzingên windabûyî bi dergavan re dixeyidî. Gava çavê wê bi min ket, nebi lez, bi aliyê min ve hat. Min mektûb û elbik danê.

Bi xwendina mektûbê mielime kenî, keça wê hat cem û sebeb jê pirsî. Wê jî, çîroka çetel gote, her du jî li min nêrîn û mideteke dirêj kenîn. Min tûrik jî da wan. Mielime pesnê min da û got ku ez kurikekî gelek jîr im û hişt ez herim mala xwe.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Heureusement je savais l'arménien et pus m'expliquer avec elle. Je lui dis à travers mes larmes, d'une voix offensée et indignée, que : "voilà ces jouets-couteau et fourchette- ils m'en ont fait eux-mêmes cadeau et maintenant, ils disent que je les ai pris".

Ce ne sont pas de jouets, m'expliqua l'Arménienne. On te le les a donné seulement pour le dîner".

Le malentendu s'éclaircit. Les uns riaient, les autres me regardaient avec commisération. Le patron dit à la bonne de me donner deux vieilles fourchettes, mais je refusai net, me sentant offensé.

Le patron me persuada doucement et, finalement, je me suis laissé convaincre et mis les précieuses fourchettes dans ma blouse. Ayant reçu une lettre pour l'institutrice, je chargeai le sac et me mis en route pour rentrer.

Tout le temps, en marchant, je pensais à cet incident désagréable, mais je n'en étais pas moins heureux d'avoir les fourchettes et je m'imaginais comment j'allais jouer avec. Plusieurs fois, en cheminant, je les sortais, les admirais et essayais de ramasser avec elles la paille jetée par terre.

La journée était belle et de bonne heure, je fus de retour chez nous. Je trouvais l'institutrice dans la cour avec sa fille. Elle se tenait du côté de la remise et grondait le vieux gardien pour le bois disparu. M'ayant remarqué, elle vint à ma rencontre. Je lui tendis la lettre et les boîtes.

En lisant la lettre, l'institutrice sourit d'abord, puis s'est mise à rire ; sa fille courut vers elle et lui en demanda la raison. L'institutrice raconta l'histoire des fourchettes et elles rirent un bon moment. Je rendis le sac. L'institutrice me loua, disant que j'étais un garçon sensé et elle me laissa partir chez moi.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# 5- Dersên pêşîn - Nifûsa min

Piştî du rojan, gava miclime bi keça xwe re digeriya, ber bi aliyê koxika me ve hat. Ez derketim û bi bez çûm pêşiya wê. Ew bi şîrînî kenî û pirsa bavê min kir. Min jî bi lez ban bavê xwe kir. Ewî jî hat, bi edeb kumê xwe rakir û silav lê da. Miclime jê xwest ku mehê bi sê rûbil ez bibim dergevanê dibistanê. Bavê min bi dilxweşî razî bû û ez bi mielime re çûm dibistanê. Li wê, ewê berî gişan, ez birim ciyê êzingan û piştre dersxanê; li wê karên min çi bûn, ji min re dan zanîn: Diviya bû her roj, ez dersxanê bimalim, tozên mase, pencere û derî paqij kim, sobeyan pê xim, bermîl tije av kim, û her sibê û êvar semawara mielimê hazir bikim û ji bo şixulên wê car car herim bajêr.

Roja pêşîn, gava ez ketim dersxanê, hema heyran min temaşaya tabloyên li dîwaran daleqandî kir. Çi nebû li wê? Teyr, heywan, heşerat, xerîte...Min tu tişt ji wan demedixist, lê kêfa min bi wan gelek dihat. Bi tenê, tiştek hebû nedikete serê min; li cem teyrên rengareng tabloyeke ecêb û bi tirs hebû. Ev zilamekî bi



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# 5- Premières leçons.
# Mon "Extrait de naissance"

Deux jours plus tard, l'institutrice en se promenant avec sa fille était venue vers notre sakla (on appelle ainsi la maison paysane en Caucase). Je sortis en courant à sa rencontre. Elle sourit gracieusement et demanda où était mon père. J'appelai aussitôt mon père qui, enlevant sa coiffure, salua poliment. L'institutrice lui demanda de m'autoriser à entrer à l'école, comme gardien, pour 3 roubles par mois. Mon père consentit avec joie et nous nous rendîmes aussitôt à l'école. L'institutrice me mena d'abord à la remise où l'on conservait le bois, ensuite dans la classe et m'expliqua en quoi allait consister mon travail. Je devais balayer chaque jour la cour et la salle de classe, essuyer la poussière sur les pupitres et les rebords des fenêtres, passer le chiffon sur les fenêtres et les portes, allumer les poêles, verser l'eau fraîche dans le réservoir, préparer le matin et le soir le samovar pour l'institutrice et faire les courses pour ses commissions en ville.

Dès le premier jour, m'étant trouvé dans la salle de classe, je commençai à contempler avec admiration les tableaux pendus aux murs. Que n'y avait-il pas là ? Oiseaux, animaux, insectes, cartes géographiques. Je n'y comprenais goutte, mais tout me plaisait. Il n'y avait qu'une seule chose


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

qehfeke rût bû. Di qehfê de diran û şûna çav û difin qulên mezin hebûn û ev zilam bi tenê ji hestiya pêve ne tu tişt bû. Welê dihate min ku, ev yek ji wan cinan bû ku li mal em pê ditirsandin. Tesîra vî tiştî di min de ewqas mezin bû ku gava ez di ber re derbaz dibûm min çavên xwe digirtin û êvaran, di tariyê de, min nediwêrî bi tena xwe li odê bimînim. Min gelek hez dikir mana vî ji mielimê bipirsim, lê ji fehîtiya min, ji min nedihat. Piştre min bala xwe da ku şagirt qet guh nedidan vê tabloyê. Bi vî awayî dilê min jî êdî xurt bû. Hêdî, bê tirs ez li ber dimam û min seyra tabloyên teyrên xweşik dikir.

Roja pêşîn, gava êvarê piştî şixul ez vegeriyam mal, hemî xelkê malê bi kêfxweşî dora min girtin, min jî ji wan re yek bi yek çi dîtibû û kiribû got. Bavê min bawer nedikir ku mehê sê rûbil bidine min û pir caran digo ku eger rûbilek biwa dîsa baş bû. Lê, gava meha min qediya mielime banî me kir û ji min re 3 rûbil dan. Min nedizanîn navê xwe binivîsim; şagirdekî li şûna min îmza min danî. Mielime pere xiste destê min, emir da min ku ez ji xwe re çakêt û şebqekê bikirim û gote min : «Hingê ezê te bêxim dersê û te bielimînim xwendin û nivîsandinê.»

Bavo ji bona kirîna çakêtekî minasiptir razî bû, lê ji bo xwendin izna min neda; ji tirsa ku eger ez jî wek şagirtên din bielimim, ez êdî tu kiriyê nestînim. Ji min re pantalonekî kevin, şebqe û saqoyek li gora min gelek mezin kirîn. Bi vî awayî ez nihu ji berî bi cilê xwe ê kevn kêmtir diketim ber çavan. Li dibistanê, bê haya

qui n'allait pas ; à côté des beaux oiseaux était pendu un tableau à la fois incompréhensible et terrifiant. Il représentait un homme qui avait un crâne nu montrant des dents et de grands trous à la place des yeux et du nez ; cet homme n'était composé que des seuls os. Il me semblait que c'était la représentation du mauvais esprit dont on nous faisait peur quelquefois à la maison. L'impression était si forte que, en passant à côté, je fermais les yeux et, le soir, dans l'obscurité, je craignais de rester dans la classe. J'avais bien envie de demander à l'institutrice ce que signifiait ce tableau, mais, étant timide, je n'osais pas ! Bientôt je remarquai que les écoliers n'accordaient aucune attention à ce tableau et cela me tranquillisa. Peu à peu, je m'y habituai et me mettais sans peur à côté quand je voulais admirer les oiseaux aux couleurs éclatantes du tableau voisin.

Le premier jour, quand j'étais rentré à la maison après le travail, toute la famille m'avait entouré avec joie et j'avais raconté par le menu ce que j'avais fait et vu. Mon père n'arrivait pas à croire qu'on me paierait trois roubles chaque mois. Il répétait souvent qu'un rouble par mois, ç'eut été déjà beau. Mais lorsque le premier mois de mon service se fût écoulé, l'institutrice m'appela et me remit trois roubles. Je ne savais pas écrire, bien entendu, et un des élèves signa pour moi. En me transmettant l'argent, l'institutrice me donna l'ordre de m'acheter un bon veston et un chapeau. Et alors ma-t-elle dit, elle me prendra à l'école et j'apprendrais avec les autres élèves.

Le père consentit à m'acheter un vêtement plus convenable, mais ne me permis pas d'apprendre, pensant que si j'entrais à l'école comme élève, on cesserait de me payer mes gages. On m'acheta un vieux pantalon, un chapeau et un grand veston qui n'était pas à ma taille. Avec ce costume, je me distinguais déjà moins dans la classe qu'avec mon vieux

bavê xwe, ez diketim dersê, ji dil dixebitîm û bi ser de jî, min karên xwe yên dergevaniyê jî xweş bi cî tanîn.

Min, bi rûkenî û kêfxweşî hemû şixul dikirin û mielime ji min gelek razî bû. Lê, rexma çekên min ê nû, zaroyên Molokan nedixwestin li cem min rûnin û digotin ku ez gelek qirêj im. Mielime mecbûr bû min bi tena xwe bide rûniştin.

Di şobeya nûhatiyan de, min dest bi xwendinê kir. Min pir dixwest ez bielimim û ez zû bi hêsanî dielimîm. Mielime pir caran dihate maseya min û didît ez bi çi xîretê herfan dinivîsim. Pesindanên wê ez teşwîq dikirim û roj bi roj ez gelek pêşve diçûm. Em hînî elfabe, bi tîpên li ser kartonê zeliqandî, dikirin; me ew dibijartin û ji wan pirsên ji me xwestî pêk tanîn; min jî her gav ew pirs ji ber dikirin.

Ez bi keça mielimê, Marûsiya re, bûbûm heval. Ew keçikeke gelek delal û qenc bû û di şobeya dibistanê ya diwemîn de dielimî û baş bi xwendin û nivîsandin dizanî. Ewê di naskirina tîpan, dirûstkirina hecan û pirsan de gelek arîkariya min dikir. Her du mielimeyên min, ya mezin û ya piçûk, ji pêşveçûnên min ecaîb diman. Min gelek hej Marûsiya dikir, û sibeha gava, zû, li dersxane û mezela mielimê, min sobe pê dixistin ez li ser pêçiyên xwe dimeşiyam da ku wê şiyar nekim.

Carek serê sibê, berî destpêkirina dersan, min semawar anî û ew danî ser masê û vegeriyam; di vê gavê de, mielime ez sekinandim û Marûsiya bi awireke

vêtement déchiré. En cachette de mon père, j'entrai comme élève à l'école et travaillai avec beaucoup de zéle, tout en accomplissant en même temps mes fonctions de gardien.

J'exécutais volontiers tous les travaux et l'institutrice était toujours contente de moi. Malgré mon nouveau costume, les garçons molokans ne voulaient pas être assis à côté de moi ; ils disaient que j'étais trop sale. L'institutrice dut me donner une place à un pupitre à part.

Dans la section des débutants où j'étais admis, je commençai à apprendre les lettres. J'avais un grand désir d'apprendre et j'apprenais facilement. L'institutrice s'approchait souvent de mon pupitre et regardait avec quel soin je traçais les lettres. Ses louanges m'encourageaient et je faisais toujours plus de progrès. Nous apprenions l'alphabet avec des lettres collées sur du carton, on les choisissait et mettait ensemble pour composer des mots que j'apprenais par coeur avec assiduité.

Je m'étais lié d'amitié avec la fille de l'institutrice, Maroussia (diminutif russe de Marie). C'était une fille très gentille et très bonne. Elle apprenait dans la seconde session de l'école et savait bien lire et écrire. Elle m'aidait volontiers à apprendre les lettres et à en faire des syllabes et des mots entiers. Mes deux institutrices, la grande et la petite, s'étonnaient de mes capacités et se réjouissaient de mes succès rapides. J'aimais beaucoup Maroussia, et le matin, quand il fallait chauffer les poêles dans la classe et dans la chambre de l'institutrice, je marchais sur la pointe des pieds pour ne pas réveiller la fille.

Une fois le matin avant le commencement des leçons, j'apportai le samovar, le mis sur la table et voulus m'en aller, quand l'institutrice m'arrêta et Maroussia d'un air solennel

cidî û bi çavên biken ji min re elfebayek hediye kir. Li ser kitêb, nivîsandineke destan hebû ku hingê min nedikarî bixwenda. Ez lê heyran mam û ji vê hediyeyê ewqas kêfa min hat ku min nedizanî çawa ji bin vê qenciyê derkevim.

Gava şagirt hatin, ez li pişt maseya xwe rûniştîbûm û bi serbilindî kitêba xwe danîbû ber xwe.

Êvarê, carek ji ders û şixul xilasbûyî, min kitêba xwe danî bin milê xwe û min bazda mal da ku xwişk û brayên xwe jî ji kêfxweşiya xwe paydar bikim. Bi kitêbekê vegera min mal, qiyamet rakir. Xelkê malê min girtin, li kitêba min bi elaqeke mezin nêrîn û guhdariya mesela wê kirin. Di gel vê yêke, xwîşkên min bawer nedikirin ku tiştekî ewqas baş ji min re hediye kiribin û ji bavo û yadê re digotin ku her hal, ew kitêb li şûna kiriya min a meha diwemîn dane min. Her çend jî bi sond û yemîn, min gote wan ku ew elfabe ji min re hediye kirine, dîsa baweriya wan bi min nedihat.

Roja dîtir, xwîşka min a mezin bi yadê re çû cem mielimê da rastiyê jê seh bikin; gelo min ev kitêb bi pere kirîbû an ji min re hediye dabûn?

Mielimê gote wan ku ewê, ev elfabe, ji min re hediye kiribû, bi ser de jî ewê his kir ku li ber zimanê xwîşka min tiştekî dî heye û newêre bêje.

Mielimê fikra wê fehim kir û gotê ku wê belaş dersa min dida, ku ez lawikekî gelek xebatker û zîrek im û ku serê salê, gava ewê here bajêr, ewê ji min re cilekî kevn ji yên kurên xwe bîne.

et avec des yeux qui brillaient de plaisir, me donna un abécédaire comme cadeau. Sur le livre, il y avait une inscription que, à mon regret, je ne pouvais pas encore lire. Je rayonnais d'admiration, me réjouissant sans limite du cadeau et ne savais comment pouvoir exprimer ma reconnaissance.

Quand les élèves arrivèrent dans la classe, j'étais déjà assis, tout fier derrière mon pupitre sur lequel était posé mon livre à moi.

Une fois finis la classe et le travail, je pris l'abécédaire sous le bras et me précipitai en courant à la maison pour partager ma joie avec mes frères et soeurs. Mon apparition avec le livre fit sensation. Les miens m'entourèrent, regardèrent le livre avec une grande attention et écoutèrent mon récit. Cependant, les soeurs ne croyaient pas que j'avais reçu une si belle chose comme cadeau et se mettaient à dire aux parents, que certainement, on me l'avait donné à la place des gages du second mois. J'affirmais qu'on m'avait fait cadeau de l'abécédaire, mais elles ne voulaient pas le croire.

Et, le lendemain, la soeur aînée se rendit avec la mère chez l'institutrice pour s'assurer si, en réalité, j'avais reçu le livre à titre grâcieux, ou si je l'avais acheté avec l'argent que je devais toucher pour mon service. L'institutrice leur confirma que le livre m'avait été donné en cadeau. Elle remarqua aussi que ma soeur voulait demander quelque chose mais n'osait pas.

Ayant deviné sa pensée, elle ajouta qu'elle me faisait apprendre à titre grâcieux, que j'étais un garçon très obéissant et capable, et que, pour la Noël, elle m'apporterait de la ville un vieux costume de son fils.

Gava min dît ku halê min çêtir dibû, min hîn bêtir xwe da xebatê da ku rojek berî rojekê bikaribim kitêba ku Marûsiya ji min re hedîye kiribû, bixwînim.

Rojek ji rojan, Marûsiya ji min pirsî ka ji kitêba wê ez çi elimîbûm û rûpela pêşîn vekir? Min zû, zû, xwend : «Ma-şa na-şa (Meryema me), Sa-şa (navek) au-ua (hece), oza (moz), h.ş...» Marûsiya bi lez çû cem diya xwe û gotê ku Şamil ji nihu de elimiye xwendinê. Mielime heta nêzîkî min û piştî ku guhdariya xwendina min kir, destê xwe li ser serê min gerand, ez pîroz kirim û got : «Ji îro bi şûnda, tu êdî zû bielimî!».

Ji pesin û hezkirina mielimê, ez ewqas bextiyar bûm ku min nedizanî çi bêjim û çi bikim, ez gelek sor bûm û hindik mabû ez ji dilxweşiyê bigirîm...

Ez bi Marûsiya re dost bûm, lê zaroyên Molokan hejî min nedikirin, li min dixistin, ez diheqirandim û nedihiştin ku ez bixwînim. Marûsiya ez ji wan dipirastim, diket navbera me û bi xweşî dixiste serê wan da ku dev ji min berdin.

Bi vî awayî, zanîna min li dibistana gund dest pê kir.

Li havînê, gava dibistan girtî bû, min şivantî dikir, lê nihu, **di tûrikê min de, li cem perçekî nan, kitêbek jî hebû**, min tê de, tiştên ji berê de elimî, dîsa dixwendin. Li zivistanê, wek berê, min li dibistanê dixwend û karên xwe yê dergevaniyê jî dikirin.

Bi pêşveçûna xwe, ez pêşiyê sinifê bûm û min gelek numereyên baş distandin : pênc û çar, li di dersa

Sentant que ma situation s'affermissait, je décidai de travailler encore mieux pour arriver plus vite à lire le livre dont Maroussia m'avait fait cadeau.

Il s'est trouvé qu'une fois Maroussia me demanda ce que j'avais réussi à apprendre dans le nouveau livre et l'ouvrit à la première page. Je lus rapidement "Ma-cha-na-cha (notre Marie), Sa-cha (nom propre) au, ua (syllabes), osa (guêpe), etc... Elle courut chez sa mère et lui dit que Chamil a déjà appris à lire. L'institutrice s'approcha de moi et, après avoir écouté la lecture, me caressa la tête, me félicita et dit : «Et bien maintenant tu apprendras vite».

Je fus si fortement ému par les louanges et les caresses de l'institutrice, je fus si confus que je rougis beaucoup et que je fus sur le point de pleurer de joie.

J'étais ami avec Maroussia, mais les enfants molokans ne me témoignaient pas d'amitié ; ils me battaient, m'offensaient, m'empêchaient d'apprendre. Maroussia, ma protectrice, elle intervenait et persuadait les enfants de me laisser tranquille.

Ainsi, commencèrent mes études à l'école du village.

En été, quand il n'y avait pas de classes à l'école, je m'embauchais comme berger, mais à présent, dans ma sacoche, **à côté d'une tranche de pain, il y avait un livre** qui me servait à revoir ce que j'avais appris. En hiver, j'apprenais de nouveau à l'école et m'acquittais comme auparavant de mes fonctions de gardien.

D'après mes succès, j'étais le premier élève de la classe et recevais de bonnes notes, des cinq et des quatre, mais en

dîn de min sê stendibû ji ber ku min ji vê dersê hiz nedikir û nedixwest wê hîn bibim.

Ûsa, di çend salan de, min dibistana gund qedand û xwendin û nivîsandin hîn kir.

Rojek, bavê min xurcîn vekir, jê desteyek kaxitên kevin derêxist û ji min xwest ku ez jê re pasporta wî pêyda bikim. Nihu bihar hatibû û ji me re pasport lazim bû, ji ber ku, me dixwest em xwe neqlî bajarê Vladî Qers bikin. Bi zanîna xwe, min xwe dinepixand û yek bi yek min ew kaxit giş xwendin; di nav wan de, wesîqeya jêrîn kete berçavên min.

*Emir :*

*Ez emir didim muxtarên gundan û bajaran ku ji bo dîtina mehîneke boz, esîl û rana wê ya çep damxakirî, arîkariya Şemoyê Adil bikin. Heçî bi emrê min nake, ewê bête ceza kirin.*

*Îmzayên Serekê polîsê û katibê mintiqa Qizil Çak-Çak.*

Ez şaş mabûm... Gelo bavê min di wextekê de zilamekî hikûmetê bû, ji ber ku di emir de hatibû gotin ku diviyabû hemî muxtar arîkariya bavo bikin, yan na ewê berpirsiyar biwana...? Bavê min ji dil kenî û gote min ku berî çend salan, ew li gundê Qizil Çak-Çak şivan bû, û serekê polîsê vê minteqê jî li wê rûdinişt. Rojek mehîna wî winda bûbû û bavê min nedikarî wê peyda bike, hingê, Serekê Polîs ku gelek hej mehîna xwe dikir, ji bavê min re emrekî nivîsandî dabû; ewî jî

religion, j'avais trois ; cette matière ne me plaisait pas et je ne voulais pas l'apprendre.

Ainsi j'ai achevé l'école du village où j'ai appris à lire et à écrire couramment.

Un jour, mon père sortit son khourdjine, en retira une liasse de vieux papiers usés et me donna l'ordre de trouver le passeport. C'était le printemps et on avait besoin du passeport, parce que nous voulions déménager au village de Vladikars. Fier de mon savoir, je relisais attentivement tous les papiers. Parmi eux le document suivant tomba sous mes yeux.

*Ordre :*

*J'ordonne à tous les maires des villages et communes de prêter aide et assistance à Chémo Adi Oghly pour les recherches d'une jument grise, de sang arabe, avec un tavre (ou tamga, marque du propriétaire) sur la cuisse gauche. Ceux qui n'obéiront pas au présent ordre seront passibles de peine sévère.*

*Signature du pristav (chef de la police rurale) et du scribe du canton de Kyzyl-tchaktchak.*

J'étais bien étonné. Mon père représentait-il jadis une autorité ? Car on disait dans l'ordre que tous les maires sous peine de responsabilité étaient tenus de lui prêter aide et assistance ! Mon père rit de bon coeur et m'expliqua qu'il y avait bien des années, il était berger dans le bourg de Kyzyl-tchaktchak, où résidait le pristav du canton. Une jument appartenant au pristav s'était perdue et mon père n'arrivait pas à la retrouver. Alors le pristav qui tenait beaucoup à sa propriété délivra à mon père un ordre par écrit et, avec le

bi arîkariya muxtaran mehîn bi dest xistibû. Bavo gote min ku wê roja ha bi xwe; ez hatibûm dinê, bi awakî welê ku ew wesîqa, bi tarîxa 28 çiriya pêşîn 1898, nifûsa min bi xwe bû.

Piştî ku min dibistana gund qedand, bi mideteke piçûk, em ji Aleksandrovka derketin û berî çûn gundê Vladî Qers, ji wê jî, saleke dî, cem Kurdên koçer, da ku li wê dîsa, şivantiyê bikin.

Di gundên Kurdan de yên li aliyê me, xudîkirina pez ne wek a Molokan e, li cem van koçeran, di welatê çiyan de heyat bi temamî, bi awakî din bû.

concours des maires, en effet, on réussit à retrouver la jument. Mon père ajouta que l'ordre avait été écrit le jour même de ma naissance, de sorte que le document, daté du 28 octobre 1898, s'est trouvé être par hasard mon acte de naissance.

Bientôt, après la fin de mes études à l'école du village, nous quittâmes Alexandrovka et allâmes d'abord au village de Vladikars, puis, l'année d'après, chez les Kurdes nomades, pour nous livrer de nouveau au métier de berger.

Dans les villages kurdes, l'élevage du bétail diffère beaucoup des pratiques de chez les Molokans et nous nous sommes trouvés dans des conditions bien différentes, en pays de montagnes, parmi les nomades, avec leur mode de vie particulier.

## 6- «Baro-dan» - Cejna biharê

Jiyîn di gundekî kurd de, ne wek ya gundên rûs ên Molokan e, li wê, ê bêtir bi ziraetê mijûl dibin. Kurd xwedî pez in, û li çiyayên bi têr-çêre û giya rûdinin. Çêreyên çiyan dewlemendiya welêt pêk tînin, bi deh hezaran pez li wê diçêrin, goşt û bez digrin.

Li zivistanê, çiya bi berfa stûr pêçandî ne lê li bin tîrêjên rojên biharê yên pêşîn tebîat zû vedinije. Berf dihele, erd nerm dibe, hêşinayî û kulîlk qûntarên çiya dixemilînin.

Li çiyan, hewa siviktir e û wek li newalan ne germ e. Ji lewre li wê, li havînê bi xwe, giya tu caran hişk nabe. Şûna giyayên hişkbûyî, giyayên din ên ter derdikevin û kulîlk ciyên xwe ji yên nû re dihêlin. Pez her gav çêreyên ter li ber xwe dibîne û ji sibê heya êvarê bêî ku ji germiyê aciz bibe, diçêre. Li wê, wek li newalan, pez ji pûşî, mêşên mezin û heşeratên din aciz nabe. Li ser deviyên çiyan çivîk, refên teyr û tirûdan bi hev re difirin û nêçîra kelmêş û mêşa dikin.

## 6- «Baro-dan» - Fête du Printemps

Le mode de vie dans un village kurde est tout-à-fait autre que dans les bourgs russo-molokans où on se livre de préférence à la culture. Les Kurdes sont des éleveurs et vivent dans les montagnes où abondent d'excellents pâturages avec une végétation plantureuse. Les pâturages de montagnes font la richesse du pays ; des dizaines de milliers de têtes de bétail y paissent et s'y engraissent.

En hiver, les montagnes sont couvertes de neige et parfois assez épaisse, mais avec les premiers rayons printaniers, la nature revit rapidement. La neige fond, la terre s'imprègne d'humidité, les versants des montagnes se couvrent de verdure et de fleurs en abondance.

Dans les montagnes, l'air est moins lourd et il ne fait pas aussi chaud que dans les vallées. Aussi l'herbe ne dessèche pas en été. Des herbes différentes s'y succèdent, les fleurs fânées cèdent leur place à d'autres. Le bétail a tout le temps une nourriture abondante et paît toute la journée, sans être incommodé par la chaleur. Il souffre beaucoup moins que dans les vallées, des taons, de grosses mouches et d'autres insectes. Dans les taillis des montagnes les merles, les moineaux et d'autres oiseaux qui voltigent par bandes entières autour des troupeaux en pourchassant les taons et les mouches.

Hema berf dihele, giya şîn dibe û kulîlkên daran vedibin, gundê kurd xwe tev dide.

Serê sibê zû, çûn û hatin destpê dike, Kurd xwe pêk tînin da ku bi keriyên xwe ve herin dolgan.

Kurd li dolgan gelek bala xwe didin berxên nûzayî, wan xweş têr dikin da ku zû mezin bin û bikaribin gava dinya dibe germ, derkevin zozanan.

Li zozanan, Kurd, bi awakî xaş dicivin hev û bi navê *obe* ji 40 heya 80 êl pêk tînin, da bikaribin tev de, li çiyan keriyên xwe biçêrînin. Li serê her *obê* obebaşiyek heye, endamê dewlemendtir û bi nifûztirê xudiyên pez. Her tişt di bin emrê wî de ye. Ew bêş davêje ser xelkê, ciyê çêreyan nîşan dide û wextê zivirandina wan dibêje. Ew merkez bi întixabê dibû û gelek bi şeref bû, diviya bû her kes bê lam û cîm emrên obebaşî bi cî bîne. Obebaşî hemen hergav serekê qebîle ye û li ber çavên feqîr û karkeran hakimê mitleq e. Ji lewre, li ser şivanan wacib e ji şixulên xwe yên şivantiyê pêve, hemî karên obebaşî jî bê pere biqedînin: anîna pezê wî konê, her êvar jimartina wî, her sibê paqijkirina govan û derêxistina ziblê derve.

Li gundê Karakala em bûne şivan. Em di meha sibatê de hatinê, û hema giya di newalan de şîn bû me pez da hev û me ew bire dolgan.

Li gora adetên wî ciyî, piştî pez digehe dolgan û dest bi zayînê dike, her Kurdê dewlemend pezekî serjêdike, xwarin dirust dike, cîran û şivan diezimîne.

Dès que la neige a fondu la verdure apparaît, les arbres fleurissent, le village kurde se met en mouvement.

Très tôt le matin, le va-et-vient commence ; les Kurdes s'apprêtent avec leurs troupeaux à passer dans ce qu'on appelle les *dolga* emplacement où le petit bétail met bas.

Les Kurdes soignant avec attention les agneaux dans les dolga, les nourrissent le mieux possible pour qu'ils poussent plus vite, prennent des forces et, les chaleurs venues, soient capables de supporter l'exode fatigant dans les montagnes.

Aux pâturages d'été, les Kurdes se réunissant en groupements de genre spécial, les *obâ* ou petites communautés de quarante à quatre-vingts patrons, pour faire paître en commun le bétail dans les prairies alpines. A la fête de l'oba se trouve un *obâ bâchî,* membre le plus riche et influent de la communauté ; toutes les affaires sont de son ressort ; il répartit les taxes, indique les endroits de pâturage et le moment de passage du bétail d'une étape à l'autre. Cette fonction est élective et était considérée comme honorifique; tout le monde obéissait à l'*obâbâchi*, sans discussion. L'*obâbâchî* presque toujours est chef de clan et koulak, c'est-à-dire maître, aux yeux des pauves et ouvriers. Aussi exige-t-on des bergers que, outre leurs fonctions directes, ils accomplissent sans rémunération tout le travail concernant le pâturage et les soins à donner au bétail de l'*obâbâchî* : ramener le bétail au camp, le compter tous les soirs et en faire le rapport au patron ; nettoyer le matin l'emplacement clôturé des brebis, *aghyl*, porter le fumier et les balayures au dehors du camp.

Nous nous embauchâmes comme bergers au village de Karakala, y arrivâmes déjà en février, et dès que l'herbe apparut dans les vallées nous réunîmes le bétail et le menâmes dans les dolga.

Xudiyê pez û jina wî bi destê xwe xwarin didin mêvanên xwe. Piştî xwarinê, ku li derva tê xwarin, xort stran dibêjin û bi şivanan re direqisin. Gava cejn diqede, her kes spasên xwe pêşkeşî mêvandarê xwe dike û dia dike ku jina wî li havînê gelek rûn û penîr pêk bîne, ku tu nexweşî neyête pez û ku zozan bi xweşî here serî.

Wê roja ha, mêvandar gelek comerdî nîşan dan û ewqas nan û goşt dan me ku çar rojan têra xelkê malên me kir.

Kurd ji vê cejnê re *Serê Pez* dibêjin. Di heyata xwe de cara pêşîn bû ku min ev tişt didît û jê heyran mabûm; lê yadê û bavo dikeniyan û digotin ku *Serê Pez* ne cejneke ewqas mezin e, lê di nêzîkê de, *Baro-dan*, roja salê ya xweştir, wê bê. Ez jî bê sebir, li benda *Barodanê* dimam.

Ji roja ku berxik hinek mezin û xurt bûn û berf hîn bêtir li çiyan heliya, obebaşî roja *Barodan*, ango derketina pez ji dolgan ber bi zozanan ve, tayin kir. Berî hefteyek her kes haziriya xwe ji vê rojê re dikir. Ev roj bi xwe hat.

Serê sibê, xelk, giş cilên xweşik ên cejnê li xwe kirin. Keçên ciwan, cilên bi rengên ronak û têrzînet wergirtî, serên xwe bi kulîlkên ter dixemilandin û karafîl (xizêm) datanîn bêvilên xwe. Karafîl xizêmek zêrîn ê qasî polokek 5 rûbil bû û xelekek zêrîn pêve kirî bû. Kurdên dewlemend hê di zarotiye de bêvilen keçên

D'après les coutumes locales, après l'arrivée dans les dolga et les premières naissances, chaque Kurde riche égorge un mouton, organise un repas et invite ses voisins et les bergers. Le patron et la patronne régalent avec empressement les invités. Après le repas qu'on sert toujours à l'air libre, on enlève les tables et la jeunesse chante des chants populaires et danse avec les bergers. Quand la fête est finie, tous remercient le patron de son accueil et forment des voeux pour que la patronne prépare en été beaucoup de beurre et de fromage, que la maladie ne s'abatte pas sur le bétail et que le pâturage d'été s'achève heureusement.

Ce jour-là, les patrons se montrèrent généreux et nous donnèrent tant de pain et de viande que notre famille en a eu pour quatre jours.

Cette fête s'appelle en kurde *sar-ê-pez*, c'est-à-dire le "commencement du croît (du bétail)". J'y assistais pour la première fois de ma vie et en étais émerveillé : mais le père et la mère souriaient et disaient que *sar-ê-pez*, ce n'est pas encore une bien grande fête, mais bientôt, il y aura le *Baro-dan*", la meilleure journée de l'année. Et je me mettais à attendre une grande impatience le *Baro-dan*.

Dès que les agneaux ont grandi et sont devenus forts et que la neige a commencé à fondre davantage dans les montagnes, l'*obâbâchi* fixe le jour du *Baro-dan*, celui du départ des dolga vers les alpages. Les préparatifs avaient commencé une semaine auparavant et, enfin, voici la journée solennelle arriva. Dans la matinée, tout le monde commença à s'habiller avec les meilleurs vêtements de fête. Les jeunes filles, revêtues de robes voyantes et riches, s'ornaient la tête de fraiches fleurs champêtres et se mettaient dans les narines des *karafil* , des plaques rondes d'or, grandes comme des pièces de cinq roubles, avec un petit anneau d'or servant de boucle. A cette fin, les Kurdes riches perforent la narine de

xwe qul dikirin ji bo xizêmê. Kurd, li stûyê mî, beran û bizinên xwe kulîlkên rengareng danîbûn û li yên nêriyên çêtirîn jî zengilên sifir ên reng bi reng xemilandî daleqandibûn. Piştre mî û berxan ber didan nav hev û saeta meşê tayîn kirin.

Ber bi rê derketina me ve, roj li ifiq qederek bilind bûbû. Ezman safî û bê ewir bû, hewa bi xweşiya germiya rojekê biharê û bi bêhna kulîlkan dagirtî bû.

Her tişt pêkhatî bû û obebaşî emrê seferê da. Li pêşiya *Baro-dan* bi cilê xwe yê xweşiktir û bilûra wî di dest de, serşivan dimeşiya. Ewî wezîfeya serfermandar dikir; ji şivanên xort re, ji bo îdareya berxikên piçûk û miyên neban talîmat didan. Li dû serşivan nêriyê mestir û spehîtir dihat, li stûyê wî zengilek hebû ku, awê digotin, dengê bilindtir dida.

Berê em bi rê kevin, axa banî şivanên xwe dikirin û ji wan re digotin: «Bi girtina te ji xwe re şivan, ez ji te dixwazim ku tu wezîfeya xwe baş bi cî bînî û qenc bala xwe bidî pezê min.» Gava tenbîhat qediyan, serşivan dest bi blûra xwe kir û em giş bi rê ketin. Keriyê me bi nîzam li pey şivan û xortan diçû û dûşivan û zaro li her du alî, vir da, wê da, baz didan, nedihiştin ku nîzam xirab be û bi gopalên xwe, an bi fîkandineke xas, di nav kerî de, ji her pezî re ciyê wî nîşan didan.

Ji vê rojê heya nihu gelek sal derbaz bûne, lê tesîrên cejna *Baro-dan* a pêşîn, di bîra min de, pir vejandî mane. Her wekî îro bû, ez li ber xwe rûyên

leurs filles encore toutes petites. Les brebis, les moutons et les chèvres étaient ornés par les Kurdes avec des touffes de laine colorée. Aux colliers des meilleurs béliers on fixait des grelots en cuivre avec des ornements multicolores. Ensuite on laissait les brebis et les agneaux aller dans le troupeau commun et on fixait l'ordre de la marche.

Vers le moment où les préparatifs s'achevaient, le soleil avait déjà eu le temps de s'élever assez haut au-dessus de l'horizon. Le ciel était pur et sans nuages, l'air était rempli de chaleur agréable d'une journée de printemps, de parfums de fleurs et de bourgeons éclos.

Enfin, l'heure solennelle sonna. Tout était prêt; l'*obâbâchî* donna le signal du départ. A la tête du Baro dan s'était mis le berger principal, vêtu de son meilleur costume de berger, flûte à la main. Il jouait le rôle de commandant ; il donnait aux jeunes les indications sur la manière de s'y prendre avec les petits agneaux ou avec les brebis qui n'acceptaient pas leurs nourrissons. Derrière le berger principal s'avançait le plus grand et le plus beau bouc, en kurde *nêri* ; à son cou pendait une clochette, qui avait comme qualité, m'a-t-on expliqué, de sonner à la note la plus haute.

Au dernier moment, chaque patron (autrement dit le koulak chez qui on s'embauchait) prononçait en s'adressant aux bergers cette admonition : "En te confirmant mon troupeau, je t'engage à accomplir ton devoir honnêtement et consciencieusement et à bien garder le bétail". Quand toutes les recommandations furent faites, le berger principal se mit à jouer de la flûte et l'on commença la marche. Le troupeau en bon ordre allait derrière le berger accompagné de la jeunesse ; les aide-bergers et les enfants couraient sur les côtés et veillaient attentivement à ce que l'ordre de la marche ne fût troublé en rien ; à coups de bâton ou en sifflant d'une façon particulière, les aide-bergers indiquaient à chaque mouton sa place dans le troupeau.

biken ên zaro, xort û şivanan dibînim û stranên wan dibihîsim. Arxalix, oyme û beşmet, cilên bi neqiş yên keçikên delal û serê wan ên bi kulîlkan xemilandî, xemlên mî û mêsinan di ber çavên min re derbas dibin. Newal giş bi heşinayiyê pêçandî ye. Li her derê, ronahiya rojê diçirise û li dûr, çiya hîn li bin berfê ne. Barîna mî û ya berxikan, stranê şivan û xortan li dûr, di newalan de olan didin û gundî ji malên xwe derdikevin û tên seyra me.

Ev tişt, di salê de du caran çêdibin, li biharê, gava pez dibin zozanan û li payîzê dereng, gava ji zozanan vedigerin mal. Divê ji bîr nekin ku dewlemendiya Kurdên koçer gî di keriyên wan de ye. Kurd ji şîr, ne bi tenê penîr û rûnê xwe yên salekê derdixînin, lê jê gelek jî dibin bajaran û li wê digel hirî û pezên xwe didin û ji kifletên xwe re tiştên lazim dikirin. Divê ku bacên xwe bidin û ji malên re tiştên ku li bajêr tên firotin peyda bikin. Ûsa, qet ne ecêb e ku Kurd, çûn û vegera zozanan di heyata xwe de bûyerên hêja bigirin û rojên *Barodanê* wek dema mestirîn a salê bihesibînin.

Bien des années se sont passées depuis le jour où, pour la première fois, j'ai vu la procession du Barodan, mais les impressions en restent toujours vivantes dans mon esprit. Comme si c'était maintenant, je vois devant moi les visages rayonnants des enfants, de la jeunesse et des bergers, j'entends leurs chants. En couleurs vives se dessinent les *arkhâlouk*, *oïma* et *bechmets*, les costumes de gala des jeunes filles et les couronnes de fleurs sur leurs têtes, les ornements sur les brebis et les moutons. Partout une lumière éclatante de soleil. Toute la vallée est couverte de verdure et, au loin, on voit les montagnes encore sous la neige. Le bêlement des brebis et des agneaux, les chants des bergers et de la jeunesse se répercutent au loin dans la vallée ; et les habitants accourent de leurs demeures pour admirer la gaie procession.

Pareilles processions n'ont lieu que deux fois dans l'année, au printemps, quand les troupeaux partent pour les pâturages d'été et, tard en automne, quand ils rentrent à la maison. Il ne faut pas oublier que toute la richesse des Kurdes nomades consiste en troupeaux. Un bon rendement en lait n'assure pas seulement au Kurde la réserve de beurre et de fromage pour l'année entière, mais il a encore la possibilité de vendre en ville l'excédent de ces produits, ainsi que la laine et une partie de son troupeau à la boucherie. Il faut payer ses impôts et procurer à la famille les produits de la ville. Il n'est donc pas étonnant que le déplacement du bétail aux pâturages d'été en son retour à la maison, soit des événements importants dans la vie du village kurde et les journées du Barodân, l'époque la plus solennelle de l'année.

## 7- Li zozanan

Riya heya qonaxa pêşîn ne kin bû. Xort, piştî çend kîlometir, bi hêwirze, bi me re meşiyan, em berdan û vegeriyan malên xwe, lê şivan û dûşivan barên wan li pişt wan, hêdî, hêdî, dom bi riya xwe dikirin. Adetî, roja ewil mesafeyeke piçûk dibirin. Piştre, her roj, hin bi hin wê zêde dikirin da ku pez gelek newestînin û wî hînî cîguhirandinê bikin.

Kerî, ji hev û du hinek dûr, li dû hev, bi rê ve diçûn. Li qonaxa pêşîn, em hinek rawestan da ku pez hinek bêhna xwe bistîne û biçêre. Hingê, bavê min, wek serekşivan, ji me re, dest bi parkirina diyariyên ku axeyan dabûn me, kir : nan, goşt, helaw û meyweyên hişkkirî. Bi rê de û li warê pêşîn, heya hatina axan, bavê min wekîlê wan bû. Li rê, êvaran şivan dihatin cem bavo û şîret jê distandin. Gelek pirsan jê dikirin: ji bo istiraheta mî û berxikan çend car rawestan diviyabû, çend car ji wan re avdan lazim bû...?

# 7- Aux pâturages d'été

Le parcours jusqu'à la première étape n'était pas un court trajet. La jeunesse après nous avoir accompagnés bruyamment sur quelques kilomètres s'en retourna et regagna les maisons, alors que les bergers et leurs aides, chargés de provisions, continuaient lentement leur chemin. Au cours de la première journée, on se contentait habituellement d'une marche courte. On la prolongeait ensuite tous les jours pour que les moutons ne se fatiguent pas trop et s'habituent au déplacement.

Les troupes elles se suivaient les unes, les autres à de petits intervalles. A la première halte, on laissa le bétail se reposer et brouter. Pendant ce temps, mon père, en tant que berger principal, commença à partager équitablement les produits que les patrons avaient donnés comme cadeaux : pain, viande, khalva, fruits secs. Mon père assumait les fonctions de doyen en cours de route et au premier campement, jusqu'à l'arrivée des patrons. En route, les bergers venaient le soir chez mon père pour ses conseils. Il y avait beaucoup de questions : combien de haltes faut-il faire pour les abreuver et combien fera-t-on d'arrêts d'une journée pour que les brebis et les agneaux se reposent ?

Li warê pêşîn, em bi tena xwe pir neman. Piştî çar rojan, axên me bi kifletên xwe ve hatin û di cî de konên xwe danîn. Konên Kurdên dewlemend gelek mezin û bi çar, pênc çîtan ji hev veqetandî, bi mehfûr û qoşmeyan (kulavan) raxistî bûn tê de ciyek ji bo mêvanan û xwarindanek cihê hebû ji bo rûn, penêr û dew. Konê feqîran piçûktir bû, ji malikek rûniştinê û razanê û xwarindanek pêk dihat.

Kon, hin ji wan ji hev dûr, hinekan jî li cem hev, li quntarên çiyan, li nêzîkî tchtan, lehî û robarên çiyan, dihatin danîn. Ji dûr, ev konên reş, wek warekî eskerî, dixuyan.

Di van robaran de, masiyên berad hebûn, ku di wê wextê de ber bi kaniyan ve derdiketin. Li hin ciyan kaniyên zeal û sar ji zinaran dizên. Her kes xwe, li wê, şidiyayî û şêntir dihesiya û şixul ji me re xweş û hêsanîtir dihat. Zaroyên axan, ji sibê heya êvarê, li derve diman, dileyistin, di robarên nêzîk de, masî digirtin û li çêre giya diçinîn.

Jiyîna şivanan, bi awakî din bû. Li vir jî, dewlemendên kurd ji yên Molokan kêmtir em nediêşandin. Li vir jî em perîşan û bedbext bûn. Di hatina me ji deştê ber bi zozanan ve, di ser kevir û zinaran re em hema pêxwas gihaştibûn jor. Gava me pez dibir çolê, ji dirih û daran, cilên me diqetiyan û em bi kincê zerzilî dîman, wek li cem Molokan. Bavo ji min re ji hiriya miyan kumek çêkiribû, lê cw gelek grûzerkî bû, guh û stûyê min dixurand. Ev kum ez ecêb diêşandim

Au premier campement, nous ne sommes pas restés seuls longtemps. Quatre jours plus tard, arrivèrent nos patrons avec les familles et ils vaquèrent aussitôt à l'installation de leurs tentes noires. La grande tente, faite de pièces tissées en laine de chèvre, s'appelle *kone*. . Les *kone* des Kurdes riches étaient grandes, divisées en plusieurs compartiments ornés de tapis et de feutres (*kochma* ) ; il y avait une place à part pour les visites et un garde-manger, séparé pour les produits du laitage : beurre, fromage et caillebotte. Chez les moins aisés, le *kone* était bien plus petit et consistait en un compartiment pour l'habitation et un garde-manger.

Les tentes étaient dressées isolément ou en petits groupes sur les pentes de montagne ou dans les ravins et défilés où se dressaient les rochers et coulaient avec bruit les torrents et les ruisseaux de montagne. De loin on pouvait prendre les groupes de kone pour un campement militaire.

Dans les cours d'eau et les ruisseaux de montagne, il y avait des truites qui, à cette époque de l'année, montaient vers les sources pour frayer. Par endroits, des sources pures et froides sortaient des rochers. Tout le monde se sentait ici plus énergique et plus gai, et le travail était plus facile à faire. Les enfants de nos patrons passaient toute la journée à l'air ; ils jouaient, prenaient les truites dans les ruisseaux proches, ramassaient les herbes.

La vie des bergers était tout autre. Ici, dans les montagnes, nos corélégionnaires, les koulaks kurdes ne nous exploitaient pas moins que les Molokans. Nous menions la même vie misérable et malheureuse. En montant des vallées vers la montagne, à travers les pierres et les rochers, nous y étions arrivés presque pieds nus. En ramenant les moutons et, en les recherchant dans la brousse nous déchirions complètement nos vêtements et vivions en guenilles, tout comme chez les Molokans. Mon père foula pour moi un chapeau avec de la

û ji serma û baranê, ji tîrejên germ ên tavê kêm disitirandim.

Malê min ji van tiştan pêve nebû: kulavê şivaniyê ku bi şev min xwe pê dipêçand, tûrikê xwey, perçeyek nanê timî hiştk û tasek sifir ku pê min ji xwe re ava vexwarinê tanî. Carna, ji şivanan hinek şîr min bi dest dixist. Diviyabû ku xwarina germ tu car neyê bîra me. Digel vê yekê, halê min dîsa ji yên din hinek çêtir bû. Her du sê hefte carek, min dikarî serekî bidim mal û li wê ji destê diya xwe, xwarineke germ bixwim. Bav û birayên min, hîn ji me bi jortir, li serê çiyê, li nav zinar û kendalên ku qet rê û şiverê pê nediketin û pezên bi qiloç nikaribûn derbas bibin, pezê mêşin diçêrandin. Ewan bi mehan rûyê mal nedidîtin.

Li ber destê min kerek hebû ku pê, carna, berxek nexweş an ling-şikestî, min tanî mal. Hûrmirê min jî giş, li ser pişta vî kerî bû. Şivana hemû, 24 saetên xwe li bin ezmên derbas dikirin. Wextê baran û bager, min xwe li bin beriha, di şikeft an di quncikeke şil de, vedişart û bê agir, bi cilên xwe yên şil, bi saetan ve, li wê, ji sermê dilerizîm. Carna, bi heftan, heta bi mehan ve, min dengê tu însan nedibihîst.

Di jiyîna xwe de, li ciyên kûvî, em her gav li ber xetera mirinê bûn. Me pez, ji tada guran, ji çeteyên dizan, ji herikandina sîpanên berfê û ji gundirbûna keviran diparast. Carna, kevirên mezin ji serê çiyan bi dengekî gur digundirîn û li ber xwe çi hebû, dibirin newalan.

laine de brebis, mais il était très grossier et me démangeait les oreilles et le cou. Ce chapeau me causait d'atroces souffrances et il me protégeait peu contre le froid, les rayons brûlants de soleil et la pluie.

Tout mon bagage consistait en une houppelande de feutre, *kevalé chevanié*, dans laquelle je m'enveloppe pour la nuit ; un petit sac de sel et un morceau de pain, invariablement très rassis, il y avait aussi une gamelle en cuivre, dans laquelle je puisais l'eau pour boire. Quelquefois, j'arrivais à obtenir du lait qui venait trait chez les bergers. Il n'y avait pas à songer au repas chaud. Malgré tout, je vivais un peu mieux que les autres ; j'avais la possibilité, ne fut-ce qu'une fois toutes les deux ou trois semaines de faire un saut jusqu'à la maison ; où ma mère me servait un repas chaud. Mon père et mes frères faisaient paître les brebis bien plus haut dans la montagne, au milieu des rochers et des falaises, où il n'y avait ni route, ni sentier et où on ne pouvait pas pénétrer le grand bétail à cornes. Pendant des mois, ils ne revenaient pas à la maison.

J'avais à ma disposition un petit âne, sur lequel il m'arrivait de transporter à la maison un agneau tombé malade ou qui s'était brisé la patte. Sur cet âne je déplaçais mon bagage. Tous les bergers passaient à ciel ouvert les vingt-quatre heures. Pendant la nuit ou l'orage, je me cachais sous des rochers surplombants ou dans de petites cavités ou simplement je restais assis dans quelque trou humide en tremblant de froid et sans feu pour me faire tant soit peu sécher. Des semaines, quelquefois des mois, je n'entendais pas la voix humaine. Vivant au sein d'une nature sauvage, nous affrontions à chaque pas le danger mortel. Nous gardions nos brebis contre les agressions de loups, contre les bandes de voleurs, contre les éboulements d'avalanches de pierres qui parfois s'écroulaient du sommet même de la montagne avec un bruit et un fracas retentissants ; un éboulement pareil balayait littéralement tout sur son parcours.

Bi rojan, em li palên çiyayên asê, di kenarên zinaran re û di kortalan de dimeşiyan, pez ji ciyên bi xeter bi dûr dixist û bala xwe dida ku tu ziyan negihê axayên me. Cama bi strandin, an bi fîkandin, bê tirs û telaş, wek pezkûviya, ji tehtekê me xwe davête tehteke din. Lê, piştre, me li jêr dinêrî û li bin xwe, newalan, an kortalên kûr ên bi lehiyan, didîtin, tirs dikete dilê me û em jê gêj dibûn.

Her wekî dibêjin : ji mirinê, em bi tiliyekê, dûr bûn. Le masûlkeyên me pêşve diçûn, xurt dibûn û hisên me ziravtir û zîztir dibûn. Çavên şivanan gelek baş dibînin. Di cî de, bi roj an bi şev, gava tiştekî xerîb xwe bi dizî keriyê nêzîkî keriya me dikir, em pê dihesiyan û dengên gelek nizm, xûşîneke piçûk nêzîkî keriyê zû digihaştin guhên me.

Des journées entières nous marchions sur les pentes des montagnes les plus abruptes, au bord des falaises à pic et des précipices, en éloignant nos brebis et moutons des endroits dangereux, en veillant avec soin qu'aucune perte ou dommage ne se produise pour le patron. En chantonnant des chansons gaies ou en sifflotant sans souci, il nous arrivait parfois de sauter comme des chamois d'un rocher sur l'autre, sans peur du danger. Cependant, il suffisait de regarder une fois en bas la chute profonde de la falaise à pic ou le défilé au fond duquel se précipitaient des torrents tumultueux pour que la tête tournât et qu'on eût peur.

Nous vivions pour ainsi dire à un doigt de la mort, mais en revanche nos muscles se développaient et se raffermissaient et nos organes des sens s'affinaient. La vue chez les bergers est extrêmement aiguë. Nous apercevions instantanément si quelqu'un, de jour ou de nuit, s'approchait furtivement du troupeau, et nous entendions le moindre bruit, un frôlement presque imperceptible qui se produisait près du troupeau.

## 8- Leyistikên me

Car car, dûşivanan keriyên xwe nêzîkî hev dikirin û bi xweşî bi hev re dileyistin. Hin ji leyistikên me ji yên kevin bûn ku ji piçûkahiya xwe de me dizanîn, lê hin jê, me bi xwe derdixistin. Ew jî pir caran reqis û stran bûn. Mesela, me destên hev digirtin û me heleqeyek çêdikir; yekî ji me distrand û ên din jî bi dengekî lê vedigerand.

Yek ji stranên me ev bû:

*« Lo şivano, lo, lo şivano!*
*Tilî zêro, dil kovano.*
*Bi vî dengê xwey xweş,*
*Ew di blûrê de dixûne.*
*Lê lê dayê şivanok,*
*Baş guh nade keriyê.*
*Lê lê dayê şivanok,*
*Dilikê min ketiyê.*
*Dayê min bidin şivanok,*
*Bavo min bidin şivanok.*
*Ezê timî pêre şabim.*

# 8- Nos jeux

De temps à autre, les aide-bergers ramenaient leurs troupeaux plus près les uns des autres et jouaient avec entrain. Certains de ces jeux nous étaient familiers depuis l'enfance et, d'autres, nous les inventions nous-mêmes. Ils consistaient surtout en danse et en chants. Par exemple, nous nous prenions les mains et nous nous mettions en rond ; un des joueurs commençait le premier la chanson et les autres reprenaient en choeur une de nos mélodies préférées en marchant en rond.

Voici un passage d'une chanson :

*« Ei, ei, petit berger !*
*Doigts d'or.*
*De son chalumeau, il joue*
*Des airs qui ne sont pas ordinaires.*
*Ei maman, le petit berger*
*Garde mal le troupeau*
*Ei, Maman, le petit berger*
*Je l'aimerais volontiers*
*Donne-moi pour femme,*
*Maman, au petit berger,*
*Papa, au petit berger*
*Je serai toujours heureuse*

*Ezê ji bo qelenê bedewa xwe*
*Bibim şivanê bavê wê*
*Sibe bû*
*Roj wa hilda*
*Zerê eniya bedewa min*
*Şewq û şemal da*
*Min heft sal temam şivantî kir*
*Qewl û seeta me hatiye*
*Ezê ji bedewa xwe re*
*Kemberek zîvî bikirim.»*

Me stranên kevin ên li ser egîdan jî, digotin. Wan zilamên ku bi mêranî, ji bo bidestixistina çêreyên baştir, xwe davêtin ser Kurdên din, ew dikuştin, an ew bi xwe di şerek bê eman de dihatin kuştin. Em wisa jî bi leysitikeka xasa şivanan, *zeze*, dileyistin. Leyistik ev bû : her yek kêrek an darikek çîk dixist nav pêçiyên piyê xwe û heya jê dihat ew bi aliyek ve dûr davêt, yek ji leyistikvanan diviyabû timî bigota ze-ze-ze û bêi ku hilma xwe berde here bemû tiştên avêtî berhev bike. Eger ew berî ku hemûyan berhev ke hilma xwe berda leyistikê winda dikir. Carna, me bêhna xwe, bi şerê berana jî derdixist, ji nav keriyên xwe, li beranên xurt û şerker digeriyan, ew berdidan hev û seyra wan dikir. Karkirî ji me ew bû ku beranê wî bera yên dîtir dida.

Ev leyistikên me bi dizî çêdibûn. Axeyan qebûl nedikir ku em keriyên xwe bînin cem hev; ji tirsa ku pez têr nexwe û goşt negire... Di tenhayiya me de, teseliya me ya bingehîn, blûra me bû.

Her yekî ji me yeka wê hebû û xweş lê dixist. Blûr

*Avec lui*
*Je travaillerai chez vous*
*Pour la dot..*

*"Voici le matin*
*Le soleil est déjà levé*
*Sur le front de ma belle, l'or éclatant a brillé*
*Je suis resté comme berger sept ans,*
*mais le moment est venu,*
*J'achèterai à ma belle une ceinture d'argent...»*

Nous chantions aussi les anciennes chansons populaires sur les héros qui se battaient vaillamment contre d'autres Kurdes pour s'emparer de meilleurs pâturages et campements pour leurs tribus et qui perdirent leur tête dans quelque bataille inégale.

Nous jouions aussi à un jeu spécial, particulier aux bergers, le *zézé*. Il consistait en ceci : chacun mettait verticalement au bout du pied un couteau ou un bâton et de toute sa force lançait cet objet loin de côté ; un des joueurs devait en répétant tout le temps "zé-zé-zé" et sans reprendre haleine ramasser tous les objets lancés. S'il reprenait haleine avant de les avoir ramassés, il perdait la partie.

Quelquefois, nous organisions les combats de moutons. Ayant choisi de chaque troupeau les jeunes moutons les plus forts et les plus batailleurs, nous les opposions l'un contre l'autre et le combat commençait. Le gagnant était parmi nous celui dont le mouton sortait vainqueur.

Ces jeux en commun se faisaient en secret. Les patrons ne nous permettaient pas de nous réunir avec nos troupeaux pour que les brebis aient plus d'herbe, se nourrissent mieux

bi kêrî gelek tiştan dihat: bi hewakî hezîn, me pez û kerî li hev didan, bi ahengeke din me ew dibirin avê, dîsa bi nexmeke din me banî yên windabûyî dikir. Hêdî, hêdî me ew hînî deng û nexmeyan dikir. Gava berxik hin gelek piçûk bûn û me ew dibirin avdanê, me ji wan re, bi awakî welê lê dixist ku li ciyên din nayê lê xistin. Gava me xwey dida wan ji bo ku bêtir giya bixwin, dîsa bi hewakî xas me ew didan hev.

Berxên me zû dielimîn dengên blûrê û ew ji hev gelek xweş ferq dikirin. Kîjan deng ji bo kîjan sebebê bû, zû dikete guhê wan û li gora wî dikirin. Di nav berxan de me ji hinekan bêtir hiz dikir û navên dilovan li wan datanî : Kavê, Kurê, Qerqasê.

et engraissent plus vite. Dans notre solitude, la principale distraction était la flûte dont tous nous jouions assez bien.

La flûte, en kurde *blûr*, nous servait à des fins diverses. Ainsi à l'aide d'une mélodie déterminée, nous réunissions les moutons en troupeau, une autre appelait à l'abreuvoir, une troisième ramassait les égarés. Progressivement, on leur apprenait à distinguer les sons et les mélodies. Quand les agneaux étaient encore tout petits, on les menait à l'abreuvoir en jouant une mélodie spéciale qu'on ne faisait entendre en aucun autre cas. Quand on leur donnait du sel pour qu'ils mangent plus d'herbe, on le faisait aussi aux sons d'une mélodie déterminée qui signifiait qu'ils devaient être ensemble et paître.

Nos agneaux s'habituaient rapidement aux sons de la flûte et distinguaient bien quel était le motif que nous jouions et ce qu'il signifiait. Parmi les agneaux, nous avions des favoris, à qui nous donnions des sobriquets caressants : Kavé Kourré Karkkaché.

# 9- Yê ku şîr dide

Gava ku em li serê çiyan tevî keriyan digeriyan axeyên me bi şîr mijûl dibûn û jê xurekên ku demeke dirêj hilanîna wan û barê wan sivik be çêdikirin. Ev, bê guman, bi awayekî iptidaî, dihate pêk anîn. Li cem kurda çêkirina rûnê nivîşk karekî zehmet û giran e û barê milê jina ye. Kebanî hemû şîrê çêlek, mî û bizinan e ku di rojê de hatiye dotin berî nav qazanên sifir ên mezin didin ; her yek ji van qazanan ji du ta deh satilan hildide. Qazanê datînin ser agir û gava kela şir radibe wê atînin û dihêlin ku hinek sar bebe. Qasî her deh deqîqan carekê kebanî kevçiyek şorbê tijî mast dixin nav her qazanê û serê wê bi poteke ji hirî bi navê *yelop* qenc dinixêmin. Serê sibe her tişt hazir e û kebanî mastê qazanê dixin nav denên ji çerm ku jê re *meşk* tê gotin. Piştre karê girantir dest pê dike. Divê ku van meşkan carina bi vî alî, carina bi aliyê din ve bikulin û carcarna hinek ava sar bi ser ve zêde kin, heta ku mast bibe dew. Ew wisa zû bi zû nabe dew, divê ku xwe gelek bi vî karê

# 9- Ce que donne le lait

Pendant que nous rôdions avec les troupeaux dans les montagnes, nos patrons étaient occupés à transformer le lait en des produits capables de supporter la conservation prolongée et le transport. Cela se faisait, bien entendu, d'une façon toute primitive. La préparation du beurre, chez les Kurdes est une besogne dure et exténuante qui échoit aux femmes. Les patronnes versent tout le lait de vache, brebis et chèvre, qu'on trait dans la journée, dans de grands chaudrons de cuivre, *Kazan*, d'une capacité de deux à dix seaux. On met le Kazan sur le feu et quand le lait a bouilli on le laisse se refroidir un peu. Toutes les dix minutes, à peu près, la patronne verse dans chaque chaudron une cuillerée à soupe de lait caillé et recouvre soigneusement le chaudron d'un lainage, *iélop*. Au matin tout est prêt et les patronnes mettent le lait caillé dans les outres de cuir, *mechk* qu'on ficelle solidement. Ensuite commence le travail le plus difficile. Il faut secouer les outres, tantôt d'un côté, tantôt de l'autre, en ajoutant de temps en temps de l'eau froide, tant que le lait n'est pas baratté. Quand arrive ce moment , et cela ne se

yeknesak û wetar biêşînin. Gava ku êdî mast dibe dew nava meşkan hemû vala dikin tûrikên caw û rûn ji dew vediqetînin. Piştre rûnê hazir ji tûrik derdixin, ew bi ava sar dişon, xwe pê werdikin û ew dixin derdanên xas.

Ji bermayiyê rûn re bi kurdî *dew* dibêjin û jê jî cureyek pênirê spî çêdikin. Xwey lê dikin û hin giyayan dixin navê û gava ku ew baş hevûdu digre, ewî dixin tûrên cawî û tiştekî giran datînin ser tûrik ji bo baş vî penîrê bê avdan bê givaştin. Dew û avdawê didin golikan ; heçî penîrê spî yê givaştî, vî dixin nav deman. ev penîr yek ji xureken sereke yên Kurda ye. Dew lemend jê miqdarek mezin, qasî deh heta panzde denan, feqîr jî ji bo malbata xwe yek an du denan hazir dikin.

Penîr jî bi awayekî ne kêm iptidaî tê çêkirin. Jin şîrê ku di rojê de hatiye dotin berdidin nav qezanan. Divê ku ev şîr bi adan be, rûnê wî jê nehatibe standin. Ji bo Kurda ji şîrê bê run penîr çêkirin gunehkariyeke mezin e û ji vî şîrî re şîrê bê îman dibêjin. Piştre şîr dikelînin û havên davêjin nav. Kurd havênê xwe ji berê miyan çêdikin ; gava mî dizên berê wî distînin, bvaş bi sîlikê dişon û ziva dikin. Piştre ew hûrhûr dikin heta ku her perçeyek bibe qasî poleke piçûk û paşê vî havênê bji bo çêkirina penîr di qazanan de bi kar tînin. Şîr zû havên digre, di panzde an bist deqîqan de tîr dibe. Piştre qazanan vala dikin nav tûrikên cawî yên xas û devê wan girê didin û ew datînin ser tehteke hilû kevirek mezin datînin ser wan. Penîrên givaştî ku ji tûrikan derdixin pehn û giroverên in û ew li ber hewayê hişk dibin.

produit pas rapidement, on doit dépenser beaucoup de force à ce travail fatiguant et monotone, tout le contenu des outres est déversé dans des sacs coniques spéciaux de toile et on y presse le beurre. Ensuite, le beurre prêt est sorti du sac, on le lave à l'eau froide, on y met du sel et on le dépose dans les récipients appropriés.

Le résidu du beurre, en kurde *dew* (petit lait), sert à préparer du fromage blanc. On le sale, l'assaisonne de différentes herbes et, quand il se consolide tout-à-fait, on le met dans des sacs de toile et on le presse sous un poids. Le petit-lait est employé pour les veaux, quant au fromage pressé, on le serre bien dans les outres. Le fromage blanc sert d'aliment principal aux Kurdes. Les riches en préparent une grande quantité, dix à quinze outres, les pauvres une ou deux, pour la famille.

Le fromage est préparé d'une manière non moins primitive. Les femmes versent dans des chaudrons le lait qu'on a trait dans la journée, obligatoirement du lait non écrémé. Les Kurdes estiment que c'est un grand péché de préparer du fromage avec du lait écrémé. Ensuite, on fait bouillir le lait et on le fait fermenter avec du placenta. Dans ce but, les Kurdes ramassent les placentas quand les brebis mettent bas, les lavent soigneusement aux cristaux et les font sécher. Le placenta séché est coupé en morceaux ayant la dimension approximative d'un gros sou et on s'en sert pour la préparation du fromage dans les chaudrons. La fermentation se produit vite ; le lait se coagule en quinze ou vingt minutes. Ensuite le contenu est versé des chaudrons dans de petits sacs de toile spécialement préparés qu'on ficelle et place sur une dalle de pierre lisse. Une grande pierre lourde remplace le pressoir. Le fromage pressé, sorti des sacs en forme de ronds aplatis, est séché à l'air libre.

# 10- Ji zozana vegér
# Cejna payizê *Beran-berdan*

Koçeriya Kurdên xwedî pez ne bê sebeb e. Li biharê di newalan de berf zû û li çiya dereng dihele. Berf, li quntarên jêrîn dest pê dike û hêdî, hêdî, her hefte, li ciyên ku berf li wê winda dibe, li bin germiya rojê, erd şîn dibe û bi giyayên ter tê raxistin. Bi berfê re ku hin bi hin xwe bi şûnda dide, koçer bi keriyên xwe ve, hîn ber bi bilindahiyê ve derdikevin. Li payîzê, piştî nîvê çiriya pêşîn, tevdan ber meqlûb dest pê dike. Li newalan baran û li çiyayên bilind berf dikevin; Kurd jî, bi keriyên xwe ve, ji berfê direvin, berê xwe didin jêr û digehin warên xwe yên berê; li wê, nihu giya ku li havînê hişk bûbûn, ji nû ve, ter derdikevin. Piştre, di dawiya payîzê de, pez dadikeve newalên ku hîn berf li wê neketiye, eger bikeve jî zû dihele û qet xwe nagire. Digel vê yekê, berf dereng namîne ku bigehe newalan

# 10- Retour des pâturages d'été Fête d'automne *Beran-berdan*

Les transhumances des Kurdes en été, le déplacement de leurs troupeaux d'un endroit à un autre, ne sont pas du tout fortuits. Au printemps, la neige commence à fondre le plus tôt dans les vallées ; elle fond plus lentement dans les montagnes, en commençant par les pentes inférieures, et libère peu à peu chaque semaine une partie de la surface qui, grâce à l'abondance de l'humidité et à la chaleur du soleil, se couvre rapidement de végétation. En suivant la neige qui recule, les nomades avec leurs troupeaux montent toujours plus haut dans la montagne. En automne, à peu près vers la seconde moitié d'octobre, le mouvement commence dans le sens inverse. Il pleut dans les vallées, la neige commence à tomber dans la haute montagne, en reculant devant la neige qui avance. Ils arrivent ainsi à l'endroit de leurs anciens campements où l'herbe a eu le temps de repousser en été. Enfin, tard en automne, les troupeaux descendent dans les vallées où il n'y a pas encore de neige, et s'il en tombe quelquefois elle fond rapidement dans la journée. Cepen-

jî, hingê, xwediyên pez bi keriyên xwe re vedigerin wargehên xwe yên zivistanê.

Kurd, vê vegera payîzê bûyereke bi xêr dihesibînin; ji ber ku rojên zozanan her xweştir û serbestir bin jî ne bê xeter in. Ev dem bi xweşî digehe dawiya xwe û kerî bi selametî vedigerin ciyên xwe û şivan jî kiriya xwe ya havînê timam ji axayê xwe werdigrin. Digel vê yekê, ev roj ne wek a *Baro-danê* ye. Di vê de kêmtir tevdan û can heye. Guhirandina mewsim li ser nefsa Kurdan tesîreke mezin dike. Ev tesîr, di dema hatina rojên payizê yên bi mij û baran de, hîn bêtir xuya dike. Yek dibê qey pez bi xwe bi vê guhirandinê dihese. Gava min pezê xwe ji zozana ber bi germiyana ve dibir, welê ji min re dixuya ku heywan, bi serên xwe yên bi awakî dilşkestî xwar kirî, ji borîna rojên serbestî yên çiyan poşman bûne û naxwazin vegerin govên teng û heya dawiya zivistanê, ji azadî mehrûm, tê de bimînin.

Lê heyat bi ihtiyac û zerûretên xwe, me her gav bindest dike. Jinên xweyî pez, li ser riya vegera mal, ji hev dipirsin eger havîn xweş derbaz bû an na? Bi hev re hesab dikin û ji hev dipirsin her yekê ji wan, çiqa rûn, penîr û cacî li hev daye?

Kurdên dewlemend, bi xirabî û bi hesûdiyê, qala Kurdên feqîr, ku rexma kêmaniya pezên xwe, bi xebat û zîrekiya xwe bi nisbeta wan, gelek rûn û penîr, çêkiribûn, dikin. Zilam hesab dikin, bêî ku xesarê bighînin mala xwe çiqa rûn, penîr û hîrî bikaribin

dant, finalement, il neige aussi dans les vallées et alors les troupeaux avec leurs propriétaires retournent aux quartiers d'hiver.

Les Kurdes fêtent ce retour automnal des troupeaux comme un heureux événement, car les jours des pâturages d'été qui, tout en étant plus libres n'en présentent pas moins certains dangers sont finis, les troupeaux sont rentrés sains et saufs, les bergers, escomptent le règlement pour le travail d'été qui approche et les patrons leurs gros bénéfices. Cependant, on ne peut d'aucune façon comparer cette fête avec le *Baro-dan* du printemps. Elle est moins animée et spontanée. Le changement de saison influe beaucoup sur l'état d'âme des Kurdes. Cela est surtout visible quand arrive l'automne avec les journées grises, les pluies et les brouillards. On dirait que les bêtes sentent aussi le changement qui s'annonce. Quand je menais en bas vers les vallées mes moutons qui ont si bien mangé en été et ont pris des forces, il me semblait toujours que les bêtes, leurs têtes baissées tristement paraissaient regretter la liberté d'été perdue et le commencement pour eux du stationnement prolongé et ennuyeux dans les bercails étroits.

Mais bien entendu la vie avec ses besoins et ses soucis prend le dessus. Chaque patronne, sur le chemin du retour au foyer, commence déjà à supputer avec ses amis si l'été a réussi. Elles calculent combien chacune a préparé de beurre, de fromage blanc et de fromage.

Les koulaks parlent avec malveillance et envie des pauvres, qui, grâce à leur travail soutenu tout en ayant une quantité infirme de bétail, ont constitué des réserves relativement grandes de beurre et de fromage. Les hommes calculent combien, sans détriment pour leur ménage, ils pourront vendre de beurre, de fromage, de laine et combien ils pour-

bifroşin û bi pereyê wan ji xwe re genim û ce bikirin. Kurdên koçer ku bi piranî bi xwedîkirina pez îdara xwe dikin, bi çandiniyê mijûl nabin. Ji lewre mecbûr in dexlê xwe bikirin. Ev, ji bo wan meseleyeke gelek muhîm e.

Îşê peydakirina çêreyên zivistanê jî ne hêsanî ye. Herwekî koçer li havînê ji pezê xwe re ji bo zivistanê tu êm pêk naynin di zivistanê de pezê xwe derdixînin çêreyan.

Pîrekên can bi tiştên ku ji çerçiyan kirîne xwe dinepixînin û wan şanî hev dikin: destmal, derzî, ta, bişkok, kibrît û zînetên por. Xort û keç sirên xwe dibêjine hev; ji xwe re kê û kê dergistî girtine û wan bistînin an na? Dilketî behsa rojên bextiyarî yên zozanan dikin, û ciyên ku bi delalên xwe re, bi saetan, li wê diman, tînin bîra xwe: kaniyên ku ji ava wan a sar û zelal vexwarin, şevên tavheyivê, gava bi tena xwe, ji çavên xelkê dûr, li bin stêran, li serê çiyan, di nav kulîlk û heşînayîyê de, deqîqeyên jiyîna xwe yên xweştir derbaz dikirin, lawikan digotin û direqisîn û di dawiyê de bi navê Xwedê sond dixwarin ku heya mirinê ji hev re sadiq bimînin. Ev tişt nihu, giş, dihatin ber çavên wan û pê dilê wan davêt.

Keç diyariyên ku ji dergistî an dilketiyên xwe standibûn, şanî hevalên xwe didin: gustîlkên zîv, ên sifr, eynikeke dora wê zêrkirî, morîkên rengareng. Xort jî ji aliyê xwe hediyeyên xwe şanî hevalan dikin: destmal, cizdanên bi mirariyên piçûk neqişkirî, kirasên bi neqşên hevrîşim, goreyên hirî, lepik... Ev giş û li

ront s'acheter de froment et d'orge avec l'argent ainsi procuré. Les Kurdes nomades, en pratiquant principalement l'élevage, ne font pas eux-mêmes de semailles et sont obligés d'acheter le pain. La question des céréales a par conséquent pour eux une grande importance.

On débat aussi la question d'organisation du pâturage d'hiver, car les Kurdes ne ramassent pas le foin, et en hiver, font sortir, chaque jour leur bétail au pâturage.

Les jeunes patronnes se vantent l'une devant l'autre en racontant quels objets elles ont pu obtenir, au moyen du troc, chez le marchand ambulant : mouchoirs, aiguilles, fils, boutons, allumettes, ornements pour la coiffure. Les jeunes gens et les jeunes filles se confient leurs secrets : qui a choisi une telle ou un tel comme fiancée ou fiancé et si l'on a convenu définitivement du mariage. Les amoureux parlent de l'été qu'ils ont passé si heureusement, se rappellent les endroits où ils restaient assis ensemble, les sources dont ils ont bu ensemble l'eau fraîche et limpide, les nuits de lune à la clarté desquelles ils passaient les plus heureuses minutes de leur vie dans les montagnes, parmi les fleurs ; ils se rappellent les endroits où, librement, loin des regards vigilants des parents, ils ont joué et ri, dansé et chanté leurs chansons préférées et où, enfin, au moment décisif, ils ont juré au nom de *Khodé* (Dieu) de rester fidèles l'un à l'autre toute la vie.

Les jeunes filles montrent aux amies les cadeaux du fiancé ou de l'amoureux, des anneaux d'argent ou de cuivre, un miroir doré ou des verroteries multicolores. Les jeunes gens, à leur tour, montrent les cadeaux qu'ils ont reçus : mouchoirs de poche, porte-monnaie brodés avec de petites perles, chemises ornées de soies multicolores, chaussettes de

dora wan, giyayên zer, kulîlkên çilmisî, dar bi pelên xwe yên hişkbûyî, ezmanê tarî û bayên hişk, deriyên zivistanê vedikin û li benda wê disekinin.

Bi vî awayî, Kurdên koçer bi kiflet û keriyên xwe ve li ser riyên ji ber baranên payizê bi herî, ber bi warên zivistanê ve dimeşin. Gava digehinê, pîrek hûrmirên xwe zû saz dikin, tiştên ji çiya anî bi cî dikin, pez dijmêrin û karên xwe pêk tînin.

Piştre cejna *beran-berdan* tê. Ji vê re, ji her kesî bêtir, kêfa şivan û ya dûşivanan tê. Di vê rojê de, karê wan xilas dibe û kiriya xwe ya havînê ji axên xwe distînin. Roja *beran-berdanê*, mî dixin govekê bi tenê û beranên tovê ku, li havînê, ji wan cuda diçêriyan, berdidin nav wan. Ûsa dikin ku li biharê, mî giş di carekê de bizên.

Gava beran berdidin nav miyan, Kurd tifingan berdidin, herwekî şahîneta zewaca miyên xwe dikin. Wê rojê ha, xwarinên rengareng çêdikin : mirtoxe, gata, qawirme ; xelkê diezimînin şîvê banî belengazan dikin û ji wan re xwarin didin.

Keçên ciwan, destmalên xwe ji serê xwe dikin û wan davêjin stûyê beranên hêjatir û xort jî diçin destmalên keçên ku hez dikin û dixwazin bistînin, direvînin. Dê û bav bala xwe didin ka kîjan xort destmala keça wan distîne. Bi vî awayî dizanin ku keça wan li havînê, bi vî xortî re li hev hatiye û di dilê wê de heye ku wî bistîne. Eger dê û bav razî dibin, nîşana wan

laine tricotées, gants... Et tout autour, l'herbe fanée, les fleurs flétries, les arbres au feuillage jauni ; le ciel qui se renfrogne et les brusques coupures de vent font accélérer le pas ouvrent les portes de l'hiver.

Ainsi, avancent lentement les Kurdes avec leurs familles, leurs biens et leurs troupeaux sur des routes détrempées par les pluies d'automne, jusqu'à ce qu'enfin, ils rejoignent leurs demeures d'hiver. Ici les patronnes s'installent à la va vite de nouveau pour l'hiver, rangent les produits apportés de la montagne, comptent le bétail et mettent en ordre le ménage.

Arrive la fête du Barân-berdân, le "lâcher des moutons", dont se réjouissent le plus les bergers et leurs aides. C'est ce jour là en effet que finit le temps de leur service et qu'ils recoivent la rémunération de leur travail d'été. Au jour du Barân-berdân, on sépare les brebis dans un enclos à part et on laisse pénétrer chez elles les béliers reproducteurs qui, durant tout l'été, paissaient dans un troupeau isolé. On procède ainsi pour que, au printemps de l'année qui vient, toutes les brebis agnèlent en même temps.

Au moment où on lâche les béliers chez les brebis, les Kurdes tirent les coups de fusil, comme s'ils fêtaient le mariage de leurs brebis. Ce jour-là on prépare des mets divers *mrtokha*, nougat ; *gata* "beignets sucrés fins ; *kaourma*, viande rôtie, et on invite du monde pour le dîner ; ensuite on réunit les pauvres à qui on donne à manger.

Les jeunes filles enlèvent de leurs coiffures les mouchoirs de soie et les jettent au cou des moutons favoris, tandis que les jeunes gens s'approchent et s'emparent de ces mouchoirs pour signaler qu'ils aiment les jeunes filles et

tête birîn û piştî demekê jî, daweta wan çêdibe. Bê guman, dê û bav adetî bêtir hez ji dergistiyên dewlemend dikin û di demên berê de kêm axeyên zengîn razî dibûn ku keça xwe bidin şivanekî.

Piştî cejna *beran-berdan*, xwediyên pez hesabê şivanên xwe didîtin. Şivanekî, ji bo xebata xwe ya havînê, ji 8 heya 9 pez distandin û dûşivan jî, ji 3 heya 5. Li gora adetên ciyî li ser her 25 serî, şivanekî pezek distand. Bi vê hesabê, xwediyê 200 an 250 pezî, diviya bû 10 an 15 pez bide şivanê xwe, ev jî li gora dijwarî û zehmetên ku dihatin kişandin, ne tu tişt bû. Lê, bi ser de, her xwediyê pez, bi awakî din em dixapandin. Ew bi cîranên xwe li hev dihatin, miqabilê pere, keriyên wan jî bi yên xwe re dibirin zozanan, û bi vî awayî 200, 300 serî bêî ku tiştek bidin şivanan, didan çêrandin. Lê selamitiya vê keriya zêde jî ji şivan dihate pirsîn.

Digel vê yekê, rexma kêmbûna kiriya me, li cem Kurdan halê me ji yê li cem Molokan çêtir bû. Ji bo miyekê ji aliyê gura revandî, an dirandî, Kurd ji heqên me nedibirî û wek Molokan, bi bêinsafî ewqas li me nedixist. Jê pêve heqê her şivan hebû ku li havînê ji xwe re, bi dilê xwedî, pezekî serjêke. Ji bo sivikkirina perîşaniya me, ev tiştekî gelek giranbiha bû.

veulent les épouser. Les pères et mères surveillent quel jeune homme a pris le mouchoir de leur fille ; ils savent que la jeunesse s'est entendue en été que leur fille est d'accord pour épouser celui qui prendra son mouchoir. S'il n'y a pas d'obstacles de la part des parents, les fiançailles ont lieu et quelque temps après on célèbre la noce. Bien entendu, les parents donnent habituellement la préférence à des fiancés riches, et dans le vieux temps peu de patrons riches auraient consenti à donner leur fille à un berger.

Après la fête du Barân-berdân, les patrons réglaient les comptes de leurs bergers. un berger adulte recevait pour le travail d'été de 8 à 12 jeunes moutons et un aide de 3 à 5. D'après l'usage local, le berger recevait une brebis sur chaque 25 ; suivant ce calcul, si le koulak (patron) avait un troupeau de 200 à 250 brebis, il donnait au berger 10 à 12 têtes, ce qui représentait une rémunération plus que modeste du travail difficile et dangereux du berger. Mais en outre, le koulak kurde s'évertuait à nous tromper encore d'une façon détournée. Il s'entendait avec d'autres voisins moins aisés et, moyennant compensation, prenait leurs petits troupeaux au pâturage d'été ; ainsi, insensiblement, il s'accumulait encore quelques 200 à 300 brebis qui paissaient avec son troupeau. Quant au berger qui répondait de l'intégrité de ce troupeau additionnel, il ne touchait aucun salaire en plus.

Tout de même, malgré la maigre paye, nous comptions qu'on vivait mieux chez les Kurdes que chez les Molokans. Pour la perte d'une brebis déchirée par des loups, les Kurdes ne faisaient pas de retenue sur le salaire et ne battaient pas le berger d'une façon aussi atroce que les Molokans. D'autre part, chaque berger avait le droit au cours de l'été d'égorger pour lui une brebis, suivant l'indication de patron, et c'était d'un grand appoint dans notre vie de misère.

## 11- Pezên windabûyî
## Mirina birakî

Havîna dîtir dîsa li gundê Karakala Reş li cem Baroyê Evdê em bûn şivan. Bavo, her du brayên min û ez, me çêrandina hemû pezên wî *baranta* li ser xwe girt. Me gelek bi xweşî karê xwe pêk tanî; me guh dida gotinên bavo û bi xwe jê şîret dipirsîn. Bavo êdî pîr bûbû û çêrandina pez êdî jê re pir zehmet dihat. Me bi tena xwe şixul dikir û nedihişt ku bavo rind ranezê û gelek biweste.

Lê bavo li ser vê yekê pir bi ya me nedikir. Ewî bi tenê bi roj rahet dikir û bi şev, her wekî baweriya wî bi me nedihat, ew bi xwe diçû ber pez. Ewî digote me ku xort bi şev nikarin heya sibê bê xew bimînin, û ku bi şev diz bi tifingan têne pez. Gur jî bi şev bêtir xwe davêjin keriyan û bawerî bi kûçikan jî bi tenê nabe.

Gava dibû şev, bavo kincên stûr li xwe dikirin, çifta xwe digirt, saçme dadigirt, nizim difikand û

# 11- Moutons disparus
# Mort du frère

L'été suivant, nous nous embauchâmes comme bergers dans le même village de Karakala chez le propriétaire Baroé-Avdi. Nous nous chargeâmes de faire paître tout son troupeau, *baranta*, à nous seuls, c'est à dire mon père, mes frères et moi. Nous travaillions en bon accord, en écoutant en tout le père et allions nous-mêmes demander ses conseils.

Le père était déjà âgé, il lui était difficile d'aller dans la campagne avec le bétail. Nous faisions donc nous-mêmes tout le travail, ne voulant pas que le vieux dorme mal et se fatigue.

Cependant, le père n'était pas très conciliant sur ce point. Il ne consentait de se reposer que de jour, mais la nuit ne se fiant à nous qu'imparfaitement, il gardait lui-même le troupeau. Il répétait souvent que les jeunes gens ne sont pas capables de veiller toute la nuit et que c'est précisément à ce moment que le voleur peut s'approcher subrepticement avec

çavên xwe di tariyê de digerandin. Ji kûçikan re ciyê sekna wan nîşan dida û li wê ew didan vezelandin û nobet girtin. Bi tenê Bêlas, seyê hêja, tim bi wî re dima û bi bihustek jê ne dibû.

Rojekê, serê sibê, gava em şiyar bûn, brayê min Bro ne xuya bû. Em gelek lê geriyan û li tu dera me ew peyda nekir. Bi vî awayî ez û birayê min ê piçûk Derwêş bitenê li ber pez man. Piştî çend mehên din hin Kurd gotin me ku Bro li gundekî dûr şivantî dikir. Bavê min, di cî de bi rê ket û çû wî bîne. Lê Bro nexwest vegere û got ku li mal bi têra xwe nedixwar, ku kifletên malê gelek bûn û çêtir bû jê re ku bi tena xwe bişixule; qet nebe bi vî awayî ewê birçî nemîne. Bavo û yadê gelek li ber ketin, Bro bi rastî malê xwedî dikir. Berî şivantiyê gava ku betal bû ew tevî yadê diçû bajêr û gundên cîran zekatê berhev dikir. Gava ku ew tevî me bû halê me xweştir bû. Lê liavakirin û gazinên dê û bavê me bê feyde bû, Bro xistibû eqlê xwe ku bi tena xwe bimîne û hemû havînê li gundekî din şivantî kir.

Havîn bi xweşî derbas bû lê, li payizê felaketek hate serê me : ji keriyê me sê pez winda bûn. Bavê min pir li wan geriya, lê taba wî vala çû. Ji ber bê umîdî, çû cem falçiyekê, ewê jî gote ku şivan Mîrza Temo ew dizîne. Bavo çû cem, xeber danê û jê xwest an peza an heqê wan bidiyê. Şivanê reben sond dixwar ku haya wî jê nebû, lê bavo, jê bêtir bi gotinên falçiyê baweriya xwe anî û bi xeyd çû cem Mûsa Beg, serekê eşîra Mîrza Temo. Beg gelek bi nifûz bû, çi dixwest dikir. Da ku giliyên bavê min bibihîse, jê berxek xwest. Bavo qaîl bû û bi vî awayî ket dîwana wî û gotê ku li gora fala

son fusil et s'emparer de quelques têtes de moutons. Les loups aussi peuvent se glisser jusqu'au troupeau ; on ne peut se fier aux chiens seuls.

Dès que tombait la nuit, le père s'habillait plus chaudement, prenait son vieux flingot de chasse qu'il chargeait de gros plomb et partait pour la garde de nuit. Toute la nuit, il faisait la route autour du troupeau en sifflant bas et en plongeant ses regards dans les ténèbres. Aux chiens de garde, il indiquait les endroits où ils devaient rester couchés et veiller ; seul le chien berger principal., Beilas, ne le quittait pas d'une semelle.

Un matin, au réveil, nous aperçumes que notre frère ainé, Bro avait disparu? Nous l'avons cherché longtemps sans pouvoir le retrouver nulle part. Nous restâmes donc deux, avec le frère cadet, pour garder et faire paître le troupeau. Quelque trois mois plus tard, des Kurdes nous rapportèrent que notre frère Bro s'était embauché comme berger dans un autre village. Mon père s'y rendit immédiatement et, effectivement trouva le frère. Mais Bro ne voulut pas revenir et refusa net en disant qu'à la maison, il vivait sans manger à sa faim, que la famille était trop grande et qu'il valait mieux travailler seul, au moins on n'a pas faim ! Le père et la mère furent très chagrinés au départ du frère. Bro était, en effet, le nourricier de la famille. Outre son métier de berger, aux moments libres, il allait à la ville avec la mère, ainsi que dans les bourgs voisins pour demander l'aumône. Quand il était là , on vivait mieux.. Cependant les parents eurent beau se lamenter et supplier, Bro ne revint pas et servit tout l'été comme berger dans un autre village.

L'été se passa sans incidents, mais en automne il arriva un malheur : trois moutons disparurent de notre troupeau. Le

qereçî, Mîrza Temo sê pezên wî dizîne. Mîrza Temoyê reben, ku tu cara dizî nekiribû, bi sond û yemîn xwe xilas nekir, Mûsa Beg, bi zor, sê pez jê standin, lê şûna ku wan bide bavê min, ew ji xwe re hiştin. Bavê min ji vê miamelê pir aciz û dilşkestî bû; çend car çû cem beg û pez jê xwestin. Lê Mûsa Beg guh nedayê û dawiyê gotê ku eger dom bi telebên xwe bike, ewê wî bide girtin û lêxistin. Bavê min dizanî ku her tişt ji destê Beg tê, tirsiya û nema bi ser de çû. Me êdî dizanî ku pezên me winda bûne, û bi wan re, kiriya me ya havînê jî. Em li ber diketin, pir caran hêstir di çavên me re dihatin xwar û me digo ku bela li pişt hev, wek kevirên giran, têne ser me.

Êvareke xweş a payizê, ez, bavo û brayê min Derwêş, gava em li çolê rûniştibûn û me nanê xwe dixwar û şîrê ku me nû dotibû vedixwar, Kurdek, ku me nedinasî, hate cem me.

Kurd, qedrê mêvanan ne bi tenê li mal, lê li çolê jî digirtin, ji lewre, bavo di cî de çû, şîr doşî, xwarin û vexwarin danîn ber mêvanê me, jê re li ser kulavekî nivînek çêkir û piştre jê pirsî ka ewê bi çi dikaribû arîkariya wî bike. Mêvanê me, piştî ku spasên xwe pêşkeşî me kirin, ji bo şîvê û mêvandariya me ya germ, gote ku eve çil roj in ku sê pezên biyanî ketine nav keriya wî û pê re diçêrin; ji xelkê pirsîbû û gotibûnê ku ên me ne, ji lewre hatibû xeberê bide me.

Ji vê xeberê em ewqa kêfxweş bûn ku me nedizanî ji bin qenciya ku vî zilamî bi me dikir, çawa derkevin.

Piştre me bi hev re xeber da; welê derket ku mêvanê me jî wek me şivanekî bi icare bû û ku ev bela bi xwe rojek hatibû serê wî jî, ji lewre dilê wî bi me ve mabû û ewqas zehmet dabû xwe ku vê xeberê bigehîne me.

Roja dîtir ez pê re çûm da ku her sê pezan bînim. Gava em nêzîkî kerî hatin, şivan û dûşivan xwe li dora me civandin û ji min xwestin ku ez pezên xwe binasim...

Ji dûr, min li keriyê mezin nêrî; ûsa, bê imkan bû ku ez wan ji nav ewqas heywanan, derêxim. Hingê ez derketim ser tehteke bilind û di cî de min dît ku her sê pez, her wekî biyanî ne, bi tena xwe diçêrin.

Şivanan pesnê min dan û gotin ku ez pisporekî hêja me. Piştre ez sekinandim ji bo xwarina goştekî biraştî, bi isûla şivanan : piştî ku berxekî qelew gurandin û postê wî jê derêxistin, goştê wî kur kirin, giyayên bi bihin û sîrik danîn tê de, û dîsa ev goşt xistin nav çermê. Di vê gavê de, dûşivan, li erdê ciyek ne gelek kûr kolabûn, postê goşt tê de xistinê, ax li ser kirin û li ser wê jî agireke mezin dadan. Du sê saet bi şûnda, agir û ax ji ser de avêtin, û hêdî hêdî, postê goşt tê de derêxistin û ew danîn nav kodikan.

Bêhna goştê di nav giya û sîrikê de biraştî, bi vî awayî iştaha me vejand, bi xwe ji sibê da me tiştek tam nekiribû. Bêhna giya, ewqas xweş bû, goşt ewqas tamdar dixuya ku bê aram (sebir), em li benda xwarinê diman. Her wekî şivan li cem hev bi isûl, bi heleqe

père les chercha longtemps, mais en vain. De désespoir il se rendit auprès d'une voyante qui lui dit que les moutons avait été volés par le berger Mirza Temo. Le père alla chez lui et, en l'insultant, se mit à exiger qu'il lui rendit les moutons volés et le dédommageât. Le malheureux berger jurait qu'il n'avait pas pris les moutons, mais on ne le croyait pas, car on avait davantage confiance dans la voyante. Le père, irrité, s'en fut chez Mousa Bek, chef du clan auquel appartenait le berger. Le bek, tout puissant, abusait fortement de son autorité. Il exigea un jeune mouton pour recevoir mon père et entendre sa plainte. Il fallut bien s'exécuter. A l'audience mon père déclara au bek que, d'après la voyante. Mirza Temo avait volé les trois moutons. Le pauvre miséreux qui, en réalité n'avait jamais été voleur, avait beau jurer, le chef du clan reconnut que Mirza Temo était coupable et exigea de lui les trois moutons. Cependant, au lieu de les rendre à mon père, il les conserva pour lui. Mon père fut interloqué et offensé de cette déclaration inattendue. Il se rendit plusieurs fois chez le bek et le priait de lui rendre ses moutons, mais le bek n'y consentait pas. Finalement, le bek menaça le père de l'arrêter et de le battre s'il osait encore une fois venir chez lui pour les moutons. Mon père savait que ça n'était pas là, vaine menace. Il eut peur et cessa ses visites au bek. Nous étions persuadés que les moutons étaient irrévocablement perdus, et qu'avec eux s'étaient évanouis tous nos bénéfices de l'été. Plus d'une fois nous versions des larmes nous disant que les malheurs tombaient sur nous l'un après l'autre comme de lourdes pierres.

Par un beau soir d'automne, mon père, mon frère Davrech et moi étions en train de souper dans la campagne, mangeant notre pain et buvant du lait qu'on venait de traire, lorsqu'un Kurde que nous ne connaissions pas s'approcha de nous.

Les Kurdes observent les règles de l'hospitalité non seulement à la maison, mais aussi dans les champs. Aussi, mon père, après avoir trait du lait frais, donna à boire et à manger à notre hôte, lui prépara un lit sur son tapis de feutre et lui demanda en quoi il pouvait lui être utile. Notre hôte, après nous avoir remerciés du repas et de notre accueil cordial, raconta que depuis une quarantaine de jours trois moutons étrangers ont rejoint son troupeau et depuis lors passent chez lui. S'étant informé auprès de certains, il avait appris que les moutons étaient probablement de notre troupeau et était venu nous le dire.

A cette nouvelle, nous éprouvâmes une joie indicible et ne savions comment remercier cet hôte qui nous rendait un si grand service. On causa et il se trouva que notre sauveur aussi pauvre salarié que nous, avait jadis subi le même malheur. Il s'en était souvenu et, nous prenant en pitié, il n'avait pas lambiné pour venir nous annoncer la trouvaille.

Le lendemain matin, je partis avec lui chercher nos moutons. A notre approche du troupeau, tous les bergers et leurs aides s'assemblèrent et se proposèrent d'aller reconnaître les moutons.

Ayant regardé de loin d'énormes troupeaux, je ne pouvais pas, bien entendu, y reconnaître les miens. Je montai alors sur un rocher élevé et pus aussitôt montrer les trois moutons qui, comme s'ils se sentaient étrangers dans ce troupeau, paissaient à l'écart.

Les bergers louèrent ma perspicacité et me reconnurent pour un bon *pispor* (expert).. Ensuite ils me régalèrent d'un rôti à la mode des bergers. Après avoir égorgé un jeune mouton bien en chair et lui avoir enlevé la

rûdiniştin, min xwe digirt ku bê edebî nekim û berî wan xwe navêjim sifrê. Lê çi şîvek bi lezet !

Piştî xwarinê ez vegeriyam mal. Bavê min minasib dî ku here cem Mîrza Temo û efwa xwe jê bixwaze. Lê, Begê zalim guh nedida feqîrên wek me û Mîrza Temo; ji lewre, ewî her sê pezên Mîrzayê reben, jê re venegerandin. Qereçî jî, ji derketina pezên me beicî û derewên wê li her derê hatin bihîstin û êdî tu kesî miraceata wê bi tu tiştî nekir.

Havîn ûsa derbas bû. Dû wê, pâyiz bi mij, baran û bi bayên xwe yên cemidî, bi ser me de girt. Brayê min Derwêş, bi nexweşiyekê ketibû, tum ser û parsûyên wî diêşiyan û roj bi roj êşa wî zêdetir dibû. Bi zor dikarî li dû kerî bimeşe û hin bi hin ji taqet diket. Dawiyê kete nav nivîna. Bavê min çû cem hekîmekî kurmancî. Evî tewsiye kir ku tenûr germ bikin, pezekî serjêkin, çermê wî derênin, brayê min tê de bipêçin û mideteke, li ser devê tenûrê bigirin û rojê, du sê car vî tiştî tekrar bikin.

Bavo û yadê gotinên hekîm, yek bi yek bi cî anîn. Bi ser de jî, hekîm ji brayê min du sê car xwîn berda, di nav şîr de kilis keland û ew danî ser singê wî. Van dermanên ha tu tesîreke baş neda. Brayê min, hin bi hin, ber bi mirinê ve diçû.

Bavo, dilşkestî, miraceata pîr û şêxan kir. Lê, ewan jî, ji êşa reben re tu çare nedîtin û Derwêş terka me da û ji destê me çû. Bê wî jî êdî bavo pîr bûyî, nedikarî keriyên mezin îdare bike. Ji wê rojê bi şûnda,

peau. Ils coupèrent la viande en morceaux, le soupoudrèrent avec de l'herbe odorante pilée menue, l'assaisonnèrent d'oignons sauvages et le replacèrent dans sa peau. Pendant ce temps, les aide-bergers avaient déjà pu creuser un trou peu profond, dans lequel ils posèrent avec précaution la peau bourrée de viande. Ils remplirent le trou de la terre et sur ce monticule allumèrent un grand feu. Deux ou trois heures après, quand le feu eût été entièrement consumé, les bergers écartèrent doucement le feu et la terre couvrant la peau avec précaution, ils mirent la viande dans les gamelles.

L'odeur agréable de la viande de mouton rôtie à l'instant, assaisonnée d'herbes et d'oignons, excita notre appétit, d'autant plus que depuis le matin, nous n'avions presque rien mangé. Les herbes répandaient un tel parfum, la viande semblait si savoureuse que nous attendions avec impatience le moment où nous pourrions nous installer pour le repas. Comme les bergers s'asseyaient en rond cérémonieusement et sans se presser, je dus pour garder les convenances cacher mon empressement. Mais quel bon dîner !

Je regagnai notre campement après le dîner. Mon père crut bon de se rendre immédiatement chez Mirza Temo pour lui présenter ses excuses. Il le persuadait de se rendre chez le bek pour reprendre ses moutons, mais le bek tout puissant ne se souciait guère des miséreux comme nous ou Mirza Temo et, bien entendu, garda les moutons. La voyante pâtit de cette affaire, car le bruit de sa tromperie se répandit aussitôt à la ronde et dès lors on cessa entièrement de s'adresser à elle.

L'été passa. Revint l'automne avec ses brouillards, ses pluies, son vent froid. Mon frère Davrech commença à se plaindre de douleurs à la tête et au côté. Chaque jour il se

li cem zilamên bi pezên hindik şivantî kir. Bi vî îşî dikarî bê berdest jî rabe. Ser xwestina wî, ez çûm bajêr, da ku ji xwe re karekî peyda bikim, qet nebe, yê dergevaniyê. Belê, bi şivantiyê, êdî me nedikarî nanê xwe derêxin û ji zûda bi xwe, me bi têra xwe nedixwar.

sentait plus mal. Il pouvait à peine marcher derrière le troupeau, et il était évident que ses forces l'abandonnaient. Enfin, il s'alita. Mon père s'en fut chercher le *hekim* rebouteux qui lui conseilla de bien charger le *tendûr*, d'égorger un mouton, de l'écorcher et, après avoir enveloppé mon frère dans la peau, de le tenir au-dessus de l'orifice du poêle et de répéter plusieurs fois l'opération.

Mes parents exécutèrent minutieusement l'ordonnance du *hekim*. En outre, le rebouteux fit à mon frère plusieurs saignées, fit bouillir de la chaux dans du lait, et avec ce mélange, fit des cataplasmes sur la poitrine de mon frère. Mais cette médication se montra inefficace. Mon frère s'éteignait.

Mon père s'attrista, s'adressa à plusieurs reprises aux membres du clergé, les *pir* et les *cheikhs*, mais ceux-là non plus ne purent venir en aide au malade. Bientôt Davrech mourut. Privé de son aide, mon père âgé se décida à ne plus assumer la charge d'un grand troupeau et se plaça désormais chez des patrons qui n'avaient que de petits troupeaux. Il pouvait venir à bout de ce travail sans assistant. Quant à moi, sur son conseil, je me rendis à la ville pour m'embaucher quelque part, ne fut-ce que comme gardien. En effet, le métier de berger ne pouvait plus assurer notre existence et depuis déjà longtemps nous végétions sans manger à notre faim.

## 12- Li bajêr - Şerê emperyalîstan

Cîranên me yên kurd xwe pêk tanîn ku herine bajêr, li wê genim û cehên xwe bifroşin û bi pereyê wan ji xwe re şekir, çay, cil û caw û tiştên dîtir ku ji wan re ji bo zivistanê hewce bûn bikirin.

Diya min ji min re nan peht, tûrek dirût, cilên min ên qetiyayî çêkirin û bi şev min xwe gihande karwanekê erebeyan û di du rojan de em gihiştin Qersê.

Bajarê Qersê, li milê çiyakî hatiye avakirin. Li serê çiyê, keleheke mezin heye. Li dora Qersê, li ciyên bilind gelek asêgeh hene; bi xwe, Qers bajarekî eskerî ye. Kêfa min, gelek bi wan xaniyên, bi du sê tebeq, bi kolanên kuçkirî û bi bexçeyên di heşînayiyê de xeriqî dihat. Lê,,ê bêtir ez lê hêyran dimam mexazeyên mezin bûn. Min nedikarî ji ber cemekana ku li pişt wan ewqas tiştên bi texlît û spehî hebûn bi dûr bim. Ji bo peydaki-

# 12- Dans la Ville
# Guerre Impérialiste

Nos voisins kurdes s'apprêtaient à aller en ville pour y vendre orge et froment et acheter sucre, thé, étoffes et autres produits qui leur étaient nécessaires pour l'hiver.

Ma mère me cuisit du pain, me cousut un sac pour le voyage, me prépara mes vêtements et, la nuit, je me mis en route me joignant à un train de chariots. En cheminant, j'aiguillonnais les boeufs et, en général je me rendais volontiers utile de toute manière. Après deux jours, nous arrivâmes à Kars.

La ville de Kars est située au pied d'une montagne sur laquelle s'élève une grande forteresse. Autour de Kars, sur les hauteurs, sont disposés des forts et Kars lui-même est une ville militaire. Je trouvais bien plaisantes les belles maisons à deux ou trois étages, les rues pavées, les jardins noyés dans la verdure, mais c'est surtout les magasins qui m'attiraient. Je ne pouvais m'arracher aux grandes vitrines où étaient exposées tant de choses diverses et si jolies. En cherchant du

rina karekî ez li her derê bajêr geriyam û min ew xweş nas kir.

Ez li xanekê peya bûbûm û kiriya wê bi xebata xwe derdixist: her sibê min axur paqij dikir û hewş dimalî. Bi roj ez li şixulekî digeriyam. Lê, her roj destvala diziviñm xanê û pereyên min jî digihaştin dawiya xwe. Ji 25 kopek pêve, tu tiştê min nemabû. Yekê, hingê şîret li min kir ku ez herim febrîqeya kevirê xiram ku li Alexandrovka vekiribûn, gundê ku berê me li wê şivantî dikir. Ez çûmê û li karxanê rastî Molokan hatim ku min bi wan re li dibistanê dixwend. Bi arîkariya wan, ez ketim şixul. Xebata min ev bû: danîna kevirên ku ji bin axê derdixistin, di sendûqan de. Qederê 150 keç û xort bi vî îşî mijûl dibûn.

Ev kar ne gelek çetin bû, min zû xwe hînî kir. Ji şefeq heya bo rojava, em dixebitîn, ango, qederê yanzde saet û nîv li havînê, û dch saet li zivistanê; rojiya me jî, bi tenê, bi 30 kopek bû. Min kevirên baş û xirab ji hev ferq kirin; mehê, ji bo cûdakirina wan ji hev, ji min re 10 rûbil didan. Piştre min her du xwişkên xwe jî xistin xebatê. Gava ew hatin û bi cî bûn, me ji xwe re xaniyek bi tena xwe girt; welê halê me hinek xweş bû û me dikarî, ji bo dê û bavê xwe, çend kopek jî deynin alîkî. Di vê febrîqeyê de ez du salan xebitîm; gava em hîn li wê bûn, Cenga Emperyalîst (Şerê mezinê pêşîn ê salên 1914-1918), dest pê kir.

Di payiza sala 1914 de, alaya sisiya ya Kozakên Kizlaro-Grebenskoy, hate gundê Aleksandrovka û li nêzîkî fabrîqeya me bi cî bû. Pirîcar, piştî şîvê, ez

travail, j'ai parcouru la ville presque entière et l'ai bien étudiée.

J'étais descendu dans un *khan* (auberge) et m'acquittais du loyer par mon travail. Chaque matin, je nettoyais l'écurie et balayais la cour. Durant la journée, j'allais à la recherche d'une place, mais toujours sans succès. Cependant, mon argent tirait sur sa fin ; il ne me restait plus que 25 kopeks. Quelqu'un me conseilla alors de me rendre à la fabrique de pierre ponce qu'on avait ouverte récemment dans ce même bourg d'Alexandrovka où jadis nous avions exercé le métier de berger. Je me rendis là-bas et rencontrai à la fabrique des garçons Molokans avec qui j'avais été à l'école. Ils m'aidèrent à me placer. On me mit au travail qui consistait à placer dans des caisses la pierre ponce qu'on retirait du sol. Il n'y avait pas moins de 150 garçons et filles de mon âge qui étaient occupés à ce travail.

L'ouvrage n'était pas pénible et je m'y suis vite habitué. Nous travaillions de l'aube au coucher du soleil, ce qui me faisait pas moins de onze heures et demie et, en hiver, dix heures, et nous étions payés 30 kopeks pour la journée. J'appris rapidement à trier la pierre ponce d'après sa qualité et fus nommé assortisseur à dix roubles par mois. Bientôt je réussis à faire embaucher mes deux soeurs dans le même travail. Dès qu'elles arrivèrent et furent placées, nous nous logeâmes ensemble et menâmes un train de vie des plus modestes, car nous mettions de côté chaque kopek pour nos parents. J'ai travaillé deux ans environ dans cette fabrique et c'est là que m'a surpris la guerre impérialiste.

En automne 1914, arriva dans le bourg d'Alexandrovka, le 3ème régiment de Cosaques Kizlaro-Grébenskoi. Il prit ses quartiers près de la fabrique. J'allais souvent au régiment, après leur dîner, demander aux

diçûm alayê, ji Kozakan bermayiyên xwarinê dixwast û min ew tanî malê, xwe pê têr dikirin.

Rojên yekşembê, ez bi wan re diçûm çem; gava hespên xwe dişûştin min gelek arîkariya wan dikir. Eskerên Kozak û çend zabitên wan gelek hej min dikirin. Gava Fermandarê wan bihîst ku ez baş bi kurdî, rûsî, ermenî û tirkî dizanim, ji min xwest ku mehê bi 25 rûbil, ez li alayê bimînim û bibim tercimanê wê. Xwişkên min digirîn, nedixwestin ku ez terka wan bidim. Lê, 25 rûbil mehê ji min re ji hêstirên wan bihatir bûn; min guh neda hêviyên wan û ez ketim ordiyê. Lê berê, min sê roj izin xwest da ku ez xwişkên xwe bibime mal û vegerim. Piştî ku min ev tişt bi cî anî, ez vegeriyam alayê û min dest bi xebata xwe kir. Digel bicîhanîna karên xwe yên tercimaniyê di navbera zabit, memûr û muxtaran de, diviyabû bi riyên wê minteqê ez giş bizanim, ji hespa re êm bikirim û bi tacira re jî bazar bikim.

Piştî heftekê, di bajarê Kaxîzman re ber bi Sarîbûlax, li ser tixûbê tirk, em bi rê ketin. Berê, em li ser cadê dimeşiyan, piştre, li ser qerara fermandar, em ketin şiveriyên gundan. Karê min pir dijwar bû: min hem tercimanî, hem jî rêberî dikirin; diviyabû ez bi xelkê cî re xeber bidim û rê binasim. Pircara em bi şev dimeşiyan, li welatekî bi çiya, bi geliyên kûr, rêveçûn û rêderêxistin ne tiştekî hêsanî bûn; şopên dewaran û şiverê li gelek ciyan tevîhev dibûn. Gundiyên wê derê hej Rûsan nedikir û pirîcar rêyên xelet şanî me didan. Carek Kurd û Tirkên wê derê em xapandin. Gava zabitên me hesiyan ku em di reyekê xelet re diçûn,

Cosaques les restes du repas et je les portais à la maison où on s'en régalait.

Le dimanche, j'allais avec les Cosaques à la rivière pour faire baigner les chevaux et je les aidais souvent dans le travail. Je plus beaucoup aux Cosaques et à quelques officiers qui étaient de service. Ayant appris que je possédais bien le turc, l'arménien, le kurde et le russe, le commandant me proposa de rester au régiment en qualité d'interprète. J'acceptai cette proposition avec grand plaisir. On me fixa 25 roubles de gages par mois. Mes soeurs tout en pleurs, me suppliaient de ne pas les abandonner, mais la tentation de toucher tant d'argent s'avéra plus forte que leurs larmes et je me décidai à partir avec le régiment. Je pris un congé de trois jours pour ramener mes soeurs, à la maison, et ayant consciencieusement accompli ce devoir, je revins immédiatement au régiment et me mis au travail. Tout en m'acquittant des fonctions d'interprète lors des pourparlers des officiers et des fonctionnaires avec les maires, je devais m'enquérir de la direction des routes, assister à l'achat de fourrage et des vivres et traiter avec les marchands.

Une semaine plus tard, nous nous mîmes en marche, par la ville de Kagyzman, sur Sary Boulakh qui est sur la frontière turque. D'abord on suivit la chaussée,puis le commandant décida qu'on emprunterait les routes vicinales. C'était une tâche difficile. Je devais travailler à la fois comme interprète et, comme guide, m'entretenir avec les habitants de la contrée et reconnaître le chemin. Assez fréquemment, on partait de nuit et il était assez difficile de s'orienter dans un pays montagneux traversé partout par des défilés profonds ; en maints endroits s'entrecroisaient de multiples pistes et sentiers tracés par le bétail. Les paysans de l'endroit avaient une attitude hostile à l'égard des troupes russes et fournissaient souvent des indications fausses. C'est

miawinê fermandar bi hêrs ket û du qirbacên xweş li min xistin; di gel vê yekê tu sûç di min de nebû.

Welatê ku em tê re diçûn, gelek spehî bû. Lê pêşveçûn jî pir dijwar bû, girbûna keviran, zinarên bilind, kaşên asê û lehiyên çiyan, meşa me dereng dikir. Hespên alayê ne elimîbûn rêveçûnê. Em mecbûr man bîst û çar saet sekinîn, me solên hespa nûkirin û erebeya selihandin. Jê pêve jî her ro, em hinek radiwestiyan ; li çend ciyan, pirîcar di newalên bi star, me bêhna xwe distand, xwarina çêdikirin û dixwarin. Adetî, alay bi şev ji warê xwe bi rê diket ji bo ku meşa xwe ji dijmin veşêre. Roja neha em gihiştin sînorê Tirkiyê. Esker hin bi hin li Sarîbûlax kom dibûn û li dirêjahiya geliyên kûr ên ji dijmin veşartî, komên xwe datanîn. Piştî istiraheta çend rojan, eskerên rûs derbazî tixûbê Tirkiyê bûn. Sê kîlometir ji Sarîbûlax wê da, şer dest pê kir. Top, tifing û mîtralyoz dinya li hev dida, di geliyan de olan dida. Gurgira wan bi awakî dayimî hewa dadigirt!

Karê me ew bû ku em di pişt çiyan re bizivirin û paşiya eskerên tirk bigirin. Di vê zivirînê de min rê winda kir; ji ber ku Kurdên koçer rêyeke nerast şanî min dabûn. Piştî vê hadisê baweriya serekên alayê êdî bi min nema. Welê hate wan ku min ew xapandibûn; ez ji tercimaniyê derêxistim û ji bo du mehên xebatê bi tenê 7 rûbil dan min. Heyif bû ku ez karekî welê berdim, lê tu tişt ji destê min nedihat; min nedikarî li cem kesî gilî bikim.

Alaya me bi rê ket û li serê çiyan, bê çek, li welatekî nenas, ez bi tena xwe mam.

ainsi qu'une fois Turcs et Kurdes de l'endroit nous avaient trompés. Lorsqu'on s'aperçut qúe nous suivions une fausse piste, l'aide-de-camp du régiment s'emporta et m'allongea deux coups de *nagaika* (fouet cosaque), alors que je n'étais en rien fautif.

Le pays qu'on traversait était d'un grand pittoresque, mais il était difficile d'y avancer ; éboulements de pierres, descentes rapides, rochers à pic et torrents de montagne gênaient le mouvement. Les chevaux du régiment n'étaient pas encore entraînés à la marche et il fallut s'accorder quelques arrêts de 24 heures pour laisser reposer les chevaux, les ferrer à nouveau et réparer les véhicules. En outre, tous les jours on faisait des haltes, le plus souvent dans de petits vallons abrités pour préparer le dîner et le souper. Habituellement le régiment quittait son campement la nuit pour cacher ses déplacements à l'ennemi. Au neuvième jour enfin, nous arrivâmes à la frontière turque. Des troupes se concentraient peu à peu à Sary-Boulakh et s'installaient sous les tentes le long des défilés cachés aux Turcs. Après un repos de quelques jours, l'armée russe traversa la frontière turque. A trois kilomètres de Sary-Boulakh, une bataille s'engagea. Eclatement de la canonnade, coups de fusil, crépitement des mitrailleuses résonnaient tout le long du défilé. Un vacarme continu et terrible restait dans l'air.

Nous avions pour tâche de traverser la chaîne de montagnes et prendre les forces turques à revers. Au cours de ce détour, je perdis le chemin, car les Kurdes nomades m'avaient indiqué une fausse direction. Après ce coup-là, la confiance en moi des officiers supérieurs du régiment se trouva complètement ébranlée. On me soupçonna d'avoir trompé et on me congédia, ne m'ayant payé que 7 roubles seulement pour mes deux mois de travail. C'était bien dommage de perdre un pareil service ; mais il n'y avait rien à faire et je ne pouvais me plaindre à personne.

Bi ku da herim? Min qerara xwe da ku ez vegerim Sarîbûlax û ji wê jî herim Qiznefer, cem mêrê metika xwe ya mirî. Di van geliyên kûr de, tije dehbeyên kuvî, bi tena xwe man ne tiştekî xweş bû. Bi dilekî givaştî û tevizî, ez bi rê ketim û hêdî hêdî, gava ez fikirîm ku ev ne cara pêşîn bû ku ez li ber xeterê dimam, cesaret hate min.

Le régiment s'en alla et je restai dans la montagne, seul, sans armes, en plein pays inconnu.

Où me rendre ? Je décidai de revenir à Sary Boulakh et de là à Kyznafar, où vivait le mari de ma tante défunte. Je me sentais mal à l'aise de marcher ainsi seul à travers des défilés remplis de bêtes sauvages. Je m'en allai ainsi le coeur serré, mais je reprenais courage à la pensée que ce n'était pas la première fois que j'avais à affronter le danger.

## 13- Hezkirin û jin xwestin

Wek ez ditirsiyam nebû; li rê ez rastî tu serpêhatinê nebûm. Sax, selîm, ez gihaştim Sarîbûlax û ji wê Qiznefer. Li wê, min merivên xwe zû peyda kirin. Mêrê metika min ez nas nedikirim. Bi tenê ewî ji şivanên ku ji navçeya Qersê dihatin bihîstibû ku ez diçûm dibistanê û ku min bi xwendin û nivîsandinê dizanî. Ewî ez gelek bi xweşî qebûl kirim û pirsa xelkê mala me kir. Ecebmayî dima ku riya 50 kîlometir, bê tirs, ez tena xwe hatîbim. Min jî ji wan re bi kurtî, çawa ez li fabrîqeya kevir dixebitîm, çawa ez bûbûm terciman û çima ez jê hatibûm derêxistin, gote wî...

Welê, qederê mehekê, ez li cem apê xwe mam û di vê midetê de, di îşên malê de, min arîkariya keça meta xwe, Karê dikir. Em her du jî xort bûn; di vê mehekê de, berê, em bi hev re bûn dost, piştre, bi rastî, dilê me kete hev. Bi hêvî û rica Karê ji min dixwest ku ez wê mehir bikim; eger bavê wê bêdilî bikira, ez wê birevînim. Pirsa melûn "ez ji ku qelen peyda bikim" li ber me wekî serê bilindtir ê çiyayê Agirî disekinî. Ma

# 13- Amour et fiançailles

Contrairement à mon attente, le voyage s'accomplit sans aventures. Je suis arrivé sain et sauf à Sary Boulakh et de là à Kyznafar où je retrouvai vite mes parents. L'oncle ne me connaissait pas du tout. Il avait seulement entendu dire par des bergers qui venaient de la région de Kars que je suivais les cours de l'école et que je savais lire et écrire. Il m'accueillit très cordialement et m'interrogea en détail sur notre famille. On s'étonna que je n'avais pas eu peur de faire presque 50 kilomètres à travers la montagnes. Et mois, je leur racontai d'une manière circonstanciée comment j'avais travaillé à la fabrique de pierre ponce, comment j'était entré au régiment comme interprète et pourquoi j'avais perdu ma place.

Je vécus ainsi chez mon oncle, un mois environ, aidant ma cousine Karé en ses travaux de ménage. Nous étions jeunes et au cours de ce mois de vie commune, nous nous liâmes d'amitié et puis nous tombâmes profondément amoureux l'un de l'autre. Elle me priait tendrement de l'épouser ou de l'enlever au cas où son père ne consentirait pas à notre mariage. La maudite question: "Où prendrai-je le "kalym" (dot) ? se dressait devant nous comme la plus haute

ez rebentirê dinyayê nebûm? Min ne pere, ne jî pez hebûn û min dizanî ku bavê Karê wê bê qelen nade min. Li ser vê meselê ez û Karê, em çiqas fikirîn. Karê, heta stranek jî çêkir û tê de lanet li wana anî ku frotina jina kirine adeteke kirêt û genî.

Ji careke bêtir, bavê Karê zilamekî tirtire û bê dil, ku ji tu kesê nehatibû hez kirin, xwe têkilî axaftinên me dikir. Digo ku şêxê mezin, heta pêxemberê me bixwe, jinên bi qelen anîne; nexwe, Xwedê bi xwe ev adet danîye. Karê ciwaba wî dida û digo ku bav keçên xwe wek dewaran difroşin, wek pezê adî û ji bo isbat gelek mîsal jî tanîn. Lê dawiya wan pevçûnan her girîn û hêstir bû. Gava min dît ku iştixalî bê feyde ye û em nikarin vî kalî şerût iqna bikin min Karê bire alîkî, min gotê ku divê xem nexwe, ku ezê bixebitim û qelenê wê pêk bînin.

Bajarê Sarîbûlax, ku li ser tixûb bû, bûbû qerargeheke mezin. Hemû eskerên rûs ku diçûn eniyê an jê vedigeriyan, li wê kom dibûn. Gelek eskeran li wê, ez wek tercimanê kevin dinasîm û ez bi xwe re dibirim xwarinê.

Rojekê, serê sibê, eskerek hate mala me û gote min ku serekê qerargehê, Mîralay Emerîk, min di cî de dixwaze da ku jê re tercimaniyê bikim. Min zû cilên xwe wergirtin û çûm Sarîbûlaxê. Di van rojan de, gundiyên dorê, gelek zad û qût anîbûn vê qonaxê. Tu kes ji wan bi rûsî nedizanî û tu Rûs jî ji zimanê wan fehim nedikir.

cime de l'Ararat. N'étais-je pas le dernier des miséreux ? Je n'avais ni argent, ni bétail et nous savions que le père de Karé ne la donnerait pas sans kalym. Combien n'avons-nous pas réfléchi et conversé sur ce point; Karé a même composé une chanson pour maudire ceux qui ont établi l'usage honteux d'acheter les femmes.

Plus d'une fois, le père de Karé, homme grossier et que personne n'aimait intervint dans nos conversations. Il disait que le Grand Cheikh et Mahomet lùi même avaient de leur temps, versé le kalym pour leurs fiancées et, par conséquent, cet usage est reconnu licite par Alah lui-même. Karé répliquait à son père en disant que les parents vendent les femmes comme des bêtes de somme, du vulgaire bétail. Et a l'appui de sa pensée, elle citait des passages des anciennes traditions. Ces disputes finissaient toujours par des larmes. Voyant qu'il était impossible de convaincre ce vieillard avare, j'interrompai la conversation et consolai Karé en tête-à-tête en la priant d'attendre. j'espérais réussir à trouver de nouveau une occupation et à mettre de côté de l'argent pour le kalym.

Le bourg de Sary Boulakh qui était un poste-frontière était devenu un important point d'étape. Des troupes de Russie le traversaient pour se rendre plus loin sur le front. Beaucoup de soldats me connaissaient ici comme ancien interprète de régiment et m'offraient volontiers à partager leurs repas.

Un jour, tôt le matin, un soldat s'en vint chez nous m'appeler et me dire que le commandant d'étape, lieutenant colonel Emerick, me donne l'ordre de venir immédiatement car il a besoin de moi comme interprète. Je m'habillai rapidement et me rendis à Sary Boulakh. Il se trouvait que ces derniers jours de grands transports de vivres étaient arrivés

Gava ez nêzîkî erebeyan bûm, min dît ku fermandarê qerargehê bi xwe li nav gundiyan sekiniye û dike nake nikare ji wan fehim bike çima naxwazin pêştir herin? Bi kurdî min ji wan pirsî: gotin min ku dewarên wan ji tabê diketin û ku rê gelek asê bû. Ez çûm cem fermandar, min silaveke eskerî dayê û çi ji gundiyan bihîstibû, gotê. Fermandar li min nêrî, kenî û ji min pirsî eger min dixwest ez bibime terciman, min bi çend zimanan dizanî, mehiya min berê li alayê bi çi bû û çima ez jê hatibûm derêxistin...? Min jê re vegerand ku ez bi kurdî, bi ermenî, bi rûsî û bi tirkî dizanim û sebeba derketina xwe jî ji alayê gotê. Fermandar ji zanînên min şaş ma û ji min pirsî ka di kîjan dibistanên bilind de min xwendibû...? Min jî gotê ku ez Kurd im, ku bi tenê rûsî min di dibistanê de xwendiye û şehada xwe şanî wî da ; zimanên mayî, min li cem Tirk û Ermeniyan şivantî kiriye û bi vî awayî, min zimanên wan girtine. Fermandar emir da ku çekê eskerî li min kin û ez mehê bi 25 rûbilan bixebitim.

Bi karê min ê nû halê min gelek baş bû. Sarîbûlax nihu ji aliyê *Drûjîna Orengbûrg* (Eskerên bi emir gelek mezin ku du caran eskeriya xwe kirine) işxal kirin. Ji wan re *Ordiya Îsa* digotin, ew jî jê gelek aciz dibûn. Min pirsî çima vî navî li wan kirine û esker gotin min ku ev hemû eskerên ihtiyadî ji bo Çar û Welat hatine şer û li ser şewqeyên wan xaçên mezin hene. Ji bo nîşandana sedaqeta wan ji Çar re.

Carna erebeyên xwarin û zad gelek dereng dihatin û yekîneyên eskerî bê qût diman. Hingê, zabitê le-

à l'étape. Les rouliers et les fournisseurs des livraisons étaient des paysans de la contrée qui ne connaissaient pas le russe et, parmi les Russes, personne n'était capable de s'expliquer avec eux.

M'étant approché du train de chariots, je vis que le commandant d'étape lui-même se trouvait au milieu des rouliers et avait toutes les peines du monde à comprendre pourquoi ils refusaient d'aller plus loin. J'interrogeai les paysans et appris que le chemin était très dur et que les bêtes tombaient presque de fatigue. J'allai donc vers le commandant, prit la position de garde à vous et, saluant militairement, lui fais part de ce que j'avais appris. Le commandant me regarda en souriant et me demanda si je voulais servir comme interprète, quelles langues je parlais, combien on me payais au régiment et pourquoi on m'avait renvoyé. Je répondis que je possédais le turc, le kurde, l'arménien et le russe et expliquai pour quel motif on m'avait licencié du régiment. Le commandant s'étonna de mes connaissances et me demanda dans quel établissement scolaire j'avais fait mes études. Je lui expliquai que j'avais vécu durant quelques années au milieu de ces différentes populations et que, travaillant chez elles comme berger, j'avais appris leurs langues en les pratiquant. Quant au russe, c'est à l'école du village que j'avais appris à lire et à écrire et lui montrai mon certificat. Le commandant m'engagea pour 25 roubles par mois et donna ordre de m'équiper entièrement.

Je vivais bien en mon nouveau service. Le point d'étape était alors desservi par la 593 e droujina (unité de territoriaux) d'Orenbourg, composée de vieux territoriaux dont tout le monde se moquait en les appelant "armée de Jésus" ce dont ils s'offensaient beaucoup. Je me suis enquis de l'origine de ce sobriquet et les soldats m'expliquèrent que tous les vieux réservistes étaient partis en guerre pour le Czar

wazim Andrîev, miawinê wî Nîkolayêv û ez, bi çend Kozakan re, em diçûn gundên dora xwe da ku pez, dewar û dexil bikirin. Gelek caran, malê gundiya, hema hema bê pere distandin. Li ber çavê me, muhasib qayimeyên sexte pêk tanîn û gundiya icbar dikirin ku wan imza bikin; pereyê kêm didan wan û pereyê mayî bi zabitên din re par dikir.

Min zivistanên sala 1914 û 1915 bi timamî li wê derbaz kirin. Herwekî her tiştê min li ser ordiyê bû ji meaşê xwe min kêm xerc dikir û min pereyê xwe giş dida bavê Karê, Zahiro, li ser hesabê qelen. Ez pêre bi 150 rûbil li hev hatibûm; eger min ev pere gî bidayê, Karê wê ya min bibiwa û hingê heqê min hebû ez wê bibim. Qelen ne gelek giran bû, Zahiro bi vê miqdarê razî bûbû ji ber ku ez ne xerîb lê kurxalê Karê bûm.

Bi vî awayî, hin bi hin, min qelenê Karê dida Zahiro. Ev tiştekî hêsanî nebû, lê ji bo anîna Karê, minê her tişt bikira... Gava ji qelen çi dima min da, min sê roj îzin stand û ez çûm cem Zahiro; min jê re got ku divê Karê hazir bike ku ez wê bibim cem dê û bavê xwe û dîsa vegerim ser karê xwe. Lê hingê tiştek qewimî ku min tu cara neanîbû bîra xwe. Zahiro qebûl nekir keça xwe bide min û bi eşkere got ku min tu qelen nedabûyê û ku bi zor min dixwest ez Karê birevînim. Bi xeyd, min gotê ku min qelen dabûyê.

Zahiro bi tehqîr li min nêrî, her tişt inkar kir û got:

- Ka şahidên te? Li ber kê te pere da min? Isbat bike...! Ka xwezgîniyên te ?

et la Patrie et portaient sur leurs casquettes de grandes croix en signe de leur fidélité au Souverain. Il arrivait parfois que les trains de chariots de ravitaillement étaient en retard et alors les unités militaires restaient sans vivres. Dans de pareils cas, l'officier d'intendance Andréev, l'adjudant Nikolaé et moi, en compagnie de quelques Cosaques, nous rendions dans les villages d'alentour pour acheter du bétail. Très souvent, on prenait le bétail pour presque rien. Sous nos yeux, l'intendant rédigeait des factures fictives et obligeait les paysans à signer qu'ils avaient reçu la totalité de l'argent alors qu'en réalité, il n'en donnait qu'une partie insignifiante. Il se partageait le reste avec les autres partenaires de l'achat.

J'ai passé à cette étape l'hiver de 1914 et l'année 1915 tout entière. Comme mon entretien était fourni entièrement par l'armée, je ne dépensais presque rien de mes gages et je portais toutes mes économies à Saéro, père de Karé, comme acompte sur le kalym. Je m'étais entendu avec la somme de 150 roubles après quoi j'aurais droit de prendre Karé pour femme. Le kalym n'était pas considérable, mais Saéro y avait consenti en expliquant sa complaisance par le fait que je n'étais pas un étranger mais le cousin de Karé.

Je commençai donc à payer progressivement à Saéro la somme convenue. Ce n'était pas très facile, mais le désir d'épouser Karé au plus tôt m'aida à supporter les difficultés. Après avoir versé le dernier acompte, je pris un congé de quelques jours et me rendis aussitôt chez Saéro. Je le priai de préparer Karé pour le voyage, car je voulais l'accompagner chez mes parents et revenir ensuite à mon service. Alors se passa une scène à laquelle je ne m'attendais guère. Saéro refusa de me donner sa fille, déclarant que je n'avais pas payé le kalym et que je voulais enlever Karé par force, les armes à la main. Je répliquai avec indignation que le kalym était

Ev pirs wek brûskeke li min ketin. Min fehim kir ku Zahiro ji xeşîmî û dilpakiya min dixwaze pereyê min bixwe û Karê bifroşe yekî din ê zengîntir. Li ser pêvçûna me, cîran li dora me kom bûbûn; ewana dizanîn ku min qelen dayê, bi qencî gotin Zahiro ku bêbextiyê neke û keça xwe bide min. Lê zilamê çikûs û zalim, guh neda wan û herwekî du qasê min bû, rabû ku li min xe. Tifinga min li ser milê min û qûndaxa wê jî li destê min bûn. Gava Zahiro hate min, min baz da. Ew kete dû min û ez li hewşê girtim. Destê xwe avêt tifinga min, lûla wê girt û ew bi aliyê xwe ve da. Bêî ku ez vegerim paş, min xwe avête pêş û tifing di destê min de teqiya. Zahiro di cî de hatibû kuştin.

Ez girtim û ez birim cem fermandar, ji wê jî gundê Kûlpî, li cem serekê polîsê minteqê. Di pirsiyarê de, şahid û Karê jî bi wan re îfada min tesdîq kirin û gotin ku eger Zahiro tifinga min nekişandaba ez direviyam û ev misîbet nedihate serê wî. Li ser xwestina fermandar, îşê min bi derengî nexistin û ez berdam. Lê merivên Zahiro dawa xwinê li min kirin û li kuştina min digeriyan. Êdî min nedikarî ez li wan deran bisekinim û Karê careke dî bibînim. Merivên wê ew bi xwe re bir...

payé intégralement, mais Saéro sourit avec insolence, répétant qu'il n'avait reçu aucun argent.

"En présence de qui me payais-tu ? Où sont tes témoins, tes demandeurs en mariage ? criait-il .

Ces paroles me frappèrent comme un coup de foudre. Je compris que Saéro, profitant de mon inexpérience et de ma confiance s'était approprié mon argent et comptait probablement vendre la pauvre Karé à un autre fiancé plus avantageux. J'étais hors de moi. Entendant notre querelle des voisins étaient accourus qui, eux, savaient que j'avais payé le kalym par acomptes. Ils se mirent à convaincre Saéro, mais le despote avare ne voulait pas les écouter. Profitant de son énorme force physique, il se précipita sur moi pour me battre. J'avais le fusil à l'épaule et le tenais par la crosse. Dès que Saéro fit mine de s'approcher de moi, je me mis à courir. Il me poursuivit. M'ayant rattrapé dans la cour, il saisit le fusil par le canon et tira vers lui. Sans me retourner je fis un bond en avant. Un coup de feu retentit. Saéro était tué à bout portant.

On m'arrêta et m'amena chez le commandant et de là au bourg de Koulpy où se trouvait le pristav (chef de la police) du district. A l'interrogatoire, les témoins, et Karé parmi eux, confirmèrent l'exactitude de ma déposition et ils ajoutèrent que si Saéro n'avait pas tiré le fusil par le canon, j'aurais eu tout le temps de me sauver et le malheur ne serait pas arrivé. Sur l'insistance du commandant, mon affaire fut jugée en procédure d'urgence. Le tribunal m'acquitta, mais les parents de Saéro me menacèrent de la vengeance du sang. Je ne pouvais donc plus revenir dans la région. Je n'ai même pas réussi à revoir Karé qui fut emmenée par ses parents.

# 14- Li Tirkiyê
# Siyabend û Xecê

Li ser şîreta fermandar ez bûm tercimanê Alaya 1 a Kozakên Labînskî û çûm eniya Tirkiyê.

Li gundên ku ketibûn destê Rûsan teqrîben xelk li ciyê xwe mabûn. Ezab û işkence ku ji aliyê zabit û eskerên rûs bi wan dihatin kirin, min bi çavên xwe didîtin. Leşkerên Çar wa bawer dikir ku li şer her tişt mesmûh e: talana malê xelkê, şikênandina irza jin û keçan... Da ku xwe biparêzin, gelek jin dest bi şerê canî û bêbextan kir û li gora adetên kevin, xencer di dest de, bi mêranî namûsa xwe parast.

Hadiseyek hin di bîra min de ye: di vê minteqê de, li gundê Kêrik, pîrekek ji eşîra min hebû. Ewê di mala xwe de çeteyeke jina pêk anîbû û nedihişt ku zabit û esker bikevin hundirê malê. Di gel vê yekê, zabitên xort aşiqî vê delala şerevan bûbûn û gelek dixwestin ku wê bêxine destên xwe.

# 14- En Turquie: Le poème kurde Siyaband et Khadjé

Grâce à la recommandation du commandant, j'entrai comme interprète au 1er régiment des Cosaques Labinsky et partis pour le front de Turquie.

Dans les villages turcs sur le territoire occupé par les troupes russes presque tous les habitants étaient restés sur place et je fus témoin oculaire des brimades et exactions dont ils furent victimes de la part des officiers et soldats russes. Les troupes du Czar croyaient probablement qu'à la guerre tout était permis: le pillage des propriétés et le viol des femmes et des fillettes. Pour se défendre, beaucoup de femmes engagèrent la lutte avec les gredins et, selon l'ancienne tradition, c'est le poignard à la main qu'elles défendaient courageusement leur honneur. Une histoire me revint à la mémoire.

Dans cette région, au village de Dérik, vivait une femme kurde de ma tribu. Elle avait organisé chez elle un détachement de femmes et ne faisait pénétrer dans sa maison, aucun soldat ni officier. Cependant, les jeunes officiers s'intéressaient beaucoup à cette beauté guerrière.

Zabitên rûs di herbê de gelek pere distandin û gava li eniyê lihevxistin disekinî, xwe didan sefaheteke mezin. Bi rojan ve, nemaze bi şev, diketin vexwarin û qumarê. Serekên wan ew didîtin bêî ku dengê xwe bikin, herwekî ev tişt gelek adetî bûn...

Carek piştî vexwarinekê, di şeveke xweş de ji yên havînê, çend zabit xistin serê xwe ku bikevin mala jinên kurd ên asê. Gava deriyê hewşê girtî dîtin, xwestin di ser dîwarên bilind re bikevin hundir. Zabitekî xwe bilind kir da ku derkeviyê. Van serxweşên ha wa dizanîn ku di mal de tu peya nîne, lê gava ku tifingek li wê teqiya û berik di ser serê zabit re derbaz bû, şebqa wî qul û serê wî jî hinek birîn kir, pir şaş man... Zabit di cî de ji dîwêr hate xwar û careke dî newêrî xwe nêzîkî wî bike. Lê, yekê din xwest mêraniya xwe nîşan bide û çû ku ji wî alî derbazî hindurê malê bibe; tifingeke dî hate berdan, û zabit bi milekî sivik brîndarbûyî, pol, poşman, vegeriya cem hevalê xwe... Ji nîşandariya pîrekan ecayibmayî û ji tirsa ku dengê tifinga bigehe guhên dewriyeyên alayê, zabitên me dest vala û sernizim vegeriyan ciyên xwe.

Piştî çend rojên din, ji nû ve avêtin ser vê malê. Lê dîsa, zabitê ku dixwest bibihure cem jinên kurd ji aliyê tifingvanên veşartî derbek li milê xwe xwar û bi lez xwe bi şûnde da.

Îcar, yekê raporek da Erkanê Herba Ordiyê. Di cî de, zabitekê inzibatê ji Ordiya IV a Qefqesê bi çendekên din re hate wê derê ku têhqîqatê bike. Ez jî di

Les officiers russes touchaient en temps de guerre des soldes assez importantes et menaient pendant l'accalmie du front une vie très débauchée. Des journées entières, mais surtout le soir et la nuit on se livrait à des beuveries et aux gros jeux de cartes. Les chefs regardaient tous ces débordements avec indulgence, comme si c'était naturel.

Une fois donc, après une beuverie, par une magnifique nuit d'été, un groupe d'officiers décida de s'introduire dans la maison des femmes kurdes inabordables. Ayant trouvé fermée la porte cochère, ils voulurent escalader la palissade qui était assez élevée; un officier commençait même à y grimper. Le groupe éméché était persuadé qu'il n'y avait pas d'homme dans cette maison. Quel ne fut pas leur étonnement quand un coup de feu retentit de là-bas et que la balle, passant au-dessus de la tête de l'officier entreprenant, lui troua la casquette et égratigna la tête. L'officier descendit de la palissade n'osant plus renouveler sa tentative, mais il se trouva un autre audacieux que l'aventure excitait davantage. Il se mit à aborder la maison par le côté opposé. Il subit le même sort: d'un coup de fusil il fut légèrement blessé à l'épaule. Surpris par la précision du tir et appréhendant que les coups de feu ne finissent par attirer l'attention des patrouilleurs du régiment, les officiers décidèrent de s'en retourner bredouilles.

Quelques jours plus tard, l'attaque fut renouvelée. De nouveau l'officier qui essaya de s'introduire dans la maison des femmes kurdes fut blessé par le tirailleur mystérieux.

Cette fois quelqu'un fit un rapport à l'Etat-Major du corps d'armée. Immédiatement un officier de la prévôté du IV$^{e}$ corps d'armée du Caucase vient de là-bas avec quelques autres pour procéder à l'enquête. J'accompagnai cette

vê encimenê de terciman bûm. Gava em gihaştin mala jina kurd, zabit di pêşiyê de ez şandim da ku ji pîreka re bibêjim ku ev encimen ji bo parastina wan hatiye. Ev giş bi roj çêdibûn û gava gihaştim mal, li ber derî tifingek dirêjî min bû, lê min bi kurdî gote wan: «metirsin ez ji we me!» Hiştin ku ez bikevim hewşê û piştre hundirê malê bi xwe. Hingê min dît ku şervanên me çar pîrek bûn: xesû û her sê bûkên wê. Sereka çetê, bi rastî jinekeke spehî, bûka piçûktir bû; her du bûkên din û xwesû li bin emrê wê bûn giş bi tifing û rext. Min gote wan ku Mezinê eskerî yê bilintir hatibû tehqîqê; dixwest rastiyê bizane da ku yên bi sûc ceza bike. Pîrek çûn mezeleke dîtir ku bi hev re şewrê bikin. Yek ji wan tifinga wê bi dest û li min dirêjkirî, li ber derî sekinî. Piştî ku qederê nîv saet, bi hev re axaftin, vegeriyan û li ser niyetên heyetê ez dam sondê. Min jî bi ya wan kir, sond xwar. Piştre heyet hat û ji hemû jinan, ji hin zabit û eskeran, pirsan kirin. Evan gazinan ji wan jinan dikirin û gelek tiştên xirab di heqê wan de digotin.

Ji pirsiyarê, pir fêlên zabit û eskeran ên nebaş derketin meydanê. Dawiyê, hin zabit hatin rêkirin yekîneyên din, û ji bo parastina jinên kurd jî, nobetçî hatin danîn li ber mala wan. Lê, pîrekan baweriya xwe bi wan netanî û nedihişt ji min pêve tu kes bikeve mala wan.

Çend hefte bi şûnda em hîn bêtir ketin nav Tirkiyê û gihaştin çiyayê Sîpanê ku bi bilindahî ji Agirî ne kêmtir e. Çiyayê Sîpanê yê muhteşem, çiyayê

commission comme interprète. Quand nous arrivâmes à la maison de la femme kurde, le prévôt m'envoya en avant, en me chargeant de dire aux femmes que la commission venait pour les défendre. Cela se passait en plein jour et j'allais directement à la porte. Dès que j'y apparus, un fusil fut braqué sur moi, mais je criai en kurde *ji we me*, ce qui signifie: "je suis des vôtres". On me laissa entrer dans la cour et même dans la maison. Il apparut alors que la défense de la maison était dirigée par une bru cadette, une grande beauté en effet, et sous son commandement se trouvaient deux brus plus âgées et la belle mère, également armées. Je leur expliquai que le plus grand chef était venu, qu'il avait appris les méfaits des militaires et punirait sévèrement les coupables. Les femmes s'éloignèrent pour se consulter, mais l'une d'elles resta à l'entrée, son fusil pointé sur moi. Après avoir conféré pendant une demi-heure, elles me forcèrent à jurer que la commission était venue avec d'honnêtes intentions. Je prononçai un serment solennel . Ensuite, la commission interrogea toutes les femmes, ainsi que plusieurs officiers et cosaques qui furent convoqués dans ce but. Ces derniers accusaient les femmes kurdes de diverses choses et ont dit pas mal de bêtises.

L'interrogatoire éclaircit toute une série d'actes scandaleux.. L'affaire eut comme suite que quelques officiers furent transférés dans d'autres unités et que des sentinelles furent postées à la maison des femmes kurdes pour la garde. Cependant, les femmes ne relâchèrent pas leur vigilance et, sauf moi, ne laissaient pénétrer personne dans leur maison.

Quelques semaines passèrent et nous nous avançâmes davantage à l'intérieur de la Turquie. Nous approchâmes de la montagne Sipan-Dagh que ne le cède pas en altitude à l'Ararat. Le majestueux Sipan Dagh est chanté dans le poème

(Siyamend û Xecê) ku li wê çend car min strana wan bihîst. Bi kurti çîroka wan ev e :

*Di wextê berê de, nêçîrvanek keleş, ji eşîra Zillî, li serê çiyayê Sîpan dijî ; navê wî Siyabend bû. Dilê Siyabend kete Xecêya bedew. Lê ew belengaz bû, diravê wî nebû ku qelen bide bavê Xecê. Loma rabû Dedewa xwe revand, bir serê çiyê. Li wir bi xweşi û bê xem sê roj û sê şevan derbas kirin. Roja çaran, Siyabend serê xwe danî ser çoka Xecê û di xew re çû. Wê gavê, çend pezkûvî di ber wan re derbas bûn û yek ji wan, yê mestir û spehîtir xezalekê rakir û xwe tevî wê ji keriyê da alî. Gava Xece ev dît, girî pê ket û hestirêk ji çavê wê ket ser rûyê Siyabend. Ew şiyar bû û dît ku Xecê digrî, jê re got :*

*- Eger te bê dil ez kirime, ezê bi te re êdî wek xwişk û bira bim û ezê te bibim mala bavê te.*

*- Na, Siyabendê min ê delal, ez ji te hez dikim û ezê timî ji te re jineke sadiq bim, lê ez digrîm ji ber ku min dît çewa pezkuviyek spehî û mezin xezalek ji nav keriye rakir bêî ku tu pezkûvî yê din biwêribe li ber wî rabe. Ev pezkuvî jî wek te mêrxas e, mêraniya te hate bîra min û ez ji ber dilşayiya xwe ya pir mezin giriyam, lê vegerand Xecê.*

*Siyabend hingê jê pirsî :*

*- Ka ew pezkuvî û xezal çûn ku ?*

*Xecç şanî wî da ew bi kîjan alî ve çûbûn û Siyabend gote :*

*- Ez nêçîrvan im. Ez li serê vî çiyayî ji xwe xurtir tu kesî nas nakim, çewa pêzkûviyek li ber çavên min xezalekê ji keriya wê direvîne : ew ji min re rûresî ye !*

kurde *Siyaband et Kadjé* qu'il m'arriva d'entendre plus d'une fois chez les Kurdes nomades. En voici brièvement le thème:

*Aux temps anciens, vivait sur le Sipan-Dagh le beau Siyaband, chasseur de la tribu de Zilli. Siyaband tomba amoureux de la belle Khadjé. Mais il était pauvre et ne pouvait payer le kalym à ses parents. Alors il enleva la Belle et l'amena dans la montagne, où ils passèrent heureusement et sans souci trois jours et trois nuits. Le quatrième jour, il arriva que Siyaband s'endormit la tête posée sur les genoux de Khadjé. A ce moment, quelques cerfs sauvages passèrent à côté, et l'un d'eux, le plus grand et le plus beau s'empara d'une femelle du troupeau et s'en alla avec elle de côté. Ayant vu ceci, Khadjé pleura et une larme de ses yeux tomba sur la joue de Siyaband. Il se reveilla et, voyant Khadjé pleurer, il lui dit:*

*- Si tu m'as épousé contre ta volonté, je me conduirai envers toi comme un frère vis-à-vis de sa sœur et je te ramènerai à la maison de tes parents.*

*- Non, mon cher Siyaband, je t'aime et je te serai toujours une épouse fidèle, mais je pleure pour avoir vu comment un beau et grand cerf s'est emparé d'une biche du troupeau sans qu'aucun autre cerf n'ai osé la lui disputer. Ce cerf est un brave comme toi, je me rappelais ton audace et j'ai pleuré de mon trop grand bonheur, répondit Khadjé.*

*Siyaband demanda alors:*

*- Où s'en est allé le cerf avec la biche ?*

*Khadjé montra dans quelle direction ils s'étaient enfuis et Siyaband s'écria:*

*- Je suis chasseur. Je ne connais sur cette montagne personne qui soit plus fort que moi, et voici que, presque sous mes yeux, un cerf enlève une biche du troupeau: quelle offense pour moi !*

*Ew ciyê xwe rabu û da pey pezkuvî. Çewa nêzikî wî bû, bi tûrkevanê xwe nîşan lê girt, lê pezkûvî xwe avêt ser wî bi darên xwe lê da û ew avête kortalê. Xecê wî li wir brindare xedar dît. Ew di bin kortalê de vezeliyabû û Xecê xwe bi sr wî ve xwar kir, dest bi girîneke tehl kir. Ewê li bedewiya dar û beran, li kulîlkan, li hemû ihtişama xwezayê lanet dibarand ; ewê li ava kaniyê, li deviyan, li meywan û li vî giyaye ku pezkûvî xaribû û pê gihîstibû vê qeweta ku hişt bi ser Siyabend bikeve lanet barand. Ji behêvîtiyê, ewê li sêreyên zozanan ên ku di hêşinahiye de xeniqîbûn, li hewa xweş a tjî behna kulîlkên çiya û li taa tûj a ku Sîpanê Xelatê, warê vî pezkûviyê xirab, ronî dikir lanet barand.*

*Siyabend û Xece yek ji çîrokên kurdî yên xweştir û spehîtir e.*

*Il se leva et s'élança à la poursuite du cerf. Dès qu'il s'en fut approché, il le visa avec son tirkevan (arc de chasse) mais le mâle se jeta sur lui, le frappa de ses bois et le précipita dans le ravin. Là, Khadjé le trouva grièvement blessé. Il gisait au fond du gouffre et Khadhjé penchée sur lui, pleura amèrement. Elle maudissait la beauté de la forêt, des fleurs, toute la magnificence de la nature; elle maudissait l'eau de la source, les buissons, les fruits et cette herbe que le cerf a broûtée et qui lui a donné cette force qui lui a permis de vaincre Siyaband. Dans un accès de désespoir, elle maudit aussi les pâturages d'été noyés dans la verdure, l'air suave pénétré de l'arôme des fleurs de la montagne et le soleil éclatant qui éclaire le Sipan-Dagh, refuge du cerf méchant.*

*"Siyaband et Khadjé" est un des plus beaux et charmants poèmes kurdes.*

## 15- "Ez hêvî ji we dikim, mebin qurbanên derbên min!" Vegera min a mal

Li ber çiyayê Sîpanê em gelek neman, piştî çend rojan, ji serfermandar emir hate me ku em bi pêşve herin. Belê, li ser serdestiya ordiya rûs eniya şer gelek çûbû pêş. Zabitekî, çend Kozak û ez jî bi xwe re birin û di pêşiyê de derket. Diviyabû, berî hatina esker, em ji qerargehê re cî, ji esker re xwarin û ji dewaran re jî êm peyda bikin.

Gava di quntara çiyakî re ber bi jêr dibûn me Kurdek dî direviya û 10-15 peya jî li pey wî, dida ser û tifinga berdidanê; lê berikên wan gî vala diçûn. Firar tim diziviri û digote wan:

- Ez ji we hêvî dikim, bela xwe ji min vekin û mebin qurbanên derbên min. Ji min çi dixwazin? Ev meseleke borî ye.

Mêrik baz dida, şîreta li wan dikirin, û gava guh nedidanê diziviri wan, bera wan dida û di her derbê de yek ji dijminên xwe dixiste erdê. Kozakên me tev de,

me bêbextiya Fermandariya Bilind bû û li bendê bû ku şer rojek zûtir xelas bibe. Gelek ji wan ji eniyê direviyan.

Her çend em nêzîkî cephê dibûn, rewşa me xirabtir dibû. Min xiste eqlê xwe ku ez xwe ji wezîfe derêxim. Meaşê pênc mehan dan min û di cî de min berê xwe da gundê Astaflû (li minteqeya Sûrmelî, tabiî Erîvan) û welatê bavê min.

Gava ez gihaştim mal, min xelkê xwe di perîşaniyeke mezin de dîn. Du sal dûrketina min ji mal, ew ji xebatkarek mehrûm kiribûn û îşên wan tevlihev bûbûn. Di vê nebûna min de li mal, çavên diya min êşiyabûn; her wekî doktor nebûn, çûbûn cem hekîmê kurmancî; ewan jî çavên diya min ewqas baş derman kiribûn ku rebenê hema kor bûbû. Ew bi zor roj û şevê ji hev dineqand, tiştan xirab ditît û nema êdî bi kêrî îşên malê dihat. Her du xwişkên min kebaniya malê dikir. Bavê min jî, rexma pîrî û êşên xwe, dîsa diçû ber dewarên xelkê.

Gava ez ketim hundirê malê, diya min ez ji dengê min nas kirim. Xwe avête min da min maçî bike; nedihişt ku tu kes berî wê nêzîkî min bibe. Rebenê nedikarî cilê min ê eskerî bibîne; destên xwe li ser min digerandin û kêfa wê bi bedla min a eskerî û bi bişkokên wê yên mezin dihat. Piştî ku ez têra xwe himbêz kirim, diya min hişt ku xwişkên min jî bên silav li min bikin.

Xebera hatina min zû li gund belav bû. Meriv û nasên me hatin xweşhatina min. Bavo ne li mal bû,

On se rendit compte à l'interrogatoire que la poursuite avait pour cause une vengeance de sang. Le fuyard qui nous avait tous étonné par son audace et son tir extrêmement précis, avait été rencontré par hasard au village des parents d'un homme qu'il avait tué jadis. Ceux-ci décidèrent d'en finir avec leur ennemi, d'autant qu'il le savait dernier de la famille et qu'il n'avait plus personne pour le venger. Ils l'attaquèrent, mais le Kurde réussit à s'évader du village. Sûr de son tir précis, il ne craignait pas trop ceux qui le poursuivaient et leur criait pour s'en moquer: "Ne devenez pas victimes de ma balle ! Tous ceux qui l'avaient poursuivi furent arrêtés et envoyés à la disposition du chef du district de Melazgert occupé par les Russes. Quant au blessé, il fut mis à l'hôpital militaire où il guérit complètement et il regagna ensuite sa maison.

Ainsi s'écoulait ma vie sur le front, en déplacement continuelle dans les villages et campements nomades kurdes. L'hiver 1915-1916 approchait. La vie devenait de jour en jour plus difficile. Les froids commençaient et je pensais retourner à la maison. A cette époque, beaucoup de soldats recevaient de chez eux des nouvelles alarmantes. On leur écrivait qu'il y avait famine au pays par suite de la mobilisation générale et qu'il n'y a plus personne pour travailler aux champs. On leur écrivait aussi que le bétail est réquisitionné pour être abattu, que les familles de soldats souffrent de la faim, ainsi que leurs enfants en bas âge. De pareilles lettres troublaient beaucoup les soldats fatigués d'une guerre prolongée. Tous étaient mécontents et sous le manteau on se communiquait les nouvelles alarmantes. Le bruit courut que la situation empirait sur le front allemand de jour en jour et que des dizaines et des centaines de milliers de blessés étaient abandonnés à leur triste sort dans les hôpitaux. Tous étaient persuadés que la raison de nos défaites étaient dans la

destek fîşek berdanê û li lingê wî egîdî xistin. Mêrik mecbûr bû xwe bide dest.

Di pirsiyarê de hate zanîn ku ev zilam, ji bo hilanîna tola xwa, ketibûn dû vî peyayê hêja. Firar ku, bi mêranî û nîşandariya xwe em heyirî hiştibûn, çûbû gundê ku ji zûda li wê merivek kuştibû. Merivên kuştî wî dibînin û herwekî dizanin ku ji malbata wî tu kesê dîtir nemaye, didin pey ku wî bikujin. Qatil ji gund direve û ji tifinga xwe bawer, ji dijminên xwe natirse, heneka xwe bi wan dike û ji wan re dibêje: «Qurbanên berikên min mebin, bela xwe ji min vekin!». Ewên ku ketibûn dû wî giş hatin girtin û rêkirin ber hakimê Melazgirt, nû ketî destê Rûsan. Brîndar jî hate danîn xestexaneya eskerî; li wê, piştî ku brîna wî bi timamî rahet bû, dîsa vegeriya mala xwe.

Jiyîna min li eniyê, bi vî awayî derbas dibû: çûn û hatinên dayimî di nav gundan û warên koçeran de. Zivistana sala 1915-1916 nêzîk bû. Halê min jî pê re dijwartir dibû; serma dest pê dikir û ez difikirîm vegerim mal. Di vê wextê de, gelek eskeran ji malên xwe xeberên xirab distandin. Ji wan re dihate nivîsandin ku ji ber seferberiyê, xelayî hebû, tu kes li gundan nemabû ku bi çandiniyê mijûl be. Ji wan re dihate nivîsandin ku dest datanîn ser pez û dewaran û ew serjêdikirin, ku malbatên eskeran, zaroyên wan ên piçûk birçî ne. Mektûbên wilo eskerên ji vî şerê dirêj westiyayî gelek xemgîn dikirin. Dihate gotin ku li Eniya alman rewş roj bi roj ber bi xirabiyê diçe û bi deh hezaran, sed hezaran birîndar di xestexaneyan de bê xwedî mane. Hemû bawer dikirin ku sedemê şkestinên

# 15- "Je vous prie, ne devenez pas victime de ma balle !" Retour à la maison

Nous ne restâmes pas longtemps au pied du Sipan-Dagh. Bientôt, on reçut l'ordre du commandant de l'armée prescrivant à notre régiment d'avancer. En effet grâce aux combats heureux pour les troupes russes, le front s'était déplacé, bien plus loin. Un des officiers partit en avant et prit avec lui quelques Cosaques. Je l'accompagnais comme interprète. Il s'agissait de trouver à l'avance un endroit commode pour le camp, préparer le fourrage et les vivres.

Engagés sur le versant d'une montagne, nous vîmes un Kurde qui s'enfuyait, poursuivi par une bande de dix à quinze individus. Ceux-ci tiraient sans discontinuer, mais ils râtaient à chaque coup. Le fuyard criait continuellement à ceux qui le pourchassaient:

- Je vous prie, ne devenez pas victime de ma balle. Que voulez-vous de moi ? c'est une affaire du passé.

Et en même temps tirant tout en galopant, il tuait à chaque fois l'un de ses poursuivants. Les Cosaques tirèrent une salve sur ce gaillard et le blessèrent à la jambe. Il dut se rendre.

trahison du Haut Commandement et ils attendaient que la guerre finisse au plus vite. Beaucoup désertaient du front.

Plus on approchait du front, plus notre situation empirait et je décidai alors de démissionner. On me régla pour cinq mois et je partis immédiatement au village d'Astaflu (district de Sourmaly, gouvernement d'Erivan), pays de mon père.

Les habitants se trouvaient encore aux campements d'automne et je dus descendre chez mon oncle. Je passai chez lui quelques jours, m'y reposai parfaitement, puis me rendis chez nous, au village de Sousouz, de la région de Kars, où mon père continuait à exercer le métier de berger.

Rentré chez moi, je trouvai mes parents dans une situation critique. Mon absence de deux années avaient privé la famille d'un travail et entraîné la déchéance de notre ménage. Dans l'intervalle, ma mère avait mal aux yeux et, en l'absence de l'assistance médicale, s'était adressée à des rebouteux qui l'avaient si bien soignée qu'elle en était devenue presque aveugle. Elle distinguait à peine le jour et la nuit et saisissait mal les contours des objets. Elle n'était plus capable de vaquer aux soins du ménage et mes soeurs avaient dû la remplacer au foyer. Quant au père, malgré son âge avancé et des malaises continuels, il travaillait toujours comme berger.

Quand je franchis le seuil de la maison, ma mère me reconnut au son de ma voix. Elle se précipita sur moi pour m'embrasser et ne laissait personne d'autre m'approcher. La pauvre, elle ne pouvait guère voir mon uniforme de soldat et me tâtait longuement sur toutes les coutures. Le costume militaire avec ses gros boutons l'a intéressé, semble-t-il, et lui plût. Après m'avoir ainsi tâté, elle permit enfin à ma soeur de s'approcher de moi et de me saluer.

çûbû ber golikan. Xwişka min çû xeberê bidiyê û li ber garanê rûnê da ku ew vegere mal. Rexma pîrbûna xwe, bavê min, bê sekin, bihinçikandî û çav bi hêstir, bi lez hate mal, ez himbêz kirim û gote min:

- Çima te ez berdam? Ez êdî pîr bûme û nikarim herim ber dewêr...!

Piştre rûnişt, bêhna xwe kûr kişand û bi girînê ket. Hingê, min heştê rûbilên xwe derêxistin, danê û got:

- Evê ji bo zivistanê, têra we bikin.

Gelek kêfa bavê min hat: ji bo wî, her wekî elimîbû kiriyên bê qiymet, heştê rûbil xezneyeke mezin bûn.

Qederek ji payizê derbaz bûbû û çêreyên havînê digihaştin dawiya xwe. Min ciyê bavê xwe girt; da bihêlin çend rojan xweş rahet bike.

Min tûrikê xwe yê kevin bir û dîsa çûm çolê, ber golikan. Bi xwe piştî çend rojên din berf daket, çêre êdî neman û ez vegeriyam mal. Ez çend rojan di nav xelkê xwe de mam û piştre li şixulekî fikirim.

Le bruit de mon retour se répandit vite dans le village. Des parents et des connaissances vinrent me saluer. Le père n'était pas à la maison, mais faisait paître des veaux dans les champs. Ma soeur courut le chercher et demeura avec le troupeau pour que le père pût revenir à la maison. Malgré son grand âge, le père courut sans arrêt jusque chez nous et, tout essoufflé, les larmes aux yeux, il m'embrassa et me dit:

- Pourquoi m'as-tu abandonné ? Je suis déjà si vieux et je ne puis plus garder le troupeau !

Puis, il s'assit, soupira profondément et éclata en sanglots. Je sortis alors mes quatre-vingt roubles, les comptai et, les donnant au père, je lui dis que cet argent suffirait probablement pour tout l'hiver. Mon père se réjouit beaucoup de cette somme : pour lui, habitué à un salaire bien modeste, c'était un véritable trésor.

L'automne était bien lancé, le pâturage d'été approchait de la fin. Je décidai donc de remplacer le père, pour lui procurer un repos complet, ne fut-ce que pour un temps bien court.

Je repris ma vieille besace de berger et me rendis dans les champs pour garder les veaux. Bientôt d'ailleurs, il neigea et le pâturage fut fini. Je revins à la maison et, après être resté quelque temps en famille, je commençai à songer au travail à entreprendre.

# 16- Di partiyê de

Min îzna xwe ji mal xwest û berê xwe da bajarê Sarîqamîş. Li wê, ji bo xebatên avahiyê di Drûjana 6 a de (tabûra ihtiyatan), ez bûm emele. Piştî çend rojan, gava serekên min bihîst ku ez bi çend zimanan dizanim ez dîsa kirim terciman.

Drûjana me ber bi Erzerûmê ve, ku di meha sebatê de ketibû destê Rûsan, rêhesina teng çêdikir. Di vî karî de, ji her miletan, Kurd, Ermenî, Tirk, Oset... çend hezar emele dişixulîn. Ji van pêve, ji Moskova û bajarên Rûsya yên mezin jî, gelek Rûs hebûn ku ji bo karên eskeriyên pişt Cephê hatibûn seferber kirin. Min ji wan gelek naskirin û bi Kilîmov, Mîxaîlov, Popov, Şûrka Kornev re ku piştre min li Moskova dî, ez bûm dost.

Ji Kornev pêve ewên din giş endamên partiya Sosyal Demokrat a Bolşevîk bûn û di teşkîlatên veşartî de dixebitîn. Kêfa wan bi min gelek dihat; ez kirim hevalê xwe û ez pir caran dibirim civînên xwe. Heya wê gavê, haya min ji civatên veşartî nebû. Cara pêşîn bû ku ez rastî xebatkarên sewrewî (şoreşger) dihatim. Di civînên xwe de endamên civat ji min dixwest ez ji

# 16- Dans le parti

Je pris congé des parents et me dirigeai vers la ville de Sarykamych où je m'embauchai en qualité d'ouvrier dans la 6ème *Droujina* du Caucase pour les travaux de construction. Bientôt mes nouveaux chefs apprirent que je connaissais les langues du pays et me nommèrent interprète.

Notre droujina construisait le chemin de fer à voie étroite vers la ville d'Erzéroum que les troupes russes occupèrent en février 1916. Sur ce chantier travaillaient quelques milliers d'ouvriers de nationalités diverses: Arméniens, Kurdes, Ossètes, Turcs. Il y avait aussi des Russes de Moscou et des autres villes industrielles de Russie, mobilisés pour les travaux militaires de l'arrière. Je fis ici connaissance avec des ouvriers russes et me liai avec Klimov, Mikhailov, Popov et le jeune Chourka Kornev que, plus tard je rencontrai à Moscou.

Kornev excepté, ils étaient tous membres du Parti social-démocrate bolchévik et travaillaient dans des organisations secrètes. Visiblement je leur fis bonne impression. Ils me prirent en amitié et m'invitaient souvent dans leur cercle. Jusqu'alors, je n'avais aucune idée des cercles secrets. C'était ma première rencontre avec les ouvriers révolutionnaires actifs. Au cours de leurs invitations, les

emeleyên ne rûs re bibêjim ku pir guh nedin şixul û zêdekirina kiriyên xwe teleb bikin. Min li ser xwe girtinên gihandin emeleyên kurd, tirk û yên dîtir... Ewan jî di cî de gotinên me ecibandin û xwestinên xwe beyan kirin ku, bi tercimaniya xwe min gihandin ciyên berpirsiyar. Meqamên bilind serên xwe di ber xwe re berdan, li ber xwestinên emeleyan serê xwe danîn û hin bi hin kiriyên wan zêde kirin.

Emeleyên Moskova ji min re neşriyatên şoreşger didin ji bo xwendinê. Bi saya xwendina van kitêban û tim û tim bi dîtina endamên partiyê, hêdî, hêdî min li ber xwe didît û ji bo azadiya miletên bindest û xilasiya feqîr û xebatkaran ji bin istimara xwedî milk û dewlemenda, dibûm şeravanekî bêtirs û serhişk. Berê, ferq di navbera Bolşevîk û partiyên din de çi bû, min nedizanî, lê, min hez dikir ku hemû şoreşer qewetên xwe bikine yek û tevde ji bo armancekê bixebitin : **rakirina istibdad û zulm, sekinandina şer, xilaskirina feqîr û xebatkarên ji bin tehekûma sermiyan, ango ji ya dewlemenda**. Min gumanên xwe gotin hevalên xwe. Kilîmov dûr û dirêj bi min re axaft û piştre kitêbeke pir mezin da min ku min bi diqeteke kûr xwend. Paşê, ez çûm civînên Bolşevîkan di nav rêla da, li wê ji bo qulibandina hikûmatê Bolşevîk xwe pêk tanîn. Tenbîhan li min kirin ku ji tu kesî re behsa van civîna nekim yan na polîs wê bihatana me û em giş bigirtana...

Bi vî awayî, hin bi hin, pêşiya min firehtir bû; xebata teşkîlatên partiyê ez bi xwe re kişandim û min xwe gihande Bolşevîkan.

membres du parti me chargeaient de suggérer aux ouvriers non-russes de ne pas faire trop de zéle au travail et d'exiger une augmentation de salaire. Je m'acquittais de ces missions, et les Kurdes, les Turcs et d'autres occupés aux travaux du chemin de fer s'emparèrent de l'idée avec empressement et commencèrent à formuler des revendications qu'en ma qualité d'interprète je transmettais aux autorités supérieures. Cédant aux exigences des ouvriers, les autorités furent obligés d'élever progressivement les salaires.

Les ouvriers de Moscou me donnaient à lire des publications révolutionnaires. Grâce à cette lecture et à la fréquentation constante des membres du parti, je commençai peu à peu à m'orienter dans la situation et devins un lutteur intransigeant pour la libération des travailleurs de l'exploitation des propriétaires et des bourgeois. Dans les premiers temps, je ne saisissais pas encore la différence entre les bolchéviks et les représentants des autres partis, mais j'estimais que les divergences entre partis devaient être supprimées et que tous les révolutionnaires, devaient unir leurs forces pour tendre au but unique: **renversement de l'absolutisme, cessation de la guerre et libération des travailleurs de l'oppression du capital**. Je soumettais mes doutes aux camarades. Klimov me fit toute une conférence et me donna, en outre, une brochure assez volumineuse que je lus avec une grande attention. Ensuite, je commençai à fréquenter les réunions à allure de conspirations que les bolcheviks organisaient dans la forêt. On me prévint qu'il ne fallait parler à personne de ces réunions, sinon la police ferait une descente et nous arrêterait tous.

Ainsi progressivement, mon horizon s'élargit, le travail des organisations du parti m'entraîna et j'adhérai aux bolchéviks.

# BIRA DIWEMÎN

## 1- Sala 1917

Kela şahiya rojên sibatê xwê danî.

Bêmanabûna şer ji her kesî re êdî eşkere bû, lê dîsa, di gel vê yekê dom dikir. «Çar êdî nemaye, lê... Hikûmata Miweqet hikim dike.» Û alayên nû rêdikirin eniyê.

Li mîtîngan, Menşevîk û SR (Sosyalîstên şoreşger) xwe tev didan û armancên xwe bi qîrîn belav dikirin: «Şer heya serdestiya dawîn!»

Esker, li ciyê xwe melûl û dilşkestî diman, bê deng guh didan gotaran, bê dil û bi sistî diqîrin “bijî”, û diçûn eniya şer.

Û li eniyê, grûyan (qitea) êrîşa dijmin nedibir û dixwest ku wan vegerînin welatê wan, Rûsya.

Fermandarî, ji bo îtaeta wan, Kozak û Jûnkeran (xwendekarên xwendegeha Şer) rêdikirin. Ji Rûsya, di ser çiyan re xeberên bêbextî û birçîbûnê, dihatin.

Xeyid, gilî û gazin ji eniyê digihaştin paşiya wê û di nav esker û emeleyan de, belav dibûn.

SECONDE PARTIE

# 1- L'Année 1917

L'effervescence de la première joie des journées de février se calma.

La guerre continuait bien que son absurdité fût claire pour tous, «il n'y a plus de Czar, mais.. il y a le Gouvernemet Provisoire». Et on envoyait au front de nouveaux régiments.

A des meetings réunissants des parents s'agitaient des mencheviks et des S.R. (socialistes révolutionnaires), avec leurs mots d'ordre bruyants: "La guerre jusqu'à la victoire finale!)

Les soldats restaient là, moroses, mécontents. Ils écoutaient en silence les discours avec lesquels on les laissait partir, criaient mollement et à contre-coeur,"hourra" et s'en allaient pour le front. Et au front, les troupes refusaient de passer à l'offensive et demandaient leur renvoi en Russie.

Le commandant envoyait pour leurs représailles des Cosaques et des Junkers (élèves des écoles militaires). De Russie, par dessus les montagnes rampaient des bruits sur la trahison et la famine.

Le mécontentement et le murmure passaient du front bien en arrière, s'emparant des masses de soldats et

Di nav van dilêşî û gazina de, zerûriyeta bi tehdîd xwe da bihîstin ; « Êdî şer rawestînin! Me vegerînin mal!»

Drûjana me ya 6 an a Qefqasya ya Komela bajaran hingê li Sarîqamîş dixebitî. Di nav me de gelek Almanên Rûsya hebûn, lê herwekî hikûmata Çar bi wan bawer nebû, çek nedida wan û ew di îşên avahî û çêkirina riyan de didan şixulandin.

Cejna Yekê Gulanê, jî nêzîk dibû. Teşkîlata Bolşevîkan a bi dizî jî ku ez tê de bûm, bi dil û can xwe ji vê rojê re pêk tanî. Me qerar da ku emê seyranekê gulanê û mîtîngekê pêk bînin, rêçika Bolşevîkan bidin zanîn û ji esker û xebatkaran re, çima Hikûmata Miweqet şer nedisekinand, bidin fehm kirin.

Armancên me ev bûn : «Rawestandina şer !. Aşîtiyeke bê ilhaq û terxîskirina ordiyê !.»

Wek endamê teşkîlata bi dizî, karê min ew bû ku ez di nav xelkê bajêr de beyaname û gaziyên komunîstan belav bikim.

Bi kincên min ên kurmancî, tu kes ji min bi şibhe nedibû. Bi kum û qeftanê xwe ve, serbest, ez li nav bajêr digeriyam û li ciyên ji berê de tayin bûyî, ez rastî hevalên xwe dibûn, beyaname û kitêbokan didan wan.

Bi roj em di nav rêlê de dixebitîn û êvarê ez vedigeriyam bajêr.

Carekê, gava berîkên min tije beyaname ez ji holika xwe derdiketim, li ber sênca rêlê rastî hevalê

d'ouvriers. Dans ce mécontentement grandissant et ce murmure se fit entendre l'exigence menaçante: "... A bas la guerre ! A la maison !

Notre 6ème droujina caucasienne de l'association des villes travaillait à Sarykamych, ville frontière, à exécuter divers travaux à l'arrière.

Parmi-nous, il y avait beaucoup de colons allemands. Le gouvernement tzariste, ne leur confiant pas d'armes, s'en servait pour les travaux routiers, la construction de baraquements, etc...

La fête du 1er Mai approchait aussi. L'organisation secrète des bolchéviks à laquelle j'appartenais aussi s'y préparait activement. Il fut décidé qu'on organiserait une "promenade de mai" (*maïovka*) et un meeting, qu'on proclamerait des mots d'ordre bolchéviks et qu'on raconterait aux soldats et aux ouvriers pourquoi le Gouvernement Provisoire ne faisait pas cesser la guerre.

Nos mots d'ordre étaient: "A bas la guerre ! Paix sans annexions, ni contributions ! et "démobilisation immédiate de l'armée !" J'avais pour tâche comme membre de l'organisation secrète de diffuser les tracts et les appels communistes parmi la population de la ville.

Mon aspect kurde et mon costume n'éveillaient aucun soupçon. Avec mon *arkhaloukh* (caftan oriental) et le fez, je me promenais librement dans la ville, rencontrais les camarades aux endroits convenus et leur passais les tracts et les brochures. Le jour nous travaillions dans la forêt et, le soir, je m'en allais en ville.

Une fois en sortant de la baraque les poches remplies de brochures, je rencontrai à la lisière du bois mon camarade de

xwe yê Drûjana, Alman Şineydir hatim. Min bala xwe dabû ku, ew her gav, her wekî bi tesadifî, li wê, rastî min dibû, heya ez ji ber çavên wî winda bibim li min dinêrî, her wekî dixwest min ji casûsan biparêze.

Ez sekinîm û bala xwe dayê. Ew kenî û nêzîkî min bû:

- Tu diçî? Ewî gote min û li dora xwe nêrî.

- Ez diçim. Û tu jî, ji xwe re digerî?...

- Ez digerim, Şineydir kenî : Şamil! min jî bi xwe re bibe!

Diltengî nîşan da û sor bû. Min baş li çavên wî nêrî û gotê:

- Bi ku da?

- Bajêr...

- Çima ?

- Ezê bi te re bim. Ez dizanim...

- Tu çi dizanî? Bêje...!

Şineydir kenî.

- Metirse xeber bide!

- Ezê ji çi bitirsim? Ez dizanim... Ez ji zûda dizanim, hêdîka gotê guhê min û destê xwe li berîka min xist... Here, Şamil, bi dilekî xurt here! Ez li vir im...

Û Şineydir, bi fîkandinê, di ber sêncê re meşiya.

Ez ketim du wî, ew girt û gotê:

- Şineydir!

- Çi ye?

- Te gotiye hinekan?

- Tu dîn î... Gelo yek dikare vî tiştî bibêje her kesî ?

- Here !

droujina, le colon allemand Shneider. J'avais remarqué qu'il s'efforçait toujours comme par hasard de me rencontrer ici et qu'il m'accompagnait du regard comme s'il voulait me protéger des espions.

Je m'arrêtai et le regardai attentivement. Il me sourit et s'approcha de moi.

- Tu t'en vas ? me dit-il en regardant tout autour.

- Je m'en vais. Et toi tu te promènes ?

- Je me promène..., rit Shneider. Chamil, prends-moi avec toi !

Il eut l'air gêné et rougit. Je le regardai d'un oeil scrutateur.

- Où ?

- En ville

- Pourquoi ?

- Je serai avec toi. Je sais...

- Qu'est-ce que tu sais ? parle !

Il rit.

- N'aie pas peur!

- De quoi aurai-je peur ? Je sais. je sais, depuis longtemps, me chuchotat-il à l'oreille, en tapotant ma poche... Va Chamil, vas y hardiment..

Je suis ici et sifflant fort, il longea la lisière.

- Schneider, lui dis-je en le rattrapant.

- Quoi ?

- Tu as parlé à quelqu'un ?

- Tu es drôle ! Est-ce qu'on peut en parler à qui que ce soit ?

- Va !

C'était la veille du 1er Mai. Je n'ai plus revu Schneider.

Ev di şeva Yekê Gulanê de bû. Min ji wê bi şûnda êdî Şineydir nedît. Gava ez gihaştim bajêr, min beyannameyan dan hevalekî xwe ku li benda min bû, û berê xwe da stasyona Sarîqamîş da ku bikevim nav eskeran ku, ji bo bihîstina xeberên Rûsya, li wê kom dibûn.

Li stasyon min lihevgihaneke mezin dît. Bi nêzîkayî, hemû lekên leşkergehê li wê kom bûbûn. Meydana li ber stasyon tije xelk bû. Civîn li ser vî tiştî hatibû xwestin: pakêtên ku ji eskeran re ji Rûsya hatibûn rêkirin, di rê de riziyabûn, û gava gihaştibûn Sarîqamîş, mudîrê stasyonê ew ji wagona avêtibûn, ji ber ku êdî bi kêrî tu tiştî nedihatin.

Timam di vê gavê de, yekîneke rêdikirin eniyê. Eskera pakêtên riziyayî dîtin, ji enira xwe çûn li mudîr xistin û mîtîngek pêk anîn. Qebûl nedikirin herin cephê û dixwestin ku wan vegerînin malên wan. Gelek diaxaftin û sergm bûn.

Gotarên wan gelek tesîr li min dikir. Bi lerza şabûnê ez dilerizîm. Dilê min pir dixwest ku ez derkevim pêşiya van eskeran ku bê rawestan xwe tev didan. Quweteke nenas, ez ber bi sendûqan ve ku minberek pêk tanîn, avêtim. Nêzîkî minberê, eskerekî ez sekinandim :

- Bi ku da diçî ?

- Bra, ez dixwazim xeber bidim, ez bolşevîk im!...

Arrivé en ville, je donnai les tracts au camarade qui m'attendait et allai à la gare de Sarykamych me mêler aux soldats qui arrivaient pour écouter les nouvelles de Russie.

A la gare, je trouvai un meeting monstre. Presque toutes les unités da la garnison étaient là. La place devant la gare était entièrement bondée de soldats. Le meeting avait été provoqué par le fait que les colis destinés aux soldats étaient jetés au dehors des wagons. Les colis, envoyés de Russie, avaient voyagé longtemps et, arrivés à Sarykamych n'étaient plus que des choses innommables.

Juste à ce moment, on envoyait au front une unité. Les soldats ayant aperçu les colis pourris, s'indignèrent, rossèrent le chef de gare et organisèrent un meeting. Ils refusaient de se rendre sur le front et réclamaient qu'on les renvoyât dans leurs foyers. Ils parlaient beaucoup et avec chaleur.

Tous ces discours agissaient fortement sur moi. Je tremblais d'une émotion joyeuse. J'eus grande envie de me produire devant ces soldats qui s'agitaient autour. Une force inconnue me poussa vers des caisses entassées qui formaient la tribune.

- Où-vas-tu ? m'arrêta un soldat près de la tribune.
- Frérot, je veux parler. Je suis bolchévik.

Il sourit et me tendit la main. Je sautai sur la caisse. Mon apparition à la tribune avec le fez et en arkhaloukh intéressa les soldats. On se tût à l'entour.

Kenî û destê xwe da min. Ez derketim ser sendûqê. Li wê qiyafeta min a kurdî, bi kum û qeftan, eskeran eleqedar kirin. Li dora min herkes xwe ker kir.

- Xeber bide, esker gote min, lê bi dengekî bilind, da ku herkes te bibihîse!

Bi qetandin û nîqûrçîkirina pirsên rûsî, min dest bi axaftinê kir, û, di nav çend salên dawîn de, min çi dîbûn û his kiribûn, gotin wan. Min gote ku berê Çar em dixeniqandin, lê nihû, li şûna wî, bajariyên dewlemend, beg û axa me dixeniqînin û me rêdikin mirinê. Divê ku em wan ji hikim bavêjin û vegerin malên xwe.

- Ev Tirk e! Zabitekî lewtelewte kir, derket ser minberê û hate min.

Eskeran lê kir qîrîn: «Destê xwe dirêjî wî meke!»

Ez ji ser sendûqê hatim xwar û di nav xelkê de winda bûm.

Mîtîng heya miqdarekê ji şevê jî dom kir.

Bi şev dereng, ji tiştên ku min kiribûn kêfxweş, di kolana stasyona teng re, ez vedigeriyam holika xwe û min ji xwe re hêdî, hêdî straneke kurdî digot. Ji nişkave, ji paş min reperepa lingê zilaman hat. Ez sekinîm.Çend meriv dabûn dû min.

- Va ye...! Zabitê ku ketibû pêşiya wan kire qîr, û di destê wî de tiştekî giran dikila.

Bi wî li serê min xist. Bê hiş, ez ketim erdê...

Di hebsa Sarîqamîş de, di hicreke piçûk de, min çavên xwe vekirin. Nobetkar kete hicra min. Gava dît

- Parle, me poussa le soldat, mais plus haut, pour que tout le monde entende !

En bredouillant et en estropiant les mots russes, je commençai à parler de tout ce que j'avais vécu et senti au cours de ces années. Je dis qu'auparavant c'était le Czar qui nous étranglais, mais que maintenant ce sont nos nouveaux patrons, les bourgeois, qui nous étranglent et nous envoient à la mort. Il faut les chasser et nous en aller dans nos foyers.

- C'est un Turc, cria d'une voix glapissante un officier en sautant sur la caisse et en se précipitant sur moi.

Les soldats lui crièrent: "N'ose pas toucher".
Je sautai de la caisse et disparus dans la foule.
Le meeting continua bien avant dans la nuit.

Emu et content de ma première intervention, je rentrai tard dans la nuit à ma baraque. Je suivais la sombre rue de la gare chantonnant ma chanson kurde préférée, lorsque tout à coup des pas retentirent derrière moi. Je m'arrêtai. Quelques hommes couraient vers moi.

- Le voilà, cria l'officier qui les devançait et, brandissant quelque chose de lourd, il m'en frappa à la tête. Je perdis connaissance.

Je revins à moi, dans la prison de Sarykamych, dans une cellule isolée.

Le garde-chiourme entra dans ma cellule. Voyant que je me soulevais du plancher, tout en gémissant, il me donna un fort coup de pied à la figure.
- Te voilà ranimé, chien, fils de chien !

ku min bi nalîn serê xwe ji erdê hildikir, pehineke hişk li rûyê min da û got:

- Tu dîsa hatî hişê xwe, ne? Sa, kurê sa...!

Ez dîsa ketim erdê...

Di hicra xwe de, çend rojan, ez bi tena xwe mam. Piştî pirsiyarê ez birim cem girtiyên din. Li wê, çend esker hebûn, di nav wan de, bi navê Nîkolayev, zilamekî rîspî û xwende jî hebû, xwediyê nifûzek mezin bû li nav girtiyan.

Gava bihîst ku ez di mîtîngê de hatibûm girtin, Nîkolayêv ji min re dest bi dayina şîretan kir, da ku di pirsiyarê de, çi û çawa cewab bidim. Lê, hevalên min, ji berê de, rê şanî min dabûn da ku ez wan nefroşim.

Ez birim cem hakimê pirsê. Ewî, di mîtîngê de min çi gotibûn, ji min pirsîn. Di bersîvên xwe de, bi rûsiyeke çat-pat min jê re tiştên tevlihev gotin.

Hakim qîr dikir û lingê xwe li erdê dida.

- Xwe li kerîtî daneyne ! Te di mîtingê de behsa Bolşevîkan kir?

- Bolşevîk?... Û min şaş lê nêrî.

- Tu Bolşevîkan nas dikî?... Hakim bi dengekî bilind qîr dikir min û şeşderba xwe dida sîngê min.

Ez dikeniyam û serê xwe dihejand.

- Bêje...

- Ez Bolşevîkan nas dikim! Miletekî mezin... Dibê lazim e şerê Tirkan bête kirin...

- Divê herkes heriyê...

Je retombai de nouveau.

Je passai plusieurs jours dans la cellule isolée. Ce n'est qu'après l'interrogatoire qu'on me transféra dans une chambre commune. Quelques soldats se trouvaient là. Parmi eux, il y avait un territorial barbu du nom de Nikolaïev, intelligent et ayant de la lecture, qui jouissait d'une grande autorité parmi les détenus.

Ayant appris que j'avais été arrêté au meeting,. Nikolaie, se mit à m'apprendre comment et quoi répondre lors des interrogatoires, mais j'avais déjà été prévenu d'avance par les camarades sur la manière de se conduire pour ne pas "vendre" les autres.

On m'amena chez le juge d'instruction qui commença à m'interroger sur ce que j'avais dit au meeting. En réponse, baragouinant le russe je produisais des coqs-à-l'âne.

Le juge criait, tapait du pied.

- Ne fais pas l'imbécile ! As-tu parlé des bolchéviks au meeting ?

- Des bolchéviks ? et j'écarquillais les yeux sur lui.

- Connais-tu les bolchéviks, criait-il en me menaçant de son revolver...

Je souriais et branlais la tête en signe d'acquiescement.

- Parle !..

- Je connais le bolchévik ! Grand peuple.. dit qu'il faut se battre avec le Turc ! Tous doivent aller...!

Le juge crachait, appelait les surveillants qui commencèrent à me battre.

- Parle !... criait de nouveau le juge, me collant le revolver à la tête; mais moi, tout en pleurant, je répétais:

Hakim tif dikir, xwe hildavêt û banî nobetdaran dikir ku li min xin.

- Bêje... Hakim dîsa qîr dikir û şeşderba xwe li ber guhê min digirt. Lê, bi girîn, min dîsa digot: Bolşevîk, miletê mezin, şerê Tirk dixwaze.

Piştî ku bi min re çend rojan kişkişandin, hakim qanî bû ku xeletî çêbûbû û li hebsê, yekcar ez ji bîr kirim û di destpêka hezîranê de ez berdam.

Ez di cî de çûm civata xwe. Hevalan, mayina min li wê minasib nedît; di wê rojê de, ez vegeriyam welatê bavê xwe. Gundê me, Sûsûz (Bêav).

“Bolchévik, grand peuple.. Il faut se battre avec le Turc..!”

Après avoir traîné avec moi quelques jours, le juge d’instruction se résigna...

Il décida qu’il y avait eu un malentendu quelconque, on m’oublia complètement et, au début de juin, on me fit sortir de prison.

Je me rendis aussitôt à mon organisation. Les camarades me proposèrent de partir immédiatement de la ville et, le jour même, je retournai en mon pays, à mon village natal de Sousouz.

## 2- Li Gund

Li welêt tu tişt neguhirîbû. Wek berê, Walî hîn "Xwedê û Çarê" minteqê bû. Wek adetî, çawişê cendirme Kurdan davêtin ber daran û mal û pereyên wan dixwar. Kurd jî hîn xwe bê deng dikir û li ber zilamên hikûmatê xwe heya erdê ditewand. Nedizanîn ku li Rûsya inqilabek çêbûye û Çar êdî ji zû ve nemaye.

Min gundiyên xwe civandin û li Rûsya çi çêbûbû gote wan. Gundiyan bi tirs guhdariya min dikir û kala, bi pistepist, şîreta didan min:

- Bala xwe bide, Ereb! Hakim wê bibihîse û belakî bîne serê te! Û ez berdidam û diçûn malên xwe.

Mezinê gund, Cindiyê Emo guh li gotinên min bû. Hate cem min û bi çawişê cendirme ez tirsandim, eger ez dev ji Kurdan bernedim.

Gotinên min vala neçûn. Heta berî hatina min jî,

## 2- Au village natal

Au pays, rien n'avait changé. Tout comme auparavant se prodiguait le chef du district "Dieu et Czar" de la contrée. Comme d'habitude, le brigadier ("ouriadnik") rossait les Kurdes, prenait les pots de vins, et les Kurdes se taisaient et saluaient bien bas lorsqu'il rencontraient les autorités. Ils ignoraient qu'il y avait eu la révolution en Russie et que le Czar n'y était plus dcpuis longtemps.

Je réunis mes villageois et commençai à leur raconter ce qui s'était passé en Russie. Les villageois m'écoutaient avec crainte et les vieux me mettaient en garde en chuchotant :

- Attention , Ereb, le chef l'apprendra, et il y aura du vilain ! et ils regagnaient leurs maisons.

Le chef du village Djindi Amomitchek, eu vent de mes entretiens. Il vint chez moi, et menaça qu'il ferait venir l'ouriadnik, si je ne cessais pas de troubler les Kurdes.

Mes paroles ne furent pas dites en vain. Même avant mon arrivée des rumeurs sur la liberté et la terre avait circulé

li ser azadî û parkirina erd û milkan, hîn gotin gihabûn gundiyan, lê Kurd ji hikûmetê ewqas ditirsiyan, nediwêrîn ji kê ku bû, tiştan bipirsin.

Lê, li gundê me bi xwe, ji min re hevalek derket. Ev, bi navê Morovê Emo, gundiyekî feqîr bû. Li serê çiyan, me bi hev re, çend şev derbaz kiribûn û li ser îşên dinê û jiyîna xwe, axaftibû. Min jê re qala Bolşevîkan kiribû û gotibûyê ku ev ji gundiya re serbestî û erd dixwazin. Morove guhdariya min dikir û ji şahiyê çavên wî yên reş ên mezin diçirisîn. Em bi hev re di zeviyan de digeriyan ; Morove bi tiliyên xwe, şanî erdên bi genim ên bê hed û hêsab ên Şewerş dida û ji kêfxweşî bihnçikiyayî, digot :

- Ev erd jî, wê yên me bin...
- Giş ême ne. Emê her tişt ji destê wî bistînin...
- Û pez û dewar?
- Ew jî wê bikevin destê milet...

Morove dikenî û wek zarokekî piçûk xwe hildida:

- Divê ev tişt, rojek berî rojeke; çêbibin.

- Em bi tena xwe nikarin. Divê milet tev de xwe rahije vî karî... Min gotê.

- Gundên Gomesoro û Qerekele bi xwe wê bibin ên her kesî? Lê eger erd têr neke?...

- Erd wê têra me gişan bike, min dilê wî rahet kir...

Carekê , ewî gundîkî xweşhal, Cindiyê Ûso, anî.

- Ereb, ewî gote min, tu dibêjî ku erd ê her kesî ye?
- Belê.
- Û me divê ew ji xwedî milkan bistînin ?
- Belê.

dans les villages, mais les Kurdes avaient tellement peur des autorités qu'ils craignaient même de questionner qui que ce soit.

Mais même dans notre village, il se trouva quelqu'un pour sympathiser avec moi. C'était un jeune paysan pauvre, Morové Amo. Nous avons passé avec lui, dans les montagnes, plus d'une nuit d'été, parlant de notre vie. Je lui racontais sur le compte des bolchéviks qui demandent la liberté et la terre pour les paysans.... Morové écoutait mes récits et ses grands yeux noirs s'enflammaient de joie. Nous nous promenions ensemble dans les champs et, montrant les grands espaces ondoyant de blé du propriétaire Chavarch, il chuchotait, étouffé de joie:

- Ceci sera à nous ?
- Tout est à nous. Nous lui prendrons tout.
- Et le bétail ?
- Le bétail aussi...

Morové riait et sautait comme un jeune garçon.

- Cela doit se faire le plus vite possible, pressait-il.

- A nous seuls, nous ne le pouvons pas. Il faut que ce soit tous ensemble... lui expliquais-je.

- Et Gomesoro et Karakala (noms de villages) aussi, à tous ? Et s'il y a peu de terre ?

- La terre suffira le calmais-je.

Une fois, il amena avec lui Djindi Ouso un paysan aisé.

- Ereb, me dit-il, tu dis que la terre est à nous ?
- Oui
- Et qu'il faut la prendre aux propriétaires ?
- Oui
- Et l'autorité. Elle ne nous rendra pas la terre ?
- Nous élirons notre autorité.

- Û hikûmat? Ew erd nadê me...
- Emê ji xwe re hikûmata xwe deynin.
- Eskerên wan hene.
- Kî?
- Serekên me.
-Ême jî çiyayên me hene...

Cindî ponijî, û bêî ku tiştekî dî bibêje, serê xwe nizim kir û vegeriya gund.

Roja dîtir dîsa hat:

- Ereb, tu Îsrayil Mîrakiyan dinasî?
- Belê ez wî dinasim.
- Ez li cem wî bûm. Cindî sekinî û li çiya nêrî.
- Te tiştek gotê?
- Belê.
- Mamoste Îsrayil Mîrekiyan çi dibêje?
- Ew jî wek te dibêje, Ereb. Cindî xwe lal kir, piştre bi dengekî nizim bi ser de ajot:
- Ez çûm Qerekelê.
- Kurd çi difikirin li wê?
- Erd dixwazin.
- Erd dixwazin? Şaş min tekrar kir...
- Belê, li Qerekelê û li Gazacan, gundî behsa erd dikin... Bêje, emê çi bikin?
- Min got...
- Serekê xwe biqewirînin?
- Belê...
- Ew car din çû. Morov li riya wi nêrî û fikand.
- Çiyê te heye ?
- Ewê bi me re bibe, Cindiyê Ûso, wê bibe hevalê me..., gote di ber xwe de.

- Ils ont des soldats
- Qui ?
- Les chefs.
- Et nous avons les montagnes...

Djindi devint pensif et, ne disant plus rien, s'en retourna au village, la tête basse.

Le lendemain, il revint .
- Ereb, tu connais l'instituteur Israël Mirakian ?
- Je le connais.
- J'étais chez lui. Djindi se tût et regarda la montagne.
- Tu lui as parlé ?
- Oui.
- Et que dit l'instituteur Israël Mirakian ?
- Il dit la même chose que toi, Ereb. Djindi se tût de nouveau, puis il ajouta tout bas :
- Je suis allé à Karakala.
- Que pensent les Kurdes ?
- Ils pensent à la terre.
- A la terre ? répétais-je étonné.
- Oui, à Karakala et Gasadjan, on parle de la terre. Dis, que faut-il faire.
- J'ai déjà dit...
- ... Chasser le chef ?
- Oui

Il s'en alla de nouveau. Morové l'accompagna du regard en sifflotant.
- Qu'as-tu ?
- Il sera avec nous. Djindi Ouso sera des nôtres, chuchota-t-il.

Et il ne se trompait pas. Djindi Ouso devint notre partisan et, après lui, plusieurs de nos villageois, le suivirent.

Belê, Morov xwe nedixapand. Cindiyê Ûso bû hevalê me, û piştî wî pir gundiyên dîtir jî ketin şopa wî.

Roja dîtir, serê sibê zû, siwarek bi lez hate gund, bi qîrqîrê çû mala mezinê gund.

Di cî de Kurd li dora wî kom bûn.

- Muxtar! Siwar, bi dengekî bilind, ban kir, axa emir daye ku gundî giş herin mala wî, ji ber ku îro amirek mezin wê bê cem wî û we giş dixwaze...

Cindiyê Emo bi îtaet serê xwe xwar kir.

- Ji bona çi? Hinekan li dorê pirsî.

- Metirsin, siwar bi ken vegerand. Nihu, êdî serbestî ye. Axa nema dikarin zilim bikin. Piştre qîr kir hespê xwe, ew rakir telebê û berê xwe da çiyê.

«Serbestî? Axa êdî zilim nakin!...»

«Herin cem axa, Morove digo, nihu azadî ye!...»

- Zimanê xwe pir dirêj meke û bala xwe bide gotinên xwe! Cindiyê Emo gotê û bi tiliya xwe ya xwar ew tehdîd kir.

Herkes hiş bû. Emo, bi awirên tûj, li dora xwe nêrî, lêvên xwe yên qermiçî li hev xistin û got :

- Herin, lê bi tertîb, we seh kir?

Gundiyan da rê û bê deng ber bi çiyan ve meşiyan.

Li gundê Dîgorê mezin, bi nêzîkayî, hemû xelkê minteqê civiyabûn. Nemînendeyên hemû miletên ciyê me li wê bûn.

Nemînendeyê Hikûmata Miweqet, gotarek da. «Sewreyek li Rûsya hatiye çêkirin, ewî digot. Çar ne-

Le lendemain, tôt le matin, un cavalier arriva en toute hâte au village. En poussant des cris, il alla à la maison du chef.

Aussitôt, des Kurdes s'assemblèrent à l'entour.

- Maire, déclara à haute voix le policier à cheval, le chef a donné l'ordre à tous les Kurdes de venir à se résidence, car un grand chef est venu, et c'est aujourd'hui qu'il convoque tout le monde.

Djindi Amomitchek baissa profondément la tête en signe d'obéissance.

- Pourquoi faire ? dirent des voix alentour.

- N'ayez pas peur, sourit le policier. Maintenant, c'est la liberté. Le chef ne sévira pas. En encourageant son cheval par un cri, il partit en vitesse vers la montagne....

"La liberté ? le chef ne sévira pas ?"

"Allons chez le chef, allons criait Morové maintenant, c'est la liberté.

- Gare à toi, remarqua Amomitchek, fronçant lęs sourcils et le menaçant de son doigt crochu.

Il y eut un silence. Amomitchek promena tout autour un regard sévère et mâchonnant ses lèvres désséchées, il dit:

- Allez, mais qu'il y ait de l'ordre... compris ?

Tout le groupe partit en silence et sans bruit vers les montagnes.

Dans le grand village de Digor presque toute la population adulte du canton s'était rassemblée. Il y avait là les représentants de toutes les nationalités de notre région.

Un discours fut prononcé par un représentant du Gouvernement Provisoire. Une révolution a été faite en Russie,

maye, û êdî, milet ji aliyê nemînendeyên xwe tê gerandin û li ser wan jî Hikûmata Miweqet heye.»

- Û erd? Morove kire qîrîn.

Pirsa «erd» weke barûdê, agir girt. Bi sedan ve deng ev pirs tekrar kirin.

Gotarbêj zor da xwe ku dengê gundiyan bide birîn; lê tu kes guh nedidayê. Ji bihntengiya xwe çû cem mezinekî kurd ê gelek bi nifûz, Egîd Beg.

Ez li nêzîkî menberê bûm û guh bi gotinên wî dibûm :

- Ev xwestin ji ku ketine nav Kurda?

Egîd Beg bi çav ez nîşan damê.

- A! A! Nemînendeyê Hikûmatê mirmirî, û bi diqet li min nêrî. Ez bi cilê eskerî bûm. Piştre devê xwe da guhê Egîd Beg, û tiştek pistepist kirê. Egîd Beg bi giranî serê xwe hejand û banî çawişê cendirmê kir. Ewî jî, bê deng, temaşa min kir, û bi işareta teyid serê xwe bir ber xwe.

- Ereb, derkeve, Morov bide! Morove bi lez hatî cem min, digote min. Hevalên me hêvî ji te dikin ku tu ji wan re gotinên xwe yên gund bibêjî. Li benda te ne, zû bike!

Bi lez, ez derketim ser menberê.

- Firarê eskerî... Nemînendeyê Hikûmata Miweqet, di nav diranên xwe re fîkand û xwe ji min dûr kir.

disait-il. Il n'y a plus de Czar et le peuple est gouverné par l'autorité du peuple, ayant à sa tête un gouvernement provisoire.

- Et la terre ? s'écria Morové

Le mot "terre" prit feu comme la poudre parmi le groupe. Des centaines de voix le répercutèrent...

L'orateur essaya de calmer les paysans, mais personne ne l'écoutait. Agacé, il se résigna et alla vers un féodal kurde important, Aguid Bek.

Je m'approchai de la tribune et l'entendit poser la question à Aguid Bek :

- D'où viennent ces demandes chez les Kurdes ? Aguid Bek me montra du regard.

- A-a ! ....ânonna le représentant, et il se mit à m'examiner attentivement. J'étais en uniforme de soldat.

Puis se penchant vers Aguid Bek, il lui chuchota quelque chose. Aguid Bek secoua gravement la tête et appela le brigadier. Ce dernier me regarda et, silencieusement approuva aussi en inclinant la tête.

- Ereb, parle ! me dit Morové accouru près de moi. Les nôtres te prient de dire tout ce que tu leur disais au village, ils attendent.

Je gagnai rapidement la tribune.

- Déserteur, siffla entre ses dents le représentant en s'écartant de moi.

L'assistance se tût.

- Camarades ! débutai-je à haute voix.

- Ereb ! Ereb !...., ce mot flottait dans les rangs....

- Nous avons besoin de la terre !... Et cette terre ce sont

Guhdar bê deng bûn.

- Hevalino! Bi dengekî bilind min dest pê kir.

- Ereb... Ereb... Ev nav di nav koma guhdaran de ji devê herkesê derdiket.

- Em gundî, mihtacî erd in. Û erd, Bolşevîk wî didin me. Ew dibêjin: «Ji şer re dawî, ji xebatkaran re febrîqe û karxane, ji gundiyan re erd!»

Gava min his kir ku yek bi milê min digire û min ber bi xwe ve dikişîne, min xwe zivirand û min destê Nemîndendeyê Hikûmatê li ser xwe dît:

- Dengê xwe bibire... Yan na? Ewî xwe tewand ser min û ji guhê min re mirmirî.

Rûyê wî ji xezebê sor bûbû.

- Wî berde! Bira xeber bide...! Çima tu wî nahêlî? Gundiya ji nû ve lê kire qîrîn.

- Bibêje, Ereb, bibêje...!

Gava min dî ku gundî diqîrin, mîtînga eskeran û hebsa Sarîqamîş hatin bîra min. Ez dîsa li wan zivirîm. Nemîndeyê Hikûmatê, xurt milê min girtibû ji hêrsê dilerizî. Egîd Beg bi çavên tije kîn û tinaz li min dinêrî. «Ne xema min e !», min ji xwe re digot.

Min milê xwe ji destê wî derêxist û dom bi gotara xwe kir: Cendirme, xwediyên milk, dewlemend û axa, Kurdan davêtin ber daran û ji îro bi şûnda jî, ewê li wan xin eger Kurd hukm nexin destên xwe û erdên xwedîmilkan nestînin. Divê em sovyetên gundî, emele û eskeran bibjêrin. Divê em gundiyên kurd ên feqîr bibjêrin.

les bolchéviks qui la donnent. Ils disent: “A bas la guerre ! Les fabriques et les usines aux ouvriers, et la terre aux paysans !"

Je me retournai, sentant que quelqu'un me tirait par derrière par le bras. C'était le représentant du Gouvernement provisoire.

- Tais-toi ! sinon... chuchota-t-il, en se penchant vers moi.

Son visage était rouge de colère.

- Laisse parler ! pourquoi ne le laisses-tu pas ? clamèrent à nouveau les villageois.

Parle Ereb, parle !

Je regardai les paysans qui criaient et me rappelai le meeting des soldats et la prison de Sarykamych. Je me retournai: le représentant de la ville me serrait le bras au-dessus du coude, tremblant de rage.

Aguid Bek me regardait, les yeux moqueurs et brillants. “Cela m'est égal ! pensai-je en moi même.

De force je me dégageai le bras et repris la parole. La police et les propriétaires, dis-je, frappaient les Kurdes et ils continueront à en faire autant maintenant, si les Kurdes ne s'emparent du pouvoir et ne prennent la terre aux propriétaires. “Nous devons élire notre pouvoir parmi les pauvres paysans kurdes. Nous devons élire notre soviet de paysans et d'ouvriers, ainsi que des soldats qui sont parmi nous”.

Telles étaient mes paroles.

- Non, nous devons élire un Gouvernement provisoire local et non point un soviet, cria le représentant, en me poussant sur le côté. Je sentis qu'une main lourde se posait sur mon épaule. C'était Aguid Bek.

Gotinên min ev bûn.

- Na! emê hikûmateke mehelî û miweqet deynin, lê, ne sovyetan! Nemînende kir qîr, û ez dehf dam alîkî. Min his kir ku destekî giran milê min digivaşt. Ev Egîd Beg bi xwe bû.

- Îşê min bi te heye, Ereb, ewî gote min.

- Tu gotinên min bi te nînin, bi xeyid min vegerandê, û milê xwe ji destê wî filitand.

- Ciwaba te ev e, Ereb?

- Bi gurekî re yek an bi agir an bi berik, xeber dide, min gotê, ji aliyê wî de tuf kir û ji menberê hatim xwar.

Civîn, heya derengiya şevê dom kir. Gelek helehele û deng hebûn. Nemînendeyê Hikûmata Miweqet, ji hemû xwestinên Kurdan re mazereta dîtin û bi cîhanîna wan li ser xwe girt. Lê, gava intixabat çêbûn, hemû namzedên Taşnaq û yên began derketin. Namzedê me, Îsrayîl Mîrakiyan ket. Di dema esasî ya dengdanê de, ew mecbûr kirin namzediya xwe bikişîne.

Di tariya şevê de, ez vedigeriyam mal. Ewrên giran di ser çiyan re hêdî hêdî derbaz dibûn. Car car, heyîv wek dasekê di pişt wan re rûyê xwe yê şên nîşan dida. Ez di şivereyeke çiyan re dimeşiyam û hevalên min ên bolşevîk, ku li wê, di bajarên rûs de, dixebitin, dihatin ber çavên min. Ji nişkave, ji tariyê, sê zilaman xwe avêt min: «Kemînek danîn ji min re...», min ji xwe re di dilê xwe de got. Çiqas ji min dihat, min kulmek li rûyê yê pêşîn xist. Min li destê xwe tiştek zeliqok his kir... Xwîn !

- Je veux parler affaire avec toi, Ereb me dit-il.

- Nous n'avons rien à nous dire, lui répondis-je avec colère en débarrassant mon épaule de son bras.

- Est-ce là ta pensée ?...

- Avec un loup, on parle avec l'aide du feu ou d'une balle !... répliquai-je en me détournant et, crachant de son côté, je descendis de la tribune.

La réunion continua tard dans la soirée. Il y avait beaucoup de clameurs et de bruit, mais le représentant du Gouvernement Provisoire trouva des excuses à toutes nos exigences des Kurdes et promit de "tout arranger". Mais quand les élections eurent lieu, les élus se trouvèrent être des Tachnaks et des beks. La candidature d'Israil Mirakian que nous avions proposée échoua. Au moment le plus décisif du ballotage, Israil retira lui-même sa candidature.

Il faisait nuit noire quand je rentrai chez moi. De lourds nuages défilaient lentement s'accrochant aux montagnes. Les perçants par moment, la faucille de la lune se montrait. Je suivais un sentier de montagne et pensais à mes camarades bolchéviks qui travaillaient là-bas, dans les villes russes. Soudain, trois figures s'élancèrent sur moi, émergeant des ténébres. "Un guet-apens", pensai-je aussitôt. Avec force, je donnai un coup de poing au visage du premier des attaquants. Je sentis sur ma main quelque chose de gluant ... du sang !.

Fils de chien, cria l'homme en chancelant et en se protégeant le visage. Les deux autres brandirent les lames étincelantes de sabres.

- Halte-là !

- "On va me sabrer !" pensai-je;

- Qui êtes-vous ?

- Tu es arrêté, dit l'un . Si tu résistes, nous te tuerons !

- Kurê sa! Mêrikî lerizî qîr kire min û rûyê xwe bi destê xwe pêçand. Diduyên dîtir, şûrên bi çirs li destê wan, ban kir min.

- Li ciyê xwe bisekine...!

«Ewê min bidin ber xenceran», di dilê xwe de got.

- Hun kî ne?

- Tu hatîyî girtin, yekê ji wan gote min. Eger tu li ber xwe bidî, emê te bikujîn.

- Ji bona çi?

- Li ser emrê serek.

Diduyê din jî, ji paş, xwe avêt min û destên min badan. Liberxwedan bê feyde bû. Destên min girêdan û ez birim Digorê.

Gava em gihaştin mala Egîd Beg, çireyên wê pêxistî, tavheyveke çilmisî xwe raxistibû li ser gundê raketî. Cendirme derket jor û di hindurê xanî de winda bû.

- Wî bînin hundir! Nemînendeyê Hikûmata Miweqet kire qîr û li ber deriyê mezin sekinî. Li pişt wî, Egîd Beg, dev bi ken li min dinêrî:

- Derbaz be; tuê bibî mêvanê me yê gelek ezîz. Bi keneke tije henek, Egîd Beg gote min, ez dehf dam hundir û derî li me girt.

Min çavên xwe li dora xwe gerandin: Çawişê cendirmê, Nemînendeyê hikûmat û çend Taşnaqên dewlemend, li pişt masê rûniştîbûn. Egîd Beg ez kişandim ber wan û got:

- Ha ji we re!

- Tu bolşevîk î? Nemînende ji min pirsî.

- Pour quel motif ?
- Ordre du chef !

Deux autres encore se jetèrent sur moi par derrière et me tordirent les bras. Il était inutile de résister. On me lia les mains et on me ramena à Digor.

Une pâle lueur de lune s'étendait sur le bourg endormi lorsqu'on arriva vers le haut du perron de la maison d'Aguid Bek brillamment éclairée. Le policier gravit le perron et disparut à l'intérieur.

- Faites entrer, cria le représentant du Gouvernement provisoire, apparaissant dans l'embrasure de la porte grande ouverte. Derrière lui se tenait Aguid Bek avec le sourire.

- Entre, tu seras un hôte chéri, dit-il, avec un sourire de travers et, me poussant dans la chambre, il en referma bien la porte.

Je jetai un coup d'oeil autour de moi. Derrière la table étaient assis l'ouriadnik, le représentant envoyé de la ville et les richards Tachnak de l'endroit.

- Le voilà, dit Aguid Bek en me poussant vers la table.

- Tu es bolchévik ? me demanda le représentant.

Je me tus.

- Réponds. C'est toi qui incites les Kurdes à la révolte ? Parle !

- Il ne veut même pas nous parler, ricana Aguid Bek dont les yeux flamboyaient de haine. Et s'approchant de moi à pas lents et lourds.

- Parle ! hurla-t-il en serrant les poings.

Je gardai le silence.

Alors, se repliant comme un chat, il se jeta sur moi, me prit à la gorge et se mit à m'étrangler. J'étouffai et tombai à terre.

Min deng nekir.

- Bêje! Ev tu î ku gundiyên kurd radike ser me? Xeber bide!

- Li xwe nagire bi me re biaxêve jî, Egîd Beg bi henek got, çavên wî ji xezebê agir dibarand. Bi gavên hêdî û giran hate ber min:

- Biştexile! ew ziriya û kulmên xwe givaştin.

Min devê xwe venekir.

Hingê wek kitikekî xwe tewand û xwe avête min. Bi her du destên xwe qirika min girt û ew givaşt. Bihna min çikîya û ez ketim erdê.

- Ah! Ah! Sa! Kurê sa! Tu erd dixwazî?! Egîd Beg digote min û bi gîzmeyên xwe pê li laşê min dikir. Piştre ji cendirmeyan re got: «Wî bibin axurê û wî hepis bikin; ezê bikim ku xeber bide»

Ez kişandim hewşê û avêtim axurê. Cendirman û çawişên wan ez diêşandim û miameleyên xirab bi min dikirin. Zibil bi min didan kişandin, li rûyê min tif dikirin û li min didan; lê wa dixuya ku nediwêrîn min bikujin. Egîd Beg bi xwe, herwekî piştre min bihîst, nedizanî çi bi min bike; mîna ku li benda tiştekî bû...

Êvara roja pêncan, ez birim daîreya hikûmatê û kaxitek bi min dan îmza kirin. Tê de min sond dixwar ku êdî di wê minteqê de tu tevdanê nekim. Piştî vî, serbest berdam. Gava ez derketim derve, çûna xwe ya rast bi rast mal, min baş nedî, tirsiyam ku Egîd Beg min bêxe xefkê û li nav çiyan tifingekê li min bide berdan. Çend rojan, ez li cem gundiyekî ji nasên xwe mam, û bi wî min ji Morove re da zanîn ku bi şev bi çek bê û min bibe.

- Ah-ah ! chien, fils de chien ! Tu veux de la terre ? .... Et il commença à me piétiner. A l'écurie, sous les verroux ! Je le forcerai bien à parler, cria-t-il aux policiers.

On me traina dans la cour et me jeta dans l'écurie.

Les policiers et le brigadier me maltraitaient. Ils me faisaient ramasser le fumier, me crachaient à la figure, me battaient. Mais, apparamment, ils ne se décidaient pas à me tuer. Aguid Bek lui-même, ainsi que je m'en rendis compte, ne savait que faire de moi, comme s'il était dans l'attente de quelque chose.

Au soir du cinquième jour, on me mena dans le bureau et on me fit signer un papier, dans lequel je promettais sous la foi du serment de cesser toute agitation dans la région. Après quoi, on me rendit la liberté. Sorti dans la rue, je me gardai bien de rentrer aussitôt à la maison, pensant que c'était là peut-être un piège d'Aguid Bek qui m'aurait fait envoyer une balle dans les montagnes. Je restai quelques jours chez un Kurde de mes connaissances et, par son intermédiaire, je fis savoir à Morové Amo qu'il vienne me chercher une nuit avec des armes.

Morové ne se fit pas attendre et se présenta de nuit à Digor avec quelques Kurdes armés. Parmi eux, je remarquai le visage sérieux et soucieux de Djindi Ouso.

En route, je leur racontai tout.

Morové brûlait d'impatience d'aller rendre à Aguid Bek la monnaie de sa pièce, c'est-à-dire qu'il voulait aussitôt rebrousser chemin pour Digor et le tuer. Mais je l'en dissuadai, disant que ça n'était pas là notre but, mais qu'il fallait agiter et soulever les Kurdes contre les richards beks, aghas, Tachnak et propriétaires.

Morove dereng nema, û bi şev çend Kurdên çekkirî re, hate Digorê. Di nav wan de min rûyê cidî û xemgîn ê Cindiyê Ûso dît.

Li rê min her tişt gote wan.

Morove bihnteng dibû û dixwest pereyê Egîd Beg jê re vegerîne. Ango, dixwest vegere Digorê û wî bikuje. Min xiste eqlê wî ku armanca me, ne xwîn rijandin, lê şiyarkirina Kurdan û xilaskirina wan ji bin nîrê beg, axa, Taşnaq, xwedîmilkan bû.

Tuê li mala min bimînî, Cindî gote min. Ew nayên cem min...

Û min xwe li mala wî veşart.

Çend roj borîn. Êvarê, bi dizî, ez ji cem Cindiyê Ûso derdiketim û bi Morove, li gundan digeriyam; min ji gundiyan re, Bolşevîk çi bûn dida zanîn û digote wan ku divê erdên dewlemendan ji wan bên standin û ji gundiyan re bêne parkirin.

Êvarekê, gava em li mala Cindî civiyabûn û me behsa tirs û sistiya Kurdan dikir, jina Cindî ji nişkave kete hundir û kire qîr: «cendirme!...»

- Li ku ne? Me qîrand û rabûn ser xwe.

- Li mala kalo Şemo

- Xwe veşêre! Cindî gote min û ji mal derket. Min xwe xist nav kahê.

Gava cendirmeyên siwarî hatin ber deriyê me, banî bavê min kirin û bi qirbac ew tirsandin:

- Bêje! Kurê te li ku ye?

- Tu vas vivre chez moi, me dit Djindi, lorsque nous arrivâmes au village. Ils ne viendront pas chez moi.

Et je me cachai chez lui.

Quelques jours s'écoulèrent. Le soir, je sortais en cachette de chez Djindi et nous nous promenions avec Morové dans les villages, racontant aux paysans ce qu'étaient les bolchéviks et leur disant qu'il fallait reprendre la terre aux propriétaires.

Un soir que nous étions réunis dans la maison de Djindi et que nous parlions de l'hésitation et de la pusillanimité des Kurdes, la femme de Djindi fit bursquement irruption dans la chambre en criant : La police !

- Où ! criâmes-nous en nous levant.

- Chez le vieux Chémo

- Cache-toi, me dit Djindi en sortant de la maison. Et je me mis dans le *kah* (recoin sombre avec un trou. On y entasse de la neige qui fond et l'eau y est emmagasinée pour abreuver le bétail).

S'étant approchés à cheval de la maison habitée par mes parents, les policiers les appelèrent dans la rue et commencèrent à les menacer du fouet.

- Dis où est ton fils ?

Mon père pleurait, jurait qu'il ne m'avait pas vu depuis mon départ pour la réunion de Digor. Ma mère à genoux dans la poussière devant le cheval, pleurait et priait qu'on leur fît grâce.

Du monde s'était réuni. Les policiers fouillèrent partout dans la maison. Furieux de leur échec, ils s'en prirent de

Bavê min digirî û sond dixwar ku ji roja Digorê, ez nedibûm. Diya min, di nav ax û tozê de, li ber hespan, li ser çogên xwe, digirî û hêvî ji wan dikir ku rehma xwe li wan bînin...

Xelk li hev gihabûn. Cendirman li her derê malê geriyan, gava ez nedîm, ji kîna xwe, dîsa bela xwe dan dê û bavê min. Lê, gundiyan xwe xist nav wan û ew ji destê wan xilas kirin û gotin wan ku ji roja Digorê, êdî tu kesî ez nedîbûm. Cendirme, destvala vegeriyan û gotin dê û bavê min ku eger ewê min bigirin, ewê hesabê xwe bi min re bibînin...

Ev tişt giş, Cindî piştî vegera xwe mal, gotin min; ji bo dê û bavê min ên pîr û kal, dilê min dişewitî, lê min dizanî ku heya ez li wê me, hikûmat û begên me ew rahet nedihiştin. Min fikra xwe gote Cindî. Ew hinek ponijî û piştre fikra min qebûl kir û qerar da ku piştî çend rojan ez ji wê derê herim. Jina Cindî tûrikê min tije kir. Min ji wan îzin stand û çûm ji dê û bavê xwe xatirê xwe bixwazim.

Di mala me de her tişt tevlihev bûbû. Diya min li erdê, bi girîn, hûrmirên me yên belawelabûyî, li hev didan. Bavê min rabû, hate ber min, mideteke li min nêrî :

- Ereb, bêje te çi diziye? Gote min û destê xwe danî ser milê min.

- Min tu tişt nediziye, bavo.

- Nexwe, te kuştinek kiriye?

- Min tu kes nekuştiye.

- Nexwe, cendirme, çima li te digerin?

- Ez nizanim.

nouveau à mes vieux, mais les villageois s'entremirent et prirent les miens sous leur protection. Ils confirmèrent que je n'étais pas réapparu au village depuis le jour où je m'étais rendu avec eux à Digor. Les policiers s'en allèrent, non sans promettre à mes vieux en partant qu'ils retrouveraient leur fils et lui règleraient son compte.

Tout ceci, Djindi me l'a raconté à son retour à la maison. J'avais le coeur gros pour mes vieux parents, mais je savais que tant que je serais là, on ne les laisserait pas tranquilles. Je le dis à Djindi. Il resta silencieux un bon moment, puis partagea ma façon de voir et décida que je devais m'en aller d'ici pour quelque temps.

La femme de Djindi me garnit ma sacoche. Je pris congé d'eux et allai faire mes adieux à mes parents.

Dans notre maison, tout était sens dessus dessous. Ma mère assise par terre ramassait en pleurant nos hardes dispersées. Mon père se leva, s'approcha de moi et me regarda longtemps.

- Ereb, parle, qu'as-tu volé ?, me dit-il, en me mettant la main sur l'épaule.

- Je n'ai rien volé, père.

- Alors tu as tué.

- Non, je n'ai pas tué non plus.

- Mais alors pourquoi la police est-elle à tes trousses ?

- Je ne sais pas.

- Tu ne veux pas l'avouer à ton propre père, à ta mère ?

- Père !

- Parle !..

- Je veux que tous les pauvres soient heureux, qu'ils aient de la terre, que toi aussi tu aies de la terre. Voilà

- Tu naxwazî rastiyê bêjî bavê xwe, diya xwe?
- Bavo!
- Bêje...
- Ez dixwazim ku gundî xwedî erd bibin, bextiyar bibin. Û tu jî bibî xwedî erd. Te seh kir, bavo, çima bi dû min dikevin, li kuştina min digerin? Nihu ez diçim, lê, ezê dîsa vegerim. Bi xatirê we!...
- Ereb tu kurê me yê tenê yî, em êdî pîr bûne, çima tu li helaka me digerî?

Bavo digirî, û hêstirên mezin di çavên wî re dihatin xwar û di ser rûyê wî yê qermiçî re diherikîn.
- Em şivan in, em ne mihtacê erdê ne, diya min digo, li ser çoga xwe dikişkişand û bi tiliyên xwe yên hişk çîpên min digirtin.
- Bi xatirê te bavo!... Min ew xurt di hembêza xwe de givaşt, û piştre, min diya xwe ji erdê rakir.
- Ereb! Bi nalînê, ewê gote min, û bê hereket, kete ser koşmayê.

Min tûrikê xwe avête milê xwe û bi lez, min da rê. Li dûr, di nav tehtan re, şirîta şefeqê bi zor dixuya. Min berê xwe da Aleksandropol (îro Lenînakan).

pourquoi on me persécute et on me pourchasse. Maintenant, je m'en vais. Mais je reviendrai, père. Adieu.

- Ereb, toi tu es notre fils unique, nous sommes vieux, pourquoi cherches-tu notre perte ?

Le père pleurait. De grosses larmes coulaient sur ses joues ridées.

- Nóus sommes des bergers, nous n'avons pas besoin de terre, disait ma mère, se trainant sur les genoux et s'agrippant de ses doigts raides à mes jambes.

- Adieu père ! Je le serrai fort dans mes bras et, saisissant ma mère, je la relevai du plancher.

- Ereb, gémit-elle, et elle s'effondra inerte sur la *kochma*

Je jetai ma sacoche sur mon dos et sortis précipitamment de la maison. Au loin, entre les rochers, brillait déjà imperceptiblement le ruban de l'aube. Je me dirigeai vers Alexandropol (aujourd'hui Leninakan).

## 3- Ji Aleksandropol ta Stavropolê

Li Aleksandropol esker pêl didan. Li meydanê, li stasyonê, kom kom diçûn û dihatin.

Hin tirêna «mêrxasên Sen Corc» dibirin eniyê. Ew bi qîrîn û xeberan dihatin verêkirin, û hema bi hev re pev diçûn. Tirênên ku ji enî dihatin tijî gûşiyên eskerên çekdar bûn. Ewên ji cebhê hatî, li stasyon bi deng û tevdanên xwe, qiyamet radikir, mîtanga pêk tanîn, şandiyar rêdikirin yekîneyên din ku diçûn eniyê, siwarî tirêna dibûn bi gotinên «Mal...» bi rê diketin û di tariyê de winda dibûn.

«Herin enî êdî qe...» Vasiya, eskerê bolşevîk ku min di hatina xwe de li Aleksendropol naskiribû bi kêfxweşî, di nav diranên xwe re fîkand.

Xwe avête tirêna ku dikete stasyonê, xwe pê girt û gote min:

- Şamil we re, xwe bavêjiyê!

-Di mezeloka tirenê de min ciyê xwe çêkir.

## 3- D'Alexandropol à Stavropol

Alexandropol fourmillait de soldats. Sur la place, à la gare, ils allaient et venaient en foule.

Des trains arrivaient qui amenaient sur le front "les chevaliers de Saint Georges". On les accompagnait de cris et d'invectives, on en venait presque aux mains. Les trains venant du front étaient recouverts de grappes de soldats en armes. Ils remplissaient la gare de leur cris et de leurs mouvements, organisaient des meetings, dépêchaient des délégués vers d'autres unités qui se rendaient sur le front, s'embarquaient à nouveau dans les trains et partaient aux cris de "à la maison !" en disparaissant dans la nuit sombre.

- Allez ! le front est f..., siffla joyeusement Vassia, soldat bolchévik dont j'avais fait connaissance en venant à Alexandropol.

Il courut au train qui entrait en gare, s'accrocha au tampon.

- Chamil ! viens, grouille-toi.

Je m'installai dans la cabine du frein.

Ber bi Tiflîsê ve em bi rê ketin.

Çend rojan, li Tiflîs, me nedizanî em çi bikin? Dihate gotin ku li rê, tirên disekinandin., xelk talan dikirin, çek distandin û dikuştin. Rewş endîşenak bû. Digotin ku li nêzîkî Gencê, tirênek perçe perçe kiribûn, heçî tê de bûn çekê wan hatibû standin, û tu kes nedizanî ew biribûn ku ? Mudirê stasyonê nedihişt ku esker bi rê kevin. Ji nişkave, hate gotin ku ji bo bêçek û rêkirina eniyê eskerên ku li Tiflîs bûn, Kozak bi-aniyana... Esker xwe tev dan. Mîtîngek danîn, da ku bizanin li gora vê xeberê, ewê çi bikin? Çekên xwe bidin wan an xwe li ber wan bigirin?... Vasiya diçû û dihat û bi çend eskeran re pistepist dikir.

- Şamil! Ewî dawiyê banî min kir.

Ez nêzîkî wî bûm.

- Gelo tu riya Viladîkokaz dinasî?

Gî li dora min kom bûbûn.

- Belê, ez dizanim. Min vegerandê. Tevî vê yekê tu cara bi peyatî, ez neçûbûm Viladîkokaz.

Me da rê. Panzde rojan em li çiya man, dawiyê, di meha çiriya pêşîn de em gihaştin Viladikokaz.

Li vir bi xwe, tu nîzam tunebû. Esker, bi timamî, tirên zeft dikirin û diçûn Rûsya. Hevalên min xistin serê min ku ez jî bi wan re herim Stavropol. Li Viladîkokaz jî, Hikûmata Miweqet hebû û min li wê tu kes nas nedikir. Min dilê xwe kir ku ez herim ciyên dûrtir, Rûsya, xebatgeha Bolşevîkan...

Bi vî awayî, em gihan Stavropol.

Roja dîtir, ez çûm li hevalên xwe yên partiyê bigerim. Rojeke timam, min her derê bajêr nas kir, bêî ku rastî tu nasê xwe bêm.

Nous partîmes pour Tiflis.

A Tiflis, notre rame resta en souffrance durant quelques jours. Des bruits circulaient qu'on arrêtait les trains en route, qu'on pillait, prenait les armes, tuait. L'ambiance était angoissante. On racontait que, près de Gandja, un train avait été mis en pièces; tous ceux qui s'y trouvaient avaient été désarmés et emmenés on ne sait où. Le chef de gare opposait un refus aux demandes des soldats de les faire partir. Le bruit courut soudain qu'on attendait les Cosaques, appelés à Tiflis. Les soldats s'agitèrent. On organisa un meeting pour résoudre la question de savoir que faire si les Cosaques arrivaient : rendre les armes ou résister ? Vassia allait et venait, tout sombre, et chuchotait avec quelques soldats.

- Chamil, m'appela-t-il enfin.

Je m'approchais.

- Connais-tu le chemin de Vladicaucase ?

On m'entoura.

- Je le connais ! répondis-je, bien que je ne sois jamais allé à pied à Vladicaucase.

Et nous nous mîmes en route. Nous errâmes pendant une quinzaine de jours dans les montages, avant d'avoir atteint Vladicaucase. Enfin, nous y arrivâmes en octobre.

Le désordre régnait ici également. Les soldats s'emparaient de trains entiers et partaient pour la Russie. Les camarades me firent accepter de partir avec eux pour Stavropol. Je vis qu'à Vladicaucase c'était toujours le même Gouvernement Provisoire et que je n'y connaissais personne. Je décidai donc d'aller plus loin, en Russie, où étaient les bolchéviks.

Ainsi on finit par arriver à Stavropol.

Ez vegeriyam stasyonê. Li nav bajêr, bêdengî hikimferma bû. Bi Vasiya re dûr û dirêj li ser rewşa xwe, me axaft. Di dawiyê de, me qerar da ku em hinekî bisekinin. Da ku em ji nêza nemirin, me ji xwe re hemaltî dikir.

Ûsa, me çend roj derbas kirin.

Carekê, li stasyonê ez li şixul digeriyam. Rêwiyek li wê rûniştîbû û li ber lingên wî jî çend çente hebûn ; min xwe nêzîkî wî kir:

- Hemwelat, belkî tu hewcedarê arîkariyê yî? min gotê û çenteyên wî nîşan danê. Ewî, ji ser serê min heya lingên min li min nêrî:

- Gelek baş e, arîkariya min bike, ezê heqê te bidim, ewî li min vegerand.

Min çente danîn milê xwe û em çûn mala wî ku ji stasyonê gelek dûr bû.

Çente pir giran bûn û yek ji wan di pişta min re hate xwar. Tirsiyayî ez sekinîm. Ewî şermezar li min nêrî :

- Min efû bike heval! Ez ji sîngê xwe brîndar im; ji lewre min nedikarî arîkariya te bikim.

Ji min re «heval» got., ez fikirîm û min çente dîsa hilgirtin û em di riya xwe re çûn.

Gava em gihaştin mala wî, ewî heqê min û çay û kolbasa dan min û ji ku dihatim ji min pirsî. Min baweriya xwe pê anî û çîroka rev û hatina xwe jê re go.

- Nexwe tu bolşevîk î? ewî ji min pirsî, bi ken.

- Belê...

Le lendemain, je m'en allai à la recherche des camarades du parti. Je parcourus la ville sans résultat pendant la journée entière.

Je revins à la gare. Dans la ville on sentait un calme expectatif. Avec Vassia Tchougounov nous discutâmes longuement sur notre situation et décidâmes d'attendre. Et pour ne pas périr de faim, nous commençâmes à gagner notre pain en aidant les voyageurs à porter leurs bagages.

Ainsi quelques jours se passèrent.

Une fois, je rôdais dans la gare à la recherche de travail. Un voyageur était assis sur un banc et à ses pieds se trouvaient quelques grosses malles ; je m'approchai de lui.

- Citoyen, vous avez peut-être besoin qu'on vous aide ? lui dis-je en montrant ses affaires. Il me regarda des pieds à la tête.

- Eh bien aide-moi, je te paierai, répondit-il.

Je chargeai les malles sur le dos et nous partîmes. Il habitait loin de la gare. Les malles étaient lourdes et l'une d'elles glissa de mon dos. Je m'arrêtai effrayé. Il me regarda, confus.

- Pardonne-moi camarade, de ne pas t'avoir aidé, mais j'ai été blessé à la poitrine.

Il m'a dit "camarade" pensai-je.

Je rechargeai les malles et les portai à nouveau.

Une fois chez lui, il me paya, m'offrit du thé et du saucisson et commença à me demander d'où j'étais ? Je me sentis de la confiance pour lui et me mis à lui parler de moi et de ma fuite de la maison.

- Kaxitên te hene?

- Çi kaxit?

- Şehadetname yan pirseke borînê.

- Na...

- Ûsa nabe... Lê, binêr min, ezê ji te re tiştekî binivîsim; here vê adresa ha, ewê te qebûl bikin...

Min karta wî girt û bi dilşahî ez çûm ku li Vasiya bigerim.

Roja dîtir em ketin Ordiya Sor. Fermandarê me Mîralay Şpak bû...

- Alors, tu es bolchévik ? me demanda-t-il en souriant.

- Oui...

- As-tu des documents ?

- Lesquels ?

- Certificat ou un mot de passe.

- Non..

- Ça ne va pas ! murmura-t-il. Mais voilà, je vais te donner un mot, rends toi à cette adresse et l'on t'acceptera.

Il me donna un mot et, tout heureux, je courus à la recherche de Vassia.

Le lendemain, on nous enrôla dans l'Armée Rouge, au détachement du commandant Chpak.

## 4- Şerê Hundir

Di sala 1918 de, mifreza me di mintiqeya Salîsk de, Şerê çeteyên Rûsên Spî dikir.

Gava mifreza me girêdayî alaya yekemîn a Stavropolê kirin, hevalê min Vasiya, Çûgûnov di vegirtina Batayisk de, hate kuştin. Piştre, di mintiqeya Tsarîtsîn de, me bi Rûsên Spî re lihevxistin; û di dawiyê de, em çûn ku Stavropol ji çembera Kozakan xilas bikin.

Her wekî, ji leşgergeha wî, ji eniyên din re qiwet rêdikirin, rewşa Stavropol roj bi roj, dijwartir dibû. Çeteyên Spî li dora bajêr xuya kir, û Ordiyên Spî xwe kar kir ku êrîşî bajêr bikin. General Şkûro, eniya me qelaşd û hate me. Piştî şerên xwînrêj, bajar kete destê dijmin. Me xwe kişande gundê Tatarskoye û ji wê jî, bi

# 4- La Guerre Civile

1918. Notre détachement prit part à la liquidation des bandes blanches dans le district de Salsk.

Après la réorganisation du détachement transformé en 1er régiment de Stavropol, j'avais pris part aux batailles sous Bataisk, où je fus blessé. Vassia Tchougounov tomba à la prise de Bataisk. Plus tard, notre régiment combattit les Blancs dans la région de Tsaritsine. Ensuite, il partit pour défendre Stavropol contre les bandes cosaques qui l'entouraient.

En raison du rappel des forces principales sur d'autres fronts et de la diminution de la garnison, la situation de Stavropol devenait tendue. Des bandes de Blancs apparurent aux environs. Des unités de gardes blancs se concentrèrent vers la ville. Le général Chkouro, ayant percé le front, poussa l'offensive. Après des combats acharnés, la ville se rendit.

ber êrîşekê, me xwest ku em bajêr dîsa bêxin destê xwe. Du caran, em gihaştin nav bajêr, lê her du caran jî em bi şûnda vegerandin. Di van lihevxistinan de, yek ji fermandarên me yên mêrtir û hêjatir, heval Şpak hate kuştin. Ji gundê Tatarskoyê, me xwe kişande ser Nevîmoskaya. Di van şeran de, ez ji bo caran sisiya brîndar bûm, lê min xwe ji sefan dûr nexist. Ji bo êrîşa Stavropol, li ber çemê Manîç, bergeheke nû hate danîn. Bi mifrezeyên piçûk, me avêt ser bajêr, lê, li Medvêdka em bi şûnda hatin êxistin. Li wê, nexweşiya tîfûs ez avêtim erdê. Bi birîndaran re ez birim Piyatîgrosk û ji wê Viladîkokaz.

Li wê jî, bi nexweşiya paratîfoîd, ez dîsa ketim nav nivîna. Ez hêdî hêdî hatim ser xwe. Tîfûs, û paratîfoîd, ez yekcar ji qewet xistibûm û xwarina xestexanê jî nedihate xwarin. Hingê, Çeteyên Rûsên Spî, dest bi êrîşê kir. Rojekê, me dengê topa bihîst. Xestexane, wek kumîroyekê fûrî, kelekel bû.

- Rûsên Spî... Rûsên Spî... Ev pirs li dora me, ji devê her kesî derdiketin. Ên ku dikarîn ji piya bisekinin, lez didan xwe ku ji xestexanê derkevin.

Li cem min Kozakek ji Kûban hebû; rabû ser xwe û cilê xwe xwest.

- Tu diçî? Min jê pirsî.
- Herê.
- Ku da?
- Xwebigehînin ordiya xwe.
- Lê, ka binêr! Tu bi zor xwe li ser piya digirî...
- Xem nake, li derve, ezê xurt bibim. Ma tu

Nous nous retirâmes au village de Tatarskoie, faisant une dernière tentative de reprendre la ville par une contre-attaque. Par deux fois, on s'en approcha, prit les carrières, mais on recula de nouveau ayant perdu, dans ces engagements, un de nos meilleurs et plus braves commandants, le camarade Chpak. Du village de Tatarskoie, nous nous repliâmes en combattant sur Nevinnommyskaia. Dans ces combats, je fus blessé pour une troisième fois, mais je restai sur les rangs. A Sviatoikrest, un nouveau plan d'offensive sur Stavropol fut élaboré, par le fleuve Manytch. Répartis en de petits détachements, nous approchâmes de la ville, mais fûmes refoulés à Medvedka. Là, le typhus expanthématique me terrassa et je fus envoyé avec les blessés à Piatigorsk et de là à Vladicaucase.

Je tombai à nouveau malade de la fièvre para-typhoïde. je me remettais lentement. Le typhus et la fièvre paratyphoïde que j'avais contractés avaient définitivement épuisé mes forces et la nourriture de l'hôpital était mauvaise. C'est alors que les gardes blancs commencèrent l'offensive. Un beau jour, la canonnade se fit entendre. L'hôpital entra en effervescence comme une fourmilière alarmée.

- Les Blancs... les Blancs... ! entendait-on partout à l'entour. Et tous ceux qui pouvaient tenir debout s'empressaient de quitter l'hôpital.

A côté de moi était alité un Cosaque du Kouban. Il se mit à réclamer son uniforme.

- Tu t'en vas ? lui demandai-je

- Oui !

- Où ?

- Rejoindre mon corps

- Mais regarde-toi, tu tiens à peine debout !

dixwazî ez li vir bimînim da ku Stanişkirî (hêzên Rûsên Spî) bên û min bidin ber şûran ?

Kozakê me ji xestexanê derket. Min dil kir ku ez herim, lê, ez ewqas sist bûm ku bê arîkariya tu kesî, min nedikarî li odeya xestexanê bixwe bimeşim.

«Çiqas ji min bê, ezê xwe zû rahet bikim!»

Ev xwestin di min de ewqas xurt bû ku, yek dikare bêje, ewê di çend rojan de ez bi qewet kirim. Di nav odê de ez êdî, bi tena xwe dimeşiyam, nêzîkî pencereya dibûm û guhê xwe dida dengê tifingan.

Şer êdî, li nav bajêr çêdibû. Rojekê, serê sibê me bihîst ku Rûsên Spî ketine nav bajêr û ew girtine. Piştî çend saetan, Kozak hatin xestexanê ; ew di nav nexweş û brîndaran de li Kozakên komunîst ên navçeya xwe digeriyan; gava ji wan didîtin ew di cî de dibirin hewşê û ew didan ber qundaxên tifingan û piştre dikuştin.

Serê minê rût û riha min a li xestexanê dirêjbûyî, şik xiste dilê wan ku ez cuhî me.

- Tu cuhî yî! Digotin min, her du milên min digirtin û ez dihejandim.

- Na, ez Tirk... Kurd im.

- Tu derewa dikî û ev?... Berde!... Binêrin... Bi zor derpiyê min daxistin. Min digote wan ku ez misilman im û ku... Şewata derbekê qûndaxa tifingê, gotinên min dan birîn. Ez avêtim erdê û bi kulman bi min ketin. Di vê gavê de, Sertebîb xwe gihande hewara min.

- Ce n'est rien, je me ragaillardirai à l'air. Puis-je attendre ici que les Stanitchniki arrivent et me sabrent ?

Il partit... J'aspirais moi aussi à m'en aller, mais j'étais si faible que si, personne ne m'aidait, je ne pouvais même pas marcher dans la chambre d'hôpital.

«Me rétablir, au plus vite, au plus vite !»

Ce désir était si fort, qu'il m'a aidé peut-on dire, à vaincre ma faiblesse en quelques jours. Je commençai à me déplacer tant soit peu dans la chambre, je m'approchais des fenêtres et écoutais la fusillade.

Les combats se livraient déjà aux abords de la ville. Un matin, nous apprîmes que les Blancs avaient occupé la ville. Quelques heures après les Cosaques firent irruption dans l'hôpital. Ils cherchaient parmi les malades et les blessés, des Cosaques communistes de leur stanitsa, et leur rendaient justice sur place, en les fustigeant avec des baguettes de fusil et en les passant par les armes dans la cour.

Mon aspect, tête rasée et barbe noire qui m'avait poussé, éveillèrent chez eux, le soupçon que j'étais juif.

- Tu es juif ? me disaient-ils en me secouant.

- Non, je Turc... Kurde...

- Tu mens... et çà ?... montre voir ! Ils arrachèrent mon linge. J'avais beau leur persuader que j'étais musulman, et que... La forte brûlure d'un coup de baguette de fusil coupa court à mes explications. On me renversa sur le lit en me rouant de coups. A ce moment, le médecin chef accourut.

Il avait les pattes d'épaules d'officier.

- Qu'est-ce que c'est ?... Que faites-vous ! cria-t-il.

- On règle son compte à un youpin, Votre Honneur...

Li ser milên wî nîşanên zabitan hebûn :
- Ev çi ye? Çi dikin? Ewî qîr kire Kozakan.
- Ez benî, em hêsabê cuhîyekî dibînin...
- Kê gote we ku ev cuhî ye?...
- Cuhî bi xwe ye. Ez benî... Li vir, temaşe bike!...
- Ev Kurd e, misilman e... Wî di cî de berdin!...

Kozakan, şaşbûyî, ez berdam; lê ne bi dilê wan bû. Gava derdiketin qîr kirin min:

- Emê dîsa bêne te, tu ji destê me nafilitî...

Wê şevê, ji derban ketî, mest û helak, min ji nexweşnêr hêvî kir ku ji min re cilekî peyda bike. Ên hevalên me yên mirî, giş li wê bûn. Pîrê ji min re pantalonek qetiyayî û çakêtek anîn. Ber bi sibê ve, min xestexane berda, û li derve, rastî Ermeniyên mihacir hatim ku bi min gelek şa bûn. Yek ji wan, Xaço, nasekî me yê kevn bû.

Li bajêr, talan û vegirtina xaniyan bê perwa dom dikir. Xwe veşartin dijwar û bi xeter bû. Xwediyên xaniyan ji bo nefsa xwe dilerizîn. Tu kes nedikarî gazinan ji wan bike, ji ber ku li kuçan, li ber deriyan, komunîst, eskerên Ordiya Sor û herçî kesên ku ew vedişartin didan ber tifingan an bidarve dikirin. Li nav bajêr ger bi xwe, bi xeter bû; eger hema kêfa Kozakekî serxweş an zabitek bi rûyî yekî nehata, di cî de, te dikişandin xwendegeha eskerî ya "navdar" û kes ji wê sax dernediket.

Dawiyê, jina Xaço, derketina min ji mal minasibtir dî. Êvarekê Xaço ji min re nan û kartol dan û ez bi rê ketim. Bi şevê, ez ji bajêr derketim; armanca min ew bû ku di eniya Rûsên Spî re derbaz bim û xwe bigehînim bajarê Astraxanê.

- D'où prenez-vous que c'est un juif ?..

- Un vrai Votre Honneur... Voilà, admirez....

- C'est un Kurde, un musulman !... Lâchez-le à l'instant.

Les Cosaques interloqués, piétinaient sur place et me lâchèrent à regret.

- Çà, on reviendra te chercher, promirent-ils en quittant l'hôpital.

Cette même nuit, roué de coups, tenant à peine debout, je suppliai l'infirmière de me donner un vêtement quelconque. Il y en avait des quantités ayant appartenu à des partisans morts. La vieille m'apporta un veston déchiré et un pantalon. Vers le matin , je quittai l'hôpital et retrouvai des réfugiés arméniens qui me firent bon accueil. L'un d'eux, Khatcho était une vieille connaissance du pays.

Des perquisitions générales et le pillage allaient leur train dans la ville. Il était difficile et dangereux de se cacher; les propriétaires tremblaient pour eux-mêmes, et on ne pouvait le leur reprocher puisque, dans les rues, devant les maisons mêmes, on fusillait et on pendait à des poteaux des communistes partisans de l'armée rouge et les personnes qui les avaient cachés. Il était même dangereux de se montrer en ville. Il suffisait que ta tête ne fut pas du goût du premier Cosaque ivre rencontré ou d'un officier, pour que, sans autre forme de procès, on te traînât à la "fameuse" école des Cadets d'où personne ne sortait vivant.

Finalement, la femme de Khatcho exigea que je quittasse leur maison et Khatcho lui-même, un soir, après m'avoir donné du pain et des pommes de terre, me pria de partir. Je m'en allai dans la nuit, décidé à rejoindre Astrakhan en passant par le front des Blancs.

Piştî çend rojan ez gihaştim gundê Qîzler. Min ne pere ne jî nan hebû.

Ermeniyekî dewlemend ez birim cem xwe ku ez jê re bexçevaniyê bikim.

Hema, li derva razan, xwarineke ne xirab tesîra xwe nîşan dan. Min dest pê kir bi lez werim ser xwe. Digotin ku di van rojan de, Soran, di nav zilan de xwe dabûn xuya kirin. Bi kêfxweşî min guh dida van xeberan û ji bin de jî min xwe pêk tanî ku ez dom bi riya xwe bikim. Piştî çend rojan, firseteke xweş kete destê min.

Carekê, çend zabitên serxweş hatibûn bexçeyê me. Efendiyê min ji wan tirsiyayî, ji wan re xwarin, vexwarin, jin anîn û sefahet dest pê kir. Wê şevê heta sibê, heya ji serxweşî bêhiş ketin, vexwarin. Hinek ji wan, mestbûyî, li bexçe, li bin stêran raketin.

Wê şevê, xew qet neket çavên min û min seyra sefaheta wan a kirêt kir. Gava giş serxweş ketin min xistê eqlê xwe ku ez çekên wan bidizim û xwe bavêjim nav zilan. Du tifingên Kozakan, li ber masê avêtî bûn, lê, rext li raketiyan bûn. Min bêhna xwe girt û çar lepika, xwe gihande Kozakekî, rextê wî birî, tifing girt û ji wê reviyam. Mideteke dirêj, bêî ku rastî hevalên xwe yên Sor bêm, ez di nav zilan de geriyam. Ji teab ketî, min xwe dirêj kir ku hinekî bêhna xwe bistînin. Hindik mabû ku ez di xew herim, çend zilaman xwe avêtin min û di nav milên xwe de ez givaştim. Min zor da xwe ku ji destê wan bifilitim, lê ez xurt girtibûm û li berîkên min digeriyan. Min baş li rûyê wan nêrî û ji

Quelques jours plus tard, j'arrivai à Kizlar. Je n'avais ni argent, ni pain.

Je m'embauchai chez un riche Arménien pour travailler au jardin.

L'air, le sommeil à la belle étoile, la nourriture supportable, produisirent leur effet. Je commençai à me rétablir rapidement. Entretemps des bruits circulèrent que les Rouges étaient apparus dans les roseaux. En écoutant avec émotion ces conversations, je me mis à réfléchir qu'il était temps pour moi de continuer mon chemin et je commençai à m'y préparer. Une occasion propice se présenta bientôt.

Une fois, quelques officiers éméchés étaient venus dans le jardin de mon patron. Celui-ci effrayé par leur apparition inattendue, leur proposa un dîner et du vin. On amena des femmes et la débauche commença. La beuverie continua toute la nuit jusqu'à ce qu'ils furent ivres-morts. Quelques-uns s'écroulèrent et s'endormirent dans le jardin.

Je ne dormis pas de la nuit, contemplant cette débauche éhontée. Lorsqu'ils furent tous ivres, je me décidai à m'emparer de leurs armes et à me sauver dans les roseaux.... Deux fusils de Cosaques gisaient près de la table, mais les cartouchières se trouvaient sur les dormeurs. Retenant mon souffle, je rampai vers un Cosaque, coupai la cartouchière et m'esquivai en m'emparant du fusil. Pendant longtemps, je ne parvins pas à découvrir les Rouges et rôdai en vain dans la jungle de roseaux. Fatigué de cette journée, je m'étendis pour me reposer. A peine allais-je m'endormir que je sentis plusieurs personnes qui me serraient à bras le corps. Je voulus me dégager, mais on me tenait serré et déjà on me fouillait. Je regardai attentivement les visages des hommes

nişkave, kenekê ez girtim. Nexwe, ew bûn... Fedaiyên me yên sor bi xwe bûn.

Gava zanîn ez kî me, ez birim mifrezeya canbêzaran. Li çiyan, li dar û deviyan me xwe diveşart û me davêt ser tirênên çek û posatşer û yekîneyên piçûk ên Rûsên Spî. Me riya eskerên General Dratsenko ên şikestî digirt û gelek xisar didan ordiya Şkûro ya tarûmar bûyî. Di van rojan de, Ordiya Sor jî, eskerên General Denîkîn, ji Xarkof derdikirin.

Di bihara sala 1920 de, li Georgîviyesk, me xwe gihande Ordiya Sor.

Li Qefqasyaya Bakur, dijminên Şoreşa Sor şikestibûn û hemû eniyên şer ji wan pak bûbûn. Em, şerevan bi xwe, çûn eniyeke nû, eniya ava û sazkirina aboriya (iqtisadiya) wêran a Qefqasya ya sovyetî.

qui m'entouraient et soudain j'éclatai de rire... Au fait, c'étaient donc eux les partisans rouges !

Quant on sut qui j'étais, on m'accueillit au détachement des partisans. Nous cachant dans les forêts et les montagnes, nous nous livrions à des coups de main sur des trains, des équipages, et de petites unités de Blancs battant et infligeant des échecs aux éléments en retraite du général Dratsénko et aux restes de l'armée Chkouro, tandis que l'Armée rouge chassait de Kharkov les bandes blanches de Denikine.

Au printemps de 1920, à Gueorguievsk, nous opérâmes la jonction avec l'Armée rouge.

La contre-révolution était écrasée au Caucase du Nord. Les fronts furent liquidés et nous, les combattants, nous partîmes sur un nouveau front, celui de l'édification pacifique et de la reconstitution de l'économie ruinée du Caucase soviétique.

## 5- Veger

Salên Şerê Hindur, ji bo mideteke dirêj, ji Kurdistan, ji welatê min ez bi dûr xistibûm. Di sibata sala 1924 de, partiya me ez rêkirim Ermenistanê da ku li wê, di nav Kurdan de bixebitim. Komîteya Navendî (Licne Merkezî) ya Partiya Komunîsta Ermenistanê, ez hînkerê komîteya navendî û endamê şûba «Eqeliyatên qewmî» tayin kirin. Ji wê rojê de, rûpela jiyina min a nû dest pê kir. Min xwe xist dijminên sedsalan : şerê axa, Taşnaq û began, da ku li şûna wan, li warên koçer û li gundên sovyetan pêk bînin.

Bi dilxweşiyeke mezin, min çiya û çêreyên welatê xwe dîtin, ciyên ku di piçûkahiya xwe de, min bi bav û brayên xwe re keriyên xelkê çêrandibûn.

Mij hin bi hin stûrtir û bi xoftir dibû û serê Axrî yê bi ewir, ji min vedişart. «Dê û bavên min, hîn sax in gelo?». Di dilê xwe de min ji xwe dipirsî û sibê zû hêdî hêdî, nêzîkî çiyayên gundê xwe yên kesk dibûm.

# 5- Le retour

Les années de la guerre civile m'avaient arraché pour longtemps au Kurdistan, ma patrie. Ce n'est qu'en février 1924 que le parti m'a envoyé en Arménie pour travailler au milieu de la population kurde. Le comité central du parti communiste d'Arménie me nomma membre de la sous-section des minorités nationales et instructeur du comité central. A partir de ce jour, commença une nouvelle page de ma vie, dans la lutte contre les exploiteurs séculaires, les beks, les Tachnaks et les princes féodaux, pour l'établissement des soviets dans les camps de nomades et les villages kurdes.

Avec un sentiment de joie, je revis mes montagnes natales, les pâturages où, tout enfant, j'avais gardé les troupeaux des autres avec mon père et mes frères.

Le brouillard s'accumulait, sévère, cachant dans les nuages, la cîme de l'Ararat. "Mes vieux sont-ils vivants ?" pensai-je ému, en m'approchant, tôt le matin, des montagnes verdoyantes de mon village natal.

Va ne holikên me, yên di erdê de temirî! Lê çi qewimiye? Gundên Kurdan giş vala bûn. Derî û pencereyên xaniyan vekirî bûn... Çi bi gundiyan hatibû? Morove li ku ye ?... Bavo, yadê ?... Ez daketim newalê. Di çemê şile re ku sînorên gundên ermenî û kurd pêk tîne, derbas bûm û li ber xaniyê pêşîn sekinîm. Ermeniyekî porspî, di bîstanekî de erd dikola.

- Heval! Min gotê, Kurd li ku ne?

Ewî çavên xwe yên nîv-kor rakirin ser min, bi milê xwe xweydana xwe paqij kir:

- Gelo tu nizanî? Ewî bi bê bawerî, vegerande min û dîsa zivirî şixulê xwe.

- Guh bide min, min gotê û ji hesp hatim xwar. Bêje min, diya min, bavê min Şemo, li ku ne?

- Şemo? Ma tu nû hatiyî?

- Belê.

- Ew giş çûne... Kalo destê xwe dirêjî çiyan kir.

- Ku da?

- Ser çiyayê Alagozê.

- Alagozê? Ji mêj ve?

- Belê, ji mêj ve. Here li wan deran bigere...

Piştre, kalo, pişta xwe, bi awakî welê da min, min fehim kir ku êdî tu gotinên wî nemabûn.

Piştî ji mal derketina min bi çend rojan, hikim ketibû destê partiya Taşnaq. Ev partiya Ermeniyên dewlemend, a dijminên sewrê, bû. Armanca wê ev bû: pêkanîna Ermenistanekî ji deryakê heya derya din ango ji Derya Reş heya Derya Spî. Ji bo bicîhanîna vê

Les voilà les sakla enfoncées dans le sol. Mais quoi ? Tous les villages kurdes étaient vides. Les sakla regardaient par les ouvertures béantes des portes... Où sont passés les hommes ?..... Où est Morové ?.... le père ? la mère ?... je descendis dans la vallée, traversai le ruisseau trouble qui séparait les villages kurdes et arméniens et arrêtai mon cheval à la première sakla. Un Arménien aux cheveux blancs, bêchait autour des arbres d'un jardin.

- Camarade dis, où sont les Kurdes ?

Il leva sur moi ses yeux mi-aveugles, essuyant d'un revers de manche la sueur de son visage.

- Est-ce que tu ne le sais pas ? dit-il avec méfiance, reprenant sa bêche.

- Ecoute ! dis-je en descendant de cheval. Dis où est mon père, ma mère, Chémo ?

- Chémo ? serais-tu un nouveau venu ?

- Oui !

- Ils sont tous partis... fit-il, en indiquant de la main la direction de la montagne.

- Où ?

- Sur l'Alagoeuz

- Alagoeuz ? Il y a longtemps ?

- Il y a longtemps, cherche par là-bas... et le vieux se détourna, laissant entendre qu'il n'avait plus rien à dire.

Peu après mon départ de la maison, le pouvoir était passé aux mains du parti Tachnak. C'était un parti contre-révolutionnaire de la grande bourgeoisie d'Arménie qui, dans son programme, s'était fixé le but de créer une Arménie "d'une mer à l'autre" c'est-à-dire, de la Mer noire à la Méditerrannée. Pour le réaliser, il avait décidé d'anéantir les

armancê, ewê qelandina Kurd û Tirkên Ermenistanê danibû ber xwe, da ku timamî paşiya xwe ji wan pak bike û piştre bi hemû qewetên xwe, xwe bavêje ser Tirkiyê.

Ji lewre, nihu min gund vala didîtin û ezab û şkenceyên xebatker û feqîrên kurd, dihatin ber çavên min. Kurdên ku min li bakurê Qefqasyê, dîbûn, ji min re qala zilma Taşnaqan kiribûn. Çeteyên Taşnaq, bi çekên ku Ordiya Çar li Ermenistanê hiştibûn, gundên kurd û tirkmen, talan û wêran dikirin.

Lê, eşîrên ku, wek Sipkî, Hesenî û Zurkî, serekên wan hikmê partiya Taşnaq qebûl kiribûn, li ciyê xwe mabûn. Mezinên wan ritbe û nîşan standibûn. Hinek ji wan bûbûn efser (zabit). Van axa û began, ji Taşnaqan re eskerên kurd pêk anîbûn û pê, bi hevaltiya Taşnaqan, feqîr û xebatker diqelandin. Li ser her mifrezekê kurd, Taşnaqan yek ji zilamên xwe yên mixlis datanîn. Li miqabilê vê arîkariyê, begên kurd ji nûve, sixreyên derebegitiyê danîbûn, heta ewên ku di zemanê Çar de bi xwe hatibûn rakirin jî. Xebatker, êdî ji taqet diketin. Taşnaq, mawzer di dest de di bin emrên ximpabêt (serekên çete) ên xwe, li gora dilê xwe, dikuştin, talan dikirin, dişewitandin, xelk didan ber şûran. Tu kesî nedikarî serê xwe li ber hovîtiya wan rake. Serekê eşîra Zerkî, Cangîr axa, bûbû serfermandarê quwetên kurdî yên «dilxwaz» û ritbeya serheng (mîrelay) standibû. Yusif Beg Teymûrof jî, di parlementa Taşnaqan de nemînende bû.

Beg har bûbûn. Kê bi emrê wan nedikir, heya bikeve ber mirinê, dihate lêxistin; milk û pez û dewarê

Kurdes et les Turcs qui vivaient en Arménie, de nettoyer ainsi ses arrières et de jeter toutes ses forces sur le front contre les Turcs.

C'est pourquoi je voyais maintenant ces saklas détruits et de nouveau, se dressaient devant moi les horreurs qu'avaient vécues les travailleurs kurdes sous le pouvoir Tachnak. Je connaissais ces horreurs d'après les récits des réfugiés kurdes que j'avais rencontrés dans les villes du Caucase du Nord. Des détachements Tachnak, profitant des armes restées de l'ancienne armée tsariste, dévastaient et anéantissaient les villages kurdes et turcs, en les livrant au fer et au feu.

Mais des tribus, comme par exemple, les Sipki, les Hasani et les Zukri, dont les chefs avaient proclamé leur soumission au pouvoir Tachnak, étaient restées sur place. Leurs notables reçurent des grades, des épaulettes et des médailles; certains, parmi eux, furent promus officiers. Toute cette meute féodale organisa des formations de volontaires pour assister les Tachnak et, d'accord avec eux, supprimait les pauvres. A chacune de ces formations, les Tachnak affectèrent leurs instructeurs dévoués. En compensation de cette assistance, les féodaux kurdes se virent reconnaître le droit de rétablir les corvées féodales, même celles que le gouvernement du Czar avait abolies. La population laborieuse n'en pouvait plus. Les Tachnak, armés de Mausers, dirigés par leurs khmbapète pillaient, incendiaient, sabraient et personne ne pouvait résister à cet arbitraire sauvage. Le chef de la tribu des Zurki, Djanguir Agha, fut nommé commandant en chef des détachements kurdes "volontaires" et promu au grade de colonel, tandis que Ousoub Beg Teymourov était membre du Parlement Tachnak.

wî jê dihatin standin. Ji bo Ordiya Tasnaq, bêşên bilind hatibûn avêtin ser xelkê, dewar û zadên wan, bê hisab û kitêb, dihatin zeft kirin. Lê, para şêr, dîsa di destê began de dima. Egîd Beg Teymûrof ji aliyê Taşnaqan serekê eşîra Şerqî tayin bûbû. Herwekî, Şerqiyan êdî nedikarîn hikmê Taşnaqan hilgirin; li deşta Serdar-Abad isyan kiribûn û danîna hikmê Sovyetan xwestibûn. Ji bo şerê wan, Taşnaqan li bin fermandariya Garo Sasonî, ordiya xwe rêkiribûn. Eşîra Şerqî ya piçûk, bê çek û bê arîkarî nedikarî li ber alayên Taşnaq ên heya diranên xwe çekkirî, xwe pir bigire. Isyana wan neçû serî û rebena ji destê Taşnaqan, şkenceyên li tu deran nedidîtî kişandin; her tiştê wan hate hilweşandin û ew bi xwe di xwîna xwe de hatin xeriqandin...

Çend rojan, bi hêviya peydakirina dê û bavê xwe, ez gund bi gund geriyam, lê, tu kesî nedikarî min li ser wan ageh bike. Herwekî Kurd girêdayî adetên xwe bûn, gava min behsa wan dikir, serê xwe xwar dikirin û bê deng diman.

Hingê, min zanî ku felaketek hatiye serê dê û bavê min. Min berê xwe da Alagozê, cem Kurdên koçer. Di niqtek polîs de min bi xwe re cendirmeyek bir û êvara roja dîtir, hêdî hêdî, di şiverêyeke teng re, em gihaştin çiyê. Hespên me di kaşa çiyê re bihn çikandî bi rê ve diçûn.

Bîsteke dî em ketin merceke piçûk. Li vê, li wê, ber bi geliyê ve, konên reş hatibûn danîn. Li ber konekî, Kurd kom bûbûn; em li cem wan sekinîn û ji wan hêvî

Les beks étaient en fureur. Ils battaient à mort ceux qui s'opposaient à la mobilisation, enlevaient le bétail et le blé. La population était frappée de taxes insupportables; pour l'armée Tachnak, on réquisitionnait les bêtes et les céréales, la part du lion du tout restant entre les mains des beks. Aguid Bek Teymurov, était nommé par les Tachnak chef de la tribu des Kurdes Charki. Les Charki las de supporter les exactions et les horreurs du pouvoir Tachnak, s'étaient soulevés dans la vallée de Serdar-Abad, réclamant l'établissement du pouvoir des soviets. Les Tachnak envoyèrent contre les Charki leur armée sous le commandement de Sasuntzi-Karo. La petite tribu des Charki, mal armée, ne put resister longtemps aux détachements Tachnak armés jusqu'aux dents. La révolte fut réprimée. Les Charki subirent des tortures cruelles et un châtiment sanglant: tout fut détruit et noyé dans le sang.

Durant plusieurs jours je fis la tournée dans les villages kurdes avec l'espoir de retrouver mon père, mais personne ne pouvait rien me dire à son sujet. Fidèles aux usages, les Kurdes se détournaient et se taisaient quand la conversation touchait à mes parents.

Je commençai à deviner qu'un grand malheur était arrivé à mes parents et je me dirigeai dans les montagnes vers les camps nomades des Kurdes de l'Alagoeuz. Dans un poste de police, je pris un milicien, et vers le soir du lendemain, nous suivions lentement un étroit sentier qui menait à la montagne. Les chevaux, en gravissant la pente rapide du versant s'essoufflaient.

Bientôt se décrouvit devant nous une une petite pelouse avec des tentes dispersées le long du défilé. Nous nous

kir ku konê serekê sovyeta koçeran şanî me bidin. Giş bê deng li hev nêrîn û destê xwe dirêjî deştê kirin :

- Sovyet li wê ne, cem me, li vir, hîn beg û şêx in.

- Ev çêre, ya kîjan eşîrê ye? Min pîrsî.

- Ya eşîra Hesenî ye.

- Serek kî ye?

- Elîxan Beg Teymûrof, yekî ji wan got. Û serekê çêre jî, Şêx Silêyman e. Tu bê feyde pirsa sovyetan dikî.

Piştre konekî mezin û zengîn şanî min da û bi ser de ajot :

- Mistefa Beg Teymûrof hatiye; ew hez nake ku Kurd behsa sovyetan bikin.

Zilamekî bejin kin, ji kon derket û ber bi me ve hat. Ji kemera wî ya zîv xencerek daleqandîbû. Di destê wî de, qemçiyeke bi qebda zîvîn hebû. Kurdan, li ber wî xwe heya erdê tewandin.

- Çi dixwazin? Bi rûsî, ewî ji me pirsî.

- Îşê me bi serekê sovyetê re heye, bi nermî, min vegerandê.

Mistefa Beg kenî.

- Êl-begî pismamê min e, û mala wî ha li wê ye! Ewî gote me û bi destê xwe newalek, di mija êvarê de nîv-xuya, şanî me da.

- Spas, min gotê û hespê xwe ji nû ve ajot.

Li ber devê newal, bi tenê bi kevir dora wan girtî, konên Kurdên feqîr hebûn. Li ber deriyê yekî ji wan, jinikeke bejin bilind û porspî, disekinî. Min silav lê kir; rû û dengê wê tiştek ji zarotiya min a dûrketî anî bîra min.

approchâmes de la tente autour de laquelle des Kurdes étaient groupés et nous les priâmes de nous montrer la tente du président du soviet nomade. Ils se regardèrent en silence et avec étonnement, puis l'un d'eux , d'un air morne, dit, tendant la main vers la plaine :

- Les soviets sont là-bas, chez nous, ce sont encore les beks et les cheikhs.

- A quelle tribu est -ce pâturage ? demandai-je.

- A la tribu des Hasani.

- Et qui est le chef ?

- Ali Khan Bek Teymurov dit quelqu'un et le chef de notre pâturage est le Cheikh Suleyman. C'est à tort que tu t'enquiers des soviets !

Ensuite, me montrant une grande et riche tente, il ajouta :

- Mustapha Bek Teymurov est arrivé. Il n'aime pas que les Kurdes parlent des soviets.

Un homme de petite taille sortit de la tente et vint vers nous. A sa ceinture d'argent repoussé pendait un poignard. Il tenait un fouet à manche d'argent. Les Kurdes saluèrent bien bas.

- Que demandez-vous ? nous interpella-t-il en russe.

- Nous avons besoin du chef principal du soviet, répondis-je calmement.

Moustapha Bek sourit.

- *El-begui* (le chef de la tribu) est mon cousin, dit-il. Il vit là-bas et il montra une grande vallée qu'on apercevait dans la brume du soir.

- Merci, dis-je en remettant le cheval en marche.

A l'entrée de la vallée, serrées contre les pierres nues, se trouvaient les *kone* des pauvres. A la porte d'une des tentes

Min bala xwe dayê.

- Xaltîka Parê! Min qîr kirê û ji hesp hatim xwar. Ew, tirsiyayî xwe bi şûn de da.

- Ez Ereb im, Ereb Şemo. Ez nayim bîra te, Xaltîka Parê?

- Na, tu ne Ereb î, tu bê simbêl î, te rûyê xwe kur kiriye! Ewê bi hişkî gote min.

- Kurkirî ?

Hingê hate bîra min ku li cem Kurdan, kurkirina simbêl guneheke mezin bû !

Min gelek xwe westand da ku baweriya wê bînim ku ez Ereb Şemoyê şivan bi xwe bûm, ku pir caran, ewê ez ji destê bavê min derêxistibûm, gava ewî dikir ku li min xe. Ser van gotinan, êdî tu şikên wê nemabûn û bi kenekê dilxweşiyê ez ezimandim mala xwe. Em ketin konê wê yê dîsa weke berê perîşan. Di cî de, Xaltîka Parê, xwe da xebatê da ku ji me re xwarinekê pêk bîne.

- Ereb, çi hatiye serê te? Mûyên spî ketine porê te... Û destê xwe li ser serê min gerand.

Min hingê behsa Rûsyaya Sovyetî û şerê hundir kir, û ji vî bi şûnda, Kurd êdî çawa wê bijîn, gotê. Bi şev dereng, Gelo, mêrê Xaltika Parê, hate mal. Ewî, ji sibê heya wê demê, şixulê begê xwe dikir. Gava bihîst ku ez kurê Şemo me, bi kêfxweşî silav li min kir û rûnişt. Dûr û dirêj li ser jiyana Kurdan me ji xwe re axaft.

Çar şal bûn ku nîzama sovyetî, li Ermenistanê hatibû danîn, lê, gundî û koçerên kurd, dîsa wek berê bi isûla eşîrtî dijîn, li ser wan, dîsa axa an kurên wan hikim

se tenait une grande femme à cheveux blancs. Je la saluai. Son aspect et sa voix me rappelèrent quelque chose de mon enfance lointaine. Je la fixai.

- Tante Paré ! m'écriai-je joyeux, en sautant du cheval. Elle recula étonnée.

- Je suis Ereb, Erebé Chémo. Tu te souviens de moi, tante Paré ?

- Non, tu n'est pas Ereb... Tu n'as pas de moustaches, tu es rasé, dit-elle sévèrement.

- Rasé ?

Je me rappelai alors que, d'après les usages kurdes, se raser les moustaches est un terrible péché !

J'eus longuement à la convaincre que j'étais ce même berger Erebé Chémo, que, si souvent dans sa tente, elle avait caché de son père, quand il voulait me punir de quelque polissonnerie. Cela dissipa ses doutes et, avec un sourire de joie, elle m'invita chez elle. Nous entrâmes dans sa tente toujours aussi pauvre. Elle s'affairait à préparer de quoi nous régaler.

- Ereb, qu'est-ce qui s'est passé sur ta tête ? Regarde, tu as déjà des cheveux qui grisonnent !... et elle me caressa la tête.

Je lui parlai alors de la Russie soviétique, lui racontai la guerre civile et comment les Kurdes vont vivre désormais. Tard dans la nuit, rentra Guélo, son mari, qui avait travaillé la journée entière pour son bek. Ayant appris que j'étais le fils de Chémo, il me salua joyeusement et nous bavardâmes longtemps de la vie des Kurdes.

Bien que quatre années se soient déjà écoulées depuis l'établissement du pouvoir soviétique en Arménie, les villages et les campements nomades des Kurdes continuaient à

dikir. Hîn, meclisên eşraf û dewlemendan hebûn, û şêx jî ji aliyê xwe gundî û rencberên kurd bi navê dîn tazî dikirin.

Isûlên istismara Kurdan weke berê diman, bi tenê rengê wan guhirîbûn : nihu, axa û beg şûna ku rast bi rast bi destê xwe, xelkê biêşînin û malê wan bixwin, şêx didan pêşiya xwe. Perçeyên erd, çêre û zozanên baştir, di destên beg û gundiyên dewlemend de bûn. Û yên ku bi kêrî tu tiştî nedihatin, ji gundiyên feqîr, rencber, belengazan û hin piyan re hatibûn hiştin. Keriyên began, bi hezaran ve serî ji bêşan miaf bûn, ji ber ku xwediyên wan li ser hikim bûn. «Edalet» jî bi awayê berê dîsa bi destên began dihate bi cîh anîn. Di nav eşîrê de, ji bo neheqî û mixalefetekê, axan û bega pez an pere distandin, bê şik ku ji bo xwe, lê ne ji bo yên ziyandîtî. Xelk hîn xûkî didan beg û axan; lê nihu jê re *recû* ango diyarî digotin ! Zilamên began ên xas hebûn, ku xweş têrkirî, li her derê, pesnê begên xwe didan û ew parazkerên Kurdan didan zanîn. Gava nemînendekî sovyetî dihate wê derê, ev xulam diçûn pêşiya wî û li singê xwe dixistin û qîr dikirin ku di nav eşîrê de hikim gelek baş e û feqîr ji her tada û neheqiyê hatine parastin. Kurd ciyên qemçiyên began xweş tanîn bîra xwe lê nediwêrîn rastiyê bibêjin nemînendeyên sovyetan. Ji çîrokên Gelo, yekî xweş his dikir ku ev Kurdên perîşan li riyekê digeriyan ku ji vê rewşa dijî qanûn xelas bibin. Gava Gelo bihîst ku ez ji Erîvanê hatibûm rêkirin da ku Kurdên feqîr bigehînim hev, erd û çêre ji destên began û axa bistînim û wan ji yên mihtac re par bikim, bi tirs gote min :

vivre comme par le passé; ils se divisaient toujours en clans et en tribus, à la tête desquels se trouvaient comme auparavant le chef de clan et ses fils. Les conseils de notables étaient toujours là. Le clergé, selon son habitude, dépouillait les Kurdes indigents.

Les méthodes d'exploitation des Kurdes restaient les mêmes, seules les formes avaient changé: les féodaux agissaient avec plus de circonspection et se servaient plutôt du clergé. Les meilleures parcelles de terres, les pâturages, les emplacements d'été étaient dans les mains des beks et des koulaks, tandis que les pauvres, les salariés et, en partie, les éléments d'aisance moyenne, devaient se contenter de pâturages quelconques. Les troupeaux des beks, à milliers de têtes, n'étaient frappés d'aucune taxe, car leurs propriétaires se trouvaient au pouvoir. La "justice" était toujours rendue de la même manière par les beks. Pour les infractions à l'ordre et à la tranquilité dans tribus, ils percevaient des amendes-moutons et argent, et, bien entendu, à leur profit. Le tribut féodal aux beks existait toujours, seulement maintenant il s'appelait autrement: *redjou*, ce qui signifie cadeau ! Les beks avaient des hommes à eux, qu'ils entretenaient de leurs largesses et qui clamaient partout et à tout instant que les beks sont les bienfaiteurs, les nourriciers et protecteurs des Kurdes. Quand quelque représentant du pouvoir soviétique arrivait, ces valets se mettaient en avant, se frappant la poitrine et criant que, dans la tribu, l'autorité est excellente et protège les pauvres. Les Kurdes se rappelaient bien les cicatrices des fouets des beks, mais craignaient de dire toute la vérité aux représentants des Soviets. On sentait bien dans les récits de Guélo que les miséreux cherchaient une issue à cette situation qui défie la loi. Lorsque que Guélo sut que j'étais envoyé d'Erivan pour organiser les Kurdes pauvres, reprendre aux beks les terres et les pâturages et les donner aux nécessiteux il dit avec méfiance :

- Ereb, beg, axa û dewlemend xurt in, lê, em bi xwe ?... Û Gelo çavên xwe li konê xwe yê rût gerandin.

- Divê arîkariya Hikmê Sovyetî bikin, da ku xelk ji zilma axa, beg û dewlemenda xilas bikin? Divê ku hemû Kurd ji xwe re sovyetan deynin, min gotê.

Piştî ku ez bi Gelo re li hev hatim ku êvarê hemû Kurdên rencber û feqîr li mala xwe bicivîne, ez sibê zû, ji mal derketim. Nîvro, em gihan çêreya Yûsif Beg, serekê eşîra Hesenî. Li wê, li meydaneke piçûk, bîstek siwarî li hev gihabûn, û gundiyên feqîr jî, li dora wan kom bûbûn.

- Cirîd! Hevalê min gote min.

Siwaran, bi qîrîn, serê hespên xwe ber bi newalê ve berdan û darên xwe avêtin hev.

Şêx, beg û mela, li alîkî, li cem hev bûn û li lêstikê leyistikê. Gava em ji wan xuya bûn, Elîxan Beg hate pêşiya me; ew ji berê de ageh kiribûn. Deh gavan ji me wê de, ji hesp hate xwar û bi rûsî xêrhatin da me.

- Li vir serek kî ye? Min jê pirsî û li koma beg, şêx û melan nêrî.

- Ez im, xulamê Dewleta Sovyetên Lenîn, serekê koçerên eşîra Hesenî, Elîxan Beg dîsa silav da û xwe xwar kir. Em Kurd bi xwe miletekî piçûk in, em têkilî tu kesî nabin, û tu kes kî bela xwe nade me. Miletê me bi xweşî dijî û giş jî nizama Lenîn razî ne, Elîxan Beg gote min.

Min dîsa çavên xwe li dora xwe gerandin û li ser balgihên nerm paldayî, min kalekî porspî dî. Ew Yûsif Beg Teymûrov bû, tevî Taşnaqan reviyabû Îranê û di

- Ereb, les beks sont riches et forts, tandis que nous ?..... et il promena son regard autour de sa pauvre tente.

- Il faut aider le pouvoir soviétique à anéantir les beks. Il faut que tous les Kurdes pauvres se constituent en soviets, lui dis-je.

Tôt le matin, je quittai Guélo, après m'être entendu avec lui pour qu'il réunisse, la nuit, les pauvres à qui je parlerai. A midi nous arrivâmes au pâturage d'Ousoub Bek, chef de la tribu des Hasani. Sur la petite pelouse se tenait une vingtaine de cavaliers, entourés d'une foule de pauvres.

- *Djirid*, dit mon compagnon.

Les cavaliers, poussant des cris, prirent le départ et s'égaillèrent dans le vallon en se lançant réciproquement des bâtons. Les cheikhs, les beks et les mollas se tenaient en un groupe à part, observant le jeu. A notre apparition, Ali-Khan Bek vint à notre rencontree. Apparemment, on l'avait prévenu. A dix pas de nous, il sauta lestement de cheval et salua en russe.

- Quel est le chef ici ? demandai-je, en regardant les beks, cheikhs et molas qui étaient là.

- Moi, le serviteur de l'Etat des Soviets de Lénine, Ali-Khan Bek, El -begui, chef des campements nomades de la tribu des Hasani, s'inclina Ali Khan Bek en saluant de nouveau. Nous autres, les Kurdes, sommes un petit peuple, nous n'offensons personne et personne ne nous offense. Notre peuple vit très bien et nous sommes tous contents de l'autorité de Lénine.

Je regardai de nouveau fixement les beks qui restaient debout tout autour et c'est alors seulement que j'aperçus un vieillard aux cheveux blancs assis sur des coussins moelleux.

van nêzan de vegeriyabû. Bi giranî ewî silav da me û em ezimandin konê xwe. Elîxan û Yûsif Beg ne dizanîn ku ez Kurd im û bi hev re serbest bi kurdî xeber didan. Beg, şêx û mela, li dora me li ser çogan rûniştin. Ez gelek kêfxweş bûm ku ez wek biyanî dizanim.

Gava Yûsif beg bihîst ku ez ji Erîvanê têm, dest bi pesindana Nîzama Sovyetî kir.

Li ser *destexanekî* xwarin danîn ber me.

- Va ye xwarina me, Yûsif Beg gote min. «Em miletekî gelek feqîr in. Berê herkesî, Tirkan û Rûsan li me tade dikirin, lê nihu, li bin hikmê sovyetî, jiyîna me xweştir bûye». Dengê xwe hinekî birî û li dora xwe nêrî. Guhdarên wî, giş bi teyid serê xwe hejandin:

- Em bi nizama sovyetî pir kêfxweş in. Em ne Çar ne jî dewleteke kurdî ya biserêxwe dixwazin. Em koçerên serbest in. Heta zimanê me bi xwe nîn e.

- Zimanê Kurdan nîn e? Min gote Yûsif Beg û xwe şaş nîşan da.

- Me çi ziman heye? Li vir em bi rûsî û li minteqa Abaran, Kurdên me bi ermenî dixwînin.

Min dengê xwe nekir.

Êvarê, keriyên pez ên bê hed û hesab, li ber konên Yûsif Beg bûn kom, «Ev e halê te yê qedandinê?» Min di dilê xwe de got û li ber deh, donzde şivanên bi kincên peritî, li hezaran seriyên pez nêrî.

Me îzin ji wan xwest û me berê xwe da konê Gelo. Li wê, Kurdên belengaz li benda me bisekiniyana...

C'était Ousoub Bek Teymurov, revenu récemment de Perse, où il s'était enfui avec les Tachnak. Il nous salua gravement, nous invitant à entrer sous sa tente. Ali-Khan Bek et Ousoub Bek lui-même ne me prenaient pas pour un Kurde, semble-t-il, et sans se gêner, s'entretenaient en kurde. Nous entrâmes sous a tente, et nous assîmes sur les tapis. Les beks, les cheikhs et le clergé s'étaient assis en observant le *sertchok* (position assise sur les genoux repliés). Au courant de toutes les finesses, j'étais très content qu'on me prît pour un étranger.

Ayant appris que je venais d'Erivan, Ousoub Bek, se mit à prodiguer des louanges au pouvoir soviétique. On servit le diner sur des *destakhan*.

Voilà, Monsieur, notre nourriture, dit-il. «Nous sommes un peuple très pauvre. Jadis tout le monde, les Turcs, les Russes, nous offensait, mais maintenant sous le pouvoir soviétique, la vie est devenue plus facile". Il se tut en regardant l'assistance. On inclina les têtes en signe d'approbation.

- Nous sommes très contents du pouvoir actuel, nous n'avons besoin, ni de czars, ni d'un Etat kurde séparé. Nous sommes des nomades libres. Nous n'avons même pas notre langue.

- Est-ce que les Kurdes n'ont pas leur langue ? dis-je feignant de m'étonner ?

- Qu'est-ce que c'est que notre langue ? Ici, nous étudions le russe, tandis que, dans le canton d'Abaran, nos Kurdes apprennent l'arménien.

Au soir, d'énormes troupeaux d'ovins commencèrent à affluer vers l'habitation d'Ousoub Bek.

- La voilà, ta "modeste aisance", pensai-je, en contem-

Wê şeva ha, di nav tehtan de, li cem konan, civînan Kurdên feqîr yên Alagozê ya pêşîn hate danîn. Koçera, bê deng, guh dan gotinên min ên li ser sovyetan.

Min gote wan ku Lenîn dixwest ku miletê kurd azad bibe, di xweşiyê de bijî û bi destê axa, beg û dewlemendan neyê talan kirin

Piştî civînê, Kurdên feqîr, dîsa bê deng ji hev cûda bûn, da ku sibê herin û ji gundiyên din re gotinên min belav bikin. Ev civîna me ya pêşîn, bê deng derbaz bû, lê, piştî vegera me, çiya û deşt û zozan wek lehiyekê xwe hildan :

- Erebê Şivan! Erebê Şemo, Lenîn bi xwe ew rêkiriye Kurdan gotin.

Adetên çend sed salan xebatker û rencberên kurd elimandibûn sebrê. Ji lewre, ewan bi tirs û bi dizî ji halên xwe gazin dikirin. Li cem Kurdên gundî, berê hatina min jî, li hinek ciyan, sovyetên gundan hatibûn danîn. Lê, hin dewlemend jî ketibûn nav wan.

Serekê yekê ji van sovyetan, hevalê min, Morove bi xwe bû. Min ev gund, jibo şerê beg, axa û şêxan, ji xwe re kire qerargeh. Li wê, bi saz û gihandina xortên kurd me dest pê kir.

Ji bo peydakirina dê û bavê xwe ez gihaştim heya Tiflîsê û li wê xwişka min, ji çi hatibû serê wan ez ageh kirim. Piştî çûna min ji mal, Taşnaq, bavê min gelek êşandibûn da ku bikin ku min vegerîne mal. Bavê min,

plant les troupeaux de milliers de bêtes qu'accompagnaient quelques dizaines de pauvres bergers en guenilles.

Nous prîmes congé et nous dépêchâmes vers la tente de Guélo où les pauvres devaient nous attendre.

Cette nuit-là, parmi les rochers, à côté de cette tente, la première réunion des pauvres eut lieu chez les Kurdes de l'Alagoeuz. En silence, ils écoutèrent mon récit sur les soviets et Lénine qui voulait que les Kurdes vivent dans l'aisance et que les beks-koulaks ne les pillent pas.

Puis, dans le même silence, on se sépara, pour se répartir, au matin, chacun dans son campement et tout y raconter aux autres pauvres. Cette première réunion se passa sans bruit, discrètement, mais, en revanche dans les montagnes, après notre départ, les pâturages bouillonnèrent comme un torrent.

- Berger Chémo, Erebé Chémo ! Lénine lui-même l'a envoyé...., disaient les Kurdes.

Les traditions et les usages qui s'étaient formés au cours des siècles avaient habitué les Kurdes travailleurs à la patience. Aussi, c'est craintivement et en sourdine qu'ils manifestaient leur mécontentement. Chez les Kurdes sédentaires, lors de mon arrivée, il y avait, en partie, des soviets de village, très contaminés d'ailleurs par des éléments koulaks.

Le président d'un de ces soviets de village se trouvait être mon ami Morové. Je fis de ce village ma première base d'appui dans la lutte contre les beks et le clergé et pour la liaison avec les pâturages. Là nous commençâmes à former les premiers cadres de la jeunesse kurde.

En continuant les recherches de mes parents, j'arrivai à Tiflis, et c'est là seulement que, de ma soeur, j'appris enfin

ji bêgaviyê bi kifletên xwe ve, ji welêt derketibû û çûbû mintiqeya Aleksendropol. Piştî wî, gelek mihacirên gundê me hatibûn wê derê. Lê, li wê jî, kîn û dijmintî xistibûn nav miletan û serekên eskerî bi kêfa xwe hereket dikirin. Carekê, ximpabêtên Taşnaq, bavê min biribûn derekê û ew êdî venegerandibûn. Piştî çend rojan, nêzîkî gundekî, bavê min kuştî dîbûn. Xwişka min jî bi yadê re derketibû çiyê; li wê diya min jî ji nêza miribû.

Bi vî awayî, min ixtiyarên xwe sax nedîn. Ez vegeriyam ser karên xwe. Di nav salekê de, min ji feqîr û rencberan, firqeke xurt pêk anî. Di sala 1925 an de, beg ji hiqûqên siyasî ketibûn *liçentsi* (berdayî); feqîr ew nedihiştin ku bikevin civînên wan. Şerekî dijwar di nav me û wan dest pê kir. Began xwestin ku xelk li me rakin. Şêx û mela laneta Xwedê li min û li hevalên min barandin û em xayinên dîn, dijminên miletê kurd, dijminên miqedesat û yên adetên bav û kalan îlan kirin.

Şêx, axa û began miraceatî her tişt kirin, li kuştina me bi xwe geriyan, lê me guh ne da wan û li ser riya xwe bê tirs û telaş meşiyan.

Di sala 1925 an de, li hemû warên koçeran, sovyet hatin bijartin. Bi vî awayî, me dawiya hikmê beg û axa û şêxên kurd anî.

le sort de ma mère et de mon père. Après mon départ de la maison, les Tachnak tourmentèrent longtemps mon père, exigeant qu'il me fasse revenir. Mon père fut obligé de quitter le pays avec sa famille. Il se transporta dans le district d'Alexandropol, où arrivèrent beaucoup de gens de notre village. Ici également on suscitait la haine entre les nationalités et les chefs militaires sévissaient à leur guise. Une fois, les khmbapètes emmenèrent mon père quelque part et il ne revint plus. Quelques jours après, on le trouva tué près du village. Ma soeur avec ma mère, s'en alla dans les montagnes, où ma mère mourut bientôt de faim.

Ainsi, je n'ai pas retrouvé mes vieux en vie. je revins à mes occupations. Au cours d'une année, je réussis à constituer un groupe assez fort, pris dans la masse des pauvres et des salariés. Déjà en 1925, les beks furent déclarés *lichentsi* (privés de droits civiques); les pauvres ne les laissaient pas pénétrer dans les réunions. Une lutte acharnée commença. Les beks déclenchèrent une agitation de provocation. Le clergé me foudroya de malédictions moi et tous les Kurdes élus dans les soviets, comme traîtres à la religion, ennemi du peuple kurde, des sanctuaires et de l'*adat*. (tradition). Ils se servirent de tout, jusqu'à préparer des attentats et des assassinats, mais nous restions fermement attachés à notre besogne.

En 1925, dans tous les campements nomades, des soviets furent élus et ainsi on mit un terme au pouvoir des princes féodaux kurdes.

# Kurdên Alagoz

# Les Kurdes de l'Alagoeuz

## 1- Tirsa Derebegên Alagoz

Çiyayê Alagoz, çiyakî gelek mezin û asê ye; ji beriya Serdarabad digehe heya geliyê Mîsxan. Bi tenê koçer derdikevin zozanên wî û li wê keriyên xwe diçêrînin.

Pozê wî yê bilindtir, li raserê çar qezayên Ermenistanê yên mezin dinêre : Abaran, Mela Gokça, Talîn û Aştarak. Ji dûr ve, yek dikare li ser dirêjahî û pehnayiyê wî bibîne. Li wê, ewir, wek pêlên derya yên ko di beza xwe de hişk bûbin kom dibin. Ezman jî, li wê serbest û bê hed e. Alagoz di ser deşta Erîvan a dewlemend re hilbûye û rojên germ ên havînê, di rojên paleyî yên dijwar de, çavên xebatkerên ji teab û germiyê ketî, li serê wî yê bi berf dinêrin.

- Gezo, Kurdek ji hevalê xwe re dibêje û bi destê xwe serê pozê Alagoz şanî dide, nihu li wê ba çiqas hênik e, li nêzîkî berfa ku li wê me par şivantî dikir.

# 1- Emoi chez les féodaux de l'Alagoeuz

Le Mont Alagoeuz est immense et d'accès difficile. Il s'étend largement depuis la steppe de Sardarabab jusqu'au défilé de Miskhan. Les nomades seuls mènent leurs troupeaux sur ses versants.

Le mont énorme surplombe quatre grands cantons d'Arménie: Abaran, Molla Goktcha, Talyne et Achtarak. On le voit de bien loin sur sa longueur et sur sa largeur. Les nuages s'y posent comme sur une mer aux vagues pétrifiées dans leur élan. Le ciel au-dessus de lui est libre aussi et sans limites. L'Alagoeuz se dresse au dessus de la plaine fertile d'Erivan et aux jours chauds de l'été, aux jours de dur travail dans les champs, c'est vers sa cime pure où scintille la neige que se tournent les regards de ceux que le soleil brûlant a rendus languissants.

- Gaso, dit un Kurde à un compagnon, en montrant de la main la cime de l'Alagoeuz, comme il doit faire frais là-

- Belê, Beko. Eger me bizaniya ku axa û şêxên melûn, em dixapandin, qet me keriyên wan diçêrandin? Carekê, bifikir! Ez pênc salan, bi kifletên xwe re, çûm ber pezê Egîd û Mecîd Beg; lê, di dawiyê de bêî ku tiştekî bidin min ez qewirandim. Min li cem mezinê wan giliyê xwe kir, ewî, di ser de şûna ku heqê min bide, ez dam ber daran, çima min ji began gazin kiribûn...

- Oh, Xwedê, oh Şêx Hadiyê Mezin, te welê kiriye, te ew dewlemend û em feqîr kirine!...

Her du jî xwe bê deng dikin û melûl, destên wan hîn bêtir qebdên xenceran digivêşin.

Ezman erd ji gelekî nêzîk ve dipêçand, herwekî dixwest wî himbêz bike, roj ewqas xurt diçirisî, wa dixuya ku ewê di germiya xwe de bihele.

Gezo û Beko, piştî paleyiyê, vedigeriyan malên xwe û ji pereyên ku kar kiribûn, kêfxweş bi rê ve diçûn.

Nêzîkî çiyê bûbûn; bayekî honik ji quntarên Alagoz ew baweşandin. Xiftanên wan vekirî, dilşa dimeşiyan û bêhna kulîlkên çolê ya xweş dikişandin hindurê xwe.

Gava Gezo û Beko gihaştin gundê xwe, Şemîran, roj çûbû ava û pez û dewar digihaştin mal.

Li dora gund, li ser mêrgê, qederê du sed zilam kom bûbûn. Gezo û Beko tirsiyan:

- Ev, her hal, begên me ne kêf dikin, Beko got,

haut, près de ces glaciers, où l'année dernière nous gardions les troupeaux !.

- Oui, Bako, mais nous n'aurions pas fait paître là-bas les troupeaux des beks et des cheiks maudits, si nous avions su qu'ils allaient nous tromper. Pense donc ! Cinq années durant, j'ai gardé avec ma famille les troupeaux chez Aguid Bek et Majid Bek, et, pour finir, ils m'ont chassé sans avoir rien payé.... Je suis allé me plaindre chez le bek principal, et, par dessus le marché, il m'a fait rouer de coups pour avoir osé porter plainte contre les beks.

- Oh, Koudé (Dieu) ! .... C'est toi, ô puissant Cheikh Adi, qui a attiré sur nous la colère de Dieu, c'est toi qui en as fait des riches et nous de pauvres bergers.

Et tous deux se taisent, mornes.... mais leurs mains serrent plus fort le manche de leur poignards.

Le ciel enveloppait la terre de près, comme s'il la tenait dans ses bras, le soleil avait l'air de fondre de sa propre chaleur.

Gaso et Bako rentraient chez eux après les travaux de l'été dans les champs; ils s'en allaient gaiement, contents de ce qu'ils avaient gagné.

Ils arrivaient au bout de la steppe. Une brise fraîche, venue des dernières ramifications de l'Alagoeuz, leur envoya son souffle. Leurs arkhalouks (caftans) ouverts, ils cheminaient respirant l'air frais empli du parfum des fleurs des champs.

Le soleil était déjà couché et les troupeaux rentraient au village, quand Gaso et Bako arrivèrent à Chamiran, leur bourg natal.

eger me bibînin ewê ji me pêşkêşên begîtiyê bixwazin.

Emê li benda şevê bimînin, Gezo vegerand, û emê piştre, ji wê alî bikevin gund.

Her du jî li wê, qederekê, bê deng man, lê piştre da ku bizanin li wê çi derbaz dibû, hêdî hêdî, bi dizî, û di tariyê de, xwe gihandin nêzîkî xelkê.

Qeliya koçeran di dizîkan de sor dibû, agirê êzinga pêt didan. Li jor, li ezmên, stêr bi ronahiya xwe ya sar diçirisîn. Li ber êgir, li ser mehfûrên raxistî, doşekên stûr û balgihên nerm beg û axa rûniştibûn. Hempa (dewlemend) li cem wan cî girtibûn. Li paş wan, xulamên wan, heya diranên xwe, bi xencer, şûr, debençe û tifing çekkirî, disekinîn. Li vî alî û wî aliyê singê xwe rextan girêdabûn.

Ji wan dûr, gundiyên feqîr, li benda emrên wan, serê wan xwar, li ser hev kom bûbûn.

Begek ji wan rabû û bi awirên tûj li dora xwe nêrî:

- Berî peydabûna vî komunîstê ha, her tişt xweş dimeşiya. Me xwe bi xwe îdare dikir. Xortên me bi gotinên mezinên xwe dikirin, lê, bi hatina wî, her tişt guhirî.

Şemoyê Oso, mêrxas û egîdê began, ji ciyê xwe rabû û got:

- Ewî ez ji serektiya gund avêtim û got ku ez hempa me (gundiyê dewlemend).

- Zugirtên ku guh didine wî gelek in; ew jî bêbextiya adet û isûlên eşîretiyê dikin û di riya mezin

Sur la prairie, aux abords du bourg, ils aperçurent une grande foule, quelque deux cents hommes.

Gaso et Bako s'effrayèrent.

- Ce sont probablement les beks qui s'amusent, dit Beko. S'ils nous aperçoivent, ils vont exiger les *pechkech* (cadeaux) de bek.

- Attendons veux-tu, tant que la nuit n'est pas entièrement tombéee, proposa Gaso, et alors, nous entrerons dans le bourg de l'autre côté.

Ils restèrent là, assis tous les deux, un bon moment; mais la curiosité les travaillait et ils commencèrent à se glisser, discrètement dans les ténèbres vers la foule et à observer ce qui se passait.

Le rôti des nomades, le *kali* grésillait dans les marmites. Les feux de bois pétillaient. Là haut dans le ciel, les astres brillaient de leur lumière froide. Devant les feux, des tapis déroulés, des matelas épais, les beks étaient assis s'accoudant à des coussins de duvet. A leurs côtés se tenaient les koulaks âgés et, derrière, les domestiques tous couverts d'armes, poignards, sabres, révolvers et fusils. Les cartouchières en bandouillière croisaient leurs poitrines.

Plus loin encore s'entassaient, tête basse, les pauvres attendant les ordres de leurs maîtres.

Un des beks se leva et jeta un regard autour de lui.

- Tout allait bien, tant qu'il n'y avait pas ce communiste. Nous nous gouvernions nous mêmes, notre jeunesse obéissait aux vieillards, mais il a suffi qu'un vînt pour que tout marchât de travers...

û kalan re nameşin. Binêrin meselen, kurê şivanê me, berê ji bo perçekî nan li cem Mihê dişixulî, û nihu jî giliyê wî kiriye da ku Mihê kiriya wî giş bidiyê. Ev tişt, giş ji ku tên? Bê şik, ji vî komunîstê; ewê wan hemûyan ji rê derêxe, Yûsif Beg bi ser de ajot.

Tu deng nîn e. Bişkulên pezdi nav agir de diçirisin, kevirên germbûyî perçên wek çirûskan dipejikînin. Ba dûmana agir dibe ser gundiyên ku lijêr rûniştine. Bayekî sar tê.

Dîsa bêdengî. Şêxê mezin radibe:

- Hun dizanin çima, Yûsif Beg, Cangîr Beg û Egîd Beg, hun li vir civandin? Ewan hun civandin da ku hun, xelkê eşîran, zilamên sadiq û mêrxas, kêfa xwe bînin, dilşa bibin! Hun, xadimên Xwedê!...

Bi dor ji gundiyan re bi denan mey didin. Xulam bi piyanan ew li civatê belav dikin.

- Bi xweşiya begê min! Şemoyê Oso dike qîrîn.

Evê ha, li gora talîmatên began, mala feqîr û fiqereyên ku bêemriya wan dikin dişewitîne. Ji lewre xelk jê ditirsin. Duhî bi xwe, çûbû talana eşîra Şerqî, ku ji wextê Taşnaqan de rabûbû began. Îro ew xiftanek sor û beşmetek zengîn li xwe kiriye, piştek çermê zîvkirî li nava xwe girêdaye. Li bin beşmetê êlekek bestik rast û bi xeml tê dîtin.

- Serekê eşîra Şerqî dixwaze bi me re bibe, Şemoyê Oso dibêje, lê ev komunîstên zugirt wî nahêlin.

- Xulamên min, eşîra min a sadiq! Ûsif Beg dest

Chémoé Aso premier *merkhas, jéguid* des beks se leva de sa place.

- Il m'a fait renvoyer de mon poste de président de soviet de village, il a dit que j'étais koulak.

- Nombreux sont les va-nu-pieds qui l'écoutent, trahissant l'*adad* - (coutumes) et les lois d'*achirat* (tribus), et ne veulent plus reçonnaître les plus âgés. Voici, par exemple, le fils de notre berger, qui auparavant, travaillait chez Maé pour un morceau de pain et qui maintenant a présenté une supplique contre lui et exige que Maé le rétribue pour toute la durée de son travail. D'où cela vient-il ? Sûrement du fait de ce communiste. Il les pervertira tous, c'est certain, ajouta Ousoub Bek.

Silence. Le crottin sec de brebis pétille, les pierres craquent projetant des éclats pareils à des étincelles. Le vent evoie de la fumée sur les paysans assis plus bas. Il fait froid.

Silence. Le cheikh principal se lève.

- Savez-vous pourquoi les principaux beks, Ousoub Bek, Djanguir Bek et Aguid Bek vous ont convoqué ici, demande-t-il aux villageois ? Ils vous ont appelés pour que vous vous réjouissiez, oh gens de tribus fidèles et glorieux... Réjouissez vous donc, célébrez *êlat* (tribus), serviteurs de Dieu, divertissez-vous!....

On sert à la ronde les outres de vin qui coule à flots. Les domestiques avec des verres, font le tour des assistants.

- A ta santé, mon maître, s'écrie Chémoé Aso.

C'est lui qui suivant les instructions des beks, sème la ruine chez ceux qui leur désobéissent. Aussi la population le craint. Hier encore, il s'est livré à une razzia contre la tribu des Charki qui déjà, depuis le régime des Tachnaks refusa

pê kir. Hun dizanin ku bavê min, bapîrên min û kalanên min, mezinahî li we dikir. Em, nihu ji heft bava ye ku serektiya we dikin. Hun ji me re sadiq û mûtî bûn û hun ji adetên eşîrtiyê dernediketin. Mala Yûsif Beg a miqedes û nanê wî, hun ji bela, nexweşî û perîşaniyê û pez û dewarên we jî ji êşan parastin. Lê, nihu hikmeke nû derketiye, hikmeke ku ne dîn û ne Xwedê dinase. Li gora vê nîzamê, divê her kes feqîr, belengaz û zugirt bibe, û tu kes jî dewlemend nebe. Hingê feqîr di nav eşîrê de, wê çawa bijîn? Keleş, meselen, û hin perîşanên din, eger sê keriyên Xûdo nebûna, ewê nanê xwe ji ku derêxistina? Na, ev nîzam bi kêrî koçerên wek me nayê. Bi çi awayî ku be, bi arîkariya Xwedê, îro kurê min we îdare dike û Cangîr Beg jî li ser eşîra xwe ye. Me, bi vî awayî me xwe xweş îdare dikir û tu kes jî di van çar salên îdara me de ji rê dernediket. Lê, va ye, em nizanin ji ku û çawa hat? Kurê şivanê me yê kevin, Misto. Ewî bêbextî li dîn, malbat û miletê xwe kir û çû ji xwe re jineke rûs anî, ji dîn derketiye, Xwedê nas nake, bûye komunîst, simbêlê xwe kur kiriye, û yek dibê qey şîleatek (gawirek) e. Û ketiye nav şivan û gavanên ehmeq û wan dixapîne. Ew jî bêbextî li dînê xwe dikin û dikevin dû wî û xort jî xwe komsomol (xortên komunîst) dinivîsin.

- Ev e mehek e ku ketiye dû min, şivanê Mecîd Beg dibêje.

- Ev gawirê ha, Yûsif Beg dom dike, nihu jî dixebite ku, her wekî gotine min, me bê çek bike. Çi dixwaze? Em ji heqê intixabatê dûr xistin û nihu jî çekên me ji me distîne, dixwaze çekên malbata me,

l'obéissance aux beks. Aujourd'hui, il porte un arkhaloukh rouge et un riche bechmet, serré avec une ceinture de cuir couvertes de plaques d'argent. Sous le bechmet, on aperçoit un élak au col droit cousu de galons.

- Le chef de la tribu des Charki veut bien être avec nous, dit Chémoé Aso, mais tous les va-nu pieds sont contre.

- Mes serviteurs, mon peuple fidèle, commença Ousoub Bek. Vous savez que mon père, mon aïeul et mes bisaïeuls vous ont gouvernés. D'après la tradition, c'est déjà la septième génération de notre famille qui vous gouverne. Vous étiez fidèles et obéissants envers nous et n'enfreiniez pas les usages. La sainte maison et le pain d'Ousoub Bek vous ont toujours gardés du malheur et de la maladie et votre bétail de la peste. Mais voici qu'un nouveau pouvoir est venu, un pouvoir athée qui s'érige contre Dieu. Il veut que tout le monde soit pauvre, sans vêtements, pieds nus et qu'il y ait plus du tout de riches... Mais alors, comment vivront les pauvres dans la tribu ? Où trouvera sa pitance Kalach, par exemple et d'autres miséreux, si Khoudo n'avait pas trois troupeaux de moutons ? Non ce pouvoir ne nous convient pas à nous autres, les nomades. Quoi qu'il en soit par la volonté de Dieu, mon fils vous gouverne maintenant encore, tandis que Djanguir Bek gouverne sa tribu à lui. On vivait ainsi par nous-mêmes et personne n'a troublé l'ordre pendant les quatre années de notre administration. Mais voilà-t-il pas que vient d'apparaître on ne sait d'où, qui donc ? ... Le fils de notre ancien berger Misto ! Il a trahi sa famille et sa foi, a épousé une Russe, est devenu un sans-Dieu, un communiste ! Il a rasé sa moustache et ressemble tout à fait à un *chiléat* (infidèle). Et maintenant qu'il est arrivé, il trompe ces imbéciles de *chivan* (berger) et de *gavan* (vacher). Eux aussi trahissant la religion et le suivent. Et les enfants, il les inscrit au Komsomol (jeunesses communistes).

- Il s'efforce de me convaincre depuis tout un mois, dit le berger de Madjid Bek.

çekên bav û kalanên me, ji destên me derîne.

- Xadimên min ên sadiq, xelkê eşîra! Bi çi awayî ku be divê em xwe ji Misto xilas bikin. Malê Beg pir e, heya hun bixwazin ewê pez bide we, konekî mezin wê bide we, bi şertê ku hun wî winda bikin.

- Bi navê Xwedê, bi navê dîn û îman, bi pakiya eşîra kurdî, divê hun wî sax nehêlin!

Li ser van gotinan, beg, axa, pisaxa û şêx rabûn û ji zilamên xwe re, dest bi belavkirina diyariyan kirin. Di nav feqîran de, ewê pêşîn ku qebûl nekir tiştekî wan bistîne, rencberek ji eşîra Zurkî, Edê bû. Di cî de, hemû dewlemend û mirovên wan, xwe avêtin wî û kirin ku wî bitirsînin:

- Pîsê heram! Tu bi me re bêbextiyê dikî?

- Êdê xwe ji nav koma dewlemendan derêxist û xwe gihande feqîran ku wek keriyekî xwe digihandin hev... Tu tehdîd Edê ne ditirsand. Ew ji nihu de, di sovyetekê de bûbû endam û guhdariya gotarên nemînendeyên hikûmatê kiribû û ewî xweş dizanî ku, di nêzîk de, destê prolêtariya wê bigihîşta van çiyan jî û ewê dawiya van tiralan bianiya...

Hempa, tev de ji serekên eşîran re sond dixwarin ku ewê heya dawiyê bi wan re bimînin. Lê, feqîran bi xwe xwe dabûn alîkî û bê mad û bê deng, li wan dinêrîn. Pîr Ebas xwe nêzîkî wan kir:

- Heft salan, min muxtarî kir û min tu cara Xwedê ji bîra xwe dernexist; lê, hun wek berxan, ji aliyê vî xwedanenas hatin xapandin!...

- Ce mécréant-là, continue Ousoub Bek, fait maintenant des démarches, m'a-t-on dit, en vue de nous désarmer. Que veut-il donc ? Il nous a privés du droit de vote et maintenant il veut nous prendre nos armes, nos armes de famille, que portaient nos ancêtres, nos aïeux, nos pères !

- Mes serviteurs fidèles, gens des tribus, il faut à tout prix nous débarrasser de ce Misto. Le bek a du bien, il donnera des moutons, tant que vous voudrez, il donnera une tente tissée en poils de chèvre, pourvu que vous le fassiez disparaître.

- Il faut en finir avec lui, au nom de la foi, au nom de la pureté de la tribu kurde !

Les hommes de l'entourage du bek se virent distribuer des cadeaux. On n'oublia pas non plus les acolytes des riches. Les beks et les koulaks faisaient la distribution. Parmi les pauvres, le premier qui en refusa était un ouvrier du clan des Zurki, Adé. Aussitôt tous les richards et leur clientèle de se précipiter sur lui en colère et de le menacer:

- Espèce de brigand, tu veux nous trahir.... ?

Adé se dégagea de la foule des riches et se rapprocha des pauvres qui se pressaient comme un troupeau. Aucune menace ne le pouvait effrayer. Il avait déjà été membre des soviets de canton, avait eu l'occasion d'entendre les discours des délégués et des représentants de l'autorité et il savait que le jour n'était plus loin où le bras du prolétériat s'étendrait jusqu'ici, dans ces montagnes éloignées et inaccessibles et qu'il y aurait un terme à ces fainéants.

La foule des koulaks jura aux chefs de tribus qu'ils resteraient fidèles aux traditions, qu'ils obéiraient à leurs chefs et accompliraient leur volonté. Quant aux pauvres, tassés dans un coin, mornes, ils se taisaient. Le *pir* (chef

- Tu tişt neqewimiye, cemaet vegerandê.

- Belê, nihu ji we re, bi qemçiya xwe, çawişekî cendirme lazim e, yan na diviyabû ev wezîfe bidana min da ku min hun bielimendana îtaeta beg û rûspiyên we û ne ya Misto. Pîr Ebas di nav diranên xwe re ev gotin fikandin.

- Bira bawer nekin, Mecîd Beg, ji aliyê xwe bi dengekî bilind got ku, Bolşevîk wê pir dom bikin. Di nêzîkê de, di nêzîkê de ewê dîsa bikevin bin qemçiya me, û emê hingê şanî wan bidin...

Ji şerabê serxweş ketî, beg çi dihate ser zimanê wan digotin. Mecîd Beg rabû, dengekê şerabê di destekî û piyanek jî di destê din de, bi hejandinê xwe gihande feqîran û ku şerabê bide wan. Li gora adetên kevin, herwekî beg bi xwe xizmet dikir, diviyabû ku herkes ji destê wî qedehê bistîne û vexwe. Hate ber Edê: «Kuro! Di wextê Taşnaqan de ez zabit bûm û nihu, kerê mezin, tu li min xwar dinêrî... Ezê şanî te bidim. Bigir, vexwe!... Piyanekî tije şerab dibe ber devê Edê.

- Mecîd Beg ez venaxwim, ez tayî me.

- Serseriyê mezin! Mecîd Beg bi tinaz kire qîr, tu nizanî ku şerab ta dikuje? Ewî qedeh danî ser lêvên Edî.

Lê Edê qet venexwar û feqîrên din jî jê tam nekirin. Şêx, axa û rîspî bi eşkere dijun lê kirin; çima ji destê beg qedeh negirtibû û ji rûyê wî feqîrên din jî venexwaribûn.

Goşt, nan û şerab, heya sibê, ji maseyan kêm

religieux) Abbas s'approcha d'eux.

- Pendant 7 ans j'ai été maire et je n'ai pas oublié Dieu et vous, comme des moutons vous avez subi la persuasion de ce sans-Dieu.

- Mais il ne s'est rien passé, murmurait la foule.

- Oui, il vous faudrait un bon gradé de police, avec un fouet, ou bien c'est moi qu'on devrait en charger. Je vous apprendrais moi à obéir à vos beks et à vous *rouspi* (barbe blanche) et non pas à Misto, sifffla le pir Abbas entre ses dents.

- Qu'ils ne s'imaginent pas, cria à son tour Madjid Bek, que les bolchéviks en ont pour longtemps à vivre. Bientôt, bientôt, ils se trouveront tous de nouveau sous notre fouet et alors nous leur montrerons...

Enivrés, les beks se sentaient de l'audace et disaient tout ce qui leur plaisait. Madjid Bek se leva, tout chancelant, s'approcha des pauvres avec une outre de vin sous le bras et un verre à la main et commença à leur offir à boire. D'après les anciens usages, puisque c'était le bek lui-même qui faisait le service et offrait, chacun était obligé d'accepter et de boire. Il s'approcha d'Adé.

- Mon vieux, sous les Tachnaks, j'ai commandé une *sotnia* ("une centaine", escadron cosaque ou de cavalerie irrégulière), on m'a nommé lieutenant, disait Madjid Bek en se dandinant, et toi, grande bourrique, tu me regardes de travers ? Je vais t'en faire voir... Tiens, bois, - et il porte un verre plein à la bouche d'Adé.

- Madjid Bek, je ne bois pas, j'ai la malaria.

- Espèce d'imbécile, cria en ricanant Madjid Bek, mais le vin est justement très bon contre la malaria. Et rapprochant le verre, il le colla presque aux lèvres d'Adé.

Mais Adé ne but point, comme d'ailleurs, ne burent pas

nebûn. Taşnaqek di nav Yûsif û Cangîr Beg de rûniştîbû û wa dixuya ku şîret li wan dikir, ji wan her duyan re pistepist dikir û piştre ewan jî dizivirîn û bi feqîran re diştexilîn. Şîv digihaşt dawiya xwe. Çend hev ji vexwarinê mest bûyî, li ber êgir raxistîbûn erdê û xir xir dikirin. Gelek şêx, hempa û merivên began, li cem hev rûniştîbûn û qala mêranî û talanên ku di wextê Taşnaqan de kiribûn, dikirin.

Merivên Cangîr Bek pesnê xwe didan ku di dema kuştinên qewmî de, tevî wî li gundekî miqdarek jin û mêr civandibûn, ew xistibûn axurekê û bi saxî şewitandibûn. Hinên din li ser çêreyên Alagozê ketibûn hev û digotin ew yên baştirên dinyayê ne !

Hingê Ermeniyê Taşnaq (ximpabêtekî kevin) rabû ; xweş bi kurdî dizanî; berê ewî, nivîsarên ku Misto, li ser beg, axa û pisaxa derêxistibûn xwendin û piştre jî gotara jêrîn da :

- Hun baş dizanin, ewî dest pê kir, ev nîzam çawa ye, ew mala gundiyan xira dike û dixwaze ku giş feqîr bin da ku wan hemû bike emele û xebatker. Ji nav we, ên feqîrtir dibijêre û wan dike mezin û serekên we, weke vî Mistoyê ha, mesela. Bi rastî, ev Misto kî ye? Hun giş baş dizanin ku bavê wî û ew bi xwe, li cem Tirk, Molokan, Ermenî û Kurdan, şivan bûn. Tu cara, ji olçekê bêtir zadê wan û ji kerekî pêve tu dewarê wan nebû ku pirtûpolên wan bikşîne.

Taşnaq bi destê xwe pîrekî bi simbêl nîşan dide:

- Va ye axayê wî! Ew dikare rastiyê ji we re bibêje. Û nihu jî ev Mistoyê şivan, ketiye nav me û feqîran

non plus les autres pauvres. Les cheikhs, les koulaks et les rouspi l'insultèrent copieusement pour avoir refusé le verre de la main du bek lui-même, car les autres pauvres ne le firent pas non plus à cause de lui.

La viande rôtie, le pain et le vin ne disparurent pas des tables jusqu'au matin. Un tachnak était assis entre Ousoub Beg et Djanguir Bek et semblait les diriger, car il leur chuchotait à tous deux qui, ensuite, s'entretenaient avec les pauvres. Le souper tirait sur sa fin. Plusieurs individus en état d'ébriété, gisaient près des feux et ronflaient fort; beaucoup de cheikhs, de pirs, de koulaks, de parents de beks assis , racontaient leurs exploits et les pillages qu'ils avaient accomplis sous le régime des Tachnaks.

Les parents de Djanguir Bek se vantaient que, durant les massacres nationalistes, ils avaient avec lui réuni, dans un village, une quantité d'hommes et de femmes, les avaient parqués dans une étable et brûlés vifs. D'autres se chamaillaient au sujet des pâturages de l'Alagoeuz qui, disaient-ils étaient les meilleurs du monde !

L'Arménien Tachnak, ancien Khmbapet, se leva alors ; il parlait bien le kurde; il lut d'abord les articles de Misto contre les beks, les koulaks et la religion et prononça ensuite un discours.

- Vous savez bien, commença-t-il, quel est ce pouvoir. Il ruine les paysans et veut que tous soient pauvres pour en faire des ouvriers salariés. Il choisit dans votre milieu même les plus dépourvus et en fait vos dirigeants, comme ce Misto, par exemple. Qui est-il au fond ? Vous savez tous parfaitement que son père et lui-même étaient bergers chez les Molokans, les Grecs, les Arméniens et les Kurdes. Ils n'ont jamais eu plus de deux pouds (=16 kg) de farine et un âne pour transporter leurs loques.

radike beg, axa û şêxan. Xortan dixapîne, wan rêdike bajêr, û li wê ji dersên ku dabûn Misto didine wan jî. Eger hun hez dikin ku mala we neyête xira kirin, divê ku hun bikevin pey begên xwe û şerê zilamên wek Misto bikin.

Gotara wî, bi reyina seyan û bi dengê simên hespan, hate birîn. Dengekî xurt li derve dikire qîrîn :
- Serekê sovyeta gund li ku ye ? Ji milîsan re (eskerê bejik) cî çêkin!

Cefil kete nav koma civiyayî. Giş xwe avêtin malan. Taşnaqê bizdiyayî ji şaşbûna xwe, kete nav koma kûçikan ku hindik ma wî bidirînin, eger hinekî dî xwe negihandaba mala Mecîd Beg. Gund xwe bê deng kir...

Et désignant du doigt un Kurde moustachu: voila son patron, il peut vous le dire ! Et maintenant, le voilà chez nous qui excite les pauvres contre les beks, le clergé, leurs patrons. Il trompe la jeunesse, l'envoie en ville où on leur apprend ce que lui même a appris. Vous devez donc suivre vos beks pour ne pas vous laisser ruiner; vous devez lutter contre des hommes comme Misto.

Son discours fut interrompu par l'aboiement de chiens et le bruit de sabots de chevaux. Une voix forte cria :

- Où habite le président du soviet du village ? Faites loger les miliciens.

La foule fut prise de panique. On se sauva dans les maisons. Le Tachnak, pris de frayeur en fuyant tomba au beau milieu d'une meute de chiens qui faillirent l'écharper. Il eut juste le temps de se précipiter dans la maison de Medjid Bek. Tout le village rentra dans le calme.

## 2- Piçûk di nav xwe de diaxêvin

Gezo û Beko di ciyê xwe de heyirî diman. Ewan xweş dizanîn ku, li wê, li deştê, li gundên Ermeniyan ku ew li havînê lê dişixulîn, siha tu beg nema bû, lê li vir, li gundên Kurdan, wek berê beg hîn bi çek in û hîn kêfa xwe hikim li Kurdan kirin. Gezo û Beko, mideteke dirêj xwe ker kirin û li ser tiştên ku dîbûn, raman.

Şeva payizê digihaşt dawiya xwe.

Stêr vedimirîn. Bayekî sar û sivik derbaz dibû.

Gezo ji ciyê xwe rabû, çû cem Beko û çawa zilamekî raketî dihejînin ew hejand :

- Rabe, herin mal, gotê; ew êdî ne li vir in. Emê sibê Edê bibînin û pê re li tiştên ku lazim e bikin, bifikirin.

## 2- Les petits devisent entre eux

Gaso et Bako demeuraient interloqués. Ils savaient que là-bas, dans la plaine, dans les villages arméniens où ils travaillent l'été, il n'y a même plus l'ombre d'un bek, tandis qu'ici, dans leurs villages, les beks sont encore toujours armés, se promènent en liberté et continuent d'exercer leur pouvoir sur les Kurdes. Gaso et Bako restèrent longtemps silencieux, réflichissant à ce qu'ils avaient vu.

La nuit d'automne approchait de sa fin.

Les astres s'éteignaient. Un souffle de froid passait.

Gaso se leva subitement de sa place, s'approcha de Bako et se mit à le secouer comme on secoue habituellement un dormeur;

- Allons à la maison, lui dit-il, ils ne sont plus là. Demain nous irons trouver Adé et ensemble nous penserons à ce qu'il y a lieu de faire.

- Belê, Gezo, gotinên te rast in. Edê kurikekî hêja ye. Em jî wek li gundên ermenî bikin; emê xwe bigehînin wî, malika xwe (hecre) deynin û tevde bixebitin.

- Tu çi dibêjî? Te xwe winda kiriye? Malikek ? Tu dîn î? Ew komunîst in lê em bi xwe ne komunîst in.

- Gelo te di civîna xebatkeran de nebihîst çawa Ohanes digot ku gava çend zilam bi hev re xebateke milî dikin, ew xwediyê malikekê tên hesab kirin.

- Belê, rast e, Beko hezîn lê vedigerîne.

- Na, ev ne rast e.

Bi behna bermayiyên dawetê, seyên keriyan xwe nêzîkî kuçikê vemirî kirin. Gava Gezo û Beko dîtin xwe avêtin wan. Hingê, her du jî, ji ciyê xwe rabûn, kûçik qewirandin û çûn mala xwe.

Wê şeva ha, Edê qet raneket. Gotinên beg, şêx û axa, wek derbên çakûçekê di serê wî de diçingiyan. Ji bêrîka xiftanê xwe titûn derêxist, cigareyek pêçand û kibrîtek pê xist. Li jin û zaroyên xwe yên raketî nêrî; rûyên wan, li bin ronahiya kibrîtê çilmisî dixuyan.

Heyva çardeşevî sor û mezin, wek firaxekî paxirê qilêkirî, di pencerê lê dinêrî. Edê xiste eqlê xwe ku hema sibê ewê here û her tiştji Milîsan re bêje. Gelekî mitalan kir û piştre kete xew. Sibê, bi qorîna çêlekê ku jina wî di ber serê wî re dibir garanê, çavên xwe vekirin.

Gava gund şiyar bû, roj qederekê bilind bûbû.

Piştî daweta şevê dî, xelk di xew de mabûn; digel vê yekê roj tije xem xuya dikir.

- C'est vrai, Gaso, c'est un bon gars. Faisons nous aussi comme dans les villages arméniens, joignons-nous à lui, formons notre cellule, on travaillera ensemble.

- Que dis-tu ? Où as-tu la tête ? Une cellule ? Mais ce sont des communistes et nous ne sommes pas communistes.

- Est-ce qu'à la réunion des ouvriers, tu n'as pas entendu comment Ohanès disait que si quelques hommes se réunissent pour un travail commun c'est une cellule ?

- Non, ce n'est pas vrai, dit Bako tout pensif.

Les chiens des troupeaux flairant les restes du festin, s'approchèrent du feu éteint et se jetèrent sur Gaso et Bako Tous deux se levèrent alors et s'en allèrent chez eux en chassant les chiens.

Adé ne dormit pas du tout cette nuit là. Les conversations des beks, des cheikhs et des koulaks résonnaient toujours en sa tête comme des coups de marteau. Il sortit du tabac de la poche de son arkhalouk, roula une cigarette et frotta une allumette. Il jeta un regard sur sa femme et ses enfants. Ils dormaient et leurs visages étaient pâles à la lueur de l'allumette.'

La pleine lune, rousse et très grande, semblable à un plat de cuivre bien nettoyé, regardait par la fenêtre. Adé se décida à aller, dès le matin, chez les miliciens et de leur raconter toute l'affaire. Il réfléchit longtemps et finit par s'endormir. Il revint à lui quand la vache, à qui sa femme faisait rejoindre le troupeau, meugla bien haut et plaintivement à ses oreilles.

Le soleil était déjà levé haut dans le ciel quand le village se réveilla.

Cole (serekê keriya) û obebaşî (serekê zozanan) ji bo vegera germiyanan emir dabûn. Herkes dixebitî û lez dida xwe: kon radikirin, palas, mehfûr û kulav ba didan, stûnên kon girêdidan û werîs û xemlan ditewandin...

Gezo û Beko lez nedidan xwe. Tu tiştê wan nebû. Bi tenê xwediyên keriyan xwe ji bo germiyanan pêk tanîn.

Beko li ber mala xwe rûniştîbû gava Edê hate cem:

- Rojxweş Beko! Tu kinga hatî?

- Duhî.

- Te li deştê havîn çawa derbaz kir? Tu nexweş neketî?

- Na, Beko vegerandê, ji aliyê nexweşiyê tu gazinên me nebûn, lê em ji germê fetisîbûn.

- Te Mistó dî? Tu nizanî ewê kinga bê?

- Na, çawa me dikarî wî bibînin? Em li çolê bûn û qet nediçûn bajêr.

- Çi xeberên nû li cem we hene?

- Gotinên min pir in; lê dibê em xwe giş bicivînin da ku ez gundî û emeleyên ermenî çawa xwe tenzîm dikin ji we re bêjim.

- Havînê, Beko bi ser de ajot, Misto çûbû zozanan. Li wê xelk dicivandin û ew hînî xwe tenzîmkirinê dikirin; lê began bela xwe danê û nehiştin ku şixul bibe serî.

- Bêje min, li cem we civîna duhî ji bo çî bû ? Beko jê pirsî.

Après le festin de la veille, on faisait grasse matinée et pourtant la journée s'annonçait pleine de soucis. Djola (chef de troupeaux) et *obabachi* (chef de pâturage) avaient donné l'ordre de partir pour la transhumance d'hiver. Dans toutes les saklas on se dépêchait: on démontait hâtivement les tentes, on roulait les palas, les tapis et les feutres, on désemboitait et rangeait en ordre les parties de tente en bois, on pliait les cordes et les ornements.

Gaso et Bako ne se pressaient pas. Ils n'avaient rien à faire. Seuls ceux qui avaient beaucoup de moutons se hâtaient pour la transhumance d'hiver.

Bako était assis près de sa maison quand Adé s'approcha.

- Bonjour, Bako. Quand es-tu arrivé ?

- Hier.

- Comment as-tu passé l'été dans la plaine ? Tu n'as pas été malade ?

- Non, répondit Bako, pour être malade je ne l'ai pas été, mais la chaleur nous a desséchés.

- Tu n'as pas vu Misto ? Tu ne sais pas quand il va venir ?

- Non et comment aurions-nous pu le voir ? Nous travaillions dans les champs et n'allions pas en ville.

- Et quelles sont vos nouvelles ?

- Nous en avons beaucoup, mais il faudra une fois tous nous réunir et nous raconterons comment là-bas, chez les Arméniens, pauvres et ouvriers ont organisé leur vie.

- En été, ajouta Bako, Misto est allé aux pâturages. Il y convoquait des réunions et expliquait comment il fallait s'organiser, mais les beks s'en mêlèrent et on n'a pas pu finir l'affaire...

- Ji bo vî tiştî bi xwe, min dixwest ez Misto bibînim, Edê bi dengekî nizim vegerand û li dora xwe nêrî, da ku jê re bêjim ku, li vir beg, şêx û hempa, bi arîkariya Taşnaqan, dixwazin belakî bînin serê wî!

- Belakî bînin serê wî! Çawa?

- Hinekan dixwazin qebîleyên xwe giş bicivînin û li cem hikûmatê giliyî wî bikin. Lê, gelek beg û Taşnaq di carekê de kuştina wî çêtir dibînin.

Beko nêzîkî Edê bû û ecêbmayî jê pirsî :

- Lê hevalên me çi dibêjin?

- Hevalên me kî ne?

- Ma feqîr gî ne bi Misto re ne? Ew baş dizanin ku ji roja hatina Misto halê wan xweştir bûye. Carekê bifikire! Di gundên Ermeniyan de feqîr ji bêşa bi timamî miaf in. Lê, li cem me, feqîr bêşa koçeriyê, bêşa dexlê û ya bega bidin. Ev çar sal in ku nîzama Bolşevîkan, nîzama şewrên gundî û xebatkaran hatiye danîn, lê li cem me.

... Na bi ya min, nîzama Bolşevîkan hê nehatiye cem me, ew li cem yên din e. Beko bi ser de ajot. Hinekî bifikir, malava! Ez rastiyê dibêjim. Cangîr û Elîxan Beg dîsa bûne serekên eşîrê. Ewê xema kê bixwin? Bê şik xema yên xwe, yên dewlemendan; lê ême bi xwe, me tazî dikin. Nexwe bi rastî, nîzama sovyetî hîn neketiye cem me...

Hîn dinya zû bû. Hewa ji bêhna erdê ya ziwa dagirtî bû. Roj ku derdiket hinekî bû tarî; ewirekî reşî mêşinî ew pêçand û siha xwe raxist ser çiya, gund, Edê û Beko.

Mais quelle était cette réunion chez vous, aux abords du village ? demanda Bako.

- C'est précisément à cause de cela, chuchota Adé en regardant autour de lui, que je voulais voir Misto et lui raconter que les beks, les cheiks et les koulaks veulent s'en débarrasser ici, avec l'aide des Tachnaks.

- S'en débarrasser, mais comment !

- Bien simplement: ils veulent réunir leur clan et porter ensemble une plainte contre lui. Mais plusieurs beks et Tachnaks proposaient de le tuer tout bonnement et d'en finir d'un seul coup.

Bako s'approcha d'Adé et lui demanda étonné:

- Et que dirent les nôtres ?

- Quels nôtres ?

- Mais les pauvres... Ils sont cependant tous pour Misto. Ils savent bien que depuis l'arrivée de Misto ils ont la vie plus facile. Pense donc, dans les villages arméniens, les pauvres sont tout-à-fait exonérés d'impôts, et chez nous ? Chez nous, le pauvre paye la taxe des nomades, la taxe agricole et encore celle du bek. Le pouvoir des bolchéviks, le pouvoir des soviets est, cependant, établi depuis quatre ans, alors que chez nous.

.... Non, à mon idée, le pouvoir des bolchéviks n'est pas encore chez nous, mais chez les autres, ajouta Bako. Réfléchis, pardieu, je dis la vérité: Djanguir Bek et Ali Khan Bek sont redevenus chefs dans leur tribu. Pour qui auront-ils des égards ? Bien entendu pour les leurs, les riches. Quant à nous, il nous dépouillent. Donc, à vrai dire, nous n'avons pas encore le pouvoir des bolchéviks...

Il était tôt encore dans la matinée. L'air était plein de l'odeur de la terre sèche, balayée par le vent. Le soleil qui se dressait s'assombrit un instant, voilé par la crète d'un nuage

Beko weke nalînê, keserek kişand, hinekî wê de çû û li ser kevirekî rûnişt. Edê jî xwe nêzîkî wî kir.

- Bala xwe bide min Edê, Beko hêdîka gotê, di gundên Ermeniyan de ku em lê bûn, nahêlin axa û keşe têkilî şixulên gund bibin, heta, wan naxin civînan jî; Xeçedûr axa yê Ixdirê tê bîra te? Milkê wî ji destê wî standin û ew ji rencberan re par kirin. Digel vê yekê, li cem me hîn beg û axa bi kêfa xwe dikin. Li wê, hema, her roj, minezimê xebatkeran dihat, em dicivandin, bi me re daxaft û emê çawa xwe ji bin destê keşe û dewlemendan, xilas bikin, digote me...

- Gava Misto jî me dicivîne, Edê gotê, ew jî me ji her tiştî ageh dike û riyên azadiyê şanî me dide, lê, hin bêbext diçin û gotinên wî digehînin beg û axan. Ma halê me xirab e nihu ? Em êdî tu tişt nadine began û her wekî em feqîr in hikûmet jî bêşan ji me nastîne. Lê, eger ji te tê bêşên Yûsif beg û Elî beg mede; ewê di cî de, egîdê xwe Şemoyê Oso rêkin te û bi zor wan ji te bistînin.

- Binêr, ê min, ez çi difikirim? Beko xwe hinekî tevda û got. Divê em xeberê bidin Misto, an serekê canbêzaran; yan na, beg wê Misto bidin kuştin.

- Na, vî nakin, Edê vegerand û rabû ser xwe; newêrin xwe bêxin vî belayî. Yûsif Beg bi xwe got: «Divê em wî nekujin, yan na, ji bo wî, ewê me bidin ber tifinga.» Di wextê Taşnaqan de, Yûsif Beg di Civata Miletê de nemînende bû, ji lewre bi qanûnan dizane. Di wextê çaran de, her meh diçû cem Hakimê Qefqasya û ji bo serektiya eşîra Kurdên yêzidî yên Qefqasyê jê meaş distand.

moutonneux. Une ombre s'étendit sur les montagnes, le village, Adé et Bako.

Bako soupira et son soupir ressemblait à un râle. Il s'éloigna, s'assit sur une pierre et Adé près de lui.

- Ecoute-moi, Adé s'exprima lentement Bako. Dans les villages arméniens où nous avons travaillé cet été, on ne laisse pas parler les popes et les koulaks, on ne les invite même pas aux réunions. Tu te souviens de Khatchatour Agha d'Ikdyr ? On lui a enlevé sa propriété, tandis que le beks agissent encore à leur guise. Là-bas, presque chaque jour venait l'organisateur des ouvriers, nous réunissait, s'entretenait avec nous, nous expliquait comment il faut lutter contre ces popes et ces richards...

- Quand Misto réunit les nôtres, remarqua Adé, il leur raconte et les instruit aussi, mais certains lâches vont chez les beks et leur rapportent tout. Sommes-nous si mal maintenant ? Nous ne devons pas un sous de taxe aux beks et, comme pauvres, le pouvoir nous a exonéré d'impôts. Mais essaye donc de ne pas donner et Ousoub Bek ou Ali Bek t'enverra son éguid Chémoé Aso et te prendra de force.

- Voilà ce que j'ai pensé, reprit Bako en s'animant. Nous devons faire savoir à Misto ou au chef de la milice ce que trament les beks. Sinon ils vont le tuer.

- Ils n'iront pas jusqu'à le tuer, répondit Adé en se levant. Ils ne s'y risquerons pas. Ousoub Bek lui-même dit: " Il ne faut pas le tuer, car à cause de lui, on pourrait nous fusiller". Cependant Ousoub Bek a été membre du parlement des Tachnaks et on pourrait dire qu'il connait les lois. Sous le Czar, il allait presque chaque mois chez le vice-roi du Caucase et touchait une subvention en qualité de chef de clan de tous les Kurdes Yézidis de la Transcaucasie.

- Li dawiyê, şevê dî çi qerar dan?

- Piraniya wan gotinên xwe kirin yek ku giliyî Misto bikin.

- Nexwe, divê ku, Beko got, emê banî feqîr û rencberan bikin; herwekî di gundên Ermeniyan de dikin û emê, beg û Taşnaq bi Misto re wê çi bikin, bêjine wan. Ez bawer im ku, feqîr û rencber wê hevaltiya beg û dewlemendan nekin û bi me re bimeşin.

- Belê, divê em wan bicivînin, Edê vegerand...

Beko û Edê ji hev cuda bûn.

- Enfin, demande Bako, qu'est-ce-qu'ils ont décidé l'autre nuit ?

- Ils ont persuadé plusieurs de présenter une plainte contre Misto.

- Il faut donc, dit Bako, convoquer les pauvres et les ouvriers, comme on le fait dans les villages arméniens et leur raconter ce que les beks et les Tachnaks veulent faire avec Misto. Je suis persuadé que les pauvres et les ouvriers ne suivront pas les beks et les koulaks mais nous autres.

- Oui, il faut les réunir acquiésa Adé.

Et ils se séparèrent.

## 3- Li ser riya germiyanan Jin dest hiltînin

Her tişt pêk hatibû. Hûrmûr li ser ga ku zaro ji her aliyê gund kom kiribûn, hatibûn bar kirin. Nêzîkî saet heşt, karwan, weke werîsekî dirêj û bi can hate ser rê ku lê giya şîn bûbûn.

Cangîr Beg, serekê êlê, qet guh nedida nîzama sovyetî û wek di wextê bav û bapîrên xwe de, an weke di wextê Taşnaq de, hereket dikir. Li hespekî sergerm siwarbûyî, mîna serfermandarekî, li ciyekî bilind sekinî û hişt ku karwan di ber wî re derbaz be. Gava dît ku her tişt saz bûye, hespê xwe yê boz ajot û kete pêşiya koçeran ku mîna dîwarekî, diherikîn.

Li paş keriya şivanekî, li ser milê xwe pezekî lingşkestî hilgirti bû. Reben westiyabû û bi zor bi rê ve diçû. Pez ku xwe tim xwe tev dida, ji destê şivan filitî û kete erdê. Çavê Cangîr Beg pê ket; hate cem şivên li

# 3- En route pour la Transhumance
# Les Femmes s'en mêlent

Tout était prêt. Les effets étaient rassemblés et chargés sur les boeufs, que les enfants, qui couraient par tout le village, avaient amenés. Vers huit heures, la caravane s'étendit comme un long et bruyant ruban sur la route où l'herbe avait poussé.

Djanguir Bek, chef de ce clan comptait pour rien le pouvoir soviétique et se comportait comme ses aïeux et bisaïeuls ou comme il avait accoutumé de le faire sous le régime des Tachnaks. Monté sur un cheval fougeux, placé sur une hauteur comme un chef d'armée, il laissa passer devant lui la caravane et, s'étant rendu compte que tout était en ordre, il fait partir à l'amble son cheval gris, devançant les nomades qui s'en allaient en masse compacte, tels un mur.

Derrière le troupeau qu'il menait, un berger portait sur l'épaule un gros mouton qui s'était cassé la patte en route. Le berger fatigué, transpirait et trainait la jambe. Le mouton qui ne cessait de gigoter, finit par se dégager et tomba par terre.

ser zengûyên hespê xwe ji piya sekinî û çiqas jê dihat bi qemçiyan rabûyê :

- Kerê mezin! Te çawan wêrî vî pezî li erdê xî? Tu lingekî wî ne hêja yî! Ezê şanî te bidim, sa, kurê sa!»

Rencberê reben, li bin derban tewandî, kire hewar :

- Mîrê min, min ew bi qesid nexiste erdê... Ew bi xwe ji destê min xwe derêxist, min ew ji dûr ve hilgirtin û ez ji teab ketibûm...

Gotinên şivan ji beg re giran hatin; çawa rencberekî dikarî bêedebî bike û li ber begê xwe xeber bide? Mecîd Beg hîn bêtir xeyidî, hespê xwe ajot ser şivanê reben û li bin qemçiyan ew avête erdê.

Gava şivan dît ku nedikarî xwe ji destê wî xilas bike, xwe avête nav jinan ku gihaştibûn cem wan û xwe li paş wan veşart.

Cangîr Beg ji adet û isûlên kevn derneket. Ewî dizanî ku li sûcdarekî ku xwe davêje bextê jinan, êdî lê naxin. Di pevçûnan de, di kuştinan de, di şeran de, jin kefiya xwe ji serê xwe radikin, wê davêjin erdê û dibêjin : «Bi navê Xwedê, vê sînorê miqedes bigirin, êdî li hev mexin, bela xwe ji hev vekin». Û her du neyar bi ya wan dikin û dev ji hev berdidin.

- Ji siûda xwe, te xwe avête pişta jinan, yan na, min şanî te bida! Kurê berêz, diya te şîrê keran daye te!... Û Cangîr Beg hîn dom bi dujinan dikir...

Ciyê herkes di êlê de gelek bi nîzam hatibû saz kirin : Li pêşiyê jinên dewlemendan, li hesp an ga

Djanguir Agha le remaqua, s'approcha de l'ouvrier, se dressa sur ses étriers et et se mit à le fouetter de toutes ses forces.

- Espèce d'âne, comment as-tu osé laisser tomber ce mouton ? Tu ne vaux même pas sa patte ! Je vais te montrer, fils de chien...

L'ouvrier courbé sus les coups, s'écria:

- Mon prince, je ne l'ai pas fait exprès... C'est lui même qui s'est dégagé de mes bras; Je le portais de loin, j'étais fatigué...

De telle paroles parurent irrévérencieuses à Djanguir Bek de la part d'un berger vis à vis de son clan. Il se fâcha davantage, le bouscula avec son cheval, le renversa par terre tout en le cravachant.

Le berger, voyant qu'il ne s'en tirerait pas, se jeta vers les femmes qui arrivaient et se cacha derrière elles.

Djanguir Bek respecta les anciens usages et traditions. Il savait qu'on ne peut plus battre un coupable, s'il se réfugie derrière les femmes. En pleine bagarre, lors d'un assassinat ou d'une échauffourée, la femme kurde se met au milieu, enlève son mouchoir de tête, le jette par terre et dit : "que cette limite, au nom de Mahomet, soit sacrée ! Ne vous battez plus, n'en venez plus aux mains :" et les adversaires lui obéissent obligatoirement.

- Tu as de la chance de t'être caché derrière les femmes, autrement je t'en aurais fait voir... Fils de porc, ta mère t'a nourri de lait d'ânesse.... Et Djanguir Bek continuait à insulter le pauvre berger.

La marche de tout le monde était strictement réglée. En tête, les femmes de familles riches s'en allaient, montées sur des boeufs ou à cheval. Les femmes des pauvres et des

siwarbûyî, diçûn, bi çend gavan li paş, jinên feqîr, yên rencber û şivanan, dimeşiyan. Li pişt wan zarokên piçûk girêdayî bûn. Ewên ku bê zaro bûn, barên welê giran hilgirtibûn ku, bi zor di bin de bi rê ve diçûn. Li dû wan, gayên barkirî, hesp û çêlek û di dawiya gişan de, mî û bizin di riya xwe re diçûn. Dewlemend, şêx, melayên qure û rîspî, li ser hespan, di her du alî re, li cem kifletên xwe, bi pozbilindî dimeşiyan.

Roj ronak û germ bû. Jina Cangîr Beg a sêzde salî, Zedîne Xanim, li ser hespê, li cem 1'rax, nivînên xwe yên hevrîşim û micewheratan, diçû, di deryayên xeyalan de hêdî hêdî bi baweşînê mêş an kelmêş diqewirandin û li cariyên xwe qîr dikir. Pezê ketî, yê merivekî mêrê wê bû; ji lewre xanimê nedikarî bêteref bimîne :

- Çima, ewê digote mêrê xwe, te ev bêbextê ha di cî de ne kuşt ? Ew giş êdî bûne wek guran ku li deviyan dinêrin. Bi tenê qemçî dikare wan bîne îtaetê, yan na ewê rabin û me biqurtînin...

Dengekî tevlihev ji êlê hildibû... Mî, berx û bizin dikaliyan, çêlek û ga dioriyan û ji her alî zaro û keçik pehîzokên xwe digotin...

Gezo lêdana şivan dibû. Lê ew bi rojanî li gundên ermenî xebitîbû, ketibû nav civînan û ewî baş dizanî hikmê sovyetî çiqas heqên xebatker û feqîran diparêze, ji lewre ew vî tiştî qebûl nake, û gaziya reben, gundiyên feqîr û gundiyên pî (yên ku halê wan diqede), da ku dawiya zilmê bînin.

ouvriers suivraient à une certaine distance, portant attachés dans le dos, les enfants en bas âge. Celles qui n'avaient pas d'enfants portaient un fardeau si lourd qu'elles avançaient avec peine. Derrière elles venaient les boeufs chargés, derrière les boeufs, les chevaux et les vaches, et tout à la fin, les chèvres et les brebis. Les koulaks, les cheikhs, les pirs et les mollahs, à cheval accompagnaient de chaque côté la caravane, près de leurs familles.

La journée était ensoleillée et chaude. La femme de Djanguir Bek, Zadina Khanoum, âgée de treize, à cheval sur un destrier, accompagnait la vaisselle d'apparât, la riche literie de soie et les joyaux. Tout en nage s'éventant paresseusement avec une branche pour chasser les mouches et les moustiques, elle criait sur ses *djari* (servantes). Le mouton tombé appartenait à un parent de son mari et elle ne pouvait rester indifférente.

- Pourquoi, disait-elle à son mari, n'as-tu pas tué aussitôt ce lâche ? Ils sont tous devenus comme des loups qui louchent vers la forêt. Seul le fouet peut les tenir en soumission, sinon ils se lèveront et nous dévoreront...

Un bruit confus montait de la caravane... Les brebis, les moutons et les chèvres bêlaient, les vaches meuglaient et de toutes parts fusaient les voix sonores des enfants et des jeunes filles leur *pahizoks* (chansons d'automne) de nomades.

Gaso a vu la scène du berger maltraité. Mais il a travaillé comme journalier dans les villages voisins, il a fréquenté des réunions, il sait à quel point le pouvoir soviétique défend les droits de la main d'oeuvre rurale, aussi il commence à protester énergiquement et à exhorter les pauvres, les ouvriers, les paysans d'aisance moyenne à y mettre fin.

- Li ser laşê piraniya ji we, ciyên qemçiyan hîn sax nebûne; lê nihu wext hatiye, divê hun bizanin ku ev hal êdî nema dikare dom bike. Nihu hikmê me ye, divê ku êdî beg û axa ji me bitirsin! Lê, ji ehmeqiya xwe wek gayên zexel heya nihu em xwe datînin ber derbên wan, bêşan didin wan. Kê Cangîr Beg ji me re serek bijartiye? Çima sovyeteke me ya gund nîne? Em êdî ji vî halî têr bûne...

Ev gotin ketin devê jinan ku, li bin barên giran dimeşiyan. Piştî wan, zilaman jî xwe gihandin dengê Gezo. Deng bilintir dibû û xelk li dora Gezo kom dibûn.

- Li zozanan Cangîr Beg bi hesinekî li min xist, yekî digo.

- Û ewî li ser min jî du dar şkênandin, çima ku min ji kaniya ku li nêzîkî konê wî ye av dibir...

- Ev êdî bes e! Em dikarin ji heqê wan derkevin...

Hempa Mihoyê Şemo hate nêzîkî cemaetê û gote wan ku nihu beg wê bê û hesabê xwe ji bo wan gotinan ewê bi wan re bibîne.

Xelk li dora wî bûn kom. Şivanekî bi laş û gewde kire qîr :

- Wî ji hespê bînin xwar.

Ên mala me xirab dikin ev in; û ewî Miho ji pişta wî girt û ew ji hesp kişande jêr.

Li ser qîreqîrên Miho, Cangîr Beg, tifing bi dest, hespê xwe bezand û hate wê derê :

- Xwe ji hev bidin alî yan ezê berdim!

Xelk dev ji Mihoyê ji derbaketî berdan û xwe dan paş.

- Chez beaucoup d'entre vous, les traces des fouets ne sont pas encore cicatrisées , mais il est temps que vous sachiez que cela ne doit plus exister. Le pouvoir est maintenant à nous, ce sont les beks qui doient avoir peur de nous à présent, alors que, imbéciles que nous sommes, comme des boeufs inoffensifs, jusqu'à maintenant nous nous exposons à leurs coups et payons les impôts. Qui a élu Djanguir Bek pour notre chef? Pourquoi n'avons nous pas un soviet de village ? Nous en avons assez de leurs brimades à notre endroit.

Ces paroles furent reprises par les femmes qui marchaient à pied sous un lourd fardeau. Après elles, les hommes se joignirent aussi à la voix de Gaso. Le bruit s'élevait et la foule augmentait.

- Aux pâturages d'été, il m'a battu avec une tringle de fer, criait quelqu'un.

- Et sur moi, il a brisé deux bâtons parce que je puisais de l'eau à la source près de laquelle il avait dressé sa tente.

- C'en est assez ! Nous pouvons nous-mêmes règler leur compte à eux.

Le koulak, Maé Chémo s'approcha de cette foule. Il menaça que le bek allait venir et qu'ils payeraient pour ces paroles.

La foule se pressa autour de lui. Un berger bien bâti cria :

- Enlevez -le de son cheval. Ce sont ceux-là qui faussent notre cause. Et prenant Maé par la ceinture, il le tira du cheval.

Aux cris de Maé, Djanguir Bek arriva au galop, le fusil prêt.

- Dispersez-vous ou je tire, cria-t-il

La foule, abandonnant Maé, roué de coups, se jeta de côté.

- Kê dest pê kir? Cangîr Beg ji cemaetê pirsî.
- Me giş, me tev de kir! Bi dengekî gotin.

Gava çavên jinan li Cangîr Beg ketin, singên konan ji ser barên ga kişandin û xwe avêtin wî. Di nav wan de bi navê Elmast, jinikeke bejin bilind hebû. Ew di wextekê de li malên Molokan xebitîbû, piştre, gava vegeriyabû welêt Hikûmata Sovyetî erd dabûyê.

Elmast, singek di dest de, xwe avête Cangîr Beg û derbek avêtê ku çû li hespê wî ket. Heywan xwe hilda û xwe da alîkî. Gelek jin û mêrên din jê cesaret girtin û Cangîr Beg tehdîd kirin û ew revandin. Bîsteke dî, Pîr Ebas, çend şêx û dewlemendan, ji kitêbên miqedes ayet dixwendin û digotin ku li sereka rabûn guneheke pir, pir mezin e.

Hingê Gezo derket ser tehtekê û dest pê kir:
- Hevalino! Îro bi xwe, divê em zilamekî rêkin Erîvanê, cem Misto da ku wî ji her tiştî ageh bikin. Divê ku em çekên beg, axa û hempa, ji wan bistînin. Hun giş, diçin û tên gundên ermenî û tirk û dizanin ku li cem wan, axa û muxtar nemane. Lê heya nihu li vir beg û hempa me dixeniqînin.
- Divê em, wek Cangîr Beg, dersa hempa jî bidin, Elmast dibêje, ew xulamên began in û her gav destê wan digirin, ji ber ku kolemayina me ji menfaeta wan e.

Çend hebên din axaftin û qewirandina Cangîr Beg xwestin. Di vê gavê de, merivek xwe gihande êlê û xebera jêrîn da :

- Qui a commencé ? demanda Djanguir Bek à la foule.

- C'est nous, tous ensemble, crièrent-ils d'une seule voix.

Les femmes, apercevant Djanguir Bek, retirèrent les pieux de tente, chargés sur les boeufs et se jetèrent vers lui. Parmi elles, il y avait une femme de grande taille, Almast. Elle avait travaillé comme ouvrière chez les Molokans et était revenue depuis peu dans son pays ayant reçu de la terre grâce au pouvoir soviétique.

Se précipitant sur Djanguir Bak avec le gourdin, Almast en frappa son cheval. L'animal se cabra et sauta de côté. Encouragés par cet exemple, d'autres femmes et des hommes suivirent Almast et menacèrent aussi Djanguir Bek. Celui-ci s'enfuit, éperonnant son cheval et regagna en trombe la caravane. Bientôt, le pir Abbas et quelques autres cheikhs et koulaks s'approchèrent de la foule et se mirent à la morigéner. Les cheikhs citaient des versets des livres sacrés intimant qu'on ne peut aller contre ses chefs, car c'est un grand péché .

Alors Gaso, montant sur une grosse pierre, commença:

- Camarades. Aujourd'hui même nous devons envoyer un homme à Erivan, chez Misto, pour mettre qui de droit au courant de tout. Il faut désarmer les beks et les koulaks et nous devons élire un conseil de village. Tous vous fréquentez les villages arméniens et turcs, vous savez qu'ils n'ont plus de maires, alors qu'ici, jusqu'à présent, les beks nous étranglent.

- Il faut régaler ceux-ci, comme nous l'avons fait avec Djanguir Bek, renchérit Almast. Ils sont ses valets et sont toujours à aider les beks, car c'est leur intérêt de nous tenir en esclavage.

Beaucoup d'autres encore prirent la parole pour réclamer la révocation de Djanguir Bek. Quelqu'un de la foule qui venait seulement de rejoindre la caravane fit cette communication:

- Misto hatiye gund, Serekê Komîteya Bicîbir Gonaxçan û hin din jî pê re ne. Dixwazin sovyetên gundan bibijêrin. Lê herwekî nihu koçer vedigerin germiyanan, berê çûn cem Kurdên gundî, piştî hefteke, ewê bêne cem me. Nûhatî hîn îlawe kir ku Elîxan Beg ji muxtariyê hatibû avêtin, lê ku şêx, hempa û encimena eşrefan, gazî milet kiribûn da ku, dîsa li ser karanîna wî bixwaze û digotin ku niha em ne hewcê Sovyetan in.

- Ev giş karên Misto ne! Şêx û hempa digotin; Pîr Ebas her gav li pêşiya wan bû. Divê em wî nehêlin, yan na ewê toza me rake...

Koçer nêzîkî çiyakî bilind dibûn, Boxûtlû, ku weke nanekî şekir kenarên wî bilind bûn. Zinarekî mezin ber bi esmanan ve hilbûbû baskên keviri yên dêwane yên xwe vekiribû, ji jêr gelek reş û tarî, bi esmanê ji hevrîşima girtî ve zeliqayî dixuya. Koçer ji bo şevê li quntarê vî çiyayî sekinîn. hema li ser girekî agir pê xistin, beroşên tijî goşt danîn ser agir. Barên giran ên ga û hespan danîn. Jin bi lez û bez baran vedikirin û kulavan li erdê radixistin.

Piştî şîveke sivik, herwekî şev xweş bû, hemû li bin stêran raketin.

Serê sibê, diviyabû dîsa dom bi riya xwe bikin...

Dawiyê, roja sisiya, koçer gihaştin germiyana xwe, li wê, li ser erdekî glover û qasî 5 kîlometir fireh, konên xwe danîn û ew cî ji xwe re kirin warê zivistanê.

- Misto est déjà dans le village, le président du Comité exécutif du district, Gonakhtchan, et d'autres l'accompagnent. Ils veulent procéder aux élections des soviets de village, mais comme tout le monde est à la transhumance d'hiver, ils sont allées d'abord chez les Kurdes sédentaires et seront chez nous dans une semaine. Il ajouta que le maire Ali Khan Bek était déjà révoqué, mais que les pirs, les cheikhs et le conseil des notables en avaient appelé au peuple en le priant de demander sa réintégration et en disant que pour le moment on n'avait pas besoin des soviets.

- Tout cela, c'est l'oeuvre de Misto, disaient les cheikhs et les koulaks, pir Abbas en tête, il nous faut l'éliminer au plus vite, autrement, ça ne marchera plus.

Les nomades s'approchaient d'une haute montagne, Bogoutlou, qui ressemblait à un pain de sucre aux bords relevés. Un rocher énorme montait presque à pic haut dans le ciel, étendant immobiles ses ailes de pierre gigantesques. D'en bas il paraissait tout noir et comme collé de prés au ciel de soie foncée.

Les nomades s'arrêtèrent au pied de cette montagne pour la nuit. Déjà on allume des feux sur une éminence; on y place les marmites avec de la viande. Les boeufs et les chevaux sont débarassés de leurs lourdes charges. Les femmes s'empressent de défaire les ballots et d'étendre les feutres sur le sol.

Après un repas rapide, tous se couchèrent à la belle étoile, car la nuit était claire. Aux premiers rayons de soleil, il faudra partir plus loin.

Enfin au troisième jour de marche, on arriva, là, sur un arc de cercle de cinq kilomètres d'étendue environ, les nomades choisirent leur place et s'employèrent à organiser leur campement d'hiver.

Li biharê, gava berê pez didin zozanan, ev der dîsa vala dimînin. Di vê midetê de, ev der dîsa têr çêre dibin û giya çiqas firk be jî dîsa bi feyde ye û pez dikare hemû zivistanê lê biçêre.

Au printemps, ces endroits restent vides, car le bétail s'en va dans la montagne. Durant tout ce temps, l'herbe parvient à y repousser. Bien qu'elle ne soit pas drue elle est cependant utile et le bétail peut y paître tout l'hiver.

## 4- Fikrên nû
## di nav milet de belav dibin.

Dema dayina xûkiya began û sixreyan wan hatibû. Egîd Beg bi xulamên xwe ji eşîrê re da zanîn ku herin ciyê pezê wî yê zivistanê çêkin ; Cangîr Beg jî emir da êla xwe.

Gundiyên feqîr û pî (yên hinekî xweşhal), berê ku ji xwe re tiştekî bikin, diviyabû ku, mal û zar û zêçên xwe li bin ezmên bihêlin, bi mer û bêra herin şixulê began biqedînin. Gelek ji wan qebûl nekir, li dora Gezo civiyan û nerazîbûna xwe nîşan dan. Egîd Beg, qemçiyek di dest de, di ber koçeran re derbaz bû û bi awir li wan nêrî. Tu kes ji yên rûniştî ji bo ikraha adetên kevn, bi hatina wî ranebû.

- Xem nake, baş e, baş e, rûnin!... Egîd Beg gote wan. Di nêzîk de, ezê we ji bav û kalanên we bêtir bêxim bin hikmê xwe. Hun bawer dikin ku nîzama we

# 4- Les idées nouvelles se propagent

Le moment était arrivé où la population devait fournir au bek, les prestations en nature. Aguid Bek donna donc l'ordre à ses valets de faire savoir aux gens qu'ils avaient à se présenter pour réparer le campement d'hiver du bétail; Djanguir Bek donna le même ordre à sa tribu.

Les paysans pauvres et ceux d'aisance moyenne, avant d'avoir eu le temps de rien faire pour eux-mêmes, devaient donc abandonner leurs biens et leurs enfants à ciel ouvert et aller, avec des pelles et des bêches, travailler pour le bek. Plusieurs refusèrent. Réunis autour de Gaso, il manifestaient à haute voix leur mécontentement. Aguid Bek, le fouet à la main passa près des nomades, les regardant d'un air menaçant. Personne de ceux qui étaient là, assis par mépris de l'ancien *adat* (usage) ne se leva à l'approche d'Aguid Bek.

- Ça va, ce n'est rien, restez assis, remarqua Aguid Bek. Bientôt, je vous rendrai aussi obéissants que l'étaient vos pères et vos aïeux. Vous vous figurez que votre pouvoir à

ewê dom bike, ne? Hunê paşê bibînin!... Îngilîz û Taşnaq çermê we û yê xortên we yên komunîst wê rakin...

Tu kesî bersiva wî neda.Egîd Beg derbaz bû.

Li wî, aliyê wargekê, hempa, şêx û eşraf li cem Egîd Beg diciviyan û bi saetan ve, şêwra hev dikirin.

Gava hin feqîr û pî bi danîna konên began mijûl bûn komsomolek (endamekî ji xortên komunîst) ji bo xwestina êgir çû cem wan.

- Here bixebite!... Tu çi karî dikî, tiralo, zilamekî kal ku dixebitî gotê, ên li emrê bega ne em tenê ne...

- Ez tu cara şixulê dijminên xwe nakim, komsomol vegerandê.

- Ew ji ku dijminên me ne? Kalo heyirî...

Di vê gavê de Misto derket, gotinên wan bihîstin û gote kalo :

- Dijminên me kî ne, ezê ji te re bibêjim; gotinên min xweş bêxe serê xwe, wan di nav nas û hevalên xwe de belav bike û wan jî li dijminên xwe rake. Eger em destê hev bigirin, em bi hev re heval û yek bin emê bikaribin zora wan bibin ji ber ku heq bi me re ye...

- Min, dijminên me kî ne hîn fehm nekir ? Kalo dîsa pirsî.

- Dijminên me yên pêşîn û dijwartir beg, axa, mela, şêx û hempa ne. Bi wasiyeta adetên kevin, ew me ji xwe re dikin xulam û me ji bo şixulên xwe dixebitînin. Va ye binêr! Ewrên reş ji nihu de kom dibin; bîsteke din, baran wê bikeve, kifletên te wê şil bibin; ji ber ku berê ku tu konê xwe deynî, beg te mecbûr dike ku tu yê pezê wî deynî. Em nikarin êdî bi

vous va tenir longtemps ? Mais non, bientôt il ne sera plus. Les Anglais et les Tachnaks vous enlèveront la peau à vous et à vos jeunesses communistes.

Personne ne lui répondit. Il passa.

A tout bout de champ, les koulaks, les cheikhs, les notables se réunissaient chez Aguid Bek et tenaient de longs conciliabules.

Or pendant qu'on aménageait les campements d'hiver pour les beks, un komsomol (membre des jeunesses communistes) s'approcha de ceux qui travaillaient pour demander du feu.

- Va travailler, qu'as-tu à faire le fainéant, lui fit observer un vieillard qui travaillait, nous ne sommes pas les seuls soumis au bek.

- Je ne travaille jamais pour l'ennemi, répliqua le komsomol.

- D'où vient donc qu'ils soient nos ennemis, s'étonna le vieux.

A ce moment survint Misto. Entendant de quoi il s'agissait, il dit :

- Je t'expliquerai qui sont nos ennemis, garde le bien dans ta mémoire et va le raconter aux autres et excite les tous à la lutte contre ces ennemis. Si l'on s'y met tous ensemble, en amis, nous les vaincrons tous, car communistes et pouvoir soviétique sont avec nous.

- Je n'arrive pourtant point à comprendre qui sont nos ennemis, réitéra le vieux.

- Nos ennemis, ce sont les beks, les aghas, les mollas, les cheikhs, les koulaks. Se servant des anciens usages, ils nous forcent à travailler pour eux. Tiens regarde les nuages s'amassent déjà, il ne va pas tarder à pleuvoir, tes enfants seront trempés, car tu n'as pas encore dressé la tente pour

vî awayî bijîn. Li gora adetên kevn, divê ku em bê gotin serê xwe li ber beg, axa, şêx û hempa xwar bikin û guh bidin gotinên wan, ne ji ber ku ew zilamên qenc, xwenda, zana û bi eqil in, lê ji ber ku bi tenê beg an dewlemend in. Em ji aliyê wan çiqas tên êşandin û kêm kirin!... Li cem dewlemendan, kon tije mal û pere ye, lê, li pişta feqîran tenê kirasek dirandî heye. Divê ku em adet û qanûnên xwe yên kevin bavêjin û êdî guh nedin şêxan ku timî dibêjin : "bi gotina mezinên xwe, began bikin" ; guh nedin beg û axa ku emirên wek van didine me : «Dijî qudsiyeta şêxa tiştekî mebêjin! Ewê we kor bikin!...» Û gava yek qala şêxekî, pîrekî an melayekî dike, beg wî davêje ber daran. Bi vî awayî ew hev û du digirin û ji feqîran xebat û îtaetê dixwazin. Divê em van qanûnan ku ji aliyê beg, şêx û melayan hatine danîn berdin û qanûnên welê çêkin ku pê feqîr bikaribin bijîn û xwe ji bin istibdada axa û şêxan xilas bikin. Çima şêx û melayên feqîr tune ne? Ji ber ku ew me icbar dikin ku em ji wan re bixebitin.

Berê, gelek miletên din weke me dijîn. Ew jî weke me koçer û gundî bûn. Lê, ewan berî me fehm kirin, bi ziraet û çandiniyê re seneat jî elimîn û ji xwe re bajarên mezin çêkirin. Lê, em hîn wek berê dimînin. Em di koçeriyê de didin dû began, xizmeta wan dikin. Ev hal, mîna vê meselê ye: Herwekî bavekî du kur hebûn; yek ji wan, piştî ku hate dinê, mideteke di dergûşê de ma, piştre meşiya, mezin bû û bû zilam. Lê, ê din tim di dergûşê de ma û tu cara jê derneket. Em wek vî kurê paşîn in. Ev çend hezar sal in ku em hatine dinê, lê em hîn di dergûşê de ne û em bi jîriya xelkê dijîn. Êdî, ji bo me jî wext e da ku em jî rabin ser xwe û wek

eux, puisque le bek t'oblige à préparer d'abord l'établissement de son bétail. Mais on ne peut pas vivre ainsi plus longtemps. Nos usages nous dictent d'obéir aux beks, aux aghas, aux richards et de les écouter, non point parce qu'ils sont sages et bons, mais uniquement parce qu'ils sont des beks et des richards. Que de vexations ne supportons-nous pas de leur part ! Chez le riche, la tente regorge de biens et le pauvre n'a qu'une chemise déchirée sur le dos. Il faut abolir nos anciennes lois, ne plus écouter les cheikhs qui ne cessent de répéter: "obéisseez à vos supérieurs, les beks"; ne plus écouter les beks qui ornent; "n'ose rien dire contre la sainteté des cheikhs ! " Et si quelqu'un dit quelque chose contre un cheikh, un pir ou un molla, alors le bek le fait fustiger. Ainsi ils se soutiennent réciproquement et prêchent au peuple qu'il leur obéisse en travaillant. Il faut abroger ces lois créées par les beks, les cheikhs, les mollas. Il faut créer une loi telle qu'elle aidera les pauvres à vivre, à lutter contre les beks et le clergé. Pourquoi n'y a t'il pas de beks, de cheikhs, de mollas pauvres ? C'est parce qu'ils nous obligent, toi et moi, à travailler pour eux.

Bien des peuples vivaient jadis comme nous, nomadisaient d'un endroit à un autre, pratiquant l'élevage. Mais ils ont compris plus vite que nous. Il se sont installés, se sont mis à cultiver, à semer du blé. Ils ont bâti des villes. Mais nous, nous restons toujours comme par le passé, nous suivons les beks dans les transhumances et travaillons pour eux. C'est tout à fait comme si chez un père, il y avait deux fils: l'un, à sa naissance, resta quelque temps au berceau, puis se mit à marcher, grandit, devint un véritable homme, tandis que l'autre est resté toute sa vie dans son berceau. Nous sommes comme ce second fils. Il y a déjà bien des siècles, nous sommes nés, mais nous n'avons pas encore grandi, nous continuons à rester au berceau et nous vivons de l'intelligence d'autrui. Il est cependant temps pour nous de

miletên din bijîn. Binêr, meselen, li gora adetên me yên koçeran, divê ku her Kurd konê xwe bi awakî miayen deynê, yan na, ji qanûnên ocaxê derketin, mal û malbata wî tev de wê bîne helakê. Lê, digel vê yekê, beg û şêxên me, konên xwe bi kêfa xwe datînin û tu bela nayê serê wan.

Nexwe ev çima bi tenê ji me, ji feqîra re kifr e? Dîsa li gora adetên eşîrtiyê, divê ku her eşîr, her bavik, bi serê xwe bijî û gava zilamek ji eşîrekê dibe dijminê zilamekî ji eşîreke din her du eşîr ji bo van her du zilaman dibin dijminên hev û ev tişt ne ji bo carekê an du caran, lê tim û tim. Û ev pevçûn, şer û xwînrijandin, bi tenê bi kêrî beg û axeyan tên. Heta ew bi xwe vê dubendiyê dixin nav xelkê. Bigir meselen, dijmintiya eşîrên Ortlî û Kazan; ev çend sal in ku hevûdu dikujin û bi ser de jî bertîla didin began, lê ev êdî eşkere bûye ku dijmintiya her du qebîle bi teşwîqa Egîd Beg dest pê kir. Dirbo, li ber mirinê bi xwe got ku tu kes ji qebîleya Kazan li kuştina wî nedigeriya, lê Egîd Beg bi xwe fitne dabû wan; ewî bi guhê xwe bihîstibû. Hingê, Kazanan xwe avêtin wî û derba mirinê danê.

Çi xirabî û perîşanî ji van tiştan diqewimînin li vê beriyê. Piştre, li gora adetên me, divê ku şixulên giran û dijwar ji aliyê jinan bêne qedandin. Ew ji vî tiştî zû nexweş û pîr dibin û zû dimirin. Û jinanîn li cem me çawa çêdibe? Brayê xwe bigir, meselen: kal bûye û hîn heya nihu ji xwe re jin neaniye; ji ber ku pereyê wî nîne û nikare qelen bide. Lê dewlemend bi xwe?... Ha ji te re Egîd Beg: sê jinên wî hene û nihu jî ji xwe re keça Nado ya donzde salî xwestiye. Apê Cangîr Beg, Elî

nous mettre sur nos pieds et de vivre comme vivent les autres peuples. D'après notre loi, un Kurde doit vivre sous la tente et la dresser d'une certaine façon et non d'une autre, sinon l'infraction aux lois du saint *odjakh* (foyer) fera périr la famille entière. Et cependant, les beks et les cheikhs eux-mêmes dressent leur tente comme ils l'entendent et il ne leur arrive rien.

Alors, pouquoi est-ce un péché seulement pour nous autres, les pauvres? D'après l'*adat* (coutume), chaque tribu et chaque clan doivent vivre chacun pour soi, et si, quelqu'un d'un clan offense d'une façon quelconque le clan de celui qui a offensé, et cela non pas une fois, mais indéfiniment. Toutes ces discordes, ces bagarres, ces effusions de sang ne profitent qu'aux beks et aux aghas qui sont eux-mêmes les principaux instigateurs de ces différends. Prenez, par exemple, l'inimitié du clan des Ortli et des Kazan. Il y a combien d'années qu'ils s'entretuent avec, à la clé, les multiples cadeaux au bek "pour avoir troublé l'ordre de la tribu" ! Or, cette tuerie a été déclenchée à l'instigation d'Aguid Bek. Feu Dirbo en mourant, avoua que personne du clan de Kazan n'avait l'idée de le tuer, mais que c'est Aguid Bek qui les excitait, lui même, l'a entendu dire. Et c'est alors que les Kazan se sont jetés sur lui et l'ont blessé mortellement.

Que de malheur et de misères arrivent dans la steppe à cause de cela ! Notre loi prescrit que tout le gros travail soit fait par les femmes. Elles en vieillissent et en meurent plus vite. Et les mariages, comment se font-ils chez nous.? Prends ton frère par exemple. Il est déjà vieux, mais il n'a pu se marier jusqu'ici, car il est pauvre et incapable de verse le kalym (dot). Et les beks ? Voilà Aguid Bek qui a trois femmes, et qui vient il n'y a pas longtemps, de payer la dot et de prendre la fille de Nado qui a douze ans. L'oncle de

Tahar 56 salî ye, lê di van rojan de, bi pere, keçeke 14 salî ji xwe re anî. Kê ev qanûn danîne? Û kê gotiye ku dewlemend dikarin yekê bêtir jin bistînin gava ku em feqîr, em nikarin ? Bê şik, beg û şêxan ev adet û qanûn danîne.

Di her civînê de, min rakirina qelen xwest û we giş destê xwe radikir. Em hemû, rojek berî rojekê, rakirina qelen û ji vî nîrî xilaskirina milet dixwazin. Vê havînê, li zozanên Alagozê, di *Civîna Mezin* de, pîr, kal, keç û xort tevde, me rakirina qelen teleb kiribû.

- Lê, beg, ji bo vî tiştî çi digotin? Komsomol ji kalo pirsî.

- Çi digotin? Digotin ku ev bê imkan e, ku ev guneh e, ku Misto xayinekî dînê me ye, ku êwî ji xwe re jineke rûs aniye û simbêlê xwe kur kiriye. Wan rojê ha, êvarekê, beg li hev civiyabûn û difikirîn bi çi awayî xwe ji Misto xilas bikin... ku ew ji sovyetan derxistiye û nahêle ew bikevin civînan.

Cemaet xwe ker kir. Komsomol demekê rama, piştre ji bêrîka xwe kaxitek derêxist û bi dengekî bilind, emrê lexivbûna qelen xwend û got ku heçî bi pere jinekê bînê, ewê bête girtin û 500 rûbil ceza wê jê bêne standin. Piştre, heta ku keçik nebûye şanzde û kurik jî hejde salî nikarin bizewicin. Û divê ku, di nav jin û mêr de ji 10 sal bêtir ferq nebe. Û dawiyê, qanûn êdî nahêle ku tu kes ji jinekê bêtir bînê.

- Bijî! Kalo ban kir û ji kêfa xwe mera xwe avête hewayê.

Djanguir Bek, Ali Taar, une fillette de 14 ans. Qui a fait ces lois et a dit que les riches pouvaient se marier et avoir plusieurs femmes, tandis que nous autres les pauvres, nous ne le pouvons pas ? Mais ce sont ces mêmes beks et ces mêmes cheikhs qui les ont faites.

A chaque réunion, j'ai parlé de la suppression du kalym, et tous vous leviez la main pour. Tous nous voulons supprimer le kalym au plus vite et libérer le peuple de ce joug. Au congrès des Kurdes, en été, aux pâturages d'Alagoeuz, nous, nos femmes et notre jeunesse, d'une seule voix nous avions exigé l'abolition du kalym.

- Et que disaient les beks à ce propos, demanda au vieillard le komsomol qui se trouvait à côté de lui ?

- Ce qu'ils disaient ? Ils disaient que c'est impossible, que c'est un péché, que Misto est un traitre de notre religion, qu'il a épousé une Russe, qu'il s'est rasé la moustache et que maintenant il veut souiller notre religion. Ces jours-ci, un soir, au village, tous les beks étaient réunis et discutaient sur la manière dont on pouvait se débarasser de Misto qui les a tous éliminés du travail dans les soviets et ne les laisse pas pénétrer dans les réunions.

Tout le monde se tut. Le komsomol réfléchit un instant, puis sortit de sa poche un papier et lut à haute voix que le kalym est déjà supprimé par la loi que celui qui achètera une femme sera arrêté et qu'on lui prendra cinq cent roubles d'amende. En outre, on ne peut épouser ou donner en mariage une jeune fille, tant qu'elle n'a pas seize ans accomplis et le garçon dix-huit. Quand ce sont des adultes qui se marient, ils ne peuvent différer de plus de dix ans d'âge, que ce soit l'homme ou la femme. La polygamie est également abolie et personne n'a le droit de prendre plus d'une femme.

- Bravo ! s'exclama le vieillard tout rayonnant et il lança sa pelle en l'air.

Kurdên ku bi îşên began mijûl bûn, hatin li dora wan kom bûn. Kalo ji komsomol xwest ku careke dî emrê lexivkirina qelen bixwîne. Ewî dîsa ew xwend û ji wan re her tişt da fehim kirin.

- Bijî Misto! Bijî Misto! Xelkê kir qîrîn.

Mecîd Beg deng û kenên wan bihîstin. Rabû û ber bi wan ve çû. Misto bi gotara xwe ya birî dom kir :

- Û dijminê me yê duwem çiya ne, got û bi tiliya xwe Alagozê şanî da. Belê, belê, welê li min menêrin, Alagoz him diya me, dayika me ya şîr e û him dijminê me yê pêşî. Wekî dêyek bê xem ew rû dide zaroyê xwe, wî hînî xebatê nake û piştre gava hêrsa wê radibe bi daran lê dide ; Alagoz jî rûdaye Kurdan û ew hînî tiraliyê kiriye. Tenê gava ku berf bibare û kerî ji sermayê bê hal dikeve çandiniyê dikin. Heke Kurd li gundan bi cî bibana, bi zeviyan mijûl bibana, ewê mecbûrî bixebitiyana û wisa çêtir dibû. Ewê wê gavê bizanibana ku ji bo zivistanê divê giya bê çinîn, ewê zeviyan bikêlîna û biçinîna. Lê hun, her carê hun li ciyekî nû datînin û piştî demekê ji wê diçin ciyekî din. Li zivistanê hun kêmasiya avê dikşînin. Ji ber koçeriyê hun û zaroyên we bê xwendin dimînin. Eger hun li gundan bi cî bibana ewê mektebeke we hebûna û hun dê hînî xwendinê bibûna.

Du xortên şivan guhdarî dikirin. Gava navê mektebê bihîstin bi kêf li hev nêrîn.

- Ne wisa ye ey cemaet, ne rast e ku dijminê me yê pêşî beg, axa, şêx û mela ne û dijminê duwem jî koçerî ye ; em dikarin ji heqê wan bên der eger em baş bifikirin û eger em hemû destê xwe bidine hev.

Les Kurdes qui étaient occupés à travailler pour le bek vinrent faire cercle autour d'eux. Le vieillard demanda au komsomol de relire le décret ? Celui-ci le lut donc à nouveau et l'expliqua encore une fois.

- Bijî Misto ! (vive Misto) ! s'écria-t-on à l'entour.

Madjid Bek entendit leurs cris et leurs rires. Il se leva et se dirigea vers la foule. Misto continuait son discours interrompu.

- Et notre second ennemi, ce sont ces montagnes, dit-il en montrant du doigt l'Alagoeuz. Oui, oui, ne me regardez pas comme cela. L'Alagoeuz est tout à la fois notre mère et nourrice et notre premier ennemi. Comme une mère insouciante gâte son enfant, ne l'habitue pas au travail, et, ensuite, prise de colère, lui administre des coups de bâtons, l'Alagoeuz a de même gâté le Kurde et l'a habitué à la paresse. Ce n'est que lorsque la neige tombe et que le troupeau périt que le Kurde se ressaisit et songe à l'agriculture. Si les Kurdes vivaient comme des sédentaires, attachés à la terre, ils seraient forcés de travailler et ce serait mieux. Ils sauraient alors qu'il faut préparer du fourrage pour l'hiver, ils sèmeraient et moissonneraient. Mais vous, vous vous installez chaque fois à un nouvel endroit et quelque temps après, vous l'abandonnez et partez. En hiver vous souffrez du manque d'eau. Vous et vos enfants vous restez illettrés à cause de ces transhumances. Si vous deveniez sédentaires, vous auriez une école et vous apprendriezz tous à lire.

Deux jeunes bergers écoutaient. Entendant mentionner l'école, ils se regardèrent joyeusement.

- Eh bien, *Djymat* (assemblée) , ai-je dit la vérité que notre premier ennemi ce sont les beks, les aghas, les cheikhs et mollas et que notre second ennemi ce sont les transhu-

- Ev giş rast e, gundiyan tevde bi dengekî gotin.

Misto di cî de ew berdan û çû gundekî din.

Mecîd Beg hate cem koma feqîran; gava çavê wî li komsomol ket xwe nêzîkî wî kir û ji serê wî heya piyên wî lê nêrî û bi xeyid lê kire qîr :

- Çima tu şixulê xwe disekinînî? Careke din, eger tu bê obeya min, ezê stuyê te badim...

Komsomol qet xwe şaş nekir:

- Ji mêj ve êdî obeya te nemaye. Va ye obeya te!

Xort ev gotin û bi destê xwe şikeftek nîşan dayê:
- Emê te di nêzîkê de, bêxinê.

Mecîd Beg qemçiya xwe rakir û xwe avête komsomol ku li wî xe. Lê zilamên pîr û kal ku şixulê wî dikirin bi enir gotin :

- Destê xwe nedî vî mêrxasê ha, mîr, yan na emê aliyê wî bigirin û emê te pîs bikin...!

- Hun li van zugirtên ha binêrin... Ne bi tenê ji wan re qemçî lazim e, lê divê ku qûna wan jî bi hesinekî sorkirî bête dax kirin, herwekî Egîd Beg bi Şerqiyan re kir qîrîn zilamên beg. Ev bi xwe tiştekî nake û nahêle em jî bixebitin, zilamên began gotin, divê serê Misto jî bête pelaxtin, ewî hemû ev çîrokan derêxist!

Mecîd Beg sekînî, qebda xencera xwe givaşt û bi awir li xelkê ku gazin dikirin nêrî û mirmirî: «Xem nake. Di nêzîkê de dora me wê bê û emê şanî we bidin, kurên sa...!»

Komsomol bê deng vegeriya mala xwe.

mances, qu'on peut en venir à bout si l'on y réfléchit bien et si l'on se met tous d'accord à la besogne ?

- C'est vrai, répondirent les pauvres d'une seule voix.

Misto partit aussitôt pour le village voisin où l'attendait Gonakhtchan.

Madjid Bek s'approcha de la foule. Apercevant le komsomol, il vint plus près, et le toisa sévèrement et cria:

- Pourquoi arrêtes-tu le travail ? N'ose plus te hasarder dans notre oba sinon je te tords le cou !

Le komsomol ne se laissa pas déconcerter.

- Il y a longtemps que ton oba n'existe plus. La voila ton oba, dit-il en montrant une caverne, on t'y fera bientôt entrer.

Medjid Bek, leva son fouet, se précipita vers le komsomol. Mais les viellards pauvres qui travaillaient pour le bek, le voyant s'écrièrent:

- N'ose pas toucher à ce gaillard, prince, sinon nous le défendrons et il y aura du vilain pour toi.

- Les voyez-vous ces fainéants n'ont pas seulement besoin du fouet, il leur faut encore marquer le derrière au fer chauffé à blanc, comme Aguid Bek l'a fait avec les Charkis, s'écrièrent les partisans du bek. Non seulement, il ne fait rien lui-même, mais il nous empêche de travailler. Il faudrait bien aussi rosser Misto qui a déclenché tous ces boniments.

Medjid Bek s'arrêta, serra le manche de son poignard, regarda d'un air méchant la foule qui grondait et murmura: «Ce n'est rien, bientôt viendra notre tour et alors je vous en ferai voir, fils de chien !»

Tranquillement, le komsomol s'en alla chez lui.

## 5- Serhişkiya derebegiyan dom dike

Roj diçû ava. Jor, li ezmanan, eylo, ji hev dûr, li hewa hilavistî diman, weke ku bi çavên xwe yên tûj li nêçîra xwe digeriyan. Car car li girên rût dengekî zirav û kûvî dihat; ev jî dengê eylokî çiyayî bû.

Konên began û govên pezê wan hatibûn danîn. Şêxan jî konên xwe vegirtibûn. Ewrekî reş, li ûfiq xuya kir; bayekî xurt ew ber bi warê koçera ve anî. Berî rojava, taviyeke xurt hat. Zaro û hûrmurên ewên ku ji bo beg û şêx dişuxilîn şil bûn.

Bayê payizê yê sar rabû. Zaro ji sermê dilerizîn. Bi hatina şevê baran sekinî.

Zaroyên beg, axa û şêx ji konan derketin, destên hevûdu girtin, stran gotin û reqisîn. Zaroyên xebatkaran, di nav palasên şil de xwe pêçabûn û bi keser seyra wan dikirin...

# 5- L'entêtement des féodaux continue

Le jour tombait. Haut dans le ciel planaient des aigles isolés qui restaient suspendus pour dépister le butin de leur oeil perçant. Par moment, dans les collines désertiques, se laissait entendre un cri aigu et sauvage: c'était un aigle de montagne qui le poussait.

Les tentes du bek et de sa famille et les enclos d'hiver pour son bétail étaient déjà prêts. Les cheikhs aussi dressèrent leurs tentes. Un nuage noir se montra à l'horizon chassé vers le stationnement des nomades par un vent violent. Avant le coucher du soleil une forte averse tomba. Les effets et les enfants des pauvres qui avaient travaillé pour le bek furent mouillés.

Le vent froid d'automne souffla. Les enfants, transis de froid, tremblaient. Puis la nuit vint et la pluit cessa.

Les enfants des koulaks, des beks et des cheikhs sortirent des tentes, se réunirent en une ronde, entonnèrent des chansons et se mirent à danser. Quant aux enfants des pauvres, couchés, enroulés dans les palas mouillés, ils écoutaient avec envie cette gaieté.

Hingê feqîran gotinên Misto anîn bîra xwe û heya sibê ji beg û axan gazin kirin û lanet li wan barandin.

Sibehî, roj tîrêjên xwe dirijandin li ser beriyê, û giya li kirran, weke tayên hevrîşimê yên zirav diçirisîn.

Kirr, mîna şeveke zivistanê bi mirûz û melûl in. Wek meydaneke şer, vir da, wê da ji hestiyên insan û heywanan, tije ne. Di wextê Taşnaqan de, Kurd û Ermenî, şoreşgerên bi tenê ku nedixwestin bikevin bin bikmê tifingên mawzer ên Taşnaqan xwe li wê veşartin.

Roj hîn bilindtir bû. Dewar û pez ji şahiyê dibori-yan û dikaliyan. Hesp, bi hiskirina rahetiya germiyanê, dişiyiyan. Jin jî, bi dilxweşî, li dora baran diçûn û dihatin.

Gava hempa, bi giranî piyase dikirin, da ku piştî siwariya çend rojan lingên xwe yên tevizî rahet bikin, feqîran kevir hildigirtin û ji bo konên xwe cî dikolan. Zaroyên wan jî berx dibirin çêrandinê.

Cangîr Beg diltengî dikir ku zû here Yûsif Beg bibîne û jê re bûyerên rojên dawîn bibêje.

Li ser hespê xwe, di şiverêyeke xwar û mar re, ser berjêr dibû. Ji nişkave, ji nêzîk, ji pişt tehtan, keneke gurr kete guhê wî: jinên kurd dikeniyan. Cangîr Beg hespê xwe sekinand. Jê hate xwar û di şiverê re beziya çivanekan, giha erdekî bi sêlak ku diçû heya golê,

Les pauvres gens alors se rappelèrent les paroles de Misto et un grondement de mécontententement, de malédictions à l'adresse des beks ne cessa guère jusqu'au matin.

Au matin, le soleil éclairait la steppe et les herbes brillèrent dans les *kir* (endroit dénudés de la steppe), comme de la soie fine.

Les kirs sont moroses et mornes comme une nuit d'hiver. Comme un champ de bataille, ils sont parsemés d'ossements d'hommes et de bêtes. C'est là que, sous le régime des Tachnaks, se cachaient les Turcs, les Kurdes, les révolutionnaires isolés qui ne voulaient pas se soumettre au Mauser Tachnak.

Le soleil monta plus haut. Le bétail égaillé meugla et bêla. Les chevaux hénnirent sentant le long repos et la vie facile des pâturages. Les femmes s'empressaient joyeusement autour de leur ballots.

Tandis que les koulaks se promenaient posêment dégourdissant leurs jambes raidies après la longue chevauchée, les pauvres soulevaient des pierres, creusaient des emplacements pour leurs tentes et les enfants menaient les jeunes agneaux aux pâturages.

Djanguir Bek s'impatientait. Il voulait au plus tôt rejoindre Ousoub Bek et lui raconter les évènements des derniers jours.

Il était en train de descentre à cheval un long sentier sinueux, lorsque tout à coup, à proximité, derrière les rochers, un rire sonore se fit entendre. Des femmes kurdes riaient. Djanguir Bek arrêta son cheval, sauta à bas et courut par le

coyeke kûr tê re derbaz dibû. Jinên kurd jê av dikişandin, ji ber ku li wê, av ji ya golê paqijtir, cemidîtir û zelaltir bû.

Meyane, pişta wê li şiverê û fistana wê ya şîn lê, li wê disekinî. Ji bin kofiya wê ya glover, ji serê wê yê piçûk ber bi paş ve avêtî, 14 keziyên zirav û dirêj dihatin xwar. Ji dora xwe ne ageh, Meyane serê xwe dihejand û dikenî. Li ber wê, destên wî li kêlekên wî, xortekî kurd bi laş û gewde rawestabû. Ewî diranên xwe yên xweşik û spî nîşan didan, brûyên xwe digijgijandin li Meyane dinêrî. Bi xiftana xwe ya peritî, bi kumê xwe yê riziyayî û bi piyên xwe yên nîvxwas, dirûvê koçerekî kurd pê nediket.

Gava çavê wî li Cangîr Beg ket, çend pirs gotine Meyane, xwe xwar kir, şerbika xwe girt û bi zerikekê dest bi dagirtina wê kir. Meyane xwe zivirand û çavên wî rastî yên Cangîr Beg hatin? Rûyê wê, berê sor, piştre bû zer û ken jê winda bû.

Cangîr Beg heyirî, xwe hilda. Meyaneya wî, bi tena xwe, bi vî zilamê perîşan û bi kincên peritî re çi dikir? Ji xeydê, qirika wî hate givaştin. Diranên xwe reqriqandin, bê deng xwe nêzîkî Kurdê belengaz kir, şerbika wî jê stand li serê raqibê xwe xist. Bi milên wî girt û ew ewqas bi qiwet dehif da ku şivanê reben xwe ne girt û ket.

- Sa! Cangîr Beg zuriya, tu ciyê xwe nas nakî?! Berê ku tu hîn sax î ji ber min biqele.!

sentier. Après quelques détours, le sentier aboutissait à une longue bande de sable qui descendait vers le lac. Un fossé profond la traversait. Les femmes kurdes y puisaient l'eau qui venait du lac, y restait comme dans un filtre et était plus fraîche et plus propre qu'au bord du lac où le bétail la troublait.

Le dos tourné au sentier, Maianeh s'y tenait dans son *antari* (robe) bleu; De sous sa calotte ronde sur sa petite tête renversée en arrière, pendaient quatorze nattes minces et longues. Mutine, Maianeh riait en secouant la tête. En face d'elle, les mains sur les hanches, se tenait un grand jeune homme kurde montrant ses belles dents blanches, fronçant sévèrement les sourcils, il regardait fixement le visage de Maianeh. Avec son arkhaloukh déguenillé, son turban déchiré sur la tête, pieds nus dans des espadrilles de fortune, il n'avait pourtant pas l'air d'un simple nomade kurde.

Ayant aperçu Djanguir Bek, il dit quelques mots à Maieneh, se baissa, souleva de terre sa cruche et se mit à la remplir avec une tasse. Maianeh se retourna. Ses yeux rencontrèrent ceux de Djanguir Bek. Sa figure rougit tout d'abord, puis pâlit et son sourire s'effaça de son visage.

Djanguir Bek, tout interdit, sursauta. Sa Maianeh en tête à tête avec ce misérable et indigne loqueteux ! La colère le saisit à la gorge. Il grinça des dents, s'approcha sans bruit du Kurde, s'empara de sa cruche et en frappa la tête de son rival. Puis il le prit par les épaules et le poussa si fort sur le sentier que l'autre perdit l'équilibre et tomba.

- Chien, hurla Djanguir Bek. Tu ne connais pas ta place ? Sauve-toi pendant que tu es encore en vie !

Kurmancê feqîr rabû, bi milê xwe ruyê xwe paqij kir, hinekî ma, piştre rahişte darekî û Cangîr Beg tehdîd kir :

- Sa tu yî û bavê te ye! Ewî lê kire qîr, pişta xwe tewand, ji şiverê xwe da alî û di nav tehtan de winda bû.

- Meyane...! Dengê Cangîr Beg ê birî dilerizî... Meyane...! Te ji bîr kir ku tu dergistiya min î ? Te çawa diwêrî tu bi vî şivanê reben re xeber bidî û heta pê re heneka jî bikî...? Ma ji îro heya du heftan ezê qelen rênekim bavê te...?

- Tuê çawa qelen rêkî, ma êdî qelen maye ? Meyane heyirî, jê pirsî. Eger tu qelen bidî, li gora qanûnên sovyetî, ewê te bigirin.

- Xem mexwe, ewê min negirin. Ezê qelen bi awakî welê bidim ku tu kes pê nizane...

- Cangîr Beg, mîr im... Meyane bi dengekî nizim gotê, ew şivanê me ye, hatibû avê û arîkariya min kir.

- Lê, eger yekî ji eşîra me ew dîba, di nav xelkê de îştixalî wê çêba, hingê ez mecbûr dibûm te berdim.

- Oh! Ez gorî, min efû bike! Ew jî ne şivanekî adî ye. Ew jî ji maleke baş e. Bavê wî mêrxasê hemû eşîra Hesenî bû. Em bi hev re mezin bûne. Bavê min ew bire ba xwe, ji ber ku mêrekî hêja ye. Carekê, nihu Meyane dibêje, ez bi ocaxa pîroz a şêx û pîr Ebas sond dixwim ku ezê êdî li rûyê wî yê kirêt nanêrin. Û Meyane bi girînê ket.

Bi dîtina hêstirên çavên wê, xeyda Cangîr Beg di cî de çû :

- Baş e, Meyane, bi dengekî şîrîn ewî gotê, ez te efû dikim. Ez bawer im ku ev tişt ji bo cara pêşîn bû û

Le Kurde se leva , s'essuya le visage d'un revers de manche, resta un instant, puis saisit un bâton et en menaça Djanguir Bek.

- Chien toi-même, ainsi que ton père ! cria-t-il rugissant. Et courbant l'échine, il disparut dans les rocher s'écartant du sentier.

- Maianeh.... tremblait, la voix brisée de Djanguir Bek, Maianeh..., tu as oublié que tu es ma fiancée. Comment astu osé parler et même plaisanter avec ce berger miséreux ? Est-ce que ce n'est pas dans deux semaines que je vais envoyer le kalym à ton père ?

- Comment l'enverras-tu puisqu'il n'y a plus de kalym à présent ? répliqua Maianeh étonnée. Au contrairre on va t'arrêter d'après la loi soviétique !

- Ne t'inquiètes pas. On ne m'arrêtera pas. Je vais donner le kalym de telle façon que personne ne le saura.

- Djanguir Bek, mon maître, chuchota Maianeh, c'est notre *chivan* (berger), il prenait de l'eau et il m'a aidé.

- Mais si quelqu'un de notre clan l'avait vu ? Il y aurait eu des commérages dans toute la tribu, je devrait renoncer au mariage et l'hostilité commencerait entre nos clans.

- Oh, Seigneur, pardonne-moi ! Il n'est pas simple berger. Lui aussi est d'une bonne maison. Son père était *merkhas* (brave) pour toute la tribu des Hasani. Nous avons grandi ensemble. Mon père l'a pris parce que c'était un bon *aiguid*. A lui seul, il a défendu le troupeau contre les brigands qui l'attaquaient. Mais maintenant, dit Maianeh, je jure par le saint *odjakh* (foyer) du Cheikh et du pir Abbas, que je ne regarderai jamais plus ce vilain garçon. Et elle pleura.

A la vue de ces larmes, la colère disparut aussitôt de l'âme de Djanguir Bek.

- C'est bien, Maianeh, dit-il d'une voix douce, je te pardonne. Je crois que c'était la première fois et que cela ne

ku careke dî çê nabe... Ezê emir bidim xulamên xwe ku vî sêwlekî ji vir biqewirînin. Vî geniyê ha xwest ku bi êgir bileyize... Çavên xwe bimale û êdî megirî...

Meyane û Cangîr Beg li hevhatin. Piştî nîv saetekê herwekî tiştek ne qewimîbû, Meyane, kûzê wê li ser milê wê, berê xwe dabû çiyê û Cangîr Beg jî vedigeriya ciyê ku hespê xwe li wê hiştibû.

Lê hesp li wê nebû. Kurdê êşayî, ji bo hilanîna heyfa xwe, ew revandibû.

Cangîr Beg hêrs bû; lê, tu tişt jê nedihat. Tu kes li wê nebû ku emir bidiyê û neyarê xwe pê bidê girtin. Bi peyatî xwe gihande konê Yûsif Beg.

Di nav warê koçeran de xeber zû belav bû. Kêfa feqîran gelek pê dihat û pesnê vî mêrxasê hêja didan...

Beyarên çolê li bin tîrêjên rojê dişewitin. Di germiya bi rewrewk de, ûfiq xwe dilorîne û dilerize.

Li perava golê ya bi sêlak, konên Yûsif Beg ên reş xweş dixuyin û li paş wan, wek komên giya, konên feqîran belawela ne.

Pez ji golê wê da diçêre, hesp li ber qiraxê, bi diranên xwe yên spî û xurt giyayên ter heya bi rehên wan ve jê dikin.

Bîst gava ji konê Yûsif ê mestir wê de, ji mêvanan re konekî nû vedigirin, ji ber ku ji Yûsif Beg re dane

se répétera plus. J'ordonnerai aux domestiques de chasser au loin ce chenapan, ce mendigot qui a voulu jouer avec le feu. Essuie tes yeux et ne pleure plus.

Ils se réconcilièrent. Une demi-heure plus tard, comme si rien n'était, Maianeh gravissait la montagne, sa cruche sur l'épaule et Djanguir Bek retournait à l'endroit où il avait laissé son cheval.

Mais le cheval n'y était plus. Le Kurde offensé l'avait enlevé pour se venger.

Djanguir Bek devint furieux, mais il ne pouvait rien faire. Il n'y avait là personne à qui il pût donner l'ordre de rattraper le Kurde. Il dut donc aller à pied jusqu'à la tente d'Ousoub Bek.

Tout le campement des nomades apprit bien vite ce qui s'était passé. Les pauvres jubilaient et louaient le gaillard.

Les dunes grises du désert reçoivent la caresse du soleil brûlant. Dans la chaleur ondoyante, l'horizon se berce et frisonne.

Sur la jeune rive sablonneuse du lac, les tentes noires d'Ousoub Bek se profilent nettement et, derrière elles, comme des meules de foin, les autres sont disséminées.

Le bétail s'est égaillé assez loin du campement, les chevaux paissent au bord de l'eau, coupant, de leurs fortes dents blanches, à la racine même l'herbe savoureuse.

A une vingtaine de pas de la tente principale d'Ousoub Bek, on dresse une nouvelle tente pour les amis, car on a fait

zanîn ku Taşnaq (ximpabêtên kevn), wê bên cem wî.

Dûyê agiran dirêj dibe, li ser yekî nanê lewaş lê dixin û li ser yekî din qelî dibirêjin. Seyran Xanim, jina Yûsif Beg, ji xadiman re emir dide. Her der paqij û her tişt saz dikin.

Yûsif Beg, bi giranî, li ser mehfûrekî rûniştiye; li beriyê dinêre û çavneriya mêvanên xwe dike. Li cem wî, Cangîr Beg jê re dibêje ku di nêzîkê de, ewê dest bi bijartina sovyetên koçeran bikin.
- Tu dizanî, Cangîr Beg, ku kurê min derêxistine? Nihu çûne cem Kurdên gundî û piştî çend rojan ewê bên cem me. Zor bide qebîlka xwe da ku te bikin serekê sovyeta xwe. Bi şêxa re bixebite ku feqîran bixapînin.
- Na, Yûsif Beg, ev Mistoyê melûn hemû zugurtan li ber me rakir. Tê gotin ku havînê ev Misto diçû û dihate vir, civînan çêdikir, timî li dijî me dixebitî û haya me ji tiştêkî nebû.
- Belê, Cangîr Beg, tu rast dibêjî. Gava Misto li gundê me rencber û feqîr civandin, em nexistin civînê û ji me re da zanîn ku êdî milet mezinahiya began û axan ya bi zor naxwaze û ku ji îro pêve ewê xwe bi xwe îdare bike. Û hingê şêwra gund bê me hate danîn.

Di vê gavê de, ji gundê Qoçê karkirek tevî sê denên mey hate wê derê û got ku ji deşta Serderabad hin siwar ber bi konên koçeran ve dihatin.

Deşta Serdarabad! Çi ordiyên dijwar di nav te re derbaz bûne! Bi ser dirêjahî û pehnahiya te re, Taşnaq,

savoir à Ousoub Bek que les Tachnaks, anciens khmbapètes, viennent chez lui.

Les feux fument; sur l'un on cuit les *lavach*, (fines galettes de froment) sur un autre, on prépare le rôti des bergers, le *kali*. Seiran Khanoum, femme d'Ousoub Bek, donne ses ordres aux domestiques, on nettoie et met tout en ordre.

Ousoub Bek reste gravement assis sur un feutre étendu par terre et regarde vers la steppe d'où doivent apparaître les visiteurs. A son côté Djanguir Bek lui raconte que, d'après des bruits, on va bientôt commencer les élections aux soviets nomades.

- Tu sais, Djanguir Bek, qu'ils ont déjà révoqué mon fils ? Ils sont allés chez les Kurdes sédentaires et bientôt; ils viendront chez nous. Tu dois influencer ton clan de telle manière qu'on te demande toi et personne d'autre comme président du soviet nomade. Tâche que les cheikhs et les pirs cuisinent les pauvrees.

- Non,Ousoub Bek, ce maudit Misto a soulevé tous les miséreux contre nous. Il paraît qu'en été ce Misto allait et venait par ici, convoquait des réunions, menait tout le temps la campagne et nous n'avons rien su !

- Oui, Djanguir Bek, tu as raison. Quand il a réuni les paysans dans notre village, on ne nous a pas admis, on nous a déclarés privés de droits et le conseil du village a été élu sans nous.

Un ouvrier, venu du village de Koch avec trois outres de vin, raconte qu'en bas, dans la plaine de Sardarabad, on voit des cavaliers qui se dirigent droit vers le campement d'hiver.

Tirk û firariyên ku çûn û hatin. Te himbêza xwe ji wan re yek bi yek vekir. Lê ew, bêî ku li ser erdê te yê bê pîvan tu şopa bihêlin, giş winda bûn û çûn...Beriya ziwa û bê av, bêdengiya xwe ya giran biparêze...

Kê bawer dikir ku li vê beriyê ku ji ewqas insanan re bûbû goristan, rojekê, bi vekirina coya Serdarabad, eşîrên kurd wê bikaribin cîwar bibin. Ew Kurdên ku, bav û kalanên wan, bi sedan ve salan, di vê beriyê re bi koçeriyê derbaz bûbûn.

Li beriyê hesp xweş bi teleb bi rê ve diçin. Li çola û li çiyan xebera hatina Misto û yá Encimena Mintiqê ya Tenfîzî ji bo bijartina meclîsên şewrê hin zûtir digehin gundan. Belê, li van çolên bi kevir ku ji zaroyên beriyê re bûne star, ta nihu xeynî hikmê sovyetî tu kes tu car nehatibû hawara feqîr û rebenek bi serêxwe.

La steppe de Sardarabad ! Que d'armées terribles y ont passé. En long et en large elle a été parcourue par les Tachnaks, les Turcs, les fuyards; elle les a tous accueillis et, les uns après les autres, ils ont disparu sans laisser de traces dans son espace vaste et sans limites. Steppe jeune, à végétations rare, garde ton lourd silence !

Ne croit-on pas rêver en s'apercevant que, dans cette steppe où tant de monde trouva son tombeau, à présent, grâce à la construction du grand canal de Sardarabad, plus d'un clan kurde pourra s'établir à demeure, ces mêmes Kurdes dont les pères et les aïeux nomadisèrent, durant des siècles, dans cette steppe.

Les chevaux galopent avec entrain dans la steppe. Mais plus vite encore, par delà les déserts dénudés et les monts, court la nouvelle que le président du Comité exécutif du district et Misto sont en route pour venir ici, où les étendues pierreuses abritent les fils de la steppe, ici où personne, excepté le pouvoir des soviets, n'est jamais venu en aide à un pauvre isolé !.

## 6- Daweteke Eşîran

Gava bavê wî mir, Bro hîn gelek piçûk bû. Ji wî, jê re 20 pez, ga û hespek mabûn. Diya Bro, Besê, her gav digot: «Bavê te li ber mirinê gote min ku bi van pezan ez qelenê te bidim û jinekê ji te re bînim», û ewê bi dil û can li van miyan dinêrî.

Ji bo peydakirina dergistiyeke hêja ji kurê xwe re Besê gelek geriya, lê tim taba wê vala diçû; qelenekî giran dixwestin. Ji piçûkahiya xwe de, Bro, Meyane nas dikir û her du jî hej hev dikirin. Lê, Bro nediwêrî dilê xwe ji diya xwe re veke.

Carekê, di şeveke tarî de, gava Bro ji xebata xwe vedigeriya mal, rastî Mayene hat ku melûl û bi dilekî xemgîn diçû. Bi dîtina wê Bro lê kenî, silav lê kir, ew girt, ew kişande sîngê xwe, û ew maçî kir û rûyê wê çima ewqas bêmad û çavên wê çima tije hêstir bûn, jê pirsî.

## 6- Un mariage dans les tribus

Bro était encore jeune quand il perdit son père. Il en hérita un petit bien; vingt moutons, un boeuf et un cheval. La mère de Bro, Bessé, disait souvent : «Le père, en mourant, m'a recommandé de payer le kalym avec les brebis qu'il a pu réunir avec son travail et de marier le fils». Et elle prodiguait tous ses soins aux brebis.

Bessé chercha longtemps une fiancée pour son fils, mais n'en trouvait guère. On demandait un trop grand kalym. Depuis son enfance, Bro connaissait bien Maianeh et ils s'aimaient, mais en attendant, il n'osait pas faire part de son désir à sa mère.

Une fois, par une sombre nuit, en rentrant chez lui du travail, Bro rencontra Maianeh. Elle s'en allait toute triste avec de pénibles pensées. En la voyant, Bro, sourit, la salua, la pressa contre lui, la baisa sur la joue et lui demanda pourquoi son visage était si triste et ses yeux pleins de larmes ?

Meyane gotê ku Cangîr Beg ew ji xwe re dixwest.

- Ez kurê koçerekî bi şeref im, Bro vegerandê, ez dilê xwe naguhirim. Tu yê bibî ya min! Em tev de mezin bûne. Me bi hev re zarotiya xwe di zozanên Alagozê de derbaz kiriye û gotin daye hev û du. Çawa dibe ku nihu bêbextî li min bikî? Dibêjim qey piştî mirina bavê min û feqîr ketina me...

- Na Bro, ez weke berê hej te dikim,Meyane bi girîn gotê! Lê, li bêsiûdiya me binêre... Vî Cangîr Begê qereqûş ez ecibandime û bavê min dilê wî naşkîne û dibêje: «Ew beg û zilamekî dewlemend e; ewê qelenekî giran bide...»

Bro gelek kûr rama; ewî dizanî bi begekî re şer kirin çiqas dijwar e, nemaze bi axayê êlê re. Lê, ewî di cî de xiste bîra xwe ku here ji diya xwe re bêje ku qelenê Meyane bidê.

Li gora adetê, Besê apê Bro ezimand mala xwe û bi dizî qelen hate dayin.

Piştî lihevhatin û dayina qelen divê ku xort ji merivên dergistiya xwe re diyariya bidê û li ber wan bi zîrekî û xwînşêrîniya xwe jî xwe bi qiymet bikê. Besê ku, ciyê bavekî girtibû, li kurê xwe dinêrî û digot :

- Te dît, kurê min, min wesiyeta bavê te bi cî anî. Sibê, tu yê bibî xwedî jin. Ji îro bi şûn da, êdî tu bi serêxwe yî. Divê ku tu xwe bi xwe îdare bikî û ji her tiştî bêtir bala xwe bidê miyên xwe? Sivik, pozbilind mebe. Gava tu diçî nav eşîrekê ku zilamên wê bi çavekî ne divê ku tu jî wek wan bibî û xwe bielimînî adetên wan.

Maianeh raconta que Djanguir Bek la voulait prendre pour femme.

- Je suis un honnête fils de nomade, dit Bro. Je ne changerai pas d'avis; tu seras à moi. Nous avons grandi ensemble, passé ensemble notre enfance aux pâturages des monts Alagoeuz, nous nous sommes donnés parole, est-ce possible que tu me trahisses maintenant ? On dirait que depuis la mort de mon père et notre appauvrissement...

- Non, Bro, je t'aime comme auparavant, pleura Maianeh. Mais voici le malheur, cet épervier de Djanguir Bek m'a visitée et mon père ne veut pas le refuser, c'est un homme riche, dit-il, il donnera un fort kalym.

Bro devint tout pensif. Il sait bien comme il est difficile de lutter avec un bek, surtout avec un *aghué-élé* (chef de clan). Mais il décida sur le champ de prier sa mère de payer le kalym pour Maianeh.

Suivant la coutume, Bessé a invité l'oncle de Bro et le kalym a été versé secrètement.

Après l'entente et le versement du kalym, le fiancé doit porter des cadeaux aux principaux parents de la fiancée et se racheter auprès de ses parents, non seulement au moyen de ces dons, mais encore par son esprit. Bessé, assumant les fonctions paternelles, s'est assise sur ses jambes repliées et, regardant son fils, lui dit :

- Eh bien, mon fils, voilà. Demain tu auras une femme. C'est ce que j'ai pu faire pour toi en exécutant le testament du père. Désormais, tu es ton propre maître, tu dois savoir bien conduire ton ménage et surtout bien soigner les brebis qui nous font vivre . Ne sois pas léger. Ne sois pas orgueilleux. Si tu te rends dans une tribu et que tu vois que les hommes n'y ont qu'un seul oeil tu dois devenir comme eux en t'adaptant à la vie de cette tribu.

- Baş e, dayê, Bro vegerandê.

- Û nihu emê bi mêvanên xwe mijûl bin; gelo ji her kes re topay (xomçe) hatin rêkirin?

Li gora isûlên eşîrtiyê divê ku desgirtî ji her vexwendiyê dawetê re topayekê bişîne: destmal, sabûn, êlax... Ewê ku dil dike bê dawetê, diyarî qebûl dike, yan na wê nastîne.

- Belê, yadê, me ji her kesî rêkir.

- Gelo diyarî wê têr bikin?

- Herê, dayê, ewê têr bikin; ji ber ku apê min ji bo daweta min heft pez dan min. Ewî baş dizanî ku em bi tena xwe ji heq dernediketin...

Roja dîtir gundê Bro nedihate naskirin; gelek mêvan hatibûnê. Dawûl û zirne dengê xwe yên bilind digihandin ciyê dûr. Merivên Bro giş li wê bûn. Gundî, bi xiftanên cejnê û bi kum û destmalên xwe yên rengareng bi kêfxweşî, ji konekî diçûn konekî din. Di nav wan de, jin bi fistanên cejnê yên giranbiha û bi neqiş, bi delalî dikeniyan. Li ser kofiyên delalên çiyê, zîv, zêr û guhar diçirisîn.

Li wî aliyê gund tevdaneke din hebû. Li wê jî, siwar ji bona cirîdê civiyabûn. Her yekî ji wan zor dida xwe ku hinerên hespê xwe pêş xelkê bike. Hineka bi hev re şert digirtin û hin jî li ser esîlbûna hespên xwe isbatên rengareng derdixistin.

Dawiyê, beza hespan dest pê kir. Meydana hespan 10 kîlometir dirêj bû. Siwar bi çargavên piçûk,

- Bien mère, répondit Bro.

- Et maintenant, pensons aux invités. A-t-on envoyé des *topai* (cadeaux) à tous ?

La coutume exige, en effet, que le fiancé envoie un *topai* à chaque invité de la noce, mouchoir, morceau de savon, etc.. Celui qui désire prendre part à la noce accepte le cadeau et celui qui n'y tient pas le décline.

- Oui, mère, on en a envoyé à tout le monde.

- Est-ce qu'il y aura assez de cadeaux ?

- Oui, mère, ça suffira, car l'oncle m'a donné sept moutons pour le mariage. Il sait bien que seuls nous ne pourrions pas supporter les frais.

Le lendemain, on aurait difficilement reconnu le *kichlak* (village d'hiver) de Bro. De nombreux invités étaient arrivés, la *zourna* (clarinette) et le tambour faisaient entendre leur son prolongé. Les parents du fiancé étaient là. Les Kurdes en *arkhaloukh* de gala bigarrés, en *oïma* et en turbans de couleurs voyantes allaient pleins d'entrain d'une tente à l'autre, s'assemblaient en groupes sur les pelouses, devisaient gaiement. Parmi eux, les femmes aux visages basanés, souriantes dans leurs lourdes robes de cérémonie de couleurs variées. Sur la tête des élégantes de montagne en toute leur splendeur, se dressaient de hautes coiffes enrichies de pièces de monnaie et de perles, appelées *kofi*.

A l'autre extrémité du kichlak l'animation régnait aussi. Là s'étaient réunis avec leurs chevaux les participants du *djirid* (course équestre). Chacun s'efforçait de montrer les qualités exceptionnelles de son coursier. On discutait pour savoir qui serait le gagnant. D'autres affirmaient que leurs chevaux sont des pur-sang et sortaient des attestations de toutes sortes sur leur origine.

gava digihaştin serê meydanê, bi dengê zirneyê zîz û *qaydê siwariyan* dixist bi hespên xwe cenbazî û hinerbaziyên dijwar dikirin.

Xelkê bi vî awayî kêf dikir. Di vê gavê de, Bro li ser textê zavatiyê rûniştîbû. Xortê ku li dora wî civiyabûn distrandin, direqisîn. Hineka serê wî kur dikir, ew dixemilandin û cilên xweşik lê dikirin. Li gora adetên Kurdên aliyê me, pôrê wî bi derece dibirîn; her hevalekî wî diçû cem berber, pere didayê û je dixwest ku para wî ji ya yên din zûtir biqusîne. Perê ku bi vî awayî kom dibû diçû sendûqa xortan.

Emê bêne Meyanê: ew jî di bin kon de, bi hevalên xwe re rûniştibû. Ewan cilên wê lê dikirin, û li gora adetên kurdî, digirîn jî.

Yekê ji keçika stranan cilwergirtina bûkan digot :

*Em xerîb in, bi tenê ne*
*Li ber malê rûniştî ne*
*Tu kes nizane em kîne*
*Wey li min xerîbê, wey li min pepûke !*

*Ez mala bavo dibînim*
*Banê serî kevn dibînim*
*Li xwe me de zava xorte*
*Ez bi tenê xerîb im*

*Va ye ez diçim, êdî hew têm mala bavo*
*Digrîm û xatirê xwe dixwazim*
*Ez bi tenê xerîb im*

Enfin, les courses commencèrent. La distance à parcourir était de dix kilomètres. Les cavaliers en arrivant au petit trop à la ligne de départ exécutaient divers numéros audacieux de voltige aux sons prolongés de la zourna qui jouait la mélodie appropriée *(qeidé souariya)*.

Ainsi, s'amusait le monde. Pendant ce temps, Bro était "hissé sur le trône", comme le disent les Kurdes. Les jeunes-gens, qui l'entouraient, s'amusaient, chantaient des chansons, lui rasaient la tête, s'apprêtaient à l'habiller. Suivant l'usage kurde, on rasait la tête par étapes. Chaque camarade s'approchait du barbier, le payait et lui demandait de raser plus vite sa part de chevelure. L'argent ramassé par le barbier était destiné à la marmite de la jeunesse.

Quant à Maianeh, elle restait assise sous la tente, entourée de ses amis qui l'habillaient, tout en pleurant, comme l'exigeait la coutume.

Une des jeunes filles entonna la chanson d'habillement de la fiancée.

*Seuls, toi et moi, sommes des étrangers,*
*Assis hors de la maison.*
*Personne ne sait qui nous sommes.*
*Oh, étrangère que je suis, oh, malheureuse !*

*Je vois la maison paternelle.*
*Le vieux toit qui la couvre*
*Ne te frappe pas, ton fiancé est jeune,*
*Moi, seule, je suis étrangère ici.*

*Me voilà partie, je ne reviendrai jamais*
*A ma maison familiale.*
*En pleurant et en faisant des adieux à la maison,*
*Il n'y a que moi étrangère ici*

*Ez destmaleke sor im*
*Di nav xerîban de qor im*
*Jar bikeve nav wî nanê*
*Ku diya min dida min*
*Ji bo qelenekî min rebenê*
*Difroşin kalekî genî*

Piştî her misra, giş digiriyan. Lê digel vê yekê, her yekê ji wan digote bûkê: «Tu çiqas bextiyar î! Mêrê te xort û çeleng e. Lê, em bi xwe hîn nizanin çi bête serê me? Dibe ku, em jina sisiya, an çara ya kalekî genî bibin? Hingê bê dilê xwe emê mala bavê xwe berdin û ji dil hêstirên çavan birijînin »...

Ber bi nîvroyê ve, gund hinek bê deng bû.Meyanê siwarî hespekî kirin û bi hevaltiya siwaran, ew birin mala Bro. Li ber derî tifinga berdan û diya Bro, di her destekî xwe de du firax girtin û reqsa koçerî kir. Gava Meyane di şîpandeyê re derbaz dibû kûzek danîn ber wê; ewê ew şikênand û kete hundirê malê û dawet jî li wê giha dawiya xwe. Deryaya dengê Meyane xwe ker kir. Herkes çû mala xwe û her der bê deng bû.

Ev e saleke ku Meyane mêr kiriye. Li gora hesabê wê, ev sêzde heyiv in ku hatiye mala Bro. Bi tenê, piştî zewaca xwe bi mideteke, Meyane dikarî rûyê xwe veke, xêlî jê hilîne û bi xesûya xwe re xeber bide.

Cangîr Beg Meyaneya delal ji bîr nekiribû. Gava xulamê ku ewî rêkiribû cem bavê Meyanê vegeriya û nûçeya zewaca Emînê bi Bro re anî Cangîr Beg sond xwar ku ewê Bro sax nahêle du dafikekê de bikuje.

*Je suis comme un mouchard écarlate*
*Bien en vue parmi les étrangers.*
*Que soit maudit le pain.*
*Que me donnait ma mère.*
*Pour un kalym on me vend*
*Malheureuse, à un si vieux....*

Après chaque couplet, toutes pleuraient. Mais chacune pensait en même temps: “combien tu es heureuse, ton mari est jeune et beau. Et nous, nous ne savons pas encore ce qui adviendra de nous. Peut-être serons seconde ou troisième femme d'un vieillard méchant. Alors, pour de bon, nous aurons de la peine, à quitter nos parents et nous verserons des larmes, non point pour respecter la coutume, mais ce seront des pleurs réels et véritables”.

Vers midi, il y eut un peu d'apaisement. On mit Maianeh à cheval et escortés de cavaliers, on la mena à la maison de Bro. A son approche, on tira quelques coups de fusil et la mère de Bro, avec deux assiettes dans les mains dansa le *kotchéri* (danse nomade). Quand Maianeh traversa le seuil de la tente, on mit sous ses pieds un vase d'argile qu'elle écrasa et entra dans la maison. Ainsi prit fin la cérémonie. La mer de vacarme humain se tut. Chacun regagna sa maison. Le silence s'installa.

Voici une année déjà que Maianeh est mariée. D'après le calcul de Maianeh, treize lunes se sont succédé depuis le jour où elle entra dans la maison de Bro. Et ce n'est qu'à l'expiration du délai imparti par la coutume que Maianeh obtint le droit de découvrir son visage, jusque là voilé d'un *khéli* (mousseline), et de parler à sa belle-mère.

Djanguir Bek n'avait pas oublié la belle Maianeh. Quand le domestique qu'il avait envoyé chez le père de Maianeh lui rapporta qu'elle avait déjà épousé Bro, il jura de l'abatte d'un coup de fusil dans une embuscade.

Saet pey saet, roj pey roj, meh pey meh diçûn; Bro bi kêf û dilxweşiyê bi Meyanê re dijî û diya wî jî li cem bûk û kurê xwe di derya bextiyariyê de ajinî dikir.

Les heures suivaient les heures, les jours suivaient les jours, les mois, les mois. Bro vivait avec Maianah en plein bonheur et la mère était toute à sa joie en voyant ce jeune couple...

## 7- Demeke nû dest pê kir

Bihar nêzîk dibe. Wa dixuye ku roj li ser erdê, bi tîrêjên xwe yên zêrîn, dixwaze her tiştî bişewitîne. Teht û girên wargeha zivistanê ên zer diçirisin. Giyayê gangez gurr heşîn dibe.

Li bin kon agir hêdî hêdî pêketiye. Çend Kurd li dora wî civiyane. Siha simbêlên wan ên dirêj dikeve ser rûyê wan û çavên wan ji guriya êgir diçirisin. Pir hêdî, weke mirmira avekê, bi hev re xeber didin :

- Gelek baş e! Bi vî awayî, Edê, li ser çêre, milk û bêşa dest bi axaftinê kir. Carekê bînin bîra xwe, ewî digot, ji destê van zaliman me çendîn sal ezab û perîşanî kişand! Erd û çêreyên baş di destên wan de bûn û bi ser de jî tu bêş nedidan. Lê, ji me bi xwe, her tiştê me distandin. Nihu, her wekî Misto digot, emê her tiştê wan bistînin, erd û çêre wê bikevin destên şewrên koçeran.

# 7- Une nouvelle ère a commencée

Le printemps approche. Le soleil semble vouloir tout incendier sur la terre en envoyant des milliers de rayons d'or brûlants. Les rochers et les collines jaunes des campements d'hiver sont incandescents. L'herbe *ganguez* pousse drue.

Le feu brûle lentement près de la tente. Quelques Kurdes sont réunis autour du feu. Les longues moustaches jettent une ombre sur les visages, les yeux gardent le reflet des flammes. Très bas, comme le murmure d'une source, coule la conversation.

- Très bien ! c'est ainsi qu'Adé commença l'entretien sur les pâturages et les taxes. Pensez combien d'années nous avons souffert dans les mains de ces oppresseurs. Les meilleurs pâturages étaient à eux et ils ne payaient aucune taxe, tandis qu'à nous, on nous prenait tout. Maintenant, nous allons faire comme l'a dit Misto, tous les paturâges vont passer dans les mains des soviets nomades.

Edê, dûr û dirêj behsa gelek tiştên din kir, piştre, blûra xwe girt û ew danî ser lêvên xwe. Weke tîrêjên roja germ, ahengên wê bayê beriyê dadigirtin, diketin nav konan, ji jin û dergistiyan re, şadî dibirin û delalên wan tanîn bîra wan.

Feqîran, demeke dirêj ji serbestbûna xwe re strandin û reqisîn. Ber bi sibê ve, dengê blûrê hate birîn û xelk ji hev belav bû.

Ji nişkave, warê di xew de, bi hewar û qîrînên bilind şiyar bû. Zilamên nîv-tazî an bi kiras û derpî, ji konan derketin çûn navrasta war. Di nava meydanê de peya kom bûbûn û xwe tev didan; tu kes nedizanî behsa çi ewqas bi germî dikirin? Tu kes sebebê hewara wan seh nedikir?

Lê, wa ye, siha merivên beg û axa ên bi gazin! Li dû wan jî, pîr û şêxên rêhdirêj xuya kirin.

- Ho, ehlê dîn! Evane dest pê kirin. Xwedê Teala ji me re belakî dişîne. Ne bi tenê hikim kete destê xwedênenasan, lê nihu jî beg, qewal û şêxan digirin, dînê pîrozê Melekê Tawis tê rakirin. Em nihu giş li ber helakê ne! Sebebê van tişta gî Misto ye, de herine wî ji ortê rakin û heyfa me jê hêlînin!

Lê gundiyên feqîr, ciwêlek, rencber, pale û pî ji vê nûçeyê gelek kêfxweş bûn û bi lez û bez dîsa vegeriyan malên xwe. Li meydanê, bi tenê beg, pîr, şêx, meriv û xulamên wan man.

Et Adé parla encore longtemps de bien des choses. Puis, il prit son *blûr* (flûte) et l'approcha de ses lèvres. Comme des rayons de chaud soleil, les sons remplissaient l'air de la steppe, volaient sous les tentes, apportaient la joie aux femmes et, aux fiancées, la pensée de l'aimé. Les pauvres chantèrent et dansèrent longtemps, fêtant leur libération. Vers le matin seulement, les sons du blûr se turent et les gens se dispersèrent.

Le campement endormi fut brusquement réveillé par des appels et des hauts cris. Les hommes tels qu'ils étaient, dévêtus, accoururent au centre du kichlak. Déjà beaucoup de monde s'était réuni. Tous étaient agités, discutaient avec chaleur on ne sait quoi, personne ne comprenait la raison de l'alarme

Mais voici que les silhouettes menaçantes des parents des beks se dessinèrent et, à leur suite, apparurent pirs et cheikhs aux barbes longues.

- Oh ! fidèles, commencèrent-ils. Le grand Dieu nous envoie une épreuve. Il n'a pas suffi que le pouvoir soit passé aux sans-Dieu, voici que maintenant on arrête les beks ainsi que les principaux membres du clergé, les kavals et que le saint culte de Melek Taous est suspendu. La perte nous menace tous ! Allez donc, supprimez ce Misto qui est la cause de tout ! oh ! croyants, vengez-vous sur lui.

Mais les pauvres, les ouvriers, les villageois d'aisance moyenne se réjouirent de cette nouvelle et regagnèrent bruyamment leurs maisons. Seuls restèrent sur place les parents des beks, le clergé et leurs valets partisans.

La nuit d'un bleu sombre, la nuit aux yeux bleus embrassa la terre.

Şeveke şînê tarî, şeveke bi çavên şîn, erd xiste himbêza xwe û her tişt xwe kerr kir.

Ermenistana Sovyetî ji Kurdan re gundên nû ava kirin. Li şûna konên reş û kadîn û holikan, nihu bi du, xaniyên wan ên bilind, bi pencereyên fireh û ronî hene.

Feqîr, ciwêlek û pî ji xwe re kolxoz pêk anîne û xwediyên mal û milk bûne. Genim tov dikin û diçinin. Di kolxozan de makîneyên to, penîr û nivîşk hene.

Di nav Kurdan de, karkerên bijare û pispor hene. Giş endamên kolxoza ne, an şivan in. Xort hemû di partiya komunîst de ne û ketine dibistana. Pir ji wan di zanîngeha seneat an ya febrîqan de dixwînin. Hin ji wan di zanîngehên Lenîngrad û Moskova de dielimin.

Nihu, li ciyê ku berê warên koçeran bûn, jîneke sosyalîst a nû dikele.

Tout s'immobilisa dans le calme....

L'Arménie soviétique a fait bâtir pour les Kurdes des villages nouveaux. Au lieu des sombres tentes et d'abris de fortune, ils habitent maintenat de hautes maisons claires avec de grandes fenêtres.

Les pauvres, les ouvriers et les paysans d'aisance moyenne ont organisé des kolkhoz. Ils ont maintenant leurs champs. Ils sèment et récoltent du blé. Dans les kolkhoz, il y a des écrémeuses, des barattes, des installations de fromagerie.

Parmi les Kurdes, il y a déjà un certain nombre d'ouvriers de choc (*ourdaniki*) d'hommes, "distingués" (*znatnyié ludi*, signalés dans la "production"). Tous ils sont membres de kolkhoz, bergers. La jeunesse s'est inscrite au komsomol et fréquente l'école. Nombreux sont ceux qui apprennent dans les *rabfaks* (facultés d'usine) et aux écoles professionnelles ; certains suivent les cours dans les instituts de Léningrad et de Moscou.

Une vie socialiste bouillonne là où il y avait des campements nomades.

Finito di stampare
nel marzo 1990 dalla
Società Cooperativa Tipografica
di Padova

Ereb Şemo

# ŞIVANÊ KURD
# LE BERGER KURDE

Di *Şivanê kurd* de Ereb Şemo, bi awayekî gelek xwezayî û sade, û ne bê şiîr, bûyerên her roj, jiyana eşîrên kurdên koçer bi me dide nasîn. Mirov ewê nikaribe van nivîsaran bê heyecan û bê eleqe bixwîne, nemaze ji ber ku êdî îro ev orf û adetên sedsalan di piraniya Kurdistanê de li ber windabûnê ne.

Dans *le Berger kurde,* Ereb Chémo, avec beaucoup de naturel et de simplicité et non sans poésie, nous fait connaître, dans les détails de tous les jours, la vie au grand air des tribus nomades. On ne lira pas ces récits sans émotion ni non plus sans intérêt, d'autant plus que ces coutumes séculaires ont pratiquement disparu dans la majeure partie du Kurdistan.

INSTITUT KURDE DE PARIS

85 FF
ISBN 2-908416-01-8